

T.C.
Zanîngeha Yüzüncü Yıl
Enstîtûya Zimanên Zindî
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

KOVARA HAWARÊ
û
BANDORA WÊ YA LI SER ZIMANÊ KURDÎ

Amadekar:
Süleyman ÇETİN
13950001003

Şêwirmend:
Prof. Dr. Mehmet Zeydin YILDIZ

Van-2016

NAVEROK

KURTE	IV
ÖZET	VII
ABSTRACT	XI
PÊŞGOTIN Ê SPASÎ	XIV
KURTKIRINA PEYVA	XVI
DESTPÊK.....	1
1. Dawîya Sedsala XIX'an û Serê Sedsala XX'an de Rewşa Sîyasî Ya Kurda û Rewşenbîrên Wan.....	2
2. Dema Osmanîyan de Xebatên Kurdan yê Derbarê Çandî.....	20
3. Rojnamegerîya Kurdî.....	24
4. Malbata Bedirxanîyan û Di Çanda Kurdî da Gringîya Wan	32
a) Mîr Bedirxanê Evdalxan (1803-1868).....	33
b) Emîn Alî Bedirxan (1851 - 1926).....	35
c) Mîqdat Mîdhat Bedirxan (1858-1915).....	37
d) Evdilrehman Bedirxan (1868 – 1936)	38
e) Sureyya Bedirxan (1883-1938).....	39
f) Yê Din	40
BEŞA YEKEMÎN: KOVARA HAWAR.....	41
1.1. Kovara Hawar û Mercên Dema Weşana Wê	41
1.2. Belavkirina Kovara Hawar û Bandora Wê Ya Li Ser Kurda	45
1.3. Dabeşkirina Nivîsên Hawarê Li Gor Mijaran	48
1.4. Nivîskarên Hawarê	51
1.4.1. Mîr Celadet Alî Bedirxan (1893 - 1951).....	51
1.4.2. Kamiran Alî Bedirxan(1895-1978).....	54
1.4.3. Rewşen Bedirxan (1909-1992)	57
1.4.4. Cegerxwîn (1903-1984)	58

1.4.5. Osman Sebrî (1905-1993).....	60
1.4.6. Pîremêrd (1867-1950).....	61
1.4.7. Qedrî Can (1911-1972).....	64
1.4.8. Qedrî Cemîl Paşa (1891-1973)	66
1.4.9. Reşîdê Kurd (1910-1968)	68
1.4.10. Ehmed Namî (1906-1975)	70
1.4.11. Hesên Hîşyar (1907-1985).....	72
1.4.12. Faîq Bêkes (1905-1948).....	74
1.4.13. Refîq Hilmî (1898-1960)	75
1.4.14. Dr. Ehmed Nafiz (1899-1968)	76
1.4.15. Dr. Nuredin Zaza (1919-1988)	78
1.4.16. Tewfîq Wehbî (1891-1984)	79
1.4.17. Elî Seydo Goranî (1908-1992).....	80
BEŞA DUYEMÎN: BANDORA KOVARA HAWARÊ LI SER ZIMANÊ KURDÎ	83
2.1. Ziman û Erka Wê	83
2.2. Di Pêvajoya Dîrokê De Kurd û Zimanê Kurdî	84
2.3. Elfabeyên Ku Kurdan Bikaranîne	91
2.4. Bandora Kovara Hawarê Ya Li Ser Zimanê Kurdî	98
2.4.1. Elfabe	107
2.4.2. Rêziman	119
2.4.3. Edebiyat	124
2.4.4. Ferheng	136
ENCAM Ê NÎRXANDIN	152
ÇAVKANÎ	156
PÊVEK	165
Pêvek 1. Dabeşkirina Nivîsan Li Gor Mîjara.....	165
Pêvek 2. Hejmarên Peyva Di Ferhengoka Hawarê De	167

Pêvek 3. Nivîskarên Hawarê.....	168
Pêvek 4. Çend Mînak Ji Kovarê	182



KURTE

Süleyman ÇETİN, *Kovara Hawarê û Bandora Wê Ya Li Ser Zimanê Kurdî*, Teza Lisansa Bilind, Wan, 2016, 16+203 r.

Di dîroka rojnamegerîya Kurdî de weşaneke girîng jî, kovara Hawarê ye. Bandora vê kovarê di hemû alîyên ziman û wêjeya Kurdî de tê sehkirin. Hawar di zimanê Kurdî de tê maneya “gazî û qîrîkirin” ê. Wisa xuya dike ku, evê kovarê ji bo xweyîderketina zimanê Kurdî, xwestîye gazî û hewara xwe bigihîne miletê Kurd. Kovar di sala 1932’an de ji alîyê Mîr Celadet Alî Bedirxan (1893-1951) ve li paytexta Sûrîye, Şamê hatîye derxistin. Kovarê heta sala 1943’ya weşana xwe dewam kirîye û bi temamî 57 hejmar derketîye. Hemû hejmarên kovarê, di sala 1998’an de li Stokholmê ji alîyê Firat Cewerî ve ji nav weşanên Nûdemê de careke din wek 2 cilda hatîye çapkirin.

Kovar wek weşana yekemîn tê zanîn ku bi tîpên Kurdî-Latinî yê îro ve hatîye çapkirin. Vê kovarê di 15 yê Gulana 1932’an dest bi weşanê kirîye û heta sala 1943’an dewama weşana xwe kirîye. Kovar 15 rojan carekî dihate belavkirin; lê gelek caran ji ber hinek sebebên, navberên dirêj ketine nav hejmaran.

Kovarê bingeha xwe li ser ziman, edebiyat û çandê çêkiribû. Xêncî nivîsên li ser ziman û wêje; carnan jî cîh dida nivîsên civakî û rojane. Kovar ji siyasetê dûr bû lewra ewê siyaset ji civakên din re hîştibû. Berpîrsîyarê kovarê Mîr Celadet Alî Bedirxan rêbaza weşana kovarê di hejmara ewil de wiha dihanî ziman:

“Hawar dengê zanîne ye. Zanîn xwe nasîn e, xwenasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike... Hawara me, berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyîne a pêşîn e... Hawar ji îro û pêve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîtî pê bendeware, dê mijûl bibe. Tenê siyaset jê dûre, xwe naêxe siyasetê. Hawarê siyaset ji civatên welatî re hîştîye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, huner û sin’etê de dê bixebitin...”

Ji van rêzikên li jor jî baş tê fahmkirin ku Hawar ji siyasetê dûr e. Kar û xebatên wê li ser ziman, wêje û çanda Kurdî ye. Ji xwe vê rêbazê ew kirîye yek ji kedkarê ziman, wêje û çanda Kurdî. Xêncî ked û xebatên kovarê yê di warê

nûjenkirina zimanê Kurdî; gelek nivîsên li ser lêkolîn, edebiyat, çand, huner û civakê jî cihên xwe di nav rûpelên kovarê de girtine.

Kovar xêncî zimanê kurdî di her hejmara xwe de 3-4 rûpel jî cîh daye zimanê frensizî û ziman, wêje û çanda kurdî bi vî zimanî daye naskirin. Heta hejmara 23'an tîpên latinî û erebî bi hevra hatine nivîsin; lê hejmara 24'an şûnde tenê tîpên latinî hatine bikaranîn. 57 hejmarên kovarê bi qasî 808 rûpelî digre. Di hejmarên ewilî de tenê nivîsên xweyî û berpirsiyarê kovarê Mîr Celadet Alî Bedirxan û birayê wî Dr. Kamiran Bedirxan cîh digrin. Ji hejmara 4'an şûnde gelek rewşenbîr û nivîskarên kurd yên ku îro jî bandora wan li ser zimanê kurdî hene, bi nivîsên xwe va cîhê xwe di kovarê de girtine. Celadet Ali Bedirxan, Dr. Kamiran Bedirxan, Rewşen Bedirxan, Cegerxwîn, Qedrî Cemîl Paşa, Dr. Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan, Mistefa E.Botî, Ehmed Namî, Hesên Hîşyar, Lawê Fendî, Bişarê Segman, Reşîdê Kurd, Cemilê Haco, Sibhîyê Diyarbekirî, Tewfîq Wehbî, Evdîlxaliq Esîrî, Şakir Fetah, Hevîndê Sorî, Lawîkê Kurd, Pîrot û gelek nivîskarên din, di kovara Hawarê de nivîsîne.

Kovara Hawarê, di sala 1932'an de dest avête xaleke gelekî girîng. Ew jî çêkirina elfabeyek nû bû ku wê demê ji bo zimanê Kurdî hewceyîyek mezin bû. Heta dema weşana kovarê, Kurdan gelek elfabe bikaranibûn û wê demê de jî, bi pirranî elfabeya Erebi bikar dihanîn. Heta wê demê, elfabeyeke ku hemû dengê zimanê Kurdî nîşan bike nehatibû çêkirin yan jî hinek kêmasîyên wan elfabeyan hebûn. Sê sal berîya weşana kovara Hawarê, Kurdên Yekîtiya Sovyetê rojnameya *Rêya Teze* derxistibûn û cureyek elfabeya Latinî bikardihanîn. Bi rastî, hema hema ji bo hemû dengên tîp hatibûn çêkirin; lê ew elfabe jî, ji alîyê teşeyê tîpan ve hinek tevlihev bû. Tîpên Latinî û Kirîlî bi hevra hatibûn bikaranîn. Alîyekî din; Kurdên ku piranîya wan di nav Komara Tirkîyê de dijîyan, bi biryara dewletê, ji sala 1928'ê ve derbasî elfabeya latinî bibûn û êdî tîpên latinî hîndibûn, bi van tîpan ve dixwendin û dinivîsandin. Ji ber van sebebên û hinek sebebên din, kovara Hawarê di serî de ji bo zimanê Kurdî elfabeyek nû çêkir û bi vê elfabeyê ve kovar hat çapkirin û weşandin.

Ji bo zimanê Kurdî, heta dema weşana kovarê rêzimanek bi rêk û pêk nehatibû çêkirin ew jî dibû sebebê gelek xeletî û tevlihevîyan. Mîr Celadet Bedirxan, bingeha rêzimana Kurdî çêkir û ew di kovarê de belavkir. Ev rêziman îro jî “wek çavkanîyeke rêzimanî û gelek girîng” tê bikar anîn.

Kovara Hawarê, valahîyên zimanê Kurdî bi teşeyekî zanistî dabû ber xwe û ji bo van valahîyan dagire; xebat dikir. Kovara Hawarê, bingeha ferhengeke Kurdî jî avêt û evê bingehe, wek ferhengokekî di Hawarê de cîh girt. Ji ber dawîlêhatina weşana kovarê, ev xebat neçû serî. Dîsa jî ev xebata ferhengê, ji bo gelek xebatên din yê li ser ferhenga Kurdî bû bingehe.

Helbet heta niha li ser zimanê Kurdî gelek xebat hatine çêkirin. Lêkolînerên navxweyî û biyanî li ser zimanê Kurdî gelek vekolîn kirine û pirtûk çapkirine. Kovareke wek Hawarê ku warê ziman de hewqas girîng e û bûye wek pirekî di navbera edebiyata klasîk û nûjen, gelek cureyên edebî yê nûjen wek kurteçîrok, helbest, gotar, şano û hwd. bi zimanê Kurdî çêkirîye û gihandîye nîfşên nû; divê ji bo wê xebateke berfireh bihata çêkirin. Em dibînin heya niha xebateke akademîk û berfireh ku bal bikişîne ser kovara Hawarê û wê bide naskirin li Tirkîyê nehatiye çêkirin.

Armanca me ligel danasîna kovara Hawar, xebatên kovarê yê li ser ziman, girîngîya wê ya ku daye ziman, ew ekola ziman û edebî ku li der dorê kovarê hatiye avakirin raxin ber çavan. Piştî danasîna kovarê, xebatên kovarê yê li ser ziman, wê bibe bingeha eslî ya xebata me. Helbet rewşa Kurda ya wê demê, nasandina zimanê Kurdî, xebatên li ser ziman û elfabeyên Kurdî jî wê cîhê xwe di teza me de bigrin. Divê em bidin zanîn armanca me ya herî pêşî, bandora kovara Hawarê, ya li ser zimanê Kurdî ye.

ÖZET

Süleyman ÇETİN, *Hawar Dergisi ve Kürt Dili Üzerindeki Etkisi*, Yüksek Lisans Tezi, Van, 2016. 16+203 r.

Kürt basın tarihinin en önemli yayın organlarından biri de *Hawar* dergisidir. Bu derginin Kürt dili ve edebiyatı üzerindeki etkisi, Kürt dili ve yazınında her yönüyle kendisini hissettirmektedir. “Hawar” Kürtçede “çağrı”, “imdat” veya “çığlık” anlamlarında kullanılmaktadır. Öyle anlaşıyor ki *Hawar*, o dönem içerisinde Kürtçenin sahiplenilmesi için sesini duyurmaya çalışan bir “imdat” bir “çığlık” olmak gayesindedir.

Bu dergi Celadet Ali Bedirhan tarafından Suriye’nin başkenti Şam’da, 1932 yılından 1943’e kadar toplam 57 sayı yayınlanmış olup; derginin tüm sayıları Fırat Ceweri’nin editörlüğünde, Nûdem Yayınları tarafından 1998 yılında İsveç’in başkenti Stockholm’da 2 cilt halinde tekrar basılmıştır.

Hawar dergisi (günümüzde Kürtçe yazınında hala kullanılan) Kürtçe-Latin harfleriyle basılan ve yayınlanan ilk Kürtçe dergi ve aynı zamanda ilk yayın olarak bilinir. Bu dergi 15 Mayıs 1932 yılında Şam’da yayın hayatına başlamış, belli dönemlerde duraklamasına rağmen 1943 yılına kadar yayın hayatını sürdürmüştür. 15 günde bir çıkan derginin, bu tarih aralığında toplam 57 sayısı okurlarıyla buluşmuştur. Dil, edebiyat ve kültürel içerikli bir yayın politikası olan dergi, bazen aktüel ve toplumsal yazılara da yer vermiş; fakat yayın politikası gereği siyasetten uzak durmuştur. Derginin amacını ve yayın politikasını derginin sahibi ve Genel Yayın Yönetmeni Celadet Ali Bedirhan derginin ilk sayısında şöyle özetliyor:

“Hawar (Çağrı-Çığlık) bilginin sesidir. Bilgi kendini tanımaktır, kendini tanımak da bize kurtuluş ve iyilik yolunu açar. Kendini tanıyan herkes, kendisini başkasına da tanıtabilir. Hawar’ımız (Çağrımız) her şeyden önce bize dilimizin varlığını tanıtacaktır. Zira varlığın ilk şartı dildir. Kürtçe ve Kürtlükle ilgili her şey Hawar’ın ilgi alanına girer, sadece siyasetten uzaktır, siyasete girmez. Hawar, siyaseti toplumun diğer kesimlerine bırakmıştır, siyasetle onlar uğraşsın.

Biz de sadece bilim ve sanat ile uğraşacağız.”(Çev: S.Ç)

Yukarıda da görüldüğü gibi *Hawar* dergisinin çıkış amacı başta dil olmak üzere bilim ve sanat olup, dergi siyasetten uzak bir yayın politikası gütmüştür. Belki de siyasetle arasına koyduğu bu mesafe dergiyi dil, edebiyat ve sanat alanında etkili bir yayın haline getirmiştir. Dergi zaten bu yönüyle Kürt basın tarihinde önemli bir yere sahiptir. Kürt dilinin modern anlamda gelişmesine büyük katkılarının yanında; araştırma, inceleme, edebiyat, kültür, sanat ve toplumsal temalı yazılarıyla da önemli örnekler sergilemiştir.

Dergi Kürtçenin yanı sıra, her sayısında 3-4 sayfa da Kürt dili, edebiyatı ve kültürüyle ilgili, Fransızca yazılara yer vermiştir. 23. sayıya kadar Kürtçe yazılarda, Latin ve Arap harfleri birlikte yazılmıştır. 24. sayıdan itibaren artık tamamen Latin harfleri ile yayın hayatına devam etmiştir. Derginin 57 sayıdan oluşan tamamı yaklaşık 808 sayfa tutmaktadır. İlk sayılarında daha çok, derginin sahibi ve yayın yönetmeni Celadet Ali Bedirhan ve kardeşi Dr. Kamiran Ali Bedirhan’ın yazıları yer almaktadır. 4. sayıdan itibaren başka aydın ve yazarları da, yazar kadrosunun içinde görmekteyiz. Celadet Ali Bedirhan, Dr. Kamiran Bedirhan’ın yanısıra, Celadet Bedirhan’ın eşi Rewşen Bedirhan, Cegerxwîn, Kadri Cemil Paşa, Dr. Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan, Mistefa E. Botî, Ehmed Namî, Hesên Hîşyar, Lawê Fendî, Bîşarê Segman, Reşîdê Kurd, Cemilê Haco, Sibhîyê Diyarbekirî, Goran, Tewfîq Wehbî, Evdîlxaliq Esîrî, Şakir Fetah, Hevîndê Sorî, Lawîkê Kurd, Pîrot ve daha birçok yazar, yazılarıyla dergide yer almışlardır.

1932 yılında yayın hayatına başlayan *Hawar* dergisi, o dönem içerisinde Kürtçe için önemli olan birçok konuya el attı. Belki bunların en önemlisi de Kürtçeye uygun yeni bir alfabenin yapılmasıydı ki; bu o zaman Kürtçe için artık bir ihtiyaç haline gelmişti. Derginin yayın hayatına başladığı tarihe kadar Kürtler, birçok alfabe kullanmışlardı. O dönemde de çoğunlukla Arap alfabesi kullanılıyordu. Bununla birlikte Kürtçenin bütün seslerini karşılayan ve gösteren bir alfabe oluşturulamamıştı, yapılan alfabelerde de bazı eksiklikler ve yetersizlikler mevcuttu. *Hawar* dergisinden 3 yıl önce Sovyetler Birliği’nde yaşayan Kürtler tarafından çıkarılan ve Erivan’da yayın hayatına başlayan *Rêya Teze* (Yeni Yol) adlı gazete, Kürtçenin hemen hemen tüm seslerini gösteren 37 harften oluşan yeni bir alfabe ile basılıyordu. Latin ve Kiril

harflerinin bir karışımı olan bu alfabe, harf sayısı fazla ve şekil bakımından da biraz karışık görünüyordu.

Hawar dergisi, günümüzde kullanılan Kürtçe Latin alfabesini, ilk sayısından itibaren kullanmış ve okurlarına öğretmiştir. Türkiye'nin latin alfabesine geçmesiyle birlikte, Türkçe Latin alfabesine yakın olma amacıyla da hazırlanan bu alfabe, günümüzde de Kürtçe'de en çok kullanılan alfabe olma özelliğini korumaktadır.

Diğer yandan, o döneme kadar Kürtçe için yazılmış dört başı mamur bir gramer kitabı yoktu. Bu da yazında birçok yanlışla ve karışıklığa yol açmaktaydı. Celadet Bedirhan Hawar dergisinde, Kürtçe gramerinin temellerini oluşturdu ve bu gramer kurallarını dergide yayınladı. Daha sonra tamamlanarak kitap haline getirilen bu gramer, günümüzde de kendi alanında çok önemli bir kaynak kitap olarak kabul edilmektedir.

Hawar dergisi Kürtçedeki eksiklikleri bilimsel bir tarzda ele almış, bu eksikliklerin giderilmesi için çalışmalar yapmaktaydı. Kürtçe modern bir sözlük oluşturma gayesi de bu çalışmalardan biriydi. Bunun için dergi ilk sayıdan itibaren Kürtçe bir sözlüğün temelini oluşturacak bir “lügatçe” yayınlamaya başlamış; fakat derginin yayın hayatı sona erdiğinden bu çalışma tamamlanamamıştır. Yine de bu çalışma, daha sonra yapılacak birçok modern sözlüğe bir nevi temel teşkil etmiştir.

Şüphesiz ki Kürtçe üzerine yerli ve yabancı araştırmacılar, dilbilimciler tarafından birçok çalışmalar yapılmış, birçok kitap yazılmıştır. Bununla birlikte Kürtçeyi Latin alfabesiyle tanıştıran, bu tanışmayla birlikte modern öykü, şiir, makale, tiyatro gibi çağdaş edebiyatın ürünlerini okurlarıyla buluşturan ve aynı zamanda Klasik Kürt Edebiyatını da modern edebiyat ürünleriyle birlikte verip yeni nesillere aktaran ve bu yönüyle adeta bir Kürt Dili ve Edebiyatı okulu misyonunu yüklenen Hawar dergisi üzerinde akademik alanda bilimsel bir araştırma, şimdiye kadar Türkiye'de yapılmamıştır.

Kürtçenin Latin alfabesiyle yazıldığı Hawar dergisinin tanıtımının yanında, derginin Kürtçe üzerine yaptığı çalışmalar, dile verdiği önem, Kürtçeye dil ve edebiyat alanında sunduğu katkı, kullanılan dil ve bu dil ile oluşan edebiyat ekolünü, akademik anlamda araştırmak, bu tezin amaçlarındanıdır. Kürtçe söz konusu olunca gramer ve kelime dağarcığı bakımından hemen hemen herkesin referans kabul ettiği Hawar dergisinin Kürtçeye verdiği önem, Latin alfabesinin Kürtçeye uyarlanması, Kürtçe

dilbilgisi, Krte szlk gibi alıřmaları ile birlikte; bu alıřmaların Krte zerindeki etkileri, Krt diline katkıları ve gnmze kadar olan yansımaları alıřmamızın ana eksenini oluřturacaktır.



ABSTRACT

Süleyman Çetin, *Hawar Journal and it's Effect on Kurdish Language*, Master Degree Thesis, Van, 2016. 16+203 r.

One of the most important publications of Kurdish press history is “ Hawar Journal”. The impact of tthis journal on Kurdish Language and Literature is felt itself with every sides in Kurdish Language and Literature. Hawar is used for “call, help and scream” in Kurdish. It seems that, in that period Hawar aimed to be a call that tried to be a scream of owning Kurdish. This journal was published with 57 issues in the capital city of Syria, Damasqus by Celadet Ali Bedirkhan, from 1932 to 1943, all the issues of journal were printed as two volumes with the editoring of Firat Ceweri by Nudem Publication in the capital city of Sweden, Stockholm in 1998.

Today Hawar is the first Kurdish Hournal and at the same time publication (that is still being used for Kurdish Literature) and was printed and published with the letters of Kurdish-Latin alphabet. This Journal started its broadcast life in Sam on the 15 of May in 1932, Although it paused at certain periods, it continued its broadcast life until 1943. This journal that was published every 15 days, met its readers with the total amount of 57 issues at that period. This journal had the publication policy that was consisted of language, literature and culture, sometimes gave a place to actual and social articles. But it kept away from politics according to its publication policy. Celadet Ali Bedirkhan, the owner and executive editor of the journal, summarized the aim and the publication policy of the journal in the first issue:

“Hawar (call, help) is the voice knowledge. Knowledge is to know yourself, recognising yourself opens the way of liberation and goodness to us. Eveyone, who knows oneself, can introduce oneself to the others. First of all, our Hawar (our call) introduces the exitence of our language to us. Because the first rule of existence is language. Everything about Kurdish and Kurdishness is entered into the area of interest of Hawar. Merely, it's far from politics and doesn't enter it. Hawar leaves the politics to the other parts of society, they must deal with politics. We'll only deal with science and art”

As it is seemed above, the existence purpose of Hawar is firstly language and then science and art. Maybe this distance between politics that Hawar stemmed, made the journal as a cult (ecole) of language, literature and art. From this aspect, the journal has an important place in Kurdish media history. Beside its great contribution of Kurdish language as a modern meaning, the journal presented the important sample of articles about research, investigation, literature, culture, art and social themes.

Besides Kurdish, the journal gave place 3-4 pages to French articles about Kurdish language, literature and its culture in every issue. Until the 23rd issue, Kurish articles were written with Latin and Arabic letters. From the 24th issue, it continued to its publication life with totally latin letters anymore. The whole of 57th issue consisted all about 808 pages. Mostly in the first issues, the owner and editor of the journal, Celadet Ali Bedirkhan's and his brother Dr. Kamiran Ali Bedirkhan's articles took part in. From the 4th issue, we see the other Kurdish intellectuals and authors in the author staff. Besides Celadet Ali Bedirkhan and Dr. Kamiran Bedirkhan, Celadet Bedirkhan's wife Rewshen Bedirkhan, Cegerxwin, Qedri Cemil Pasha, Dr. Nurettin Zaza, Osman Sebri, Qedrican, Mistefa E. Boti, Ehmad Nami, Hesên Hîşyar, Lawe Fendi, Bîshare Segman, Rêşîde Kurd, Cemîle Haco, Sibhiye Diyarbekiri, Goran, Taufiq Wahby, Evdîlxalîq Esîrî, Şakîr Fattah, Hevînde Sori, Lawîke Kurd, Pîrot and any more many autjourns took part in the journal with their articles.

Hawar journal that started its publication life in 1932, handled an important subject for Kurdish. That was the creating a new and suitable alphabet for Kurdish, at that period it became a need for Kurdish language anymore. Until the beginning date of the publication life of the journal, Kurdish people used a lot of alphabets. At that time, they mostly used Arabic alphabet. Nevertheless, the alphabet couldn't be formed that replied and showed all Kurdish alphabet sound and there were same deficiencies in the alphabets that was formed.

Three years ago before Hawar Journal, by Kurdish people who lived in the Soviet Union, the journal called *Reya Teze* (New Way) that started its publication life in Erivan, also used a different kind of latin letters which almost replied 37 letters for all the sounds of Kurdish, Latin and Cyrillic letters of this alphabet were seen a bit complicated on account of form.

Hawar journal used today's Kurdish Latin alphabet in Turkey, the alphabet, which aimed to be close to Turkish Latin alphabets, is used in today's feature. On the

other hand, until that period, there weren't any perfect grammar books written for Kurdish. It caused so much mistakes and confusion in literature. In Hawar journal, Celadet Bedir Khan constituted the basis of Kurdish grammar and published this grammar rules in the journal. Later, this grammar that was completed and turned into a book, was accepted as an important resource book in its field nowadays.

Hawar journal handled the deficiencies in Kurdish with a scientific way and made studies about elimination of these deficiencies. Creating a modern Kurdish dictionary was one of the aims of these studies. From this, from the first issue, the journal started to publish a "glossaries" that would create a Kurdish dictionary, but it couldn't complete this work because the journal's publication life ended. However, this study constituted the base of modern dictionary that would be made later.

By all means, many studies were made and books were written on Kurdish by native and foreign researchers, linguists. With this so far in Turkey, there weren't made any researches on Hawar journal in which Kurdish met Latin alphabet, with this meeting readers came together with the products of modern literature such as modern story, poetry, article, theatre and at the same time whether the transfer to a new generation with the classical literature, the modern Kurdish literature products and with this aspect the journal had a mission almost a Kurdish language and literature school.

Besides the introduction of Hawar Journal which was the first written publication of Kurdish Latin alphabet, the journal's studies on Kurdish, the importance given for language by the journal, the contributions of the language that was used and the production of literature with this language, to search in terms of academic regard are the purposes of this thesis. When Kurdish language is concerned, the importance given to Kurdish by Hawar journal was accepted by almost everyone on account of grammar and dictionary, the adaption of Latin alphabet into Kurdish. Kurdish grammar, Kurdish dictionary and the influences and contributions of these works on Kurdish, will form the major axis of our work.

PÊŞGOTIN Û SPASÎ

Li gor ku çavkanî ji me ra radigihînin; tê angaşt kirin ku zimanê Kurdî, di cihanê de, derdora 40 milyon kesî ve tê axaftin. Herwiha heta niha bi vî zimanî ve gelek pirtûk, rojname û kovar hatine çapkirin. Ji alîyekî din ve îro, zimanê Kurdî di hemû alavên ragihandinê (TV, rojname, intrenet û hwd.) de tê bikaranîn. Bi rastî; hê heta îro jî yekrêzî, yek elfabeyî û yek lehçeyî di nav vî zimanê navborî de nehatiye pêkanîn.

Îro hinek rojname û televizyonên Kurdî, ji bo vê yekê bi hemû zaravayên Kurdî weşanên xwe dikin û her du elfabeyên Kurdî (Latînî-Erebî) yên sereke jî bikar tînin. Birastî jî; ev yek, rêbaz û xebateke girînge ji bo yekbûna ziman û elfabeya vî zimanî. Kurd bi vî awayî hînê zaravayên din jî dibin û herwiha zaravayên vî zimanî, zêdetir nêzikî hevdu dibin. Tenê xebatên bi vî awayî, têra yekkirina ziman û zaravayan û têkûzkirina elfabeyan dike yan nake; ew ne diyar e. Heta niha çiqas caran pîspor û zimanzanên vî zimanî ji bo yekbûna ziman û elfabeya Kurdî civîn û komxebat darxistibin jî; van xebatan jî encameke berbiçav nedaye û ev daxwazana, tenê wek pêşnîyarîyekî hatine pejirandin.

Mîr Celadet Alî Bedirxan û hevalên wî, hê van kêmasîyên han di destpêka sedsala 20'an de dîtine û hemû kar û xebatên xwe ji bo yekkirin û pêşdebirina ziman û edebiyata Kurdî terxan kirine. Di sala 1932'an de kovara *Hawarê* bi vê armancê hatiye weşandin. Di hejmara ewilî de elfabeyek Latînî-Kurdî hatiye çêkirin û piştî jî; ji bo nêzikkirin û yekkirina zaravayên Kurdî gelek xebat û nivîsên girîng hatine belavkirin.

Kovara *Hawarê* di dema derketinê heta îro bandoreke mezin li ser zimanê Kurdî kirîye. Çi xebatên di warê ziman, çi nivîsên edebî û çi jî xebatên ji bo yekkirina zaravayên Kurdî, îro jî bi bandorin. Nivîs û xebatên kovarê ji bo zimanê Kurdî, wek bingeheke gelek nirxbarind û zexm tê qebûl kirin.

Ez berîya her tiştî spasîya şewirmendê xwe, mamosteyê qedirgiran Prof. Dr. Mehmet Zeydin YILDIZ dikim ku bi pêşnîyarî û rê nîşankirina wî ve gelek tarîfî li ber min ronî bûn. Hem di warê Kurdîzanebûnê hem jî di warê akademîk de alîkarîyên wî gelek çê bûn. Ji ber parvekirina fikr û ramanên xwe yê nirxbarind; ji bo sererastkirin û têkûzbûna tezê, ji birêz Alk. Doç. Dr. Nesim Sönmez, Alk. Doç. Dr. Ayhan Tek û Alk. Doç. Dr. S. Battal Uğurlu re gellek spas dikim û mala wan ava. Her wiha di pêvajoya vê xebatê de ji bo sebr û tehemul û alîkarîya wan ya manewî, ez ji hevjiña

xwe ya heskirî Nurten û her sê kulîlkên xwe yê delal, Zeynep, Elif û Esma yê re jî, bi dilgermî spas dikim. Xwedayê mezin (c.c.) her daîm ligel wan be û wana di her du cîhanan de serfiraz û bextewar bike.



KURTKIRINA PEYVA

B.Î: Berya Îsa

b.n.b: Berhema navborî

bnr: Binêhêrin

hb: Heman berhem

hd: hinekên din

hj: Hejmar

hm: Heman meqale

hn: Heman nivîs

hwd: Her wekî din

r: Rûpel

P.Î: Piştê Îsa

Wer: Werger

DESTPÊK

Rojnamegerî û çapemenî ji bo ragihandin û veguherandina civakê, amrazên gelek bihêzin. Wisa tê pejirandin ku; ji bo veguherandina civaka Kurd û pêşdebirina zimanê wan, peywireke wê ya din jî heye. Lewra rojnamegerîya Kurdî, di heman demê da bingeha rewşenbîrî, ziman, wêje û geşepêdana civakî de roleke dîrokî zevt kirîye. Di nav rojnamegerîya Kurdî da jî, cîhê kovara *Hawarê*, cîhekî berbiçav û cuda ye. Meriv dikare bêje ku bingeha ziman, wêje û çanda Kurdî ya nivîskî ya modern, bi kovara *Hawarê* ve dest pê dike. Herwiha nivîskarên *Hawarê* jî, wek ku berpirsîyarê kovarê daxwaz kiribû; nivîsên xwe ji sîyaseta rojane dûr girtine, giringîya herî mezin dane ziman, çand û edebîyatê. Berhemên Kurdî yê klasîk û nivîskarên wan bi kovara *Hawarê* ve careke din ketine rojevê û hatine naskirin.

Kovarê de bi zelalî tê dîtin ku; nivîs û berhemên Kurdî her deverên cihanê, cîhê xwe di vê kovarê de girtine û bi her sê zaravayên Kurdî (Kurmancî, Soranî, Dimilî-Zazakî-Kirdkî) nivîs hatine nivîsandin. Bê şik ev yek ji bo yekrêzîya zimanê Kurdî gelek girîng bû. Wek tê zanîn perwerdeya zimanê Kurdî bi awayekî fermî (xêncî çend cîhên herêmî) nehatibû kirin. Kurdan bi tenê rêya rojname û kovaran agahî derheq zaravayên din werdigirtin. *Hawarê* hewl daye ku zaravayên Kurdî yê din bi gel bide naskirin; bi taybetî her sê zaravayên Kurdî yê sereke bigihîne hev û zimanekî yekgirtî, bi rêziman û bi bingehe çêbike. Alîyekî din jî ziman, wêje û zargotina Kurdî berhev bike û hilde bin qeydê û ji nîfşên paşîn re wek mîrasekî bihêle.

Bi hezaran meselok, metelok, bêje, çîrok, gotinên pêşîyan di *Hawarê* de hatine berhevkirin û belavkirin. Bingehe rêzimana Kurdî bi kovara *Hawarê* ve hatiye avêtin. Kurd dewlet serê *Hawarê* dewlemendîya ziman û edebiyata Kurdî pê hisyane û tomar kirine. Rewşenbîr û nivîskarên wek Cegerxîn, Osman Sebrî, Qedrîcan, Nuredîn Zaza, Dr. Ehmed Nafîz, Hesên Hîşyar, Ehmed Namî, Qedrî Cemîlpaşa û hwd. Di dibistana *Hawarê* de cîh girtine û navê xwe û berhemên xwe di tarîxa edebîyata Kurdî de neqş kirine. Erka *Hawarê* di warê ziman û edebiyatê de hewqas girîng e; roja derketina rojnameyê ku 15 yê Gulanê ye, ji alîyên Kurdan ve wek “*Cejna Zimanê Kurdî*” hatiye pejirandin û tê pîrozkirin.

Dewlemendîyek pir zêde bi rêya rojnameya *Hawar* gihîştîye nivîsên nû. Em dikarin bêjin ku îro jî hemû kar û xebatên di warê ziman, elfabe, rêziman û edebiyata Kurdî de tên kirin, *Hawarê* ji xwe re wek rêber an jî bingehe dibînin û dipejirînin.

Lewra Hawar bi zimanekî zelal, paqij, xwemalî hatîye nivîsandin. Elfabeya Kurdî - Latinî, rêziman, bingeha ferhengeke nû û hemû cureyên edebiyata cihanê di Hawarê de bi awayekî rêk û pêk cîh girtîye û bi rêya Hawarê gihîştîye îro. Nêzîkî sed sal berê ji bo yekrêzîya zimanê Kurdî, xebatên gelek girîng çêkirîye û hemû deverên kurdnişîn û bi her sê zaravayên Kurdî gîhandîye hevdu û bi wan zaravayên sereke nivîs hatine belavkirin.

Vê xebata xwe da ez ê li ser Rojnamegerîya Kurdî, şert û mercên ku dema Hawar derketîye, nivîskarên Hawarê, xebatên li ser zimanê Kurdî heta dema weşandina Hawarê, û bi taybetî jî xebat û rola kovara Hawarê ya li ser zimanê Kurdî de bisekinim. Hawarê bidim nasîn û bandora Hawarê ya li ser zimanê Kurdî ji dema weşanê û heta îro raberê we bikim. Lewra Hawar, di ziman û wêjeya Kurdî de wek ekoleke bingeîn tê qebûlkirin. Nivîskarên Hawarê jî herwiha lehengên vê ekolê ne. Armanca min ewe ku ez serpêhatîyên rojnamegerîya Kurdî bi kurtasî raberê we bikim û nivîskarên vê kovara ziman û wêjeya Kurdî bidim nasandin. Bi rastî nivîskarên Hawarê ku hejmara wan digihîje sedan kesî hê jî baş nehatine nasandin. Lêkolîna li ser jîyana wan bi tena serê xwe, dibe mijara tezeke berfireh. Çavkanîyên derheqê wan de gelek kêr in û yên heyî jî; ji ber hev hatine girtin. Xebatên li ser kovara Hawarê yên derbarê ziman de jî gelek kêr in. Bi rastî ev kovar di pêvajoya rêwîtiya zimanê Kurdî de cihekî gelek girîng digre, lêbelê hê jî rewşenbîr û xwendevanên Kurd pak pê nehisîyane û xebatên zanistî li ser kovarê pak çênebûne. Armanca min ya esasî danasîna kovara Hawarê û bandora Hawarê ya li ser zimanê Kurdîye.

1. Dawîya Sedsala 19'an û Serê Sedsala 20'an de Rewşa Sîyasî ya Kurdan û Rewşenbîrên Wan

Pêvajoya paşdeçuyîna Dewleta Osmanî bi îmzekirina peymana Karlofçayê (1699) dest pê kir. Ev rewş heta sala 1792'an (Peymana Yaş'ê) dewam kir. Piştî Peymana Yaş'ê êdî dewlet ber bi rûxandin û hilweşandinê ve diçû. Sîyasetmedar û rewşenbîrên Dewleta Osmanî ji bo guhertina vê rewşa xirab, gelek xebat kirin. Guherandina zagonan, nûjenkirina artêşê û veguherandina rewşa sîyasî hinek ji van xebatan bûn.

Guherîn û nûjenkirina Dewleta Osmanî di sala 1808'an de dest pê kir. Ev guherîn û nûjenbûna dewletê, xwe di sê qonaxan de nîşan dide. Yekem qonax Sened-i Ittîfaq e ku dewra Sultan Mehmûd'ê III. de hatîye îmzekirin. Qonaxa didûya, di sala

1939'an de Fermana Tanzîmatê ye. Qonaxa sisîyan jî, sala 1876'an de îlankirina Meşrûtiyeta I. û Qanûna Esasî ye.¹

Fermana Islahat'ê ku di sala 1859'an de ji alîyê Sadrazam Mehmed Emin Âli Paşa ve hatibû amadekirin jî; ji bo nûjenkirin û guherîna Dewleta Osmanî gaveke giring e. Fermana Islahatê wek dewama Fermana Tanzîmatê jî tê dîtin.

Sened-i İttifak ji bo mehdûtkirina erka Sultan wek beyana nîyetê bû û yekem car bû ku desthilatîya Sultan dihate sînorkirin. Fermana Tanzîmatê bi taybet derheqê mafên kêmeteweyan de hinek tişt zelal kiribûn lê wek qanûnekî cih negirtibû. Em dikarin bêjin ku wek deklerasyonek di warê mafên niştîmanî de bû. Van her dû guherînan, binyadeke (zemîn) baş ji bo îlankirina meşrûtiyetê çê kir. Vê binyada azad de rêxistin hatin damezrandin. Ji van komel û rêxistanan de ya herî bi nav û deng rêxistana Komeleya Xortên Osmanî (Genç Osmanlılar Cemiyeti) bû.

Ev rêxistin di sala 1865'an de li Stenbolê ji alîyê rewşenbîrên wek Şinasî, Namık Kemâl, Ali Suavî, Ziya Paşa, Agâh Efendi ve hatibû saz kirin. Ev rêxistin muxalîfê desthilatdarîya Sultan bû. Ji ber tevgera Sultan Ebdilezîz a dijrabêrê Fermana Tanzîmatê van rewşenbîran ji bo wekhevî û azadîyê dest tekoşînê kirin û Komeleya Tifaqa Niştîman (İttifak-ı Vatan Cemiyeti) damezrandin. Piştî demekî derketin derveyê welat û çûn Parîs ê. Ziya Paşa û Namık Kemâl li London'ê rojnameya *Hürriyet* derxistin.²

Wisa dixûyê ku ev guhertin û nûjenbûn ne tenê di warê sîyasî de bûn. Her wiha rewşenbîr û sîyasetmedarên wextê jî, ji bo Dewlet were ser kewna xwe ya berê; di warên cûrbecur de komel, rêxistinên sîyasî û rewşenbîrî saz kiribûn.

“Di dawîya sedsala 19'an de, li bajarê wekî Cenevre, Londra, Parîs û Qahirê rewşenbîrên Tirk komel, grup û rêxistinên sîyasî damezirandibûn, di wan bajaran de rojname derdiketin û bira civakî, sîyasî û bîr û baweriya burjuvazî ya nûzayî belav dikirin. Bi bîr û raya hemû rêxistin û kesên sîyasî yê Tirkîyê û organên wan, divê tenê qet nebe rêyek bihata dîtin ji bo rizgarkirina Împaratoriya Osmanî ji vê rewşa wê ya xirab xilas be.”³

¹ Kızıltan, Y. (2006). I. Meşrutiyetin İlanı ve İlk Osmanlı Meclis-i Mebusan'ı, *GÜ, Gazi Eğitim Fakültesi Dergisi*, (Cilt 26), Sayı 1, r. 253-254.

² Kızıltan, h.n., r. 255.

³ Celil, C. (1985). *Jiyana Rewşenbîrî û Sîyasî Ya Kurdan (di dawîya sedsala 19'a û destpêka sedsala 20'a de)*. Uppsala, Jîna Nû, r.19.

Helbet di Dewleta Osmanî de ku hewqas guherîn diqewimîn, wek neteweyên din hinek Kurd jî vala nedisekinîn. Ji xwe, hê gelek berîya van lihevketinan, Kurdan hinek deveran de dijî Împeratorîya Osmanî nerazîbûna xwe nîşan didan û carnan jî li hember dewleta merkezî serî hildidan. Herçiqas sebebê herî mezin jî destçûyîna erkên herêmî û feodalî be jî; ev bûyerana girîng bûn.

Herêma de desthilatdarî bi her aliyê ve destê Mîrên feodal de bû. Lê feodalîzma Kurda û ya Ewropa ne wek hev bû. Li Ewropa kesên feodal û kilîse karên wan jî hev cuda ne; lê di nav Kurdan de her dû kar ketine nav hev.⁴ Mîrên Kurdan bac distandin û li ser Kurda û kêmetewan desthilatdar bûn. Hetta Kurdên êzîdî jî baca xwe didan şêxên xwe û mîrên Kurdan.⁵

Rêvebirî û desthilata mîrektîyên Kurdan li kêleka Dewleta Osmanî û Dewleta Îranê heta sedsala 19'mîn dewam kir. Dema sal gihîştê 1860'î piştî berxwedanên mezin û kûr, hemû mîrektîyên Kurdan hatin rûxandin. Mîr Muhemmed Rewandîzî (1826-33), Mîr Bedirxan (1843-46), û Yezdanşêr (1853-55) çend heb ji wan in.⁶ Şevket Sureyya jî vê rewşê wiha bilêv dike: “Li Rojhilatê Anatolyayê beg û şêxên Kurdan wek hikumdarên azad hikum dikin. 1806 Babanzade, 1813 Abbas Mirza, 1828 Emin Paşayê Mûşê, 1832 Mîr Mehmûd, 1842 Bedirxan, 1855 Yezdan Şêr, 1880 Abdullahê Nehrî hinek ji wan in. Li wir desthilatdarîya dewletê tine, yan wan heye.”⁷

Dawîya sedsala 19'mîn de serhildana herî mezin û berfireh serhildana Şêx Ubeydullah (1880)' e. Ev serhildan di dawîya sedsala 19'an de tevgera girînge di dîroka siyasîya Kurdan de. Lewra em dibînin ku; di daxwaz û tevgera serhildanê de rehên neteweyî û dînî bi hevra xwe derdixin pêş. Ji ber vê armancê Şêx Ubeydullah nameyekî ji Qonsolê Ingilîzî yê Elbakê (Başkale) Clayton re dişîne û daxwaza alîkarîya serxebûna “Kurdistanê” dike.⁸

⁴ Beşikçi, İ. (1990). *Devletlerarası Sömürge Kürdistan*, İstanbul, Alan Yayıncılık, r.70.

⁵ Bulut, F. (1992). *Dar Üçgende Üç İsyân, Kürdistan'da Etnik Çalışmalar Tarihi*, İstanbul, Belge Yayınları, r. 86.

⁶ Hassanpour, A. (2005). *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, (Beşinci Baskı). İstanbul, Avesta Yayınları, r.130.

⁷ Aydemir, Ş. S. (1970). *Mekadonya'dan Ortaasya'ya Enver Paşa*, İstanbul, Remzi Kitapevi, (Cild 1). r.101.

⁸ Jwadih, W. (2014). *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökeni ve Gelişimi*, İstanbul, İletişim, r.143.

Dr. Celîlê Celîl dibêje: “Programa Şêx Ubeydullah yekemîn programe ku di dîroka tevgera Kurdan de, karîye siyaset û dîn bi awayekî bike yek, ku dijîtî nekeve navbera wan.”⁹

Rêbazeke Şêx Ubeydullah, taybetî ji bo damezrandina dewletekî hebû. Ewî dixwest berê Îranê re şer bike. Lewra Îran wê demê de bi dewleta Osmanîyan re şer dikir û hemû hêzên xwe ji bo şerê Osmanîyan terxan kiribû. Ewî dixwest ku vê bêhêzbûna dewleta Îranê wek derfetekî bikar bîne û bidestxistina gelek hêzên aborî û stratejîk, piştî jî vegere bi dewleta Osmanî re şer bike.¹⁰

Dawîya sedsala 19’an de tevgera herî bi bandor û berfireh serhildana Şêx Ubeydullah be jî; ev serhildan, ji ber hinek sebeban têk çû, lê bandora serhildanê li nav Kurdên Îranê hê gellekî dewam dikir.

Rewşa Kurdistana Îranê cuda bû. Encamên serhildana Şêx Ubeydullah bandora xwe li wir, demeke dirêj dewam kir. Kurdên niştêh, piştî êrişên Şêx Ubeydullah û hevalên wî li ber desthilatdariya Şah (ku ew jî ji cihê xwe leqya bû) enîya şer nû kirin û berxwedanê dewam kir. Bi taybetî salên 1886—87’an de hinek eşîrên li Serdeşt û Urmîyê serî hildan û rewşeke nearamî çêbû. Hikumeta Îranê (piştî dayîna hinek meqamên îdarî ji bo serekeşîran û destkişandina karmendên ku Kurd ji wana nerazîbûn) karibû rewşê aram bike.¹¹

Piştî nefikirina Şêx Ubeydullah li Mekkeyê, herêma demekî aram bû. Paytexta Dewleta Osmanî jî; ji bona carek din serkirde û pêşdehatîyên Kurdan ra peywendîyê xwe nû bike û wana têxe bin xizmeta xwe, ji vê rewşê sûd wergirt,¹² hinek guherîn û politîkayên nû bi rêve bir. Yek ji wan politîkayan jî damezrandina Lîwayên Siwarîyê Hemîdîyê (Hamidiye Süvari Alayları) bû. Nerînên derbarê damezrandina Lîwayên Siwarîyê Hemîdîyê cuda cuda ne. Hinek ji wan nêrînan ev in.

“Serhildana Şêx Ubeydullah û hinek serhildanên dîn, bûn sebeb ku Dewleta Osmanî tevdîrên nû hilde. Tevgerên Ermenîyan yê ji bo serxwebûnê jî sebebê din bûn ji bo çêkirina teşkilata Lîwayên Siwarîyê Hemîdîyê.”¹³

⁹ Celîl, C. (1985). *b.n.b.*, r.21.

¹⁰ Celîl, C. (1985). *b.n.b.*, r. 22.

¹¹ Lazarev, M.S û Mihoyan, (1980). *Kürdistan Tarihi*, İstanbul, Avesta, r.155.

¹² Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.155.

¹³ Avyarov, (1995). *Osmanlı-Rus ve İran Savaşlarında Kürtler 1800-1901*, Ankara, Sipan Yayıncılık, r.130.

“Dewleta Osmanî di dawîya sedsala 19’an de, ji alîyekî dest bi reform û guherînan dikir, ji alîyekî din ve jî polîtîkayek cuda dimeşand. Bi reforman ve dixwest ku eşîreta ji hev derxe û ortê rake; ji alîyekî din ve jî bi damezrandina Lîwayên Hemîdîyê ve hê diçû hêza eşîrata xurt dikir û yekî li hemberî yên din xurttir û bihêztir dikir. Martin Van Bruinessen vê rewşê wiha tîne ziman: Sultan Ebdilhemîd carnan sîyasetek dijberî reforman jî dimeşand. Sala 1891’î de ji bo kontrolkirina herêma rojhilatê împaratorîyê hêzek herêmî wek “Cendirme” bi navê Lîwayên Hemîdîyê damezrand. Serokên eşîreta wek efser (subay) dane ser van hêzan. Gelek selahîyet û desthilatî kete destê serokeşîran. Ji ber van jî di herêmê da îstîsmar çê bûn. Hinek eşîr li hemberî yên din bihêztir bûn û denga di nav eşîreta hat guherandin.”¹⁴

Dewletên cihanê yên mezin jî, wê demê li gor berjewendiyên xwe li herêmê desttêwerdanên xwe dikirin. Taybetîya sedsala 19’min ewe ku; hêzên Ewropî (Uris û Britanya) li gor berjewendiyên xwe yên aborî û polîtîk herêm kiribûn qada şerê xwe.¹⁵ Ji xwe armanca damezrandina vê hêzê ya herî taybet; li hemberî gefxwarinên dewletên Uris û Îngilîz bû.¹⁶ Hinek lêkolîner sebebê damezrandina lîwayan bi tiştên din ve girêdidin. Yek ji wan Celîlê Celîl e ku angaştê ew dike ev bû: “Têkoşîna Kurdan, di sedsala 19’an de li dijî Sultanê Osmanî, ji alîyê siyasî de xurt, bihêz û belav bûbû. Sultan bi eşkera di heqê wan de nedihat û ji bo wê siyasetek din girte ber xwe; bi vê siyasetê ve Kurd perçe bûn û dijminayeti kete nav tevgerên Kurdan.”¹⁷

Sultan Ebdulhemîd li hemberî gefxwarina Uris, daxwaza komeleyên Ermenîyan li ser xaka rojhilata Dewleta Osmanî, ji bo ”dewleteke Ermenî ya serbixwe” û piştgirîya dewletên wek Înglîz û Amerîka¹⁸ di sala 1891’î de, di bin serokatiya hinek serokeşîran de û bi navê “ Lîwayên Siwarîyên Hemîdîyê”, 36 lîwa damezrandibû. Sala 1892’an de hejmara lîwayan 40 bû, sala 1893’an de bû 56 û di sala 1899’an hejmara lîwayan gihîştê 63’ya.¹⁹ Li gor Avyarov di sala 1899’an da 57,5 lîwayên Hemîdîyê hebûn. Ji van lîwayan 50,5 lîwa Kurd, 3 lîwa Qerepapax û 4 lîwa jî yên Ereban bûn.²⁰

¹⁴ Bruinessen, M.V. (2013). *Ağa, Şeyh, Devlet*, (Sekizinci Baskı). İstanbul, Özge Yayınları, r.285.

¹⁵ Hassanpour, (2005). *b.n.b.* , r.130.

¹⁶ Bruinessen, (2013). *b.n.b.* , r.285.

¹⁷ Celîl, C. (1985). *b.n.b.* , r.23.

¹⁸ Kodaman, B. (Mayıs 2010). II. Abdülhamit ve Kürtler-Ermeniler, *SDÜ Fen Edebiyat Fakültesi, Sosyal Bilimler Dergisi*, hj.21, r.131-138.

¹⁹ Bruinessen, (2013). *b.n.b.* , r.286.

²⁰ Avyarov, (1995). *b.n.b.* , r.135.

Sultan Ebdilhemîd bi damezrandina Lîwayên Hemîdîyê ve sîyaseteke pîralî û kûr meşandîye. Ji alîyekî ve hêzeke taybet li hemberî Uris û Ermenîyan pêk anîye, alîyê din jî, bandor û hêza xwe li ser eşîr û serekên herêmê zêdetir û xurttir kirîye.

Dewleta Osmanî tenê bi sazkirina Lîwayên Hemîdîyê, dest neavêtibû herêmê. Ji ber damezirandina Siwarîyên Hemîdîyê, hinek dibistan jî ji bo zarokên Kurdan hat vekirin. Zarokên axa û yên serekeşîretan di van dibistanan de, dersên dinî û leşkerî dixwendin.²¹ Dawîya sedsalên 19'an de gelek rewşenbîr, zana û xwendekarên Kurd, li Stenbolê hatibûn cem hev. Hinek ji wan jî bo xwendina mektebên eşîretê û mektebên din, hinek jî ji ber nefîkirinê hatibûn paytextê. Di nava wan de, kesên ji malbatên malmezin û feodalên Kurdan jî hebûn. Hinek ji wan malmezinan, piştî serhildanên ku bi ser neketibûn, sirgûnî Stenbolê bibûn. Lê gelek kesên dewlemend û zarokên serekeşîrên Kurdan jî, ji bona xwendinê li wê derê diman. Tê dîtîna ku wê demê de, hejmarek zêde ya Kurdan jî, ji bona kar û xebatê li Stenbolê bi cîh û war bûbûn. Celîlê Celîl wê demê Stenbolê rewşê wiha teswîr dike: “Stenbol ne ku tenê bibû cîhê merkeza azadî û meyla liberalizma Tirkî, her wiha, hêdi hêdi bibû merkeza rewşenbîrên Kurdan jî. Di nav wan Kurdên ku li Stenbolê dijîyan de, komê ji kurên axa, begzade û leşkeran û hinek kesên ji bo karkirinê hatibûn paytext jî hebûn.”²²

Hinek malbatên mîrên ku serhildanên wan têk çûne û hinek jî malbatên feodal ji bo hebûna hêza xwe bidomînin, bûn alîgirê hikumeta navendî. Hinekan jî muxalefeta xwe dewam kir û dema fîrset dîtîna serî hildan. Hinekê ku koçê Stenbolê kiribûn ew jî bi awayekî nûjen di nav rêxistinên polîtîk de, dibûn xwedî tecrûbe. Yê di nav wan de herî bi nav û deng jî malbata Bedirxanîyan bûn. Vê malbatê rojnameya ewil bi navê *Kurdistan* (1898) weşandibû.²³

Ji bona perwedekirina zarokên malmezin û serekeşîrên Erebi, Kurd û Arnavûdan jî, bi navê “Mektebên Eşîretan” du dibistan hatibûn vekirin. Yek ji wan li Stenbolê û ya din jî li Bexdayê bû. “Mekteba Eşîretan” ya li Stenbolê, di sala 1892'an de hatibû vekirin û di wê dibistanê de, tevî zarokên malmezin, xanedan û serokeşîrên Arnavûd û Ereban, gelek zarokên beg û serokeşîrên Kurdan jî dest bi xwendinê

²¹ Celîlê Celîl, (1985). *b.n.b.*, r.24.

²² Celîlê Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 26- 27.

²³ Hassanpour, (2005). *b.n.b.*, r.131.

kiribûn. Wana dersên dînî û leşkerî bi hev re dixwendin. Piştî qedandina vê mektebê jî, dê biçûna akademîyên leşkerî da ku xwendina bilind jî xilas bikin.²⁴

Derbarê rewşa van mekteba û li ser girtina wan, Celîlê Celîl wiha dinivîse: Bi vekirina Mektebên Eşîran, armanca Sultan Ebdulhemîd ew bû ku zarokên serokeşîr û malmezinên Kurdan li gor polîtîkayên xwe perwerde bike. Bi awayekî haya wan xwendevanan ji qewimandinê dinyayê re çêdibûn, alîyekî din jî peywendîyên wan bi gel ra dewam dikirin. Ev jî dibû sebebê xurtbûna hestên millî di nav xwendevanan de. Ji ber wê ya Sultan Ebdilhemîd di sala 1906'an de ew dibistan dane girtin.²⁵

Her sê tevgerên şoreşî, yanî şoreşa Uris (1905), Îran (1906 - 1911) û Osmanî (1908) bibû sebebê sazkirina hinek komele û rêxistinên Kurdî. Di nav refên Jon Tirkan (Tirkên Ciwan) de gelek Kurd hebûn. Tevera Kurda ya yekem a siyasî “Komeleya Hevkarî û Pêşketin a Kurd” (Kürt Teavûn ve Terakki Cemiyeti) di nav wan salan (1908 - 1909) de hat sazkirin. Piştî re jî gelek komel û sazîyên Kurdî yên edebî û polîtîk derketin; van komeleyan ji bo geşkirin û belavkirina fikrên xwe, rojnamevanî, ziman û weşangerî derxistin pêş.²⁶ Kurdên li derveyê welat dijîyan, bi rêya rojnamegerîya Kurdî bala dewletên Ewropî dikişandin ser pîrsgirêka Kurd. M.S. Lazarev & Mihoyan dibêjin: “Tu serkeftineke wana ye berbiçav tunebe jî; vê pêngavê di destpêka tevgera Kurdî da roleke girîng dileyist.”²⁷

Wek ku Lazarev- Mihoyan dibêjin: “Destpêka sedsala 20'an de Kurdên Dewleta Osmanî û Dewleta Iranê, ji ber her du dewletan nerazibûna xwe nişan didan. Yê ewilî serî hildan Kurdên Dewleta Osmanî bûn. Teqez bandora şoreşa Uris (1905), li ser vêya hebû. Lewra ev şoreş wek “*jixew rabûna Asya*” dihate navkirin. Payiza sala 1905'an de Dêrsim, Bedlîs û Bayezid'ê serhildan çêbûn. 1906'an da li Erzerom û Bedlîsê ev serhildan hatin dewam kirin. Vî şerî heta şoreşa Jon Tirkan (1908) dewam kir. Ev tevgera di van salan de, ji Bêrecuk (Birecik)'ê hetanî Musil'ê di bin desthilatdarîya Brahîm Paşayê Milî de berfireh bibû. Sala 1905'a li Îranê de jî guherînên mezin çêdibûn. Di bin rêbertîya Smaîl Axa Simko de serhildanek çêbibû û vê serhildanê hemû herêm dabû ber xwe.”²⁸

²⁴ Celîle Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 26.

²⁵ Celîle Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 26- 27.

²⁶ Hassanpour, (2005). *b.n.b.*, r.131.

²⁷ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.164-165.

²⁸ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.168-169.

Di sala 1907' an de, Komela Îttihad û Teraqqî ya Osmani û Komela Azadî ya Osmanî bûne yek. Di 29 ê Kanuna Yekem a sala 1907'an de, li Parisê Kongra Dûyem a Tirkên Ciwan çêbû.²⁹ Di vê Kongrê de nunerên hemû milan yên parti û rêxistinan beşdar bûn. Ew koma Kurdan ku li der u dora rojnameya *Kurdistan* civîyabûn, di bin serokatîya Ebdurehman Bedirxan de beşdarî kongreyê bûn. Dawîya kongreyê de, tevgerên “şoreşgerî” li Tirkîyê bi awayeki yekgirtî, hemû hêzên xwe kirin yek. Slogana wan “*azadî, wekhevî û biratî*” bû. Hemu hêzên şoreşger ên netewên Imparatoriye, dijî desthilatdarîya Sultan Ebdulhemîd bibûne yek.³⁰

Peywendîyên gelek rewşenbîrên Kurdan yên wê demê bi komeleya Ittihat ve Terakkiyê ve hebû. Ji mala bedirxanîyan Osman û Huseyîn Bedirxan, Mîthat Bedirxan, Kamil Bedirxan, Xelîl Ramî, Hesên Beg, Ebdurehman Bedirxan, Bahrî Beg, Emîn Alî Bedirxan, Sureyya, Celadet û Kamiran Bedirxan. Ji serek û rewşenbîrên din jî wek; Seyid Ebdulqadir, Dr. Ishaq Sukûtî, Ebdullah Cewdet, Şerif Paşa, Suleyman Nazîf, Ismaîl Heqqî Baban, Ziya Gokalp, Yusuf Fehmî Beg³¹ hinek ji wan in. Bira neyê jibîr kirin ku; diruşmeya komeleyê “*azadî, wekhevî û birayetî*” bû.

Roja 24 Temmuz 1908'a Qanun-i Esasî' (makezagon) hate pejirandin û Meşrûtiyet hat îlankirin. Bi vê şiklî desthilatdarîya Sultan Ebdilhemîd piştî 30 salan hat bidawîkirin.³²

Çend sal berîya îlankirina Qanunê Esasîyê, di sala 1900'î da ji alîyê Kurdên Stenbolê komeleyek hatibû saz kirin. Navê wê komelê “Komeleya Xîreta Xurt ya Kurdistanê” (Kürdistan Azm-i Kavi Cemiyeti) bûye. Sazkarê wê komelê Fikri Efendiyê Diyarbekrî ye. Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licî jî endamên wê komelê tê zanin. Lê belê ew komele temendirêj nebûye û demek paşê hatîye girtin, Ehmed Ramîz jî di sala 1904' an da çûye Misrê, piştê ku di sala 1908 'an da meşrutiyet hatîye îlankirin, ew jî vegerîyaye Stenbole.³³ Wek tê zanîn ku ev komele jî di heysebeysa demê de zêde bi bandor nebûye û piştê hatîye girtin.

Destpêka desthilatdarîya Tirkên Ciwan de navbera rewşenbîrên Kurd û rêvebirîyê da peywendîyên germ hebûn. Rêberên Kurd bawer dikirin ku dewletê

²⁹ Çavdar, T. (1995). *Türkiye'nin Demokrasi Tarihi (1839-1950)*, Ankara, İmge Yayınevi, r. 87.

³⁰ Celîle Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 71-72.

³¹ Kutlay, N. (2015). *İttihat Terakki ve Kürtler*, Ankara, Dipnot Yayınları, r. 84,114.

³² Uzunçarşılı, İ. H. (1966). *II. Meşrutiyyet'in Ne Şekilde İlan Edildiğine Dair Vesikalar*, Ankara, TTK. Yayınları, (Belleten'den ayrı basım) r.106.

³³ Silopî, Z. (1969). *Doza Kurdistan*, Stewr Basımevî, Beyrût, r. 25-26.

xwastekên wan wê bide wan.³⁴ Ji bo destxistina wan daxwazan, di payiza sala 1908' an de, bi pêşengîya Seyid Ebdulqadir û Emîn Alî Bedirxan li Stenbol'ê Komeleya Hevkarî û Pêşketin a Kurd (Kürt Teavûn ve Terakki Cemiyeti) hat damezirandin. Armanca vê komeleyê ew bû ku; serokatî û rêberiya xebatên siyasî û rewşenbirî ya hemû tebeqan bike. Endamen komeleyê piştgiriya sloganên Tirkên Ciwan dikirin. Parastina "mesela yekîtiya neteweyên Osmanîyan" û meşrutiyeta sala 1876'an dikirin. Di mintiqên Kurdan de vekirina dibistanan; tayin kirina memur û karbidestên Kurd li dam û dezgehên di welat de; îtiraf kirina resmî ji bo zimanê Kurdî; avakirina zanîngehekî li herêmê; rêdana derxistina kovar û rojnameyan bi zimanê Kurdî; kifşkirina nûneren herêmî yên Kurd, ji bo meclisê. Bizav û hewldan ji bo geşkirina rewşa aborî ya herêmê.³⁵ Bername û daxwazên komelê evanan bûn. Rojnameyek bi navê *Rojnameya Hevkarî û Pêşketin a Kurd* (Kürt Teavûn ve Terakki Gazetesi) weşana komeleyê ya fermî bû. Rêvebirê rojnameyê Hacî Tewfîqê Silêmanîyê (Pîremerd) bû.³⁶ Şaxên komeleyê li Diyarbekir, Bedlîs, Musul, Muş û Erzerom'ê hatibûn vekirin.³⁷ Xêncî şaxên komeleyê hema hema hemû bajarên piçûk yên Kurdan, klubên girêdayî bi komeleyê ve hatibûn vekirin.³⁸

Li gor Zinar Silopî, ew pêşeng û giregirên Kurdan (yên ku li qesra padişah disekinîn û meaşê xwe distandin, ji ber hilweşandina balpişt a wan), xwe bi Kurdayetîyê ve girêdan. Herçiqas fîkr û daxwazên wan ne wek hev bin jî, hatin cem hev û di taxa Gedik Paşa li Stenbolê, Komeleya Hevkarî û Pêşketin a Kurd damezrandin. Ji ber nakokîyên şexsî di navbera damezrînerên komeleyê, evê komeleyê zêde dewam nekir. Wê demê de bi xebatên Xelîl Xeyalî, Mîrî Katibîzade Cemîl û Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licî ji bo zarokên Kurdan dibistanek hat vekirin û weşanxaneyek hat damezrandin. Herwiha rojnameyek bi navê "Kurdistan" dihate weşandin. Piştî belavkirina komeleyê dibistan û weşanxane hatin girtin, karê rojnameyê jî hat betalkirin.³⁹

Garo Sasuni, naveroka weşanên komeleyê û bi taybet jî naveroka rojnameya *Rojnameya Hevkarî û Pêşketin a Kurd* qels dibîne. Ew dibêje, "naveroka weşanên wê demê ji alîyê siyasî ve bêhêz bûn. Di wan weşanan da bi gelemperî pirsê meşrutiyetê,

³⁴ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.172.

³⁵ Celîle Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 73-74.

³⁶ Bozarslan, M. E. (1998). *Kürt Teavûn ve Terakki Gazetesi*, Uppsala, Weşanxana Deng, r. 2.

³⁷ Celîle Celîl, *b.n.b.*, r. 82.

³⁸ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.172.

³⁹ Silopî, (1969). *b.n.b.*, r. 23.

hinek xwestekên çandî û bîranîna wan, tewsiya medenîbûna Kurdan zêdetir tiştek tinebû. Damezrandina partîyeke serxwebûnxwaz û daxwaza dewleteke serbixwe û belevkirina fikra serxwebûnê di nav weşanan de cih nedigirt.”⁴⁰ Tê zanîn ku wê demê de zêdahîya Kurdan li ser fikra pêkvejiyîna milletên Osmanî bûn. Fikra netewî hê neketibû nav milletên misilman û bi taybetî jî nav milletê Kurd. Li gor wan kesan, divîyabû Kurd pêşîyê ji alîyê perwerde û zanînê de kêmasîyên xwe temam bikin. Ziman, çand û dîroka xwe baş bizanibin. Piştî temamkirina wan kêmasîyan û hînbûna wan zanebûnan, Kurd dikaribûn bibin neteweyekî pêşdaçûyî û di nav neteweyên Dewleta Osmanî yê din bibin wekhev û bi rûmet. Nivîskarê rojnameya Tanîn’ê Îsmail Heqqî Baban û Bediuzzeman Seîdê Kurdî, jî di rojnameya Rojnameya Hevkarî û Pêşketin a Kurd de bal dikişînin ser van xalan. Ewana jî; ji Kurdan dixwazin ku Kurd zimanê xwe hîn bibin û xwe baş perwerde bikin, lewra Kurd tenê bi pederdeyê û bi yekitîyê ve dikarin bibin milletek bi rûmet.⁴¹

Her çiqas ew rojname û komele (Rojnameya Hevkarî û Pêşketin a Kurd û Komeleya Hevkarî û Pêşketin a Kurd) di demeke kurt jiyanî xwe karibûn bidomînin, lê rolekî wan e baş di perwerde û hişyarkirina gelê Kurd de çêbu. Komeleyê ji bo belavkirina xwendekarîyê di nav Kurdan de xebateke mezin kirîye.⁴²

“Hilbijartinên di sala 1910’an de ji malbata bedirxanîyan Huseyin Paşa û Hesên Beg ji “Kurdistanê” wek numayende (wekîl) hatin bijartin, lê rêvebirên Îttihad û Tereqqîyê ev yek qebûl nekirin û biryara girtina her dû wekîlan dan.”⁴³ Dîsa di hilbijartinên di sala 1912’an de li bajarê Sêrtê, ji malbata bedirxanîyan Hesên Paşa wekîl hat hilbijartin, lê Îttihad û Tereqqîyê bi zorê wekîltiya wî betal kir.⁴⁴

Rewşenbîr û giregirên siyasîyên Kurda, li herêmê û Stenbolê xebatên girîng dikirin. Lê xwendevanên wê demê jî di qada xebatê de cihê xwe girtibûn. Çawa ku Celîlê Celîl dibêje, “di jiyanî siyasî û civakî ya Kurdan de, xwendevanan roleke mezin listîye. Nemaze xwendekarên ku li Stenbolê di zanîngeh û enstutîyan de dixwendin. Di paytextê de, di belavok û civinên Kurdan yê siyasî de, dengên xwendewanan xurt, zelal û bilind bû. Ji bo hişyarîya siyasî û civakî, ewana jî dengê xwe bilind dikirin.

⁴⁰ Sasuni, G. (1992). *Kürt Ulusal Hareketleri Ve 15. Yy’dan Günümüze Ermeni - Kürt İlişkileri*, İstanbul, Med Yayınları, r.225.

⁴¹ Bozarslan, (1998). *b.n.b.*, r.10-20.

⁴² Celîle Celîl, (1985). *b.n.b.*, r.86.

⁴³ Öke, M. K. (1990). *İngiliz Ajansı Binbaşı E.W.C Noel’in Kürdistan Misyonu (1919)*, İstanbul, Boğaziçi Yayınları, r.101.

⁴⁴ Kutlay, (2015). *b.n.b.*, r. 269.

Wan xorta di destpêka sala 1912' an de li Stenbolê, komeleke nû, ya xwendewanan bi navê *Hêvi* di Fakulta Ziraatê de damezirandin. Ji ber ku hejmarên xwendevanên Kurdan di wê fakultê de pir bûn. Her bi wî awayî, di fakulteyên din de jî, endamên wê hebûn.”⁴⁵ Omer Cemîl Paşa serokê komeleyê, Qedri Cemil Paşa jî sekreterê wê bû. Fuat Temo, Cerrahzade Memduh Selîm, Necmeddîn Huseyin, Ebduleziz Baban, Omer Efendi û Zekî Beg endamên komeleyê bûn. Berpirsiyarê malî, Xelî Xeyalî bû. Salek piştî damezrandinê, komeleyê pêşîyê kovarek bi navê *Rojî Kurd* derxist. Piştî girtina vê kovarê *Hetawî Kurd* bû weşana fermî ya komeleyê. Kovar bi naveroka xwe ve gelek hînkar bû û di nava Kurdan da jî pirr belav bibû.⁴⁶ Şaxeke komeleyê li Erzeromê di dibistaneke navîn da hatibû damezrandin. Serokê Şaxê Teyîb Elî bû. Şaxeke din li Swisre, bajarê Lozanê hatibû vekirin.⁴⁷

Di wê hemdemê da, li Îranê, ji alîyê Ebdurrezaq Bedirxan ve komeleyek bi navê *Gehandîni* hat damezrandin. Evê komelê wek navenda belavkirina fikrên neteweyî kar dikir. Ebdurrezaq Bedirxan jî bo perwerdeya xortên Kurdan, bi kurdologên Uris yê wek N. Y. Marr û I. A. Orbelî ra peywendî danî û bernameyek amade kir. Herçiqas dewleta Îranê astengî derxistin jî, ewî li bajarê Xoy'ê dibistaneke Kurdî vekir.⁴⁸

Dawiya sala 1912'an û destpêka sala 1913'an de⁴⁹ li gor Lazarev jî nivê sala 1913'an de Kurdên Îranê komelek bi navê “Komala Kurdistan” damezrandin. Vê komeleyê ji eşîrên herêmê re çek û silêh berhev dikir û organîze dikir. Di heman demê de li Fransayê kovarek bi navê *Meşrûtiyet* derdixistin. Neteweperwerên Kurd daxuyanîyên xwe li hemû deverên wî welatî belav dikirin. Daxwaza wan, bi gelemperî otonomî (xweserî) bû.⁵⁰

Di wê demê de herêmên Kurdan ser û bin dibûn. Ebdurrezaq Bedirxan, Şêx Taha û rêberên Kurdan yê din li derdorên Erzerom û Wan'ê propagandaya Kurdayetîyê dikirin. Nakokîyên di navbera rêberan dibû asteng ji bo tevgerek gelemperî. Hinek rêberan hêvîya xwe bi dewleta Uris ve girêdabû, hinekên din jî bi Ingilîzan.⁵¹ Ev nakokî hebûn, lê dîsa jî hewla yekîtî û desthevgirtinê jî li alîyekî din

⁴⁵ Celîle Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 90-91.

⁴⁶ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.180.

⁴⁷ Celîle Celîl, (1985). *b.n.b.*, r.92.

⁴⁸ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.180.

⁴⁹ Celîle Celîl, (1985). *b.n.b.*, r.137.

⁵⁰ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.180-181.

⁵¹ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.181.

dewam dikir. Sala 1912 an, di meha Gulanê de, hinek Kurdan li Stenbolê “banga yekîtiyê” belavkirin. Ewan ji nûnerên hemû komele, rêxistin û kesên Kurdan, dixwestin ku hevkarî û yekgirtina hêzên xwe bikin yek. Nûneran daxwaza biryara damezirandina partiyek yekgirtî jî kiribû, ku ew bikare bibe çareserîya armanca wan.⁵²

Kurdan alîyekî da dixwestin nakokîyên navxweyî hildin, ji alîyekî din jî dixwestin bi Ermenîyan re peywendî daynin. Garo sasuni dibêje “Piştî hevdiştinên Seyid Elî û Mela Selîm, bi partîya Taşnaq re peymanek hat çêkirin”⁵³ lê belgeyên vê peymanê di destê me de tine. Piştî tevdîr û amadehîyan, serhildana Bedlîs’ê (1914) di bin rêberîya Mela Selîm de dest pê kir. Serhildan berfirehî dewam dikir ta ku karibûn bajarê Bedlîs’ê bixin destê xwe.⁵⁴ Îttihad û Tereqqîyê, xwestibû ku Ermenîyên deverê jî; li dijî serhildanê şer bikin.⁵⁵ Li gor ku Garo Sasûnî angaşt dike, Ermenîya bi dizîka va xeber ji Seyid Elî ra şandin û gotin emê, tenê li Norduz’ê êrişê hêzên Mihê Kor bikin.⁵⁶ Şer 18 roja dewam kir lê ev serhildan jî neçû serî. Hikumeta Îttihad û Teraqqiyê bi tundî serhildan pelçiqand. Ji pêşengên serhildanê Şêx Şahabeddîn, Seyid Elî û 14 hevalên wan hatin dardakirin.⁵⁷ Rêberê Serhildanê Mela Selîm jî, îltîcayê qonsalxana Uris ya Bedlîsê kir. Ew jî bi destpêkirina şerê cihanê yê yekem, ji qonsolxanê hat girtin û li wir hat dardakirin.⁵⁸

“Dema Şerê Cihanê Yekemîn Rojhilatê Tirkîyê, Rojavayê Iran û Başûrê Iraqê yanî ew cihên ku Kurd lê niştecîhin, bû qada şer. Îttihadçiyên hevalbendên Almanan dixwestin êrişên xwe yên Qafqasya û Rojavayê Iranê de eşîrên Kurdan bikar bînin. Carnan jî diceribandin, gelo dikarin Lîwayên Hemîdîyê vejînin yan na? Bahara sala 1915’an de Dewleta Osmanî qerarê tehcîra Ermenîyan da. Di pêvajoya tehcîra Ermenîyan de xêncî çend bûyerên takekesî tû karekî Kurda di nav vê bûyerê da nayê xuyakirin. Mînakên piştevanîya Kurda ji bo Ermenîyan, ji xwe gellek zêde ne.”⁵⁹

Sala 1917’an de Dewleta Uris bi temamî xaka Kurdên Îranê û nivê zehv jî ya destê dewleta Osmanî de dagir kiribû. Ji xwe 16 Gulan 1916’ a de, bi peymana Sykes-Picot, ev deveran di nav dewletên Uris, Fransîz û Ingilîz de hatibû parvekirin.⁶⁰

⁵² Celîle Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 153.

⁵³ Garo Sasuni, (1992). *b.n.b.*, r. 233.

⁵⁴ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r. 181.

⁵⁵ Kutlay, (2015). *b.n.b.*, r.184.

⁵⁶ Sasuni, (1992). *b.n.b.*, r.234-235.

⁵⁷ Sasuni, (1992). *b.n.b.*, r. 234.

⁵⁸ Celîle Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 172.

⁵⁹ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.185-187.

⁶⁰ Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.191.

Sîyasetmedar û rêberên Kurdan yê wê demê hewl didan bi hinek dewletan re peywendî çêkin. Desteka hinek dewletên mezin, bi taybet dewletên Uris û Îngilîz bigirin. Ji bo vê armancê Seyîd Taha bi ser navê Îstihsalê Kurdistan (Azadiya Kurdistan) nameyek ji konsolê Uris yê Urumîyê Bazîl Nikitîn re dişîne û daxwaza alîkarîyê, li hemberê Dewleta Osmanî dike.⁶¹ Di navbera Kurdên Iraqê û Ingilîzan de jî peywendî hebûn. Karbidestê Ingilîz Persî Coqs, ji bo xweserîya (otonomî) Kurdan li Marsilya'yê hevdîtin çêdikir.⁶² Dewletên Uris û Ingilîz ji bo berjewendîyên xwe, bi her rengî hemû deverên herêmê xebat dikirin. Ji bo piştgirîya eşîrên Kurdan, bi wan re peywendî datînin û propagandaya xwe dikirin.

30'ê Cotmeh'a 1918'an de, di navbera Dewleta Osmanî û hêzên hevpeymanî de Peymana Agirbesta Mondros'ê hat îmze kirin. 12 roj pişt re jî Almanya teslîm bû. Şerê cihanê yekem bi dawî bibû, lê di herêmê de tu pîrsgirêk nehatibû çareser kirin û dibe ku qonaxeke nû dest pê kiribû.

Dewletên mezin pêşîya şerê cihanê sozê damezrandina dewleteke Kurdî dabûn. Piştî şer, wana “ew cîhên ku sozê wê dabûn” di nav xwe da parve kirin.⁶³ Piştî îmzekirina Peymana Agirbesta Mondrosê û dagirkirina herêmê, endamên malbatên giregir, xortên xwenda û ew kesên ku di bin bandora fikrên neteweperwerîya Ewropa de mabûn, ketin nav siyaseta aktîf û komele û sazî damezrandin.⁶⁴ Armanca komele û sazîyên li Stenbol û Anatolyayê hatibûn damezrandin; dema zêîfbûna Dewleta Osmanî de avakirina dewleteke serbixwe bû.⁶⁵ Yek ji wan komelayan jî, piştî îmzekirina Peymana Agirbesta Mondrosê li Misrê, ji alîyê Sureyya Bedîrxan ve hatibû damezrandin. Navê Komeleyê “Encumena Azadiya Kurd” (Kürd İstiklal Komitesi) bû. Armanca vê komeleyê “yekitîya Kurdan û damezrandina dewleta Kurdî bû.”⁶⁶ Komeleyê hevdîtinên xwe (16 Kanûn 1918'da û Çileyê 1919'an) bi Îngilîza re pêk anî. Di hevdîtinê de nameyek bi zimanê Fransîzî pêşkêşê Îngilîzan kirin û tê de daxwaza dewleteke Kurdî dikirin. Encumena Azadiya Kurd ji bo pêkanîna daxwazîyên komeleyê ji lijneya Hevdîtinên Aştî yê Parîs (Paris Barış Görüşmeleri) re çend name şand. Komeleyê xebatên xwe li Misrê domand. Dema girtina wê nediyare.⁶⁷

⁶¹ Göldaş, İ. (1991). *Kurdistan Tealî Cemiyeti*, İstanbul, Doz yayınları, r.111.

⁶² Lazarev û Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.192.

⁶³ Bruneissen, (2013). *b.n.b.*, r.293.

⁶⁴ Göldaş, *b.n.b.*, r.11.

⁶⁵ Göktas, H. (1991). *Kürtler İsyan – Tenkil*, İstanbul, Alan Yayıncılık, r. 31.

⁶⁶ Aytepe, O. (1998). Kürt İstiklâl Komitesi, *Tarih ve Toplum*, Ankara, Cild 29, (hj. 173), r. 301.

⁶⁷ Aytepe, (1998). *h.n.*, r.304-305.

Piştî şer, li Stenbolê gelek komele û sazîyên Kurdan hat avakirin. Komeleya Bilindkirina Kurdistan (Kürdistan Teali Cemiyeti) û Komeleya Kurdistan (Kürdistan Cemiyeti) (1918), Komeleya Belavkirina Perwerdeya Kurd (Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti) (1919), Komeleya Hêvî (Kürt Talebe Hêvi Cemiyeti) (1919), Komeleya Bilindkirina Kurdistan Ya Jinan (Kürt Kadınlar Teali Cemiyeti) (1919) û Komeleya Hevkarîya Kurdistan (Kürdistan Teşrik-i Mesai Cemiyeti) (1921).⁶⁸

Di nav sazîyên Kurdan yên ku piştî şerê cihanê yekemîn hatine damezrandin, ya herî navdar û bi bandor “Komeleya Bilindkirina Kurdistanê” (Kurdistan Teali Cemiyeti) ye. Diroka damezrandina komeleyê 17 Kanun 1918 ye.⁶⁹ Damezrênerê komeleyê ji van kesan pêk dihat:

1. Serok: Seyid Evdilqadir (Şemdinan)
2. Alîkarê Serok 1: Emin Ali Bedirxan (Botan)
3. Alîkarê Serok 2: Fuad Paşa (Silêmanî)
4. Emîndarê Giştî: Hamdi Paşa
5. Muhasib: Seyid Ebdullah (Kurê Seyid Evdilqadir)
6. Endam: Miralay Xalid Beg (Dêrsim)
7. Endam: Miralay M. Ali Bedirxan Beg (Botan)
8. Endam: M. Emin Beg (Silêmanî)
9. Endam: Xoce Ali Efendi
10. Endam: Şefik Ervasi (Wan)
11. Endam: Şukrî Baban (Silêmanî)
12. Endam: Fuad Baban (Silêmanî)
13. Endam: Fethullah Efendi
14. Endam: Şukrî Mehmed (Paxirmaden)⁷⁰

Piştî damezrandina komeleyê, civîna yekem da biryara damezrandina şaxên komeleyê li Anatolyayê hat dayîn. Divê, di şaxên komeleyê de bi taybetî rewşenbîr û xortên Kurdan cih bigirtana. Demeke kin, piştî sazkirina komelê, gelek şaxên wê li

⁶⁸ Mumcu, U. (1991). *Kürt İslam Ayaklanması*, Ankara, Tekin Yayınevi, r.12.

⁶⁹ Tunaya, T. Z. (2003). *Türkiye’de Siyasal Partiler, Cilt II, Mütareke Dönemi (1918–1922)*, İstanbul, Doğan Kitap, r. 187.

⁷⁰ Göldaş, (1991). *b.n.b.*, r.26.

herêmê vebûn. Navê navenda li Stenbolê jî, li gor devoka wê demê, wek “Klûba Kurdî” dihat binavkirin.⁷¹ Şaxa herî bi bandor ya Diyarbekir bû. Serokê şaxê Ekrem Cemîl Paşa, endamên şaxê jî; Cerciszade Kerim, Cerhizade Fikri, Ganizade Reşat û Ömer Beg bûn.⁷²

Kovara *Jîn* weşana komeleyê, ya nefermî bû. Ev kovar di sala 1918'an de li Stenbolê dest bi weşanê kiribû. Piştî damezrandina “Komeleya Bilindkirina Kurdistan” (Kürdistan Teali Cemiyeti)’ê Kovara *Jîn* wek weşana komeleyê kar kir. Heta 2’yê Cotmeha 1919’an 25 hejmar derket. Rêvebirê kovarê Hemze Begê Miksî bû. Bi zimanê Kurdî (Kurmançî û Soranî) û Tirkî derdiket.⁷³ Wisa dixuyê ku Komele û kovarê, fikra “xweserî”yê dimeşandin. Zinar Silopî di vê derbarê de wiha dinivîse: “Rojnameyên Tirkî di wê demê da li dijî Serokê Komeleya Bilindkirina Kurdistanê Seyid Evdîlqadir da, qampanya vekirine û gotine ku: “Seyid Evdîlqadir hem Serokê Şûrayê Dewlet e, hem jî Serokê Komela Bilindkirina Kurdistanê ye. Ev komele jî daxwaza serxwebûna Kurdistanê dike. Divê ku Seyid Evdîlqadir yan jî serokîya Şûrayê Dewlet, yan jî jî îddîaya serxwebûnê berde. Li ser vê daxwazê Seyid Evdîlqadir jî, daxuyanîyek belav kir û got: *Em doza serxwebûna Kurdistanê nakin, lê em xweserî (otonomî) yê dixwazin*. Li ser vê daxuyanîyê, endamê komeleyê, yên wek Emîn Alî Bedirxan, Ferîd Bedirxan, Şukrî Baban, Fuad Baban, Hikmet Baban, Doktor Evdîllah Cevdet, Doktor Şukrî Memet Beg, Kemal Fevzî Begê Bedlîsî, Ekrem Cemîl Paşa, Necmedînê Kerkukî, Huseyin Beg, Mewlanzade Rifat Beg û Memduh Selîm Beg jî komeleyê veqetyan. Van kesan bi navê Komeleya Yekgirtû (Teşkilat-i İctîmaîye Cemiyeti) komelek nû ava kirin.”⁷⁴ Rojnameyek rojane bi navê *Jîn* wek weşana fermî derxistin.⁷⁵ Wek ku Zinar Silopî dibêje: “Komeleya Yekgirtû (Teşkilat-i İctimaiye Cemiyeti) alayek sê reng wek alaya Kurdî pejirand. Xeta jor sor, navend spî û li ser roj, xeta binî kesk bû. Ev alaya wek alaya Kurdî hat îlankirin.”⁷⁶

⁷¹Tunaya, (2003). *b.n.b.* , r.190.

⁷²Aytepe, O. (1998). Yeni Belgelerin Işığında Kürdistan Teali Cemiyeti, *Tarih ve Toplum*, Ankara, hj. 174, r.331.

⁷³Bozarşan, M. E. (1985). *Jîn, Kovara Kurdî-Tirkî * Kürdçe-Türkçe Dergi, 1918-1919*, Uppsala Weşanxana Deng, Cild 1, r.5-6.

⁷⁴Silopî, (1969).*b.n.b.* , r.59.

⁷⁵Silopî, (1969).*b.n.b.* , r.60.

⁷⁶Silopî, (1969).*b.n.b.* , r.60

Uğur Mumcu dibêje prensîbên Wilson (xala 14'mîn) hevîyek xistibû dilê Kurd û Ermenîyan.⁷⁷ Prensîbên Wilson ji her neteweyek ra daxwaza mafê xwerêbirinê îlan kiribû; lê pîrsa Kurdan, ji bo Peymana Sevr'ê ra hatibû paşxistin. "Qeder û pêşeroja Kurdan li ber teqdîra Neteweyên Yekbûyî, ya bi rastî jî; li ber daxwaz û berjewendîyên dewletên mezin mabû."⁷⁸

Peymana Sevr'ê tirsek mezin jî xistibû dilê Kurdan. Lewra li gor vê peymanê ew cîhên ku dewletên emperyal ji bo desthilatdariya Ermenîyan pêşniyar dikirin, bajarên Kurdan bûn û niştecihên wan deveran bi pirranî, Kurd û misilman bûn. Ji alîyêkî din jî, ji bo desthilatdarî û xwerêbirina Kurdan jî gelek şert û merc danîbûn pêşîya Kurdan.⁷⁹ Ji ber van bûyeran rewşenbîr û siyasetvanên Kurd, bi dewlet û hêzên demê re hevdişîn çê dikirin. Naci Kutlay dibêje: "Di hevdişîna Serokê Komeleya Bilindkirina Kurdistan Seyid Evdilqadir, karbidestên Ingilîz û Sadrazam Damat Ferit Paşa û Ali Riza Paşa de, xweserî (otonomî) ya "Kurdistan"ê hat pejirandin."⁸⁰ Her wiha Seyid Evdilqadir nameyek ji Konferansa Paris'ê re şand û nerazîbûna xwe ya li hemberê veqetandina Kurdên Tirkîyê û yê Iraqê nîşan kir.⁸¹

Rojnameyên 16'yê Kanûna 1919'a nûçeya "rewşenbîrên Osmanî, Şerîf Paşa wek nûnerê dewleta Osmanî li Konferansa Parisê hîlbijartine" belavkir. Lê Şerîf Paşa 16 Nisan 1919'an de daxuyanîya xwe ya bi rojnameya *Le Matin* de ragihand ku ji nûnertîya Dewleta Osmanî veqetiyaye û wê "doza mafê gelê Kurd" bişopîne.⁸² Em nikarên bêjin ku Şerîf Paşa ji alîyê rewşenbîr û rêberên Kurdan ve wek nûner hatibû hîlbijartin. Ewî bixwe xwe, xwe wek nûner kifşkiribû û hinek rêberan jî destek didane wî.⁸³ Dîsa jî du hev delegasyon çê bibûn û derbarê daxwazên Kurd û Ermenîyan de hevdişîn pêkdihanîn. Di nav daxwazê Ermenî û Kurdan de nakokîyên mezin hebûn. Nûnerê Ermenîya Bogos Paşa, 12 Şîbat 1919'an da Daxwazên Ermenîya ji Konferansa Paris'ê ra ragihandi bû. Ermenîya doza bajarên Wan, Diyarbekir, Bedlîs, Sêwaz, Erzerom, Trabzon, Mereş, Xozan (Kozan) û Edenê dikirin. Delegasyona di bin

⁷⁷Ew deverên ku Dewleta Osmanî desthilatdare û şênîyên wê jî Tirkin; teqez wê di bin desthilatdariya Osmanî da bimîne. Ew cihên ku netewên din tê de dijîn; divê ji wan re derfeta xwe pêşdebirin û rêvebirinê bê dayîn. Uğur Mumcu, *b.n.b.*, r.13.

⁷⁸ Silopî, (1969).*b.n.b.*, r.63.

⁷⁹ Bnr. Peymana Sevrê, xalên 62, 63, 64'an.

⁸⁰ Kutlay, (2015). *b.n.b.*, r.318.

⁸¹ Yıldız, H. (1990). *Fransız Belgeleriyle Sevr-Lozan-Musul üçgeninde Kürdistan*, Stockholm, Hêvîya Gel Yayınları, r.39.

⁸² Sarıhan, Z. (1984). *Kurtuluş Savaşı Günlüğü I*, Ankara, Öğretmen Dünyası Yayınları, r.207.

⁸³ Sasuni, (1992). *b.n.b.*, r. 257.

seroktîya “Nûnerê Kurdan Şerif Paşa” jî; heman bajar û cih ji bo Kurdan dixwestin.⁸⁴ Piştî hevdîtinan, Kurd û Ermenî lihev hatin û 20 Mijdar 1920’a li Paris’ê muxtirayek belavkirin. Di vê muxtirayê de ji dewletên mezin, daxwaza damezrandina dewletên Kurd û Ermenî dihat kirin. Niqaşên li ser xak û bajaran jî; piştî damezrandina dewletan ji insîyatîfa Konferansê re dihiştin.⁸⁵ Lihevhatina Kurd û Ermenîya û pêşkêşkirina daxwazên her du delegasyonan, di nav Kurdan da bû sebebê nerazîbûneke mezin. Gelek rewşenbîr, serokeşîr û siyasetmedarên Kurdan nerazîbûna xwe, bi rêya şandina telgrafa û belavkirina rojnameyan ve radigihandin û Şerîf Paşa şermazar dikirin.⁸⁶ Ji xwe piştî wexta Şerif Paşa dest ji vê nûnertiyê berda.⁸⁷

Peymana Sevrê jî pirsgirêka Kurdan çareser nekiribû. Hevdîtinên navbera dewletên mezin û dewleta Osmanî da, Kurd li gor berjewendîyên wan dewletên mezin dihatin bikaranîn. Vê demê de tevgera yekem di havîna sala 1919’an de li Meletî rû da. Di amadehiya vê tevgerê da, hinek endamên Komelaya Bilindkirina Kurdistanê cih girtibûn. Dewlet bi amadehiya serhildanê agahdar bû, Kurd vegeyriyane Kolik (Kâhta)’ê. Dawîyê da yekîneyên Kurd ji hev belavbûn.⁸⁸ Cihêkî din hinek Kurdan li Koçgirî’yê civîn darxistin. Di bin seroktîya Nûrî Dêrsimî de eşîrên wek Canbeg û Kurmêşan civîyan. Di civînê da daxwaza bikaranîna Peymana Sevrê û damezrandina dewletekî tê kirin.⁸⁹ Di 6 Adarê, sala 1921’an da serhildana Koçgirî dest pê kir. Serhildan ji aliyê Sakallî Nurettin Paşa ve bi awakî tund hatê kênaştin. Heyder Beg û Elîşan Beg, tevî 35 hevalên wan hatin girtin.⁹⁰

Sala 1923’an de di nav tixûbê Tirkîyê da rêxistinek veşartî û nû hat damezrandin. Navê vê rêxistina veşartî “Azadî” bû. Navê rêxistinê esas, Civata Azadîya Kurdistanê (Kürt Özgürlüğü Cemiyeti) bû. Paşê navê xwe guherand û xiste Civata Xweserîya Kurd. Damezrênerên rêxistinê merivên bijare û siyasetmedar nebûn. Zehfên wan leşker bûn û navenda rêxistinê jî şûna Stenbolê, Erzerom bû.⁹¹ Serok û rêberên rêxistinê yên wek Xalid Begê Cibirî, Yusuf Ziya Beg, Seyid Evdilqadir û Mela Evdirehimê Hekkarî jî, ji bona destxistina daxwazên xwe, dixwestin bi

⁸⁴ Mumcu, (1991). *b.n.b.*, r.14.

⁸⁵ Ji bo agahiyên berfireh û teksta muxtirayê, bnr. Sasuni, *b.n.b.*, r. 259-260.

⁸⁶ Mumcu, (1991). *b.n.b.*, r.14.

⁸⁷ Sarihan, (1984). *b.n.b.*, r. 88.

⁸⁸ Lazarev - Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.215.

⁸⁹ Komisyon, (1979). *Koçgiri Halk Hareketi 1919-1921*, Ankara, Komal Yayınları, r.35.

⁹⁰ Mumcu, (1991). *b.n.b.*, r.36-48.

⁹¹ Bruneissen, (2013). *b.n.b.*, r. 411.

neteweyên yekbûyî ra têkilîyan çê bikin û Hikumeta Enqerê, ji kar dûr bixin.⁹² Di hevdîtineke Yusuf Ziya Beg û Xalid Beg de biryar hat dayîn ku bi alîkarîya Smaîl Simko û Şêx Mehmûd hêzên eşîran bêne çekkirin. Ji bo alîkarîya Kurdan bikin, ji Neteweyên Yekbûyî ra nameyek were şandin.⁹³ Martin Van Bruneissen dibêje: Di sala 1924'an de kongreya Azadî'yê bi tevlêbûna Şêx Seîd hat lidarxistin û di kongreyê de biryara serhildanê û ilankirina serxwebûnê hat dayîn.⁹⁴

Agahîyên Dewletê bi van çalakîyan hebû. Di cotmeha sala 1924'an de Yusuf Ziya Beg, di meha mijdarê da jî, Xalid Beg hatin girtin. Piştî girtina Xalid Beg, Şêx Seîd wek rêberê "Azadî" yê hat hilbijartin.⁹⁵ Sibata sala 1925'an de li gundî Pîran di navbera cendirmeyan û gundîyan de pevçûn çêbû, di vî şerî da çend leşker hatin kuştin. Êdî ev yek bibû sebê destpêka serhildanê. Hêzên Şêx Seîd 14 Şibatê de bajarê Darahênê (Genç) xistin destê xwe.⁹⁶ Serhildanê bi berfirehî dewam kir, lê 27'ê Nisanê da bi girtina Şêx Seîd û hevalên wî ev serhildan têk çû. Şêx Seîd tevî 47 hevalên wî, 4 Îlon 1925'an de, li Diyarbekirê hatin dardakirin.⁹⁷

Piştî têkçûyîna serhildana Şêx Seîd herçiqas li hinek deveran şerr dewam kiribe jî; evana ji hev qetyayî û bê organîze bûn. Ji ber vêya jî fikra damezrandina rêxistineke din çê bû.⁹⁸ Ev rêxistin jî di sala 1927'an de bi navê "Xoybûn" hat damezrandin. Rêxistina Xoybûnê esasen wek partîyeke siyasî bû. Lewra bernameyeke wê û rêzname (Tüzük) ya wê hebû.⁹⁹ Garo Sasuni dibêje: "Armanca vê partiyê serxwebûna Ermenistan û Kurdistanê bû."¹⁰⁰ Vê rêxistinê Îhsan Nûrî Paşa bi selahîyetên awarte wek rêvebirê leşkerî şande çiyayê Agirî. Îhsan Nûrî Paşa hêzên Broyê Heskê Têlîyê bi rêxistin kir û bi Smail Axa Simko ra jî têkilî danî.¹⁰¹ Piştî van buyeran serhildana Agirî dest pê kir û ev serhildan, 5'ê Îlon 1930'yê da têk çû. Rêberên serhildanê Îhsan Nûrî Paşa û hinek hevalên wî derbasî Îranê bûn.¹⁰²

⁹² Fırat, M. Ş. (1983). *Doğu İlleri ve Varto Tarihi*, Ankara, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Beşinci Baskı, r. 157, 160.

⁹³ Lazarev - Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.230.

⁹⁴ Bruneissen, (2013). *b.n.b.*, r.412.

⁹⁵ Lazarev - Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.230.

⁹⁶ Lazarev - Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, 1980. r.230.

⁹⁷ Bruneissen, (2013). *b.n.b.*, r.429.

⁹⁸ Sasuni, (1992). *b.n.b.*, r.281.

⁹⁹ Lazarev - Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.239.

¹⁰⁰ Sasuni, (1992). *b.n.b.*, r.288.

¹⁰¹ Lazarev - Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.240.

¹⁰² Lazarev - Mihoyan, (1980). *b.n.b.*, r.240.

Em dikarin bêjin ku; di dawîya sedsala 19'an û destpêka sedsala 20'an de, gelek rêxistin û komele hatibûn damezrandin. Gelek guherînên siyasî û civakî çê bûn. Van guherînan, xwe di nav Kurdan de jî nîşan kir. Hêza ragihandin û rojnamegerîyê di warê siyasî û rewşenbîrî de hat dîtin û ev hêz ji aliyên komele û rêxistinan de hat bikaranîn. Kurd bi kêmasîyê xwe hesîyan bi taybetî; ji bo perwerdekirina gel, rewşenbîran proje û xebatên nû di warê ziman, edebiyat û çandî de dane pêşîya xwe.

2. Dewleta Osmanî de Xebatên Kurdan yê Çandî

Di dawîya sedsala 19'mîn û destpêka sedsala 20'an de gelek xebatên li ser ziman û çandê jî derketine pêş. Ev xabatana zêdetir li weşana rojname û kovaran bû. Menteşavîlî vêya wiha bilêv dike: “Di bin bandora şoreşa demokratîk ya burjuvazîya Îris (1905-1907), şoreşa Jon Tirkan (1908) û şoreşa burjuvazîya Îranê (1905-1911), geşbûn û pêşdeçûyînek di nava tevgera Kurdî de çê bû. Hêzên nû wek xortên xwendevan ku ji malbatên feodal û oldar dihatin û hinek rewşenbîr derketine qada siyasî. Rojnameya siyasîya Kurdan, ya yekemîn di nav van hêzan de li Qahireyê derket. Hilhatina rojnamegerîya Kurdî, sazkirina rêxistinên siyasî-civakî û perwerdeyî, lêkolînên derbarê ziman, wêje, tarîx, çand û zargotinên Kurdî, di derdore dawîya sedsala 19'an û destpêka sedsala 20'an de bi hişyarbûna tevgerên Kurdî ve têkilîyek xwe ye zexm heye.”¹⁰³

Di dewra Sultan Ebdilhemîdê II. da (1876-1909) Kurdên li Stenbolê, derbarê rewşa xwe de dest bi weşanê kirin.¹⁰⁴ Çawa ku tê zanîn rojnameya ewil bi navê *Kurdistan* di sala 1898'a li Qahirê, ji aliyê Midhet Bedirxan û birayê wî Ebdirehman Bedirxan ve derketibû. Li Stenbolê sala 1912'an de *Rojî Kurd*, pey wî ra *Hetavî Kurd* derket. Di sala 1916'an de ji aliyê Sureyya Bedirxan ve *Jîn*, piştî jî di salên 1917-1918'an de dîsa kovara *Kurdistan* hatin weşandin.¹⁰⁵ Tê dîtin ku çapemenî û weşangerîya Kurdî li herêma dest pê nekirîye. Dema Osmanîyan da pirtûk û kovarên ku hatin çap kirin û belavkirin li derveyî herêma, li Qahire, Stenbol û Bexdayê hatin çapkirin. Sebebê wê jî ev bûn:

- 1- Xêncî ya Mûsil, xwedîyê çapxaneyan hikûmet bûn.
- 2- Weşangerîya Kurdî bi gelemperî ji aliyê neteweperwerên Kurd li Stenbolê dest pê kiribû.

¹⁰³ Menteşavîlî, A. M. (2004). *Dünden Bugüne Kürtler*, İstanbul, Evrensel Basım Yayın, r.94.

¹⁰⁴ Özoğlu, H. (2005). *Osmanlı Devleti ve Kürt Milliyetçiliği*, İstanbul, Kitap Yayınevi, r. 49.

¹⁰⁵ Bois, Th., Minorsky, V., Mc Kenzie, D.N. (2004). *Kürtler ve Kürdistan*, (İkinci Baskı). İstanbul, Doz Yayınları, r.188.

3- Li Stenbol û Qahire, sansur ji cihên din kêmtir bû.¹⁰⁶

Di dema Osmanîyan de pirtûka ewil ku çap bûye *Dîwana* Mewlana Xalid Şehrezorî (1844) ye. Piştîre Încîla Azîz Mattew e ku li Stenbolê ji aliyê “Komeleya Pirtûka Pîroz” ve bi elfabeya Ermenî, wergera Kurmancî hatîye çapkirin. Piştîre dîsa bi elfabeya Ermenîyan di salên 1857, 1872, 1891 û 1911’an de ev pirtûk bi zaravayê Kurmancî çap bûye. Ferhenga Erebî-Kurdî *El-Hedîyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye* di sala 1892’an de li Stenbolê çap bû. Weşana xwemalî ya yekem, di sala 1911’an da, berhema Şêx Ebdullahê Nehrî ye ku bi navê “*Xulasey Eqaîd*” ji aliyê Ehmed Ramîz, li Stenbolê hatiye çapkirin. Weşangerîya Kurdî xwemalî bi çapkirina vê berhemê ve dest pê kirîye.¹⁰⁷

Piştî hilweşandina desthilatdarîya Sultan Ebdilhemîdê II. û îlankirina meşrûtiyetê (1908), di warê xebatên edebî û çandî da jî firaqetî çêbû. Evê rewşê ji bo çanda Kurdî jî derfeteke nû derxist, lê ev rewş zêde dewam nekir. Sazî û rêxistinên Kurdan xêncî karên siyasî; karên rewşenbirî û weşangerîyê ji dimeşandin.

Komela Hevkarî û Pêşketina a Kurd, ji bo belav kirina xwendekarîyê di nav Kurdan de xebateke girîng kirîye. Endamên wê komelê, ev peywira han, wek peywirêke bingeşîn, li ser milên xwe zanîne. Ji bo vê armancê Komîteyek ji bo “Weşan û Rewşenbirîyê” hatiye damezrandin. Wezîfa vê komîtê xebatkirin ji bo vekirina dibistanan û çap kirina pirtûkan bi zimanê Kurdî bûye. Endamên wê komîtê, bi wezareta Rewşenbîrî ya Osmanî re ittifaq kirine û ji bo vê armancê gelek bizaviyên hêja meşandine. Herwiha Xelîl Xeyalî, rolek mezin di vê xebatê de lîstîye.¹⁰⁸

Vekirina dibistanan û xwendina bi zimanê Kurdî, ji xebatên vê komîteyê yê herî berbiçav in. Celîlê Celîl derbarê xebatên vê komîteyê de wiha dinivîse: “Bi saya xebatên vê komîteyê, Kurdan li Stenbolê dibistanek damezrandibûn. Ew dibistan li taxa Diwan Yolu û li kuşa Hacı Paşa hatibû vekirin. Roleke wê ya mezin di jiyana çandî ya Kurdên Stenbolê de hebû. Rojnameyên li paytext derketine, bi taybetî rojnameyên wekî Horizon, Azade Millet, Jamanak û gelekî din jî li ser vebûna vê dibistanê bi firehayî nivîsîne. Programa wê dibistanê wek dibistanên din bû ye. Rojname Horizon, li ser wezîfe û programa mamosteyên wê dibistanê weha nivîsiye; “Navê dibistanê danîbûn Dibistana Meşrûtiyetê. Her çend meriv nikare bêje ku li vir

¹⁰⁶ Hassanpour, (2005). *b.n.b.*, r. 277.

¹⁰⁷ Hassanpour, (2005). *b.n.b.*, r. 298.

¹⁰⁸ Celîlê Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 86.

tenê meşrutîyet dihat xwendin, lê belê xwendina bi dil û germîn meşrutîyet bû. Serokê dibistanê Ebdurrehman Bedirxan bû. Di destpêkê de tenê 30 zarokên Kurdan hebûn, dawiyê hejmara wan gelekî zêde kirin e. Wê komîtê, doza vekirina dibistanan di herêmê de jî kirî ye. Di rastîyê de jî, ew mesele ne wisa hêsan bu. Ji ber ku, ew kadro û mamosteyên ku di Stenbolê de bi dest diketin, di nav gundên Kurdan de tunebûn.”¹⁰⁹ Ji vêya jî wisa tê têgihîştin, heke dewlet destûra vekirina dibistanan bide jî; ji bo rêvebirina van dibistanan û perwerdeya bi zimanê Kurdî, kesên pispor û mamoste tine bûne yan jî gellekî kêr bûne.

Peywendiyên komeleyê, bi xebatkar û kesên bi nav û deng, bi kesên siyasî yên Ereban re ji hebû. Wek mînak, peywendîyekî xurt di navbera Necmeddîn Huseyn, Qedri Cemil Paşa û nivîskarê bi nav û deng yê Ereb; Sedullah El Cabir û Reşid Riyad de hebû.¹¹⁰

Em dikarin bêjin, di xebata rewşenbîrî û çandî de gaveke mezin û bi bandor, damezrandina çapxaneyê Kurdî ye. Kesên rewşenbîr di wê demê de bi girîngîya çapxaneyê haydar bûn, ji ber wê jî hewla damezrandina çapxaneyê dikirin. Rojnameya Bangî Kurdistan di derbarê vê da wiha dinivîse: “Çapxane ji bo yekkirina hest û ramanê gelan û pêşdebirina wêje û ziman amûreke pirr bi hêze”.¹¹¹ Herçiqas di sala 1856’an li bajarê Erzerom, 1865’an de Bedlîs, 1868’an de Diyarbekir û 1889’an de li Wanê û Mûsilê çapxane hatibin damezrandinê jî; evan çapxaneyan ji aliyê hikûmetê va hatibûn damezrandin û weşanên bi zimanê Tirkî dihatin çap kirin. Ji ber vê ya jî meriv nikare ji wan ra bêje çapxaneyên Kurdî. Li Misrê çapxaneya rojnameya *Kurdistan* (1989) hebû. Di sala 1911’an da Ferecullah Zekî El-Kurdî çapxaneyek bi navê “Metbea Îlmîye Kurdistan” damezrandîye lê em nizanin, gelo pirtûkên Kurdî çap kirîye yan na?¹¹² M. Şükrü Hanioglu dibêje: Gava ku Evdirrehman Bedirxan û Ebdullah Cewdet li Swisre bûne, hewla kirîna çapxaneyê Kurdî kirine lê balyozê Osmanê nehiştîye ev yek bibe.¹¹³ Piştî hinek hewl û xebatan ev gava girîng ji aliyê Huseyin Huznî Mukriyanî ve hatiye avêtin. Celîlê Celîl derbarê vê da wiha dibêje: “Di nav Kurdên Mukriyan de diroknivîs û edibê hêja Huseyin Huznî, yekemîn çapxana Kurdî damezrand. Rolekî Huznî ya bê hempa û giring di warê çap û weşanê de heye.

¹⁰⁹ Celîlê Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 88.

¹¹⁰ Celîlê Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 91.

¹¹¹ Hassanpour, (2005). *b.n.b.*, r. 279.

¹¹² Hassanpour, (2005). *b.n.b.*, r. 277.

¹¹³ Hanioglu, M.Ş. (1981). *Bir Siyasal Düşünür Olarak Dr. Abdullah Cevdet ve Dönemi*, İstanbul, Üçdal Neşriyat, r.111.

Huznî, rola belavkirinê, çapxane û weşanê baş dizanibû û di vî warî de gihîştî bû. Ji ber vê yekê dixwest rewşa rewşenbirên Kurd bigihîne qonaxeke din.”¹¹⁴

Huseyin Huznî Mukriyanî ku di warê çapê û çapxaneyê de gihîştî bû; bandora çapxanê û girîngîya wê ya jî baş dizanibû. Ji bo vê jî bi sermaye xwe ya kêr, biryara damezirandina çapxaneke Kurdî da. Ji bo vê armancê çû Almanyayê û çapxaneke piçûk a bi herfên Erebi kirî. Di destpeka sala 1915'an de çapxane bire Helebê. Li wir, ji bo fonetika Kurdî, li ser bingeha zimanê Farisî hinek îşaretên nû durust kir. Careke din ji bo vî karî çû Almanya û dawiyê vegeriya Helebê û dest çapkirina pirtûkan kir. Mukriyanî karên çapkirina kitêban de bi xwe dixebitî. Ji xêncî kitêb çapkirinê, di çapxana wî de kovara *Kurdistan*, *Çiyayê Kurmanc*, *Botan*, *Diyarbakir* û hinek berhemên din jî hatine çapkirin. Çapxana Huseyin Huznî Mukriyanî heya sala 1925'an li Helebê bû. Di sala 1925'an de, Huznî Mukriyanî bi Kurdî-Fransizî kovara *Diyarbakir* derdixist. Ji vê kovarê çend hejmar derketine. Di sala 1925'an de çapxane ji Helebê bir Bexdayê û ji wir jî bir Rewandûzê. Li wir navê çapxanê guherand û danî “Zimanê Kurmancî.”¹¹⁵

Zemanê desthilatdarîya Şêx Mehmûd Berzencî, (1920-1923) li çapxaneya Silêmanîyê (ji alîyê karbidestên Îngiliz hatibû saz kirin) da 6 pirtûk, 118 hejmar rojnameya *Pêşkewtin*, 14 hejmar *Bangî Kurdistan* û 16 hejmar jî *Rojî Kurdistan* hat çapkirin. Bi tevî vekirina du dibistanan ev çapxane, hebûna rêvebirîya dema desthilata Şêx Mehmûd bû.¹¹⁶

Weşanên wê demê jî, xebatên wê demê bi xwendevanên xwe ra parve dikirin. Memduh Selîmbegî di kovara *Jîn* hejmara 20'an, ya 4 Hazîran 1335'an de, derbarê xebatên çandî de behsa du hev xebatên kêrhatî (mebrûr) dike. Yek ji wan, xebatên Komeleya Bilindkirina Jinên Kurdistan e. Li gor vê nivîsê, armanca damezrandina komeleyê alîkarîya jinên bî û zarokên sêwî bû. Kêrhatina xebatên wê komeleyê derbarê civaka Kurdî de bi berfirehî tîne ziman. Xebata duyemîn jî; xebatên Komelaya Xwendevanên Kurd Hêvî ye.¹¹⁷ Ji van agahîyan jî zelal dibe ku, komele û sazîyên Kurdan, di dema Dewleta Osmanî de li Stenbolê xêncî xebatên siyasî û ramiyarî, xebatên çandî jî dikirin. Ji van xebatanan yê herî berbiçav; vekirina dibistanan, çapkirina kovar û rojnameyan û xebatên li ser çand û ziman e.

¹¹⁴ Celîlê Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 111.

¹¹⁵ Celîlê Celîl, (1985). *b.n.b.*, r. 111-112.

¹¹⁶ Hassanpour, (2005). *b.n.b.*, r. 279.

¹¹⁷ Bozarlsan, (1985). *Jîn, Kovara Kurdî-Tirkî*, r.853-857.

3. Rojnamegerîya Kurdî

Li gor hemû çavkanîyan, rojnamevanîya Kurdî bi rojnameya “Kurdistan” ve dest pê dike. Heta meşrûtiyeta Osmanî ya sala 1908’a xêncî vê rojnameyê em rastî tu rojnameyên Kurdî yên din nayên.¹¹⁸

Wek tê zanîn ev rojname 9 Nisan 1314 hicrî, ango 22 Nîsan 1898’ê mîladî dest bi weşana xwe kirîye. Ev dest pê kirin di heman demê de bûye destpêkirina rojnamevanîya Kurdî jî. Ji ber wê jî, roja 22 Nîsanê ji alîyê rojnamevanîya Kurdan ve wek “Roja Rojnamegerîya Kurdî” hatîye pejirandin û salvegera rojnamevanîya Kurdî vê rojê tê pîrozkirin. Dîsa ev roj li Herêma Kurdistan a Iraqê jî, bi fermî wek “Roja Rojnamegerîya Kurdî” tê pîrozkirin.

Ev rojnameya yekem, li cîhekî dûr, lê belê cîhekî ku têkilîya Kurdan hê di dema Selaheddînê Eyyubî pê re çêbibû û ji ber vê yekê jî, hejmarek zêde Kurd li wir cîh bibûn; li Qahîre’ya paytexta Misrê dest bi weşanê kir. Gelo çima ev rojname ne li Stenbolê, lê li Qahîreyê derket? Sedîyanî bersîva vê pirsê wiha dide: “Damezrênerê rojnameyê dixwestin rojnama xwe li paytexta dewleta Osmanî; li Stenbolê derxin. Mîqdat Mîdhet Bedirxan û birayê wî Evdirrehman Bedirxan çiqas, name û daxwazname ji padşahê demê re şandin, lê mixabin ev name û daxwazname bê bersîv man. Ewan jî, ber bêçarebûnê rojname li Qahîre derxistin.”¹¹⁹

Xwedî, berpirsîyar û nivîskarên vê rojnameyê Mîqdat Mîdhet Bedirxan û birayê wî Evdirehman Bedirxan bûn. Rojname di sê hejmarên serî de, xwaru bi zimanê Kurdî bû. Paşê jî; xêncî çend hejmaran, nivîsên Kurdî û Tirkî bi hevra hatine çapkirin.

Hejmara rojnameya pêşîn li paytexta Misrê (Qahîre) çapxana El-Hîlal da hatîye çapkirin. Hejmarên 4 û 5’an “Çaxpxana Cerîdeya Kurdistan” yanî çapxana xwe de derketîye. Hejmara 5’an şunde rojname ji ber gelek zehmetîyan û nexweşîya Mîqdat Mîdhet Bedirxan ketîye destê birayî wî Evdirrehman Bedirxan û cîhê xwe jî, ji Misrê veguhastîye Bajarê Cenewre ya Swîsre. 14 hejmar li Swîsre hatîye weşandin, piştê dîsa hatîye Misrê. Jimareyên 20-23 li Qahîre, hejmara 24 Britanya bajarê London, hejmarên 25-29 dîsa li bajarekî Britanya li Folkstonê hatîye weşandin. Her du jimareyên dawî 30-31 li Swîsre, bajarê Cenewreyê derketîye. Ji ber ku rojnameyê evqas cîhên xwe veguhastîye kêman caran 15 rojan carekî derketîye. Gellek caran bi

¹¹⁸ Îzady, M. (2011). *Bir El kitabî: Kürtler*, İstanbul, Doz Yayınları, r.318.

¹¹⁹ İnternet:İbrahîm Sedîyanî, *Kürt Matbaasının Doğuşu*, www.ufkumuz.com (13.04.2013)

mehan derneketîye. Sedemên veguhastina rojnameya Kurdistan de M. Emîn Bozarslan weha dinivîse: “Meriv wisa texmîn dike ku Evdirehman Bedirxan xwe di ewlehîyê da nedîtîye û dilbitirs bûye, ketîye tatêlê; ji ber wê tatêlê ewqas cîhê xwe guhastîye, ewqas cîhê rojnama xwe guhastîye”. “...Pêşberê hemû alozîyan, weşandina rojnama xwe domandîye; wek bavekî diloan ê ku zarokekî xwe ji ber bager û bapûkê direvîne û ji vir dibe wir, ji wir dibe wir, ji cîyekî dibe cîyekî din, ji wî cihê jî dibe cîhekî ewletir. Evdirehman Bedirxan wisa bi diloanî rojnameya xwe hembêz kirîye û cîh cîh gerandîye, bi vî awayî derxistina wê çar sal domandîye.”¹²⁰

Esasen gava ku em destpêkirina rojnamegerîya der û cîranên Kurdan binêhêrin, emê bibînin ku destpêkirina rojnamegerîya Kurdî li gorî cîranên wan pir dereng nîne. Lê damezrandina çapxaneyê û weşangerîya bi vî zimanî, ji ber gelek sebeb û astengiyên din, bi qasê cîranên xwe pêşde neçûye. Rojnameyên ewil, bi zimanê Erebi sala 1828, Tirkî sala 1831 û Farisî jî sala 1848’a da bi inîsîyatîfa dewletên Misir, Osmanî û Îranê çap bûne. Kurdan ji bo daxwazên xwe yê siyasî, rojnamevanî wek amûrek bihêz bikaranîn.¹²¹ Heta wê demê zimanê Kurdî tenê di qesîde û helbestan de dihate bikaranîn. Lê rojnamevanî êdî, di nav Kurdan de jî wek amûrek bihêz dihate nasandin û wana jî hêza rojnamevanîyê keşfîkin. Helbestvan û rewşenbîrê naskirî yê wê demê, Hacî Qadirê Koyî (1815-1897) vêya bi zaravayê soranî, wiha dîne ziman:

Sed qa’îme û qesîde kes nakirrê bi pûlê

*Rojname û cerîde kewtote qîmet û şan*¹²²

Destpêkirina rojnamegerîya Kurdî, di heman salan de avakirina rêxistin û dezgehên Kurdî jî bi xwe re tîne. Rewşa rojnamegerîya Kurdî û rewşa siyasî û civakîya kurdan di heman rastekê dane. Damezrandina Dezgeha “Azîmî Kavî Cemîyetî” (1900) li Stenbolê çend sal piştî derketina rojnameya *Kurdistan* e. Em dikarin bêjin ku ev jî derheqê têkilîya di navbera rewşenbîrî û rojnamevanîyê de hîn tiştan nîşanî me dide. Geşepêdana rojnamegerîya Kurdî û qonaxên ku tê de derbasbûyî nîşaneyê werar (evrim) a siyasîya Kurdî ye. Rojname û kovarên Kurdî gelek caran di dema xwe de nehatine weşandin, temenê wan kurt bûye û cîhê weşan û çapê jî tîkûz nîne. Cîhê

¹²⁰ Bozarslan, M. E. (1991). *Kurdistan: Rojname Kurdîya Pêşîn, İlk Kürd Gazetesi*, Uppsala, Weşanxana Deng, r. 9.

¹²¹ Hassanpour, (2005). *b.n.b.*, r. 345.

¹²² Koyî, H. Q. (2004). *Dîwan*, Stockholm, Weşanên Nefel, r.85.

weşanê ji Stenbolê bigre heta Bexda, Silêmanî, Hewlêr, Kerkûk, Tehran, Mehabad, Tebrîz û carnan jî Şam û Bêyrût bûye. Ev rojname bi pirranî duzimanî bûne.¹²³

Herçiqas kêmkasî û bê îmkaniyên mezin di pêşîya rojnamegerîya Kurdî de hebin jî; di alîyê pêşdeçûyîna çandî, edebî û civakî de rola rojnamevanîyê nayê înkarkirin. “Bi derketina rojnameyên Kurdî re bîr û bawerî, zanîn û kultura ronahîbûna li ser esasên ilmên pozîtîf bi rûdanek modern a qirna me, di nav milletê Kurd de dest bi berfirehbûnê kir.”¹²⁴

Piştî pênc salan, rojnameya Kurdî ya yekem, di sala 1902'an da weşana xwe rawestand. Ev rojname di zemanê desthilatdarîya Sultan Ebdilhemîd de rastî gelek astengîyan hatibû. Piştî ku meşrutîyet hat îlankirin, rewşenbîrên Kurd jî derhal dest bi damezrandina dezgehan û weşana rojnameyan kirin. Li Stenbolê sala 1908'a da rojnameya bi navê *Şark ve Kurdistan*, (Bediuzzaman Seîdê Kurdî jî tê de nivîsîye), dîsa di heman salê de *Kürt Teavun ve Terakkî Gazetesi* derketin. Salên 1908-1909'an de rojnameyek bi navê *Kurdistan* hatiye weşandin. Dîsa li Stenbolê kovareke bi navê *Amîdî Sevda* bi zimanê Tirkî derketiye. Sala 1909'an de vê carê li Diyarbekirê rojnameyek bi navê *Peyman* derketiye. Li gor çavkanîyan ev rojname ji alîyên alîgirên Îttîhad ve Teraqqî Cemîyetî va hatiye weşandin. Bi vê rojnameyê ve yekem car bû ku di Diyarbekir de rojnameyek cîh daye zimanê Kurdî.¹²⁵

Rojname û kovarên wek *Rojî Kurd* (1912-1913), *Hetavî Kurd* (1913) û *Yekbûn* (1913) li Stenbolê hatine weşandin. Bi destpêkirina şerê cîhanê yekem êdî heta sala 1918'a li herêmê û Stenbolê tû rojname û kovarên Kurdî nehatine weşandin.

Rojnamegerîya Kurdî di navbera herdu şerê cîhanê da derfeta pêşdeçuyînê dît. Sala 1918 li Stenbolê Kovara *Jîn*, 1919'a da kovara *Kurdistan* dest bi weşanê kir. Silêmanîyê *Pêşkewtin* (1920-1922) 118 hejmar, *Rojê Kurdistan* (1922-1923) 15 hejmar derketin. *Bangê Kurdistan* (1922) 14 hejmar, *Bangê Heqq* (1923) 3 hejmar, *Umêdî Îstîqlal* (1923) 25 hejmar, *Dîyarê Kurdistan* (1925-1926) 16 hejmar, *Jiyanewê* (1924-1926) 56 hejmar, *Jiyan* (1926-1938) 556 hejmar û kovara *Jîn* jî sala 1939'a ta 1963'ya 1000 hejmarî zêdetir derketin. Kovara derbarê dîrok û wêje da dihate weşandin bi navê *Zanistî* (1938) tenê çend hejmar, dîsa kovara hefteyî ya bi navê *Ziman* (1937-1939) 70 hejmar weşana xwe berdewam kir. *Zarê Kurmancî* (1926-

¹²³ Bois, Minorsky, Mc Kenzie, (2004). r.188.

¹²⁴ Malmîsanij û Lewendî, (1992). M. *Li Kurdistanê Bakûr û li Tirkîyê Rojnamegerîya Kurdî (1908-1992)*, Ankara, Öz-Ge Yayınları, r.13.

¹²⁵ Malmîsanij û Lewendî, (1992). *b.n.b.*, r. 47.

1932) ya Hiznî Mukrîyanî 30 hejmar, Kovara *Gelawêj* di bin berpirsiyarîya Îbrahim Ehmed û *Dengê Gêtiyî Teze* ya Tewfîq Wehbî jî weşanê wê demê yên gelekî girîngin. Kovara *Hawar* (1932-1943) 57 hejmar, zêdaya wê *Ronahî* (1941-1945) 28 hejmar, ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan û birayê wî Dr. Kamiran Alî Bedirxan ve li Şam'ê, *Roja Nû* (1943-1946) 73 hejmar, zêdaya wê *Stêr* jî ji aliyê Dr. Kamiran Alî Bedirxan ve li Bêyrût'ê derketine.

Rojnameya *Rêya Teze* (1930 -) di dîroka Kurda de gelekî grînge. Ev rojnameya ku Êrîvanê ji aliyê Kurdên Ermenîstanê ve derdikeve; heta niha çend cara jî ber astengîyan weşana xwe rawestandibe jî, hê jî weşana xwe didomîne. Ev yek jî, ji bo rojnamegerîya Kurdî, di aliyê berdewamîyê de tiştekî grîng e.

Li Îranê, di aliyê rojnamegerîya Kurdî de, heta berîya avakirina Komara Mahabad tiştekî berbiçav naxuyê. Piştî damezrandina komarê, di warê rojnamegerîyê de pêdeçuyîneke bi hêz tê dîtin.

Heta salên 1941-1946 di Îranê de rojnamegerîya Kurdî bi taybet piştî îlankirina Komara Mahabad ji bo avakirina rojnamegerîya Kurdî yekcar derfetek çêbû. Rojnameya fermî bi navê *Kurdistan* (1945-1946) 113 hejmar derket. Bi heman navî ve kovareke edebî 16 hejmar çap bû. *Hawarê Niştîman*, *Awar*, *Gir û Galî Mindalanî Kurd* û *Helale* bi tenê demsalek hatin weşandin. Li Lahîcanê jî Şêx Letîfê kurê Şêx Mehmûd rojnameyek bi navê *Niştîman* (3 hejmar) derxist.¹²⁶

Heta salên 1960'î li Tirkîyê di warê rojnamegerîya Kurdî de xebat û hewldaneke berbiçav tune. Dema serhildana Agirî rojnameyek bi navê Agirî (1929-1930) di bin berpirsiyarîya Ihsan Nûrî Paşa de wek rojnameya fermî ya komara Agirî bi awakî derqanûnî derdiket.¹²⁷ Di navbera wan salan de li ser ziman, wêje û herweha jî rojnamegerîya Kurdî de tengasî hebûn. Dîsa jî; nivîskarên wek Musa Anter, Yaşar Kaya û Dr. Sait Kırmızıtoprak çend rojname, wek *Dicle Kaynağı* (1948) *İleri Yurd* (1958) *Dicle Fırat Gazetesi* (1962) bi zimanê Tirkî derxistin. Ev rojname bi zimanê Tirkî bûn, lê belê naveroka wan li ser Kurdan bû. Carnan jî di van rojnameyan da nivîsên bi zimanê Kurdî jî dihatin weşandin û hema hercar ev jî dibû sebebê dozvekirna li ser rojnameyan û dawîyê da jî girtina wan.¹²⁸

¹²⁶ Bois, Minorsky, Mc Kenzie, (2004). *b.n.b.*, r.190.

¹²⁷ Malmîsanij-Lewendî, (1992). *b.n.b.*, r.95.

¹²⁸ Kaya, F. *Kürt Basını*, (2010). İstanbul, Hivda Yayınları, r.171-173.

Carnan di dadgehan de rewşên pêkenî jî çêdibûn. Musa Anter di bîranîneke xwe de dibêje: “Rojekî dozger, ji ber nivîsekî gazî min kir û go: Musa beg, tu ji bo çî zimanê Kurdî dinivîsî? Min jî go: Ezbenî li Stenbolê Yahudî, Ermenî û Rûm bi zimanê xwe rojnameyan derdixin. Wekî din Îngiliz û Frensî jî rojnameyan diweşînin. Ewî go: Ezbenî belê raste lê ewan kêmtewin lema. Min jî go: Qey di vî welatî de kêmtew ji pirnetewa zêdetir xwedî mafî. Heger mafê min bi qasî kêmtewa tunebe, ezê çibkim ji pirnetewîyê? Ji kerema xwe min jî bikin kêmtew. Ser vê gotina min dadwer û dozger kenîyan.¹²⁹

Di navbera salên 1960’î heta sala 1980 rojnamgerîya Kurdî da rojnameyên wek *Dicle-Fırat Gazetesi* (1962), *Roja Nû* (1963), *Roja Welat* (1977) û kovarên *Deng* (1963), *Rêya Rast* (1963), *Yeni Akış* (1966), *Doğu Dergisi* (1969), *Özgürlük Yolu* (1975), *Rizgarî* (1976) û çend kovarên din. Piştî darbeya 12 Îlona 1980’yî dîsa li ser zimanê Kurdî qedexekirin çê bû. Dema 12 Îlonê de cuntayê dest da ser desthilatê serdema zexta herî mezin jî dest pêkir. Di Sala 1980’yî heta 1990’î tû pirtûk û rojnameyek bi zimanê Kurdî nehate weşandin.¹³⁰

Ev zexta li ser zimanê Kurdî, heta 12 Nisan 1991’î di warê nivîs û rojnamgerîyê de nehişt ku rojnamgerîya Kurdî cihê xwe bilipite. Xêncî çend rojname û kovarên derqanûnî tu xebateke têkûz di warê rojnamegerîyê de çênebû.

Çawa ku çavkanî ji me ra radigihîni, di girtîgeha Diyarbekirê de rojnameya *Hewar* (1980) dest bi weşanê kir. Nivîs di girtîgehê de bi destan dihatin amadekirin û paşê bi awakî ev nivîs derdixistin derve û li Almanyayê wek rojname çap dibû.¹³¹ Rojnameya *Roja Gel* jî alîyên Kurdên ji Tirkîyê reviyane Îranê, li Îranê bi zimanê Tirkî û Kurdî çap bûye, redaktorê wê Rojan Hetaw bûye. Li gor agahîyan ev rojname 6 hejmar derketiye.¹³²

Dîsa heman çavkanî radigihînin ku ev kovarên hanê jî, derqanûnî li Tirkîyê derketine. Zimanê van Kovaran bi pirranî Tirkî ye, tenê çend heba nivîsên Kurdî jî belavkirine. Zêdaya van kovara di girtîgehan de hatine weşandin. Kovarên ku hatine weşandin, hinek ji wan ev in: *Pêşve* (1981), *Qêrîn* (1981), *Pêşmerge* (1983), *Berxwedan* (1983), *Niştiman* (1983), *Hêvî* (1983), *Çandîya Berxwedan* (1984), *Nûçename* (1984), *Çirûska Jîyan* (1984), *Berhem* (1984), *Hêvîya Gel* (1986), *Dengê*

¹²⁹ Anter, M. (1999). *Hatıralarım*, İstanbul, Avesta Yayınları, r.141.

¹³⁰ Kaya, (2010). *b.n.b.* r.188.

¹³¹ Malmisanij-Lewendî, (1992). *b.n.b.* , r.308.

¹³² Malmisanij-Lewendî, (1992). *b.n.b.* , r. 314-316.

Partîzan (1987), *Medya Güneşi* (1988), *Toplumsal Diriliş* (1988), *Özgür Gelecek* (1988), *Demokrat* (1988), *Ala Yekîtî* (1988), *Vatan Güneşi* (1989), *Deng* (1989), *Dengê Kurdistan* (1989), *Şewqa Berxwedan* (1989), *Yeni Ülke* (1990), *Özgür Halk* (1990), *Serhildana Gel* (1990), *Xebat* (1990) û *Newroz* (1991)

12 Nisan 1991'î de zagona qedexekirina li ser zimanê Kurdî, hat rakirin. Piştî rakirina vî astenga zexm, rojnamegerîya Kurdî jî derfeta pêşdeçuyîne dît û dewreyek nû li ber rojnamegerîya Kurdî vebû. Her çiqas hinek caran bi awayekî averê, rê li pêşya zimanê Kurdî û rojnamegerîya Kurdî girtî be jî; êdî Kurdan bi zimanê xwe dikaribûn rojname û kovaran derxînin. Dîsa jî gelek caran berhevkerin û girtina weşanan çêdibû.

Kerim Yıldız rewşa wê demê bi vî awayî radigihîne: “Gava ku qedexekirina li ser çapemanîya Kurdî rabû, wer dixûya ku xweşbînîyek li ber rojnamegerîya Kurdî dê çêbe; lê rêbazên ku zagonan de ne hatibûn nivîsîn ketin dewrê û ji ber van zextan tenê çend rojnameyên Kurdî diweşîyan. Rojnameyên wek *Özgür Gündem*, *Özgür Ülke* û *Yeni Politika* bi zimanê Tirkî dihatin çapkirin. Tenê rojnameya hefteyî ya bi navê *Welatê Me* bi zimanê Kurdî diweşîya. Çend hebên din jî Kurdî-Tirkî tevlihev dihatin weşandin. Dibe ku ev, ji bo pêşdeçuyîna zaravê Kurmancî qonaxek be. Lê dîsa jî zimanê Kurdî wek hercar berê xwe dabû kevneşopîya devkî û bi qedera xwe ra rûbirû mabû.”¹³³

“Rojnameya ewil ya Kurdî li Tirkîyê Bi navê *Rojname* 29.12.1991'î de derket. Ev rojnameya yekemîn bû ku li Tirkîyê xwerû bi zimanê Kurdî çap dibû. Rojname herdu zaravayê Kurdî, bi Kurmancî û Dimilî (Zazakî) hatibû nivîsîn. Hejmara provayê 66.000 çap bû. Li Tirkîyê 30 hezar hejmar hatin firotin. Gelek rewşenbîr û nivîskarên bi nav û deng wek; Ahmet Zeki Okçuoğlu, Mehmed Malmîsanij, Mahmûd Lewendî, Musa Anter, Mehmed Uzun û Cemşîd Bender di rojnameya *Rojname'ê* de dinivîsîn. Rojname bi wêne û rengîn bû, naveroka rojnameyê jî gelek fireh bû.”¹³⁴

Xêncî rojnameya ewil xwerû bi zimanê Kurdî li Tirkîyê gelek rojnameyên din jî derketin. Li Diyarbêkrê rojnameya *Govend* (1991) bi Kurdî -Tirkî, li Stenbolê kovara *Rewşen* (1992) ji alîyê dezgeha “Navenda Çanda Mezopotamya” (NÇM) xwerû bi Kurdî derdiket. Kovara *Newroz Ateşi* (1992) dîsa li Stenbolê bi zimanê Kurdî-Tirkî tevlihev derdiket. Rojnameya duyemîn xwerû bi Kurdî derket rojnameya

¹³³ Yıldız, K. (2004). *Kürtlerin Kültürel ve Dilsel Hakları*, İstanbul, Belge Yayınları, r.28.

¹³⁴ Malmisanij&Lewendî, (1992). *b.n.b*, r.401.

hefteyî bi navê *Welat* (1992) dest bi weşanê kir. Piştî hejmara 7'a doza girtinê lê hat vekirin û rojnameya *Welat* piştî 101 hejmarî, hate girtin, dewsa wî de rojnameya *Welatê Me* dest bi weşanê kir. Kovara *Tewlo* (1992) li Stenbolê derket. Kovareke Kurdî-Tirkî û mîzahî bû. Stenbolê rojnameyeke hefteyî bi navê *Azadî* (1992) cîh di nav rojnamegerîya Kurdî de girt. Ev rojname 104 hejmar derket, lê 66 hejmarên wê hê li ber çapê bûn hat berhevkerin û nûçegîhanê wî yê Wêranşarê jî hat kuştin û gelek xebatkarên wê jî hatin girtin.¹³⁵

Kovareke din ku di rojnamegerîya Kurdî de cîhekî xwe yî girîng û taybet heye, yek jî kovara *Nûbihar* e. *Nûbihar* di Cotmeha sala 1992'a de bi diruşmeya “Ne Zalim Be, Ne Mezlûm” dest bi weşanê kir. Ev kovar ji hêla kesayetîyên ku em bêjin di nav gel de wek “Şagirtên Bediuzzaman Seîdê Nursî” tên naskirin, ku wek kesên “misilman û oldar” tên bi nav kirin ve tê amadekirin û çapkirin. Naveroka kovarê bi temamî çand û wêje ya Kurdî ye. Xwerû bi Kurdî û bi zaravayên din yê vî zimanî ye. Edebiyata klasîk û ya nûjen bi hevra dide pêş xwendevanan. Vê kovarê berhevkirina çanda Kurdî de roleke girîng leystîye. Serî de kovar mehane derdiket lê niha 3 meha carekî derdikeve û weşana kovarê hê jî dewam dike. Di heman salan de kovareke ziman, edebî û çandî bi navê *Nûdem* (1992) li ewropa, li Swêd'ê dest bi weşanê kir. Ev kovar ji aliyê xwendevanan ve wek Hawar a dûyemîn dihate navkirin. Ji ber ku naveroka kovarê li ser ziman û edebiyatê bû, gelek nivîskarên nû di vê kovarê de gihîştin. Piştî 10 salên bê navber, weşana kovarê bi dawî bû. Herwiha Kovareke lêkolînê li ser ziman, edebîyat û çandê dike, bi navê *Lêkolîn* (1995) ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Berlîn'ê, bi her sê zaravayên Kurdî (Kurmancî, Dimilî û Soranî) çap dibe.

Dengê Azadî (1994), Welatê Me (1994), Ronahî (1995), Roj (1995), Hêvî (1996), Roja Teze (1999), Dema Nû (2001), Azadîya Welat (1996) û Dengê Welat (2007) jî çend hev weşanên dinê ne. Rojnameyên rojane, Azadîya Welat û Dengê Welat hê jî weşanên xwe didomînin.¹³⁶

Li Iraqê, gelek rojname û kovarên Kurdî jî, hatin çapkirin. *Riwangey Azad* (1980), *Rêbazî Pêşmerge* (1980), *Bilawkirawey Dengî Lawan* (1981), *Kovara Alay Surî Kurdayetî* (1981), *Nûserî Kurdistan* (1981), *Estêre* (1982), *Raperîn* (1982), *Xebatî Mamosta* (1982), *Kovara Kurdistan* (1982), *Kariwan* (1982), *Bilawkirawey Edebî Bêgane* (1982), *Dengî Pêşmerge*, *Şoreşa Başûr* (1983), *Rêya Serkeftinê* (1983),

¹³⁵ Yücel, M. (1998). *Kürt Basın Tarihi: Tekzip*, İstanbul, Aram Yayınları, r.102

¹³⁶ Kaya, (2010). *b.n.b.*, r. 205-209.

Rojnama Serbexoî (1983), *Kurdayetî* (1983), *Rêbazî Lawan* (1983) *Dengî Xwêndekaranî Kurdistan* (1983), *Bilawkirawey Asos* (1984), *Bilawkirawey Edebî Mindalan* (1982), *Rojnama Behdînan* (1982), *Kovara Pîrozî Îslam* (1982), *Bilawkirawey Hawdeng* (1983), *Peyamî Şoreşî Kurdistanî Başur* (1984), *Bilawkirawey Nîrgiz* (1984), *Pala* (1984), *Roşinbîrî Pêşmerge* (1984), *Rizgarî* (1985), *Dengê Me* (1985), *Peyamî Birayetî* (1986), *Peyamî Kirêkaran* (1986), *Tendurustî û Komel* (1987), *Qendîl* (1987), *Rojnama Berey Kurdistanî*, (1988), *Helwêstî Edebî* (1988), *Terazû* (1989) û gelek kovar û rojnameyên din jî wê demê de li Herêma Kurdistanê Iraqê li bajarên wek Hewlêr, Silêmanî, Kerkûk û Duhok'ê dihatin derxistin.¹³⁷

Li Iraqê, piştî damezrandina Hikûmeta Herêma Kurdistan (1992), wê herêmê de her çi qas ne fermî be jî desthilatîyeke serbixwe hat avakirin. Parlamento, Hikûmet, wezaretên hemû karan, hemû dezgeh, sazî, komele, sendîka, bi zimanê Kurdî, karên xwe bi rêve dibin. Bê şik tesîra vêya li ser çapemenîya Kurdî jî xwe nişan kir. Di salên 1990'î de rojname û televizyonên herêmê bi awayekî amatorî be jî dest bi weşanên xwe kirin. Her çi qas şert û mercên aborî de tengasî hebin û aramîya nav Herêmê di wan salan de baş nebû jî; rojnamegerî û çapamenî bi awakî profesyonelî pêşket û kovar û rojnameyên cûrbecur hatin çapkirin. Kovarên polîtîk, tenduristî, siruştî, wêjeyî, musîkî, çandî, hunerî, wênekeşî, erdnîgarî, zanistî, nûçeyî, werzişî û hwd. Kovarên wekî *Alay Şoreş*, *Baban*, *Bûn*, *Demokrasî*, *Êsta*, *Gazî*, *Gelawejî Nwê*, *Gulan*, *Karwan*, *Serab*, *Serboxoî*, *Wêran*, *Raman*, *Rûnakî* dest bi weşanê kiribûn. Piştî roj bi roj kovar û rojnameyên nû dest bi weşanê kirin.

Piştî destpêka salên 2000'î, wekî hemî cîhan, li Herêma Kurdistanê Iraqê jî guhertînen berbiçav çêbûn. Hemû derfetên teknolojîyê ketin nav Kurdan, Kurd jî bi saya vê teknolojîyê di warê ragihandin û rojnamegerîyê de pêşde çûn. Her çi qas rojnamegerî li Herêma Kurdistanê Iraqê û cîhên din, di bin bandora hinek partî, rêxistin û alîyan da bin jî; rojname û televizyonên bêtêref jî hene. Ev yek, ji bo pêşdeçûyîn û navnetewîbûna rojnamegerîyê jî derîkî nû vedike. Hinek grubên medyayê, li herêmê hatine avakirin û hinek ji wana jî dikarin bi medya navnetewî re gavan bavêjin.

Em dikarin wek encam wiha bêjin; piştî zor û zehmetîyan û gelek qonaxên girîng, rojnamegerîya Kurdî xwe gîhande qirna 21emîn. Salên 2000'î şunde, li Tirkîyê de gellek guherînen erênî çêbûn. Têkilîyên Tirkîyê bi Yekîtiya Ewropa re zêdebûn.

¹³⁷ Rojnamegerîya Kurdî, (Gulan 2013). hj.12, Pênûsa Nû, r.5

Gellek gavên demokratîk hatin avêtin. Bi saya azadîya di warê ziman û rojnamgerîyê de, gelek pêşdeçûyîn û rihetî çêbûn. Çapemenî û weşangerîya Kurdî li Tirkîyê, di van salan de pêşdeçûyîneke berbiçav nîşan kir. Kanala dewletê TRT bi zimanê Kurdî kanalek bi navê TRT KURDÎ damezrand û ev televizyon 24 saeta weşanên xwe bi her sê zaravayên Kurdî; Kurmancî, Soranî û Zazakî diweşîne. Dîsa ajansa dewletê “Anadolu Ajansı” (AA), bi zimanê Kurdî jî nûçeyan belav dike û di malpera xwe ya fermî de diweşîne. Hejmara kanalê şexsî, yên televîzyonan jî ku hatine damezrandin gellekin. Herwiha li ber weşana rojname û kovarên Kurdî tu asteng nemaye.

Herêma Kurdistana Iraqê de, piştî sala 1992’ê, rojnamegerîya Kurdî, di qadeke hêsan de weşanên xwe kir û hê jî ev yek berfirehtir dibe û dewam dike. Di herêmê de hejmara kanalê televîzyonan, rojname û kovaran gellekî zêde ne. Li Îranê, bi saya teknoloji û pêşdeçûyînên ragihandinê, rojnamegerîya Kurdî berbi pêşve diçe. Herwiha di kanalên fermî yên Îranê de jî weşanên bi zimanê Kurdî çê dibin. Li Suriyê jî, dîsa bi rêya amûrên ragihandinê yên teknîkî û hinek guherînan, rojnamevanî bi zimanê Kurdî pêşve diçe.

4. Malbata Bedirxanîyan û Di Çanda Kurdî da Giringîya Wan

Herêma Bohtan ne herêmeke idarî ye, lêbelê herêmeke cografî ye. Herêmê navê xwe ji eşîreta “Bohtî” yan wergirtîye ku vê eşîretê, bi salên dûr û dirêj li vê herêmê desthilatdarî kirîye. “Bohtî”, ji eşîreteke serbixwe zêdetir; wek konfederasyoneka eşîran e. Rêvebirîya vê konfederasyonê jî; destê malbata “Azîzan” de bû ye. Malbata Bedirxanîyan jî, ji vê binemala navborî ye. Bedirxanî bingeha malbata xwe digihînin walîyekî serdarê islamê Hz. Xalidê kurê Welîd yê bi navê Ebdulêzîz, ku walîyê herêma Diyarbekir û Cizîrê bû ye.¹³⁸ Heta dema serhildana Mîr Bedirxan (1847) malbata Bedirxanîyan li Cizîrê disekinîn, lê piştî ku serhildan têk çû malbat belavî cihên cuda cuda li dinyayê bûn. Li gor malpereke Cizîrê ji me re radigihîne, niha ji binemala Bedirxanîyan hinek kes li Cizîrê dijîn.¹³⁹

Gellek kesayetîyên vê malbatê di rêvebirîya dewletê de peywirên mezin û girîng hildane ser milên xwe. Hinek endamên vê malbatê yên din, hema hema di nav hemû civak û rêxistinên Kurdî de yan cîh girtin, yan jî destek danê. Her wiha

¹³⁸ Kardam, A. (2011). *Cizre-Bohtan Beyi Bedirhan: Direniş ve isyan Yılları*, 1. Baskı, Ankara, Dipnot Yayınları, r.59-60.

¹³⁹ <http://www.cizreelim.com/Yazilar.asp?goster=dos&id=789>, (19.02.2009)

Bedirxanîyan di rêxistina Xoybûn'ê de jî cîh girtin û di serhildana Agirî de jî rol hildan. Derbarê malbata bedirxanîyan de Celîlê Celîl dibêje:

“Binemala Mirê Botan, Bedirxan Beg û Mirên Baban, ew binemale bûn ku Sultanê Osmanîyan bi hemu awayî dixwestin di nav wan de dost û merivên ji bo xwe peyda bikin, wan ji bo hukmê burokratîk û leşkerî bi kar bînin. Ji ber vê yekê ji wan, gelekî kesan dabûn ber xwendinê. Di sala 1878'an de, kurê Mîr Bedirxan, Osman Beg û Huseyn Beg di nav leşkerîya Dewleta Osmanî de cîh girtibûn.”¹⁴⁰ Malbata Bedirxanîyan bi navên navdaran ve gelek dewlemende. Hinek ji wana di nav siyasetê de bûn û karên siyasî û politîk dimeşandin, hinekan di nava leşkerîya dewletê de peywir girtibûn û hinek jî, di nava xebatên rewşenbîrîyê û ronakbîrîyê de kar û barên xwe dimeşandin û dihatin naskirin.¹⁴¹

Hinek kesên ku ji binemala Bedirxanîyan in û bi xebatên xwe yê siyasî û rewşenbîrî ve hatine naskirin ev in.

- 1.Mîr Bedirxanê Evdalxan (1803-1868)
- 2.Emîn Alî Bedirxan (1851-1926)
- 3.Celadet Alî Bedirxan (1897-1951)
- 4.Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978)
- 5.Mîqdad Mîdhed Bedirxan (1858-1915)
- 6.Ebdurehman Bedirxan (1868 – 1936)
- 7.Sureyya Bedirxan (1883-1938)
- 8.Rewşen Bedirxan (1909-1986)

a) Mîr Bedirxanê Evdalxan (1803-1868)

Di sala 1803'ê li Cizîra Botan hatîye dinê.¹⁴² Navê malbata mîrekên Botan, “Azîzan” e.¹⁴³ Di 18 salîya xwe de îdara herêma Botan kete destên wî. Mîrê Cizîra Botan yê dawî Mîr Bedirxan e. Piştî mirina bavê wî Mîr Evdalxan, kurê wî Mîr Salih Beg dibe mîrê Cizîrê. Mîr Salih Beg dest bi Mîrektîya Cizîra Botan berdide û

¹⁴⁰ Celîl, C. (1985). r. 27.

¹⁴¹ Celîl, C. (1999). *Autobîyografiya Ebdurezaq Bedirxan*, Berlin, Weşanên Kovara Havîbûn, r.4.

¹⁴² Malmisanij, (2000). *Cizîra Botanî Bedirhanîler*, 2. Baskî, İstanbul, Avesta Yayınları, r. 48.

¹⁴³ Bedirxan, C. (1932). Lorîya Bedirxan, *Hawar*, hj.5, r.3.

Mîrektîyê dide birayê xwe Mîr Bedirxan. Bi mîrê Soran Mîr Mihemed re tifaq çêkir. Ji ber tifaqê, Dewleta Osmanîyan êrîşî herdu mîran jî kir. Bedirxan Paşa, derbasî Îranê bû. Di sala 1838'ê de vegeriya bajarê Cizîrê. Di demeke kurt de desthilatdarîya xwe li Cizîrê xurt kir. Li ser navê xwe pere derxist û xutbe da xwendin. Ji bona serbxwebûnê xebat û amadehî kirin. Bi eşîrên herêmê yê din re û bi kêmeteweyên ne misilman re tifaq çêkir. Dewleta Osmanî, ji xurtbûna Bedirxan Paşa gelekî ditirsiya. Gelek caran êrîşî hêzên Mîr Bedirxan kir, lê belê bi serneket. Dewletê, di sala 1847'ê de bi artêşek mezin carek din êrîşî Botanê kir. Ji ber alîguhastina birazîyê mîr, (Yezdanşêr), Bedirxan Paşa teslîm bû.¹⁴⁴ Dewleta Osmanîyan ew tevî malbata wî, di 19 Îlon 1847'a de birin Stenbolê. Sultan Ebdilmecîd ew pêşwazî kir, pê ra axivî û sedemê serhildanê jê pirsî. Mîr Bedirxan bi çarînek Omer Xeyyam ve bersîv da Sultan.

Di dinê de kesekî bê guneh heye bêje,

Ew kesê bê guneh çawa dijî bêje,

Ez xirabîyê dikim, lê tu jî cezayê xirab didî,

*Di navbera min û te de çi ferq heye bêje.*¹⁴⁵

Sultan bi vê bersîvê xoşhal bû, lê dîsa jî Mîr Bedirxan ji nefîkirinê xilas nebû. Hinek kes û karên mîr nexwestin ji Stenbolê herin, ew li wir man. Mîr, malbata wî û şêxên wî, Şêx Ebdilqudus û Şêx Ebdilxenî di 31'ê Cotmeha sala 1847'a de sirgûnê Girîdê bûn. Mîr di vemirandina serhildana Yunanan ya sala 1856'an, li Girîdê roleke berbiçav leyîst. Piştî vî serkeftinê, rutbeya “mîrê mîran” û pîleya “Paşa”tîyê vegirt. Dewleta Osmanî ji Mîr Bedirxan re rê vekir, heke Mîr bixwaze dikare were Stenbolê. Piştî deh sal mayîna li Girîdê, Mîr Bedirxan vegeherîya Stenbolê. Heşt sal li Stenbolê ma, paşê çû Şamê. Bedirxan Paşa di sala 1868'a de çû ber dilovaniya Xwedê. Tirba Mîr Bedirxan niha li Şamê ye.¹⁴⁶

Mîr Bedirxan berîya mirina xwe gazî zarok û malbata xwe kir û wesîyeta xwe ji wan re got:

“Di mala xwe de bi zarokên xwe ra bi Kurdî biaxivin.

Heger hun bi Kurdî neaxivin hunê Kurdî ji bîr bikin.

¹⁴⁴ Sori, H. (1933). Hawari Bêganeyêk, We Sikalay Gewvreyeki Kurd, **Hawar**, hj.17, r.2

¹⁴⁵ Munîs, M. (24 sibat 2010). Bir Yaşam, Bir İsyen, Bir Sürgün Botan Bey'i Bedirhan'ın Hayatı, **Kovara Bir**, (Wergera Çarînê ji Farisî, li zimanê Kurdî: Süleyman Çetin).

¹⁴⁶ Munîs, (24 sibat 2010). *h.n.*

*We Kurdî ji bîr kir hunê welatê xwe ji bîr bikin. Kê
welatê xwe ji bîr bike ew ne ji min e.*¹⁴⁷

Gava Mîr Bedirxanê Evdalxan çû ber dilovaniya Xwedê, 4 jin, 6 carîye û ji van 21 kur û 21 keç û 10 nevî ma bûn.¹⁴⁸ Li gor hinek çavkanîyan ev hejmar digihîjte 96 zarokan.

b) Emîn Alî Bedirxan (1851 - 1926)

Emîn Alî Bedirxan (1851-1926) kurê Mîr Bedirxan û bavê Celadet û Kamiran Bedirxan e. Emîn Alî Bedirxan di sala 1851'î de hatîye dinyayê. Wî di xwendegêha Sultanan de, (ya ku tenê ji zarokên mîran re li Stenbolê hatibû ava kirin) beşa hiqûqê xwend. Ew merivekî gelekî jêhatî û şareza bû. Tevî jêhatîbûna wî, ewî li cem rewşenbîr, helbestvanê naskirî, Hacî Qadirê Koyî perwerdehî dîtibû.¹⁴⁹

Emîn Alî Bedirxan, ji ber ku kurê mezin bû; berpirsiyariya malbata xwe, hildabû ser milê xwe. Ew jî wek bav û kalên xwe di warê siyasî de jî dixebitî. Ji ber vê yekê di sala 1889'an de ew û birayê wî Midhet Mîqdat Bedirxan, ji Stenbolê berê xwe dane anatolyayê. Pêşîyê li bajarê Trabzonê komcivînek li dar xistin, piştê çûne Êzîrganê. Li Êzîrganê tevî xizmên xwe û hevalên wan qesda serhildanê kirin. Lêbelê li devera Baybûrtê ev serhildan têk çû.¹⁵⁰

Bi têkçuyîna serhildana Emîn Alî Bedirxan û ya birayê wî, rewşa binemala Mîr Bedirxan li Stenbolê gelek lawaz û qels bû. Ji ber vê serhildanê, du birayên wan yê din jî, Osman Paşa û Huseyn Kenan Paşa, ji çavên Dewleta Osmanî ketibûn.¹⁵¹

Ev yek di heman demê de bû sebebê ku, Sultan Ebdulhemîd zaroyên Mîr Bedirxan di bin çavan de bihêle û dest li ser wan danî, da ew bê emrê hikûmetê nikaribin xwe tevbidin. Dewleta Osmanî hêza malbata Bedirxan, ya ku wê demê digihîşte nêzîkî 3000 merivî, li Stenbolê dizanibû û dixwest rê hê ji pêşîyê ve li ber tevgereke wan bigire.¹⁵²

Malbata Bedirxanîyan ne tenê di nav gelê xwe de xweyî nav û deng bûn, belê dayîn û standinên wan currecur bûn û têkilîyên wan bi gelek cihên din ve hebûn.

¹⁴⁷ Munîs, *h.n.*, 24 sibat 2010

¹⁴⁸ Yaşın, A. <http://www.abdullahyasın.org/Cizre/mir-bedirhan>, (03.12.2014)

¹⁴⁹ Mehmet Emin Zeki Bey, (1998). *Kürd ve Kürdistan Ünlüleri*, Sweden, Apec & Öz-Ge Yayınları, r. 293.

¹⁵⁰ Bengican, blog.milliyet.com.tr/kurt-isyanlarinin-nedenleri-tarihcesi-2, (30.01.2010)

¹⁵¹ Esvet, MalbataBedirxanîyan, <http://www.cizrelim.com/Yazilar.asp?goster=dos&id=789>, (19.02.2009)

¹⁵² Esvet, *h.n.*, (19.02.2009).

Weke mînak têkiliyên wan bi Rûsan, Frensizan û Înglîzan re hebûn. Nemaze Ebdulrezaq Necîb Bedirxan, ku serekê beşa “Bixêrhatina Mêhvanên Sultan” bû, xwedî têkiliyên curbecur bû. Herwiha ji ber têkiliyên wan yên xurt û hêza wan ya siyasî, Osmanîyan ew bi xwe ve girêdidan û ew di dewletê de dixistin berpirsiyarên mezin. Ji bo mînak Emîn Alî Bedirxan, ku bavê Mîr Celadet Bedirxan bû, bibû mufettişê dadgeriyê. Li Stenbolê, Enqere û Qonyayê ev peywîr anîbû cîh.¹⁵³

Gava sala 1906'an serekê istixbaratê, Ridwan Paşa hate kuştin, Sultan gumana xwe bire ser malbata Mîr Bedirxan. Bi taybetî navê Ebdulrezaq Necîb Bedirxan û navê Alî Şamil Bedirxan di pîrsa kuştina serekê nûçebihîzê Sultan de dihate gotin. Li ser vê yekê wî fermanek derxist, ku zaroyên Bedirxan di nav sînorên Dewleta Osmanî de werin nefî kirin. Bi vê fermanê ve Ebdulrezaq Necîb Bedirxan û Alî Şamil Bedirxan nefyê bajarê Trîpolîsê li Lîbyayê kirin. Sala 1908'a piştî guherînên siyasî û hiqûqî, ew kesên, ku bi destê hikûmetê ji Stenbolê hatibûne dûr kirin, dîsa vegeriyan. Bi vî awayî Emîn Alî Bedirxan jî dîsa vegeriya Stenbolê û li wir dîsa kete nav xebatên rewşenbîriyê.¹⁵⁴

Sala 1908'an Emîn Alî Bedirxan, Şerîf Paşa, Seyîd Ebdulqadir bi hev re komeleyek li Stenbolê ava kirin û navê wê kirine “Komeleya Alîkarî û Pêşveçûna Kurdî”. (Kürt Teavûn ve Terakki Cemiyeti) Piştî ku sala 1909'an ev komele hate qedexeyê kirin, wana komeleyeke din ava kir û navê wê xistin “Komeleya Belavkirina Perwerdeya Kurdî” (Kürd Neşri Maarif Cemiyeti). Yek ji çalakîyên vê komelê ew bû, ku wê xwendegehek li taxa Çemberlitaş vekir û Ebdurehman Bedirxan bû rêvebirê wê dibistanê.¹⁵⁵

Di sala 1922'an de dîsa fermana nefîkirina Bedirxaniyan hat dayîn. Di nav navên ku di wê fermanê de hebûn, navê Emîn Alî Bedirxan û her pênc kurên wî Sureyya, Celadet, Kamîran, Safer, Tewfîq û kurê Sureyya yê mezin Heqî jî tê de bûn. Emîn Alî Bedirxan tevî kurê xwe yî mezin Sureyya çûne Misrê û li bajarê Qahîreyê bi cîh bûn. Celadet, Kamîran, Tewfîq, Safer û Heqî jî; li ser Sûriyeyê re revîn û derbasî Almaniyayê bûn.¹⁵⁶ Di sala 1926'an de, Emîn Alî Bedirxan li bajarê Qahîreyê çû ber

¹⁵³ Esvet, *h.n.*, (19.02.2009).

¹⁵⁴ Esvet, *h.n.*, (19.02.2009).

¹⁵⁵ Esvet, *h.n.*, (19.02.2009).

¹⁵⁶ Esvet, *h.n.*, (19.02.2009).

dilovaniya Xwedê. Wî piştî xwe, şeş kur û keçek hîşt. Navê keça wî Meziyet bû. Navên kurên wî, Sureyya, Hikmet, Celadet, Kamiran, Tewfîq, Safter Bedirxan bûn.¹⁵⁷

Piştî salan paşnavê Bedirxaniyan hat guhertin, navê hinekan ji wan, yên ku li Tirkîyê mayî, kirin "Çınar", yên hinek din kirin "Kutay" û yên li Misrê mayî, bû "Walî". Hinekên mayîn jî, bi paşnavê xwe yî berê, anga bi paşnavê "Bedirxan" man.

c) Mîqdat Mîdhat Bedirxan (1858-1915)

Mîqdat Mîdhat Bedirxan Kurê Mîr Bedirxan e. Ew piştî 10 salîya nefkîrîna malbata xwe, li Girîdê hatîye dinê. Çend salên zaroktîya wî ya ewilî li Girîdê derbas dibe. Li Stenbolê Dibistana Naveta ya Leşkerî (Mekteb-i Rüştiye-i Askeriye) û Dibistana Sultanî (Mekteb-i Sultani) xwendina xwe qedand. Xêncî Tirkî, zimanê Ereblî, Farisî û Frensîzî jî dizanibû.¹⁵⁸ Mîr Miqdad Mîdhat Bedirxan, xwediyê rojnameya Kurdî ya yekem e. Ewî, rojnameya ewil 22 Avrêl sala 1898'an de bi navê "Kurdistan" ya bi zimanê Kurdî li Misrê çap kirî ye. Mîqdat Mîdhat Bedirxan rewşenbîr û siyasetmedarekî Kurd bû. Di sala 1889'an de digel birayê xwe Emîn Alî Bedirxan, (bavê Mîr Celadet û Dr. Kamîran) kar û barê xwe ji bo serhildanekê kirin li herêma Trabzonê, lê serhildan neçû serî.¹⁵⁹ Wê demê xebatên xwe li Stenbolê dimeşand. Di dawîya sala 1897'an de Mîr Miqdat Mîdhat Bedirxan ji ber nexweşiyê çûye Qahîre ya paytextê Misrê. Li wir rojnameya yekem bi navê "Kurdistan" derxist.

Hejmara rojnameya pêşîn li paytexta Misrê (Qahîre) çapxana El-Hîlal da hatîye çapkirin. Hejmarên 4 û 5'an "Çapxana Cerîdeya Kurdîstan" yanî çapxana xwe de derketîye. Hejmara 5'an şunde rojname ji ber gelek zehmetîyan û nexweşîya Mîqdat Mîdhat Bedirxan ketîye destê birayî wî Evdiehman Bedirxan û cîhê xwe jî ji Misrê guhastîye Bajarê Genêve ya Swîsre.¹⁴ hejmar li Swîsre hatîye weşan, piştî dîsa hatîye Misrê. Jimareyên 20-23 li Qahîre, 24 Înglîstanê bajarê London, 25-29 dîsa bajarê Brîtanya Folkstonê hatîye weşandin. Her du jimareyên dawî 30-31 li Swîsre bajarê Cenewre derketîye. Ji ber ku rojnameyê evqas cîhê xwe veguhastîye kêman caran 15 rojan carekî derketîye.¹⁶⁰

¹⁵⁷ Esvet, *h.n.*, (19.02.2009).

¹⁵⁸ Issi, M. (Nisan 2013). Kürt Basını Ve Kürdistan Gazetesi (1898-1902), *E-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, hj:9, r.129.

¹⁵⁹ Konê Reş, "Di 113 Saliya Rojnamegeriya Kurdî De; Mîr Miqdad Medehet Bedirxan Xwediyê Banga Netewî Kurdî ye", *Kovara Bir*, 4 Mayıs 2011.

¹⁶⁰ Bozarlan, (1991). r.11-12.

Mîqdat Mîdhat Bedirxan di sala 1906'an de piştî kuştina şaredarê Stenbolê Ridvan Paşa, nefyê Trablûsgarpê bûye, lê piştî wextan hatîye zanîn ku têkilîya wî bi kuştina Ridvan Paşa re tune. 5'ê Îlona 1908'an de bi biryara meclîsa wekîla tê efûkirin. Rêvebertîya bajarê Meletî, cîgirê walîtiya Elazîz û rêvebertîya bajarê Dêrsimê dike.¹⁶¹ Sala 1915'an de 58 salîtiya xwe da, diçe ser dilovanîya xwedê.

d) Ebdurehman Bedirxan (1868 – 1936)

Ebdurehman Bedirxan di sala 1868'an de hatîye dinê. Ewî, tevî birayê xwe Mîqdat Mîdhet Bedirxan, rojnameya Kurdî ya ewil bi navê “Kurdistan” li Qahîreya paytexta Misrê derxistîye. Hejmara 5'an şûnde berpîsîyarî û karê weşandina rojnameyê bi temamî kete ser milê Ebdurehman Bedirxan. Gava ku ev rojnameya navborî dikeve bin berpîsîyarîya Ebdurehman Bedirxan zimanê nermik hêdî hêdî dewsa xwe ji zimanekî tûj re dihêle. Lêbelê, hê pirên di navbera Hikûmet û rojnameyê de ne ruxya ne. Rewşa ku Mîqdat Mîdhet Bedirxan li Stenbolê rû bi rû bûye; bibû sebebekî din, ji bo guherandina polîtîkaya rojnameyê. Ji ber nivîsên rojnameyê, Dewleta Osmanî zexteke dijwar da ser rojnameyê. Ewî ji ber zextên desthilata Dewleta Osmanî, cîhên rojnameyê gelek caran guhast. Swîsre, Misir, Britanya bûne cîhê weşana rojnameyê. Rojname ji hejmaran şeşa heta hejmara 31'an bi destên Ebdurehman Bedirxan hate weşandin.

Ebdurehman Bedirxan, xêncî rewşenbîrî û rojnamevanîyê kar û xebatên siyasî de jî merivekî çalak bû. Têkilîyên wî bi rêxistina Ittihad we Teraqqî yê re hebûn. Berpîsîyarê rojnameyê Ebdurehman Bedirxan, di sala 1902'an de bi ser navê delegeyê Kurdan tevli kongra Jon Tirkî ya Parîsê bû. Di heman demê de Ebdurehman Bedirxan endamê Îttîhad û Teraqqîyê bû.¹⁶²

Ebdurehman Bedirxan jî wek endamên malbata xwe bi sedema kuştina Ridvan Paşa tê nefîkirin. Sala 1908'an de ku tê efûkirin di nav damezrenêrên Komeleya Belavkirina Perwerdeya Kurdî (Kürd Neşri Maarif Cemîyeti) da cîh digre. Bi derfetên vê komeleyê ve dibe berpîsîyarê Dîbîstana Meşrutîyeta Kurdî (Kürd Meşrutiyet Mektebi). Di hemdemê de ev dibistana Kurdî ya yekeme, di nav Dewleta Osmanî de hatîye damezrandin.¹⁶³

¹⁶¹ Issi, (Nisan 2013). *b.n.b*, r:129.

¹⁶² Hanioglu, M. Ş. (1981). *Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah Cevdet ve Dönemi*, İstanbul, Üçdal Neşriyat, r. 41.

¹⁶³ Issi, (Nisan 2013). *b.n.b*, r.131.

Piştî damezrandina Komelaya Tirkîyê, Ebdurehman Bedirxan paşnava “Çınar” vergirtîye û ew di sala 1936’an de çûye ber dilovanîya Xwedê.¹⁶⁴

e) Sureyya Bedirxan (1883-1938)

Sureyya Bedirxan di sala 1883’ê li Surîyê, li Meqtel’ê de hatîye dinê. Kûrê Emîn Alî Bedirxan e. Sureyya Bedirxan Zanîngeha Stenbolê, Fakulteya Ziraetê xilas kirîye. Di sala 1904’an de ji ber ku dijî dewletê ketîye çalakîya û ewlehîya dewletê qels kirîye, hate girtin. Du sal nîv di zîndanê û li penaberîyê ma. Piştî kuştina Ridwan Paşa ew ji xwendegeha Sultanî (Mektebi Sultani) hildan û şandin penaberîyê.

Piştî îlankirina meşrûtiyeta duyemîn vegeîya Stenbolê. Li vir rojnameyek bi navê *Kurdistan* bi zimanê Kurdî -Tirkî weşand. (1908-1909) Piştî bûyera 31 Adarê (31 Mart Vak’ası) di sala 1909’an de bi destê Îttîhad û Tereqqîyê hate girtin û bi hinceta “murteci” bûnê, di Girtîgeha Bekirağa de hat hepskirin û bi tawankirina “amadehiya serhildaneke leşkerî” bi fermana mirinê hat cezakirin. Rojnameya wî hate girtin. Di sala 1910’an de hat efûkirin û ew şandin penaberîyê. Sala 1912’an de vegeîya Stenbolê û bi dizîkava xebatên rêxistênên Kurdî meşand. Ji ber van xebatan dîsa hat girtin û cezayê dardakirinê lê hat dayîn. Piştî demekî ji zindanê revî û di sala 1913’an de terka Dewleta Osmanî kir. Di sala 1917’an de li Misrê rojnameya “Kurdistan” derxist. Piştî peymanê Mondrosê li Qahîreyê “Komîteya Serxwebûna Kurdistanê” damezrand û serokatîya wê kir.¹⁶⁵ Li Misrê xebatên gelek berfireh derheq pîrsgirêka Kurdî de meşand û alîyekî ji bo desthilata Kurdî bê damezrandin; alîyekî din jî, ji bo alîkarîya dewletên din dîcedand. Sureyya Bedirxan di van xebat û çalakîyên xwe de têklîyên politîk bikar dihanî. Bi taybetî ji bona desteka dewleta Ingilîz gelek dixebitî û dixwest dewleta Ingilîz alîyê Kurdan bike.¹⁶⁶

Di sala 1927’an de tevî komeleya Xoybûnê bû. Sala 1929’an de vegeîya Sûrîyê. Di sala 1930’î de cîhên di bin bandora Fransîzan hat dûr xistin û ji bona xebatên Xoybûnê çû Parîsê. Li gor Basil Nikitin, ew welatperwerê yekem e ku di xebatên xwe de metodên nûjen, amûrên bi devkî û nivîskî û têkilîyên politîk bi hemahengî bikaranîye. Ew di sala 1938’ê de li Parîsê çûye ber dilovanîya Xwedê. Keç û

¹⁶⁴ Malmîsanîj, (2011). *İlk Kürt Gazetesi Kürdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan*, İstanbul, Vate Yayınları, r. 104-105.

¹⁶⁵ http://www.avestakitap.com/yazar.php?id=250,danasina_pirtuka_Dr.Bleç_Şêrko,Kürt_Sorunu_Kökeni_ve_Nedenleri (12.01.2015)

¹⁶⁶ https://ckb.wikipedia.org/wiki,soranî_bi_tîpên_erebî (24.02.2015)

kurekî wî bi navê Qudret û Heqî li pey mane. Bernavkê Ezîz Ehmed û Dr. Şêrko Bleç bikar anîye.

f) Yên Din:

Sê kesên girîng ji malbata bedirxanîyan hene ku emê behsa wan di beşa “1.4. Nivîskarên Hawarê” de bikin. Evan kesayetîyan Mîr Celadet Bedirxan, hevsera wî Rewşen Bedirxan û birayê Mîr Celadet, Dr. Kamiran Bedirxan in. Lewra ev her sê kes xêncî endametîya malbata bedirxanîyan; di hevdemê de nivîskarên kovara Hawarê ne jî. Me di beşa “Nivîskarên Hawarê” de jiyangerîya wan, bi berfirehî nivîsîye. Ji bona ku mijar dubare nebe emê li vir derbarê nivîsên wan de çend agahîyên kurt bidin.

Mîr Celadet Bedirxan di hemû hejmarên kovarê de nivîsîye. Her hejmareke kovarê de bi çend navan û bi çend nivîsan ve cîh girtîye. Herwiha Kamiran Bedirxan jî xêncî hejmara 52’yan, di hemû hejmarên kovarê de nivîsîye. Hejmara nivîsên wî 104 hev e. Rewşen Bedirxan jî bi du nivîsan ve kovarê de cîh girtîye. Nivîsên wê, di hejmarên 27 û 28’an de ye. Ewê, li ser jin û civakê nivîsîye.

BEŞA YEKEMÎN: KOVARA HAWARÊ

1.1. Kovara Hawarê û Mercên Dema Weşana Wê

Hawar, tê zanîn ku yekemîn kovara Kurdî ye ku bi tîpên latînî hatîye çapkirin. Hawar di 15'ê Gulana 1932'an de derket û piştî rawestandina çend caran weşana xwe heta 15'ê Gelawêja 1943'an domand. Di navbera van deman de kovar 57 hejmar derketîye. Cîhê xebat û weşandina kovarê, paytexta Sûriyê Şam bû. Hawar mehê du caran derdiket. Lê gava meriv li belavkirina kovarê dinihêre, ev periyoda “15 rojan carekî” nehatîye bi cîh. Gelek caran kovar di dema xwe de derneketîye û demên dirêj ketina navbera weşana hejmarên kovarê. Kovara Hawar, kovarekî wêjeyî bû û ji aliyê Mîr Celadet Alî Bedirxan ve dihate derxistin. Kovara Hawar di dîroka Kurdî de xwedî cihekî girîng e, alîkariyeke wê ya mezin ji bo zimanê Kurdî çêbûye. Di kovarê de bi giranî ziman, lêkolîn, çîrok û helbestên bi zimanê Kurdî, ji edebiyata Kurdî ya klasîk û nûjen nivîsên bijartî dihatin weşandin. Herwiha hema hema hemû cureyên edebiyata modern jî cîh di kovarê de digirt. Bi vî awayî Hawar di wêje û mijara zimanê Kurdî de bibû wek dibistanekî û heta sala 1943'an weşana xwe berdewam kir.

Mîr Celadet Bedirxan di hejmara ewilî û di rêzên pêşîn da wiha dibêje: “Hawar zarokeke nûza ye. Zaroka me ye; zaroka Kurdan e. Weke her zarokî bi xweyîtîya dê û bav, bira û pismamên xwe ve dikare bijî.”¹⁶⁷ Mîr Celadet weşana kovarê ji bo gelê Kurd wek zarokeke nûzayî dibîne. Ev zarok jî hewqas girînge ji bona malbatê, herwekî ku cara yekem e malbat dibe xwedî zarok. Divê civak jî bi hevra ji vî zarokî re xweyîtîyê bikin.

Wek me li jor gotibû tê qebûlkirin ku; Hawar kovara ewilîye di dîroka Kurdan de bi zimanê Kurdî, bi tîpên latînî (yên ku îro di çapemenî û wêjeyê de tê bikaranîn) hatiye nivîsandin. Ji ber vê yekê jî, cihekî taybet yê kovarê di pêşveçûn û standartkirina zimanê Kurdî de heye. Divê em li vîra tiştekî din jî zelal bikin. Berîya kovara Hawarê, li Rewanê rojnameya *Rêya Teze* di 25 Adarê sala 1930'î de derketibû. Evê rojnameyê jî nivîsên xwe bi tîpên latinî, (Elfabeya Margulov & Erebe Şemo) çap dikir. Elfabeya vê rojnameyê, ji 37 tîpan pêk dihat û bi hevixistina tîpên Latînî - Kirilî hatibû çêkirin. Ev yek jî di warê teşeyê de dibû sebebê hinek tevlihevîyan. Lê kovara Hawar, wek kovareke ziman û edebî cara ewilîye bi tîpên Kurdî-Latînî yên îro, hatîye çapkirin. Xêncî vê jî piştî weşana kovara Hawarê, Kurdên Sovyetê ne tê da, hema

¹⁶⁷ Bedirxan, C. (1932). Armanc, Awayê Xebatê û Nivîsandina Hawarê, *Hawar*, hj.1, Şam, Çapxana Tereqî, r.1.

bûn û gelek ji wan di demên dawîyê da, di wêjeya Kurdî de bûn kesên navdar. Di kovara Hawarê de, gelek rewşenbîr û nivîskar û hozanên Kurd ên bi nav û deng, nivîsarên xwe weşandine. Hinek ji wan, ev in: Celadet Alî Bedirxan, Dr. Kamiran Alî Bedirxan, Rewşen Bedirxan, Cegerxwîn, Qedrî Cemîl Paşa, Dr. Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan, Mistefa E. Botî, Ehmed Namî, Hesên Hîşyar, Lawê Fendî, Bişarê Segman, Reşîdê Kurd, Cemîlê Haco, Sibhîyê Diyarbekirî, Tewfîq Wehbî, Evdîlxaliq Esîrî, Şakir Fetah, Hevîndê Sorî, Lawîkê Kurd, Pîrot û hwd..

Roja destpêka weşana kovara Hawarê (15'ê gulanê) îro weke “Roja zimanê Kurdî” tê pîrozkirin.

Hemreş Reşo jimareyên Hawarê ji hejmara 24'an heta hejmara 57 an, berê ewilî berhevkiribû û di sala 1976 an de jî li Almanyayê çap kirîbû. Piştî jî, ji jimara 1'ê heta jimara 9'a jî alîyê Mehemed Bekir hatine berhevkirin û di meha Gulana 1987'an de li Stockholmê hatîye çap kirin. Mehemed Bekir nivîsarên di Hawarê de ku bi tîpên Erebi bûn, wergerandine tîpên Latîni û kirîye du beş. Yek nivîsara eslî ye, ya din jî nivîsandina wî ye. Ev jî 125 rûpel e. Di sala 1998'an de hemû hejmarên Hawarê ji aliyê Firat Cewerî ve hat berhevkirin û bi awayekî orijînal ji alîyê weşanxaneyê Nûdemê hat weşandin. Me çawa ku gotibû; Hawar kovareke edebî bû, rê û rêbaza kovarê ser ziman û edebiyatê bû. Hawar bi diruşma jêrê armanc û rêbaza xwe dide pêş xwendevanan.

“Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşîyê vedike. Her kesê ku xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ku ziman şerta heyîna pêşîn e. Hawar ji pêve bi her tiştê ku Kurdanî u Kurdîti pêwendewar e, de mijûl bibe. Tenê siyaseta jê dûr e, xwe naêxe nav siyaseta”¹⁶⁸

Hawar destpêkê da li ser hînkirina zimanê Kurdî disekine. Ji ber vîya jî, bi nîşankirin û hînkirina elfabeya Kurdî (Latîni) dest bi weşanê dike. Her çiqas pêşîya Hawar ê xebatên li ser rêziman û zimanê Kurdî çêbibin jî cara ewil e ku Hawar, bi tîpên latîni hatîye çapkirin û di heman demê de, hîmê rêzimana Kurdî bi awayekî zanistî çêkirîye û belavkirîye.

¹⁶⁸ Bedirxan, C. (1932). Armanc, Awayê Xebatê û Nivîsandina Hawarê, r.1.

Hawar 14 sal berîya şerê cihanê yê duyemîn dest bi weşanê kir, du cara weşana xwe rawestand lê heta sala 1943'ya weşana wê dewam kir. Piştî Şerê Cîhanê I. di rewşa siyasî ya Kurda da jî gellek guherîn çêbûn. Guherîna herî mezin, Dewleta Osmanî hilweşîya û Komara Tirkîyê ava bû. Piştî peymanê Lozanê (1924) di sala 1925'an de bi pêşengîya Şêx Seîd di herêmê de serhildanekî dest pê kir. Piştî serhildana Şêx Seîd gelek serhildan û tevgerên Kurdan çê bûn lê hemû têk çûn. Serhildanên Agirî (1927-1930) ku ji aliyê rêxistina Xoybûnê va dihatê rêvebirin jî di sala 1930'î de têk çû. Piştî têkçûyîna serhildanê gellek siyasîvan û rewşenbîrên Kurd derbasî Binxetê (Suriye) bûn. Dewleta Frensiyê ku Suriye di bin desthilatdariya wan da bû; Kurdên ji Tirkîyê çûne û yên din, hemû rewşenbîr û siyasîvan nehiştin Şamê kirin. Ew Kurdên ku ji hemû deverên rojava hatibûn Şamê, li hev kom bûn û di sala 1932'an de kovara Hawar derxistin. Wisa dixuyê ku Mîr Celadet Bedirxan jî piştî tekoşînek dûr û dirêj dîtibû; ku kêmasîya herî mezin xwendin, huner û zanebûne. Keça Mîr Celadet Bedirxan, Sinemxan Bedirxan vê yekê wiha tîne ziman:

“Bavê min Hawar derxist. Çi wext? Dema ku dît şer û pevçûn pere nake, dest avêt rewşenbîriyê. Kurdên me hingê ji % 90 ne xwendewar bûn. Armanca Celadet ew bû ku Kurd xwe rewşenbîr bikin, hînî xwendin û nivîsandinê bibin. Dengê Hawarê li her deverî veda. Kurdên me jê gelek fêde dîtin”¹⁶⁹

Di sala 1932'an de, Mîr Celadet Bedirxan ji bo derxistina Hawarê serî li Wezareta Karên Hundir ya Sûrîyê dide. Di serdana yekem de destûra Celadet Bedirxan nadin ku Hawarê derbixe. Di serdana duyem de, Wezareta Hundir ya Sûrîyê, destûra weşana kovarê dide, lê bi şertê ku kovar ne siyasî be. Mîr Celadet Bedirxan jî şertê wan qebûl dike û dest bi weşana Hawarê dike.¹⁷⁰ Li ser rêbaza Hawarê û vê nesiyaşbûna Hawarê, Mîr Celadet Bedirxan di hêjmara yekem de weha dibêje:

“Hawar, xwe naêxe siyasî. Hawarê siyasî ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyasîtê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, huner û sin'etê de dê bixebitin.”¹⁷¹

¹⁶⁹ Beğik, M. Hawar: Kovara Hawarê Çima û Çi Şertan de Derket?, *Kovara Bîr*, (16 Temmuz 2012).

¹⁷⁰ Beğik, h.n. ,16 Temmuz 2012.

¹⁷¹ Bedirxan, C. (1932). Armanca, Awayê Xebatê û Nivîsandina Hawarê, Hawar, r.1.

Ji ber rewşa aborî kovar di sê qonaxan re derbas bûye. Mîr Celadet Bedirxan, ev hersê qonax di nivîsa xwe ya bi navê “ Sê Tarîxên Hawarê” de, di hejmara 27’an de tîne ziman. Tarîxa pêşîn, 15 Gulan 1932’ ye ku di vê tarîxê de kovareke nû hat çapkirin. Edebiyat û çanda gel bi zimanê wan ve hate nivîsandin. Hawara gel ji devê wan derket, kete nav rûpelên kovarê. Ji bo xwendin û zanebûnê derfeteke nû çêbû. Heta hejmara bîst û şeşan Hawar hate çapkirin û belav bû. Di 18’yê Tebaxa 1935’an şûnde Hawar êdî demeke dirêj derneket. Tarîxa sisîyan 15 Nîsana sala 1941’î ye ku Hawar careke din dest bi weşanê kir hetanî sala 1943’ya bi temamî 57 hejmar derket.

Hawar xebitîye ku kurdan hînê elfabeyeke nû bike. Weke Mîr Celadet Bedirxan gotîye: Hawar di nav mîletê xwe ê bêdibistan de bûye dibistana ziman, edebiyat û çandê û karê xwe jî birîye serî.

1.2. Belavkirina Kovara Hawarê û Bandora Wê

Belavkirina çapemenîya Kurdî kêşeyeke pir mezine. Ji dîroka rojnamegerîya Kurdî diyar dibe ku, pêwendîyên di navbera çapemenîya Kurdî û xwendevanên çapemenîyê, her daîm bi tengasî û bi asteng bûye. Ji ber sedemên sîyasî û cografîk carnan bi temamî astengî ber belavkirinê hebûye, carnan jî pir bi sînordar bûye.¹⁷²

Kovara Hawar, bi sîstema abonetîyê digihîşte destê xwendevanên xwe. Abonetî ji bo dewletên Tîrkiye, Îran (Ecemistan), Iraq, Sûrîye û Welatên Qefqas dihate çê kirin. Di nav Sûrîyê da abonetî bi diravê Sûrî û Frank, ji bo welatên din bi Frank çêdibû. Bahayê kovarê ji bo Sûrîyê salewaxt 500 qurîşê Sûrî yan jî 100 Frenk, ji bo şeş meha 300 qurîş yan jî 60 Frank û çar meha jî; 200 qurîş yan jî 40 Frenk bû. Ji bo welatên din; salewaxt 150 Frank, şeş meh 90 frenk û ji bo çar mehan jî 60 Frenk e. Kovar bi ser navê Mîr Celadet Bedirxan ji xwendevanan re dihate şandin. Ev agahî di her hejmareke kovarê de, di rupela piştî devîka kovarê dihate ragihandin.

Husên Hebeş dibêje: “Li gor belgeyên di destê min da hene Hawar gihîştîye Kurdên Tîrkîye, Îran, Iraq, Suriye û Qafkaskayê. Belavbûna kovarê bi gelek rêyan bûye. Ji xwe di Rojavayê welêt bi serbestî belav dibû û bi taybetî herêma Cizîrê xwendevan û nivîskarên Kovarê pir bûn. Li Tîrkîyê kovar bi dizî digihîşte destên xwendevanan. Xêncî rewşenbîrên Kurd, rojnamevanekî ku li bakûr şeş meha mabû jî agahdar bibû ku kovara Hawar li Sûrîyê tê weşandin. Hawar di destpêkê de bi serbestî digihîşte destê xwendevanên Iraqê. Mîr Celadet ji dewleta Iraqê destûra rêdana belavkirina kovarê standibû. Nêzikî salekî xwendevanên Iraqê bi serbestî û bi awakî

¹⁷² Hebeş, H. (1999). *Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de*, Bonn, Belavgeha Hogir, r.22.

rêkûpêk kovar werdigirtin. Nivîskar û rewşenbîrên wê demê bi zêdayî nivîsên xwe yî wêjeyî va kovar dewlemend dikirin. Li li gor mercên awarteyî yên gelê Kurd ew hevkarî zêde dirêj nebû, ji bo belavkirina kovarê astengî çê bûn.”¹⁷³

Nivîsa gazîkirina xortên Îraqî bi navê “*Bo Lawanî Kurd Le Iraqa*” da tê xuyakirin ku hikumeta Îraqê rê li ber kovarê girtîye. Kovar gazîya xwe wiha digihîne xortên Îraqî:

*“Gelî xortan ev demeke ku Hawar dernediket. Lê piştî jî Hawar ne dihate Iraqê. Lewra hikumeta Îraqê rê nedida ku hawar bikeve vî welatî. Heqî û neheqî, em guh nadine vê yekê. Hawar bi dilê xelkê nebe jî, bi dilê gelê me ye. Ji ber wê jî; divê xwendevanên Iraqî dîsa wek berê nivîsên xwe bişînin û kovarê di nav gel da belav bikin.”*¹⁷⁴

Mîr Celadet Bedirxan çiqas bi qencî û bi xweşî hewl dabe ji bona çarekî bibîne bo rêdana kovarê, lê ev hewldan bê encam dimîne û destûra belavkirina Hawarê ji bo Iraqê nayê dayîn. Zirara vê yekî dualî bû; nivîsên Kurmancîya jêrîn (Sorani) ji kovarê re nedihatin û xwendevan ji van nivîsan bêpar diman. Ya din jî kovar li vî welatî hat qedexa kirin.¹⁷⁵

Ji nameyên xwendevanan tê fahm kirin ku, kovar bi awakî dikeve destê xwendevanan. Herwiha dîsa ji nameyên ku di Hawarê de belavbûne tê xuyakirin; xwendevan dema şandina kovarê bi kelecana û bi coşeke mezin raçev dikin. Yek ji xwendevanên kovarê, Wecdî Cemil Paşa ye, ku ew hestiyarîyên xwe wiha tîne ziman:

“Ji xweyîyê Hawarê, apê min ê delal Celadet Alî Bedir-Xan re: Ez yek ji wan kurdên piçûk im ko bi şev û rojan, bi roj û şevan dijmêrim û di dilê xwe de dibêjim: Gelo Hawara me kîjan rojê ê bê? Rojên postê kîjanin em dizanin. Di wan rojan de em çavnerîya wê dikin. Roja ku Hawarê ji postê distînim, dikim bin paşila xwe û newêrim zû zû vekim. Ji ber ku kêfa dîtina wê ji xwe jî didexisim. Hêdî, hêdî piştî wê vedikim, li çermê wê dinêrim, li

¹⁷³ Hebeş, (1991). , b.n.b. r.23.

¹⁷⁴ Hawar, hj.24, r.9.

¹⁷⁵ Hebeş, (1991). , b.n.b. , r.24.

*têdexistîyên wê agah dibim û paşê dikevim nav
rûpelên wê...*¹⁷⁶

Ji vê nameyê tê xuyankirin ku piçûk heta mezinan, hemû xwendevanên Hawarê bi kelecânî hêvîya hatina kovarê ne. Dema kovar dikeve destê aboneyan yan jî xwendevanan, xwendina wê bi civakî, wek merasîmekî tê kirin. Fewzî Mistefa Şahîn di bersîva nameya Wecdî Cemîl Paşa de vê merasîmê wiha teswîr dike: “Ew nivîsara te ya ku di Hawarê de belav bibû; bavê min bi dengêkî zîz dixwend, min bala xwe dayê him bavê min, him jî civata dorê hemû hêstir ketine çavên wan...”¹⁷⁷ Di her dû nameyan de jî dixuyê ku, ji xêncî mezinan, ji piçûkan jî xwendevanên kovara Hawarê hene. Em bandora Hawarê ya li ser xwendevanan, bi awakî zelal dikarin di nameyên wan de bibînin.

Kovara ku dikeve destê her aboneyekî di heman demê da digihîje destê komêk xwendevanan. Lewra her hejmareke kovarê bi alîyê dehan kesî ve tê xwendin.¹⁷⁸

Helbet kovar di rewşeke zor û zehmet da derdiket. Ji ber vêya jî xwedîyê kovarê ji xwendevanan daxwaz dikir ku kovarê bidin nasandin û jê ra aboneyan bibînin. Daxwaza ji xwendevanê Iraqî hatîye kirin vê ya baş dide ber çavan. Dê vê daxwazê de tê nîşankirin ku “Kovar ji alîyê tu sazî û komeleyekî nayê derxistin. Ji ber vê ya jî; ji bo berdewamîya derketina kovarê, hewceyîya maddî bi alîkarîya xwendevanan heye. Ew alîkarî jî bi rêya abone dîtin û zêdekirina aboneyan dê çêbibe.”¹⁷⁹

Bi qasî hebûna derfetan, Hawar belav dibû. Çi li bajarên Kurdistan û çi li derveyî wan. Bi alîkarîya Kamiran Bedirxan, kovar li Libnanê digihîşte xwendevanan û ewana jî; ji şagirtên Kurd re, li Bêyrûtê ev kovar dixwendin. Herweha li Misir û li Êrdinê jî kovar belav dibû. Li Misrê Mihemed Elî Ewnî û li Êrdunê Elî Seydo Goranî, nivîsevan û xwendevanên Hawarê bûn. Husên Hebeş dibêje ku kovar gihîştîye hinek welatên Ewropî yên wek Fransa û Yekîtîya Sovyetên Berê. Ji hejmarên 1’î hetanî 23’î ya, ewî li pirtûkxaneyê Înstîtuya Rojhilatnasîyê, li Moskow dîtîye. Dîsa li gor ragihandina heman nivîskarî, nivîskarê Fransîz Jean Bertolînî dibêje:

¹⁷⁶ Cemil Paşa, W. (1932). Hawarek, *Hawar*, hj. 8, Şam, Çapxana Tereqî, r.6.

¹⁷⁷ Şahîn, F. M. (1932). Ji Pismamê Min Wecdî Cemîl Paşa Re, *Hawar*, (bira tîpên erebî) hj. 10, r.7.

¹⁷⁸ Hawar, hj. 10, r. 6

¹⁷⁹ Hawar, hj.10, r. 8 (bira tîpên Erebi)

*“Kovar û rojnameyên bedirxanîyan di nav hemû
Kurdan de balav dibû û di wan salên tarî de, ji gelê
Kurd re dibûn çiruskên hevîyê.”¹⁸⁰*

1.3. Dabeşkirina Nivîsên Hawarê Li Gor Mijarên Wan

Sebebê derketina kovara Hawarê, xurtkirina ziman, wêje û vejîna çanda Kurdî ye. Mîr Celadet Alî Bediraxan jixwe di hejmara yekemîn de vê armancê bi zelalî dafîne pêşîya xwendevanan. “Hawara me berîya her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ku ziman şerta heyînê a pêşîn e. Hawar jû pêve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîti pê bendewar e, dê mijûl bibe.”¹⁸¹ Ev distûr derheqê naveroka kovarê û rêbaza wê da agahîyek baş radixe ber me. Nivîsên Hawarê li gor naveroka xwe, bi gelemperî li ser van mijarên jêrê dabeş dibe.

Ziman: Ziman bingeha hebûnê ye. Hawar jî li ser vê rêbazê ye û li gor kovarê “ziman şerta heyînê a pêşîn e”.¹⁸² Wê hevokê, wek diruşmeyerê di nav rûpelê Hawarê û çanda Kurdî de cîhê xwe girtiye. Ji ber vêya ku ziman hewqas girîng e û herwiha jî sebebê derxistina kovarê ye; di naveroka kovarê de cîhê herî fireh ji bo ziman hatîye terxan kirin û nivîsên li ser ziman bi hejmara xwe ve jî cîhê herî zêde girtiye.

Elfabe: Cara ewilî bi weşandina kovara Hawarê ve hîmê elfabeya Kurdî-Latînî hat avêtin. Ev hîm di her hejmareke Hawarê de cîhê xwe girt û nivîsa her hejmarekê ku li ser elfabeyê dihate nivîsîn, weke kelpîçekî, himê dîwarê elfabeya nû dirist. Mîr Celadet Bedirxan di 15 hejmarên kovarê yên ewilî de, li ser elfabeya nû dinivîse. Mîr Celadet Bedirxan tîpên elfabeyê yek bi yek bi xwendevanan dide naskirin. Bi firehî li ser dengên wan tîpan disekine, mînakên dide û xweserîtiya her dengekê dide zanîn. Mîr Celadet wan tîpan û tîpên hinek zimanên din jî dide berhev û her carê sebebê hîlbijartina tîpekê, ji xendevanan ra zelal dike.

Rêziman: Ji jimara 27’an da, Hawarê dest bi belavkirina rêzmana zimanê Kurdî jî kiriye. Di bîst û du jimarên da, “*Bingehên Gramêra Kurdmancî*” hatine danîn. Lê temenê Hawarê yê kurt, rê nedaye, ku ev rêzimana hanê temam bibe. Benda rêzimanê ya dawîn, di hejmara 54’an da hatîye belavkirin. Herçiqas ev rêziman di dema weşana Hawarê de temam nebûbe jî; piştî wefata Mîr Celadet Bedirxan, ji alîyê Roger Lescot ve hatîye temam kirin û wek pirtûk hatîye çapkirin.

¹⁸⁰ Hebeş, (1991). *b.n.b.*, r.24.

¹⁸¹ Hawar, hj.1, r.1.

¹⁸² Hawar, hj.1, r.1.

Ferheng: Helbet di pêşîya weşana kovara Hawarê de, hinek ferhengên Kurdî hatibûn çêkirin û çapkirin. Wek nimûne ferhenga Ehmedê Xanî ya bi nav û deng “*Nûbihara Biçûkan*” yek ji wan ferhenga ye. Dîsa ferhenga bi navê “*El-Hediyetûl-Hemîdiye Fî Lîsanîl Kurdîye*” di sala 1883’an ji hêla Yusuf Ziyaeddin Paşa ve hatibû nivîsandin. Ferhengeke din ya girîng jî, bi navê “*Mîrsadul Etfal*” ji aliyê Şêx Muhemmed Kerbela ve di sala 1912’an de hatibû nivîsandin. Ligel vana Mîr Celadet dixwest ku ferhengeke nû û nûjen çêbibe. Lewra Mîr Celadet dizanibû heke ferhenga zimanekî tunebe peyvên tîbîkirin û winda dibin. Dewsa peyvên xwemalî da, peyvên bîyanî dikevin nav ziman û peyvên nû jî nayên çêkirin. “Îro di zimanê me de du texlît kêmanî hene: Wendabûna peyvên Kurdî û ketina peyvên biyanî nav zimên.”¹⁸³ Ew ferhengên me li jor behs kiribûn Kurdî-Erebî û Kurdî-Farisî bûn. Ferhenga ku Mîr Celadet dixwest çêbibe û bingeha wê bi “ferhengok” ê ve avêtibû, xwerû Kurdî bû.

Edebiyat (Wêje): Edebiyata miletekî, jiyanî wî bi temamî ye. Hêvî, serpêhatî, fikir, his, bawerî, diltengî, kêfxweşî, xebat, adet, rabûn û rûniştina wî, her tiştên ku ew pê mijûl dibe, ji edebiyata wî miletî tîne naskirin. Edebiyat jî, devkî û nivîskî ye.

Yek ji berhevkarê Hawarê, Mihemed Bekir derbarê edebiyata Kurdî de dibêje: “Edebiyata Kurdî ya devkî hewqas bilind, dewlemend û rengîn e, ku hevpayê wê di nav edebiyatên cihanê da gelekî kêr in. Gelek ji Kurdan, dibe ku heta derketina kovara Hawarê, dewlemendiya vê gencîneyê nas nekiri bûn. Kurdnasên biyanî, berî vî milletî, ev dewlemendiya hanê nas kirine û li hember vê edebiyata devkî ecêbmayî mane. Wan hê tiştêkî wisa xweşik û rengîn nedîti bûn. Loma dest bi komkirina folklorê Kurdî kirine û ew wergerandine zimanên ewropayî, yê wek Rusî, Almanî, Frensîzî, Îngilîzî, Îtalî û hwd.”¹⁸⁴

Xebata Hawarê, di warê geşkirin û pêşvebirina hêmanên Edebiyata Kurdî ya nivîskî de, xebateke hêja û bi zanîn bûye. Xwedî û berpirsîyarê kovarê xwestîye hemû cureyên wêjeyê di nav rûpelên kovarê de cîh bigre û zimanê Kurdî jî, van cureyên edebî re hevnas bibe: “Bi bîst hejmarên kovara me ku heta niha belav bûne, me dil dîkir, em her awayê nivîsandinê biceribînin û bêxin zimanê xwe. Herwekî awayên bingeşî, nezm û nesîr û çend şiklên nesrê kêr û zêde di Hawarê de belav bûne. Tenê awayê temaşayê hebû ku hêj neketi bû zimanê me. Mîna ku xwendevanên me di vê hejmarê de dê bixwînin, me ew şikl û awa jî ceriband û xiste nav zimanê xwe. Temaşake piçûk bi navê *Hevind*. Ev mewzûa ha mewzûa kitêbekê ye, ne mewzûa çend

¹⁸³ Hawar, hj.1, r.2.

¹⁸⁴ Bekir, M. (1987). Dengê Zanîn û Xwenasînê, *Hawar* (a Nû Çapkirî), Stockholm, r.14.

stûnan. Lê herwekî hatiye gotin ev tenê ji bona ceribandana û têxistina zimanê temaşayê li zimanê me hatîye nivîsandin. Ji lewra heye ku nivîsevan di hinek cîhan de bi usûlên temaşayê ve ne çû be jî. Divêt holê bête zanîn û xwendin. "¹⁸⁵ Meriv gava ku Hawarê dixwîne, dibîne ku, ew armanc û daxwazên wî hatine cîh; gelek cureyên edebiyata modern di Hawarê de hatine nivîsandin û belavkirin.

Herwiha Mem û Zîn a Ehmedê Xanî û dastana Memê Alan bi xwendevanan dane nasandin ev dastanên klasîk jî, cîhê xwe di nav rûpelên kovarê da girtine. Helbest bi her şêweyî cîhê xwe di kovarê da dîtîye. Helbestên klasîk û nûjen li rex hev hatine ber xwendevanan. Di hejmarên kovarê da, bi hejmara xwe cureya edebî ya herî zêde em dikarin bêjin helbest in.

Klasîkên Kurdî: Xêncî Dîwana Melayê Cizîrî û Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, berhemên Edebiyata Kurdî yên klasîk jî di nav rûpelên kovarê da cîh girtibû. Elî Herîrî, Feqîyê Teyran, Melayê Bâteyê, Îsmailê Beyazîdî, Şeref-Xan, Mirad-Xan, Siyehpûş, Axayokê Bêdarî, Mewlana Xalid Şehrezorî, Mela Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Şêx Evdîlqadirê Gêlanî, Nalî, Şêx Riza Talebanî, Hacî Qadirê Koyî û gelekên din. Evan edîbana hem bi nivîsên xwe, hem jî bi jînenîgarîya xwe ve di Hawarê de cîh girtine.

Folklor: Hem pêşîya Hawarê hem jî piştî Hawarê, hinek lêkolînerên biyanî li ser folklorê Kurdî lêkolîn û xebat kiribûn. Bi xebatên wan camerên biyanî, birekî hêja ji folklorê Kurdî hate parastin. Destana Memê Alan, yek ji wan e. Xebatên Alexandre Jaba, H. Makas, Oscar Mann, Hadank, Basil Nikitine, Roger Lescot, D. N. Makênzî û hinekên din, di vî warî da, girîngin. Herwiha di warê berhevkirina folklorê de, xebatên rewşenbîrên wek, Hecîyê Cindî, Celîlê Celîl û Emînê Evdal, meriv dikare wek mînak bide.¹⁸⁶

Xebata Hawarê di vî warî da jî pir giring bû. Hawarê Folklorê Kurdî tesnîf kiriye. Ji her rengê folklorê qasî mimkûn bûye, ewqas nimûne berhev kirine û di Hawarê da belav kirine. Rûpelên Hawarê bi medhelokên curbecur, bi çîrok, çîrçîrok û stranên rengareng hatine xemilandin.

Werger: Hawarê gelek berhemên hêja, ji zimanê biyanî wergerandîye zimanê Kurdî. Xwendevanên Kurd ewên ku nikaribûn bi zimanê biyanî van berhemana bixwînin; saya serê Hawarê ev berhemana naskirin. Ji alîyê din ve jî di edebiyata

¹⁸⁵ Bedirxan, C. *Heyîneke Yeksalî*, Hawar, hj.20, r.2.

¹⁸⁶ Bekir, (1987). *b.n.b.*, r.15.

miletên din de çê diqewime û di kîjan astê da ne bi rêya wergerê ji gel ra dihate ragihandin. “Anabasisîa” Ksenefonê Yewnanî,¹⁸⁷ “Seyehatname”¹⁸⁸ ya Ewliya Çelebî, “Çarînên Xeyyam”¹⁸⁹ û hwd. Hinek ji wan wergera ne. Dîsa tefsîra Qur’ana Pîroz û Hedîsên Cenabê Pêxember (s.a.s) jî bi wergera Kurdî hatîye nivîsandin.

Xêncî van mijaran, jînenîgarîya kesên navdar yên Kurd, Nameyên xwendevanan û bersîvên nameyan, tarîx, erdnîgarî û jîyana rojane ya civakî, pirtûkxaneya Hawarê, nûçe, gotar û hinek nivîsên curbicur jî naveroka kovara Hawarê xemilandine.

1.4. NIVÎSKARÊN HAWARÊ

1.4.1. Mîr Celadet Alî Bedirxan (1893 - 1951)

Mîr Celadet Bedirxan kurê Mîr Emîn Alî Bedirxan e û neviyê Mîr Bedirxan e. Navê diya wî, "Senîhe" ye. Piştî birayê xwe yî mezin Hikmet, Celadet li Stenbolê di roja 26.04.1894'an de hatiye dinê. Lê belê hin çavkanî dibêjin, ku ew di 26.04.1893'an de ji diya xwe re bûye û di roja 15.07.1951'î de jî, li nêzîkê Şamê li gundê Hêcanê çûye ber dilovanîya xwedê.¹⁹⁰

“Zaroktîya wî li bajarê Stenbolê derbas bû. Ew di maleke dewlemend, mezin û xwedî nav û deng de mezin bû. Wê demê bavê wî Mîr Emîn Alî Bedirxan merivekî dewlemend bû. Xêncî van, ew merivekî rewşenbîr bû. Ji ber ku hikûmetê dest li ser wan danî bû û ewan nikarî bûn vegerin welatê xwe. Bavê wî deriyên xwe ji dengbêj, çîrokbêj û helbestvanan re vekirî bû. Ew dûrê welatê xwe be jî, welatê xwe dihanî ba xwe, da ku zarokên wî hînî ziman, erf, edet û rabûn û rûniştinê bibin. Ji xêncî wan, wî mamosteyên zimanên din jî, ji zarokên xwe re digirtin. Ji ber vê perwerdeyê jî; ji xêncî zimanê Kurdî, Mîr Celadet Bedirxan zimanên Îngilîzî, Frensîzî, Almanî, Tirkî, Farisî, Erebî, Yunanî jî dizanibû.”¹⁹¹

Ji ber xebatên Emîn Alî Bedirxan, Hikûmeta Osmanî ew nefî dikir. Mîr Celadet jî, bi bavê xwe re geh li Stenbolê, geh li Edirne, geh li Qonya, geh Enqere, geh li Filistînê li Eqqa û Nablus û geh li Selanîkê li Yûnanistanê bû. Wî di xwendegehên van bajaran de xwendina xwe ye sereta û ya amadeyî, ango lîse bire serî. Gava Mîr Celadet

¹⁸⁷ Hawar, hj.32

¹⁸⁸ Hawar, hj.16

¹⁸⁹ Hawar, hj.17-24

¹⁹⁰ Zinar, Z. (1991). *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Stockholm, Weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd, r.178.

¹⁹¹ Li Ser Kovar û Xwedîyê Wê, (1985). *Kovara Ronahî*, hj:1-28, Uppsala, Çapxana Jîna Nû, r. 6.

Bedirxan dibe 18 salî, dikeve fakulteya leşkerîyê, dixwîne û weke zabit jê derdikeve. Piştê di cenga cihanî ya yekem de beşdar dibe.¹⁹²

Di sala 1922'an de ligel hinek rewşenbîr û siyasetmedarên wê demê, Mîr Celadet û birayên xwe revîne Almanyayê. Gava serhildana Şêx Seîd di sala 1925'an de dest pêkir, çû tevli serhildanê bû. Piştî şikestina serhildanê ew careke din vegeriya Almanyayê û xwendina xwe, di beşê hiqûqê de bire serî. Wî dixwest hê li Almanyayê bimîne û nameya doktora binivîse. Lê bavê wî Mîr Emîn Alî Bedirxan li Mîsrê nexweş ketibû û ew ji ber vê yekê vegeriya Mîsrê, hate cem bavê xwe.¹⁹³

Piştî ku bavê wî Emîn Alî Bedirxan li Mîsrê sala 1926'an çû ber dilovaniya Xwedê, ew li Mîsrê nema û wî berê xwe da Bêyrûtê, mala apê xwe Xelîl Ramî Bedirxan. Piştî ku serhildana Şêx Seîd, di roja 05.02.1927'an de li bajarê Bihemdûn, li Libnanê komeleyeke nû bi navê "Xoybûn" ava kirin.¹⁹⁴ Wek ku tê zanîn, serhildana Agirî bi rêvebirîya vê rêxirawê ve bi rêve diçû.

Keça Mîr Celadet, Sinemxan Bedirxan dibêje: "Gava Serhildana Agirî di sala 1930'î de şikest, rêvebirên serhildanê çûne Îranê. Wê demê Mîr Celadet jî çû Îranê. Li wir ew çû cem şahê Îranê. Ji Şah Pehlewî xwestina alîkariya Kurdan kir. Belê Şah bi erênî ber bi daxwaziya wî ve nehat û ji wî re got, heke ew bixwaze, dikare wî bike qonsolekî Îranê li welatekî Ewropa. Mîr Celadet Bedirxan ev yek qebûl nekir. Gava Şahê Îranê dît, ku daxwazên Mîr Celadet nikare pêk bîne, wî ew ji Îranê da derxistin û şande Îraqê."¹⁹⁵

Îngilîzan, wê demê desthilatdariya Îraqê dikirin. Gava Mîr Celadet derbas bû Îraqê, wan ew xistin bin çavan. Ji ber vê yekê Mîr Celadet careke din vegeriya Sûriyê. Di 25.08.1930'î de hikûmeta Fransayê hemû endamên komeleya Xoybûnê ji ser sînor rakirin û ew nefyê Şamê kirin. Di nav wan de Mîr Celadet Bedirxan, Haco Axa û zaroyên wî, Dr. Ehmed Nafîz û birayê wî Nûreddîn Zaza, Qedrî Can, Ekrem Cemîl Paşa, Mihemed Cemîl Paşa û Hemzeyê Miksî û hinekên din hebûn.¹⁹⁶

Di roja 26.10.1931ê de, wî destûr ji hikûmeta Sûriyeyê stand, da ku kovara xwe ya *Hawarê* derxe. Di 15.05.1932'an de wî hejmara pêşî ya *Hawarê* da çap kirin.

¹⁹² Kovara Ronahî, (1985). *h.n.*, r. 5.

¹⁹³ Sinemxan Bedirxan, https://ku.wikipedia.org/wiki/Celadet_Al%C3%AE_Bedirxan, (24.03.2015).

¹⁹⁴ Sinemxan Bedirxan, *h.n.* (24.03.2015).

¹⁹⁵ Sinemxan Bedirxan, *h.n.* (24.03.2015).

¹⁹⁶ [http://www.xoybun.com/modules/Content/print.php?pid=2907,Mîr_Celadet_Bedirxan_\(1893_-_1951\),Jiyan_û_Ramanên_Wî](http://www.xoybun.com/modules/Content/print.php?pid=2907,Mîr_Celadet_Bedirxan_(1893_-_1951),Jiyan_û_Ramanên_Wî), nivîskar ne diyare, (15.01.2015)

Kovara Hawar heya roja 15.08.1943'an 57 hejmar hate derxistin. Xêncî Hawarê, Mîr Celadet, kovareke din bi navê *Ronahî* wek pêvekeke Hawarê derxist. *Ronahî* roja 01.04.1942'an derket û heya sala 1945'an 28 hejmar derketin.

Mîr Celadet Bedirxan, derheqî armanca derxistina kovarê û girîngîya ziman de wiha dinivîse. "Kovara Hawar bingeha zimanê me daniye. Divê em zanibin ku ziman hîmek ji hîmên hebûna me ye. Bê ziman em nikarin bi gelên din re weke gelekî bi rûmet, yê ku bi serbilindayîyê hatîye nas kirin, bijîn. Ji ber ku hemû gelên dinyayê jî, li ser zimanê xwe wisa difikire." ¹⁹⁷

Sala 1935'a Mîr Celadet bi keça apê xwe Rewşen Bedirxan re zewicî. Piştî zewacê, wana mala xwe li Şamê guhestin taxa Salihîyê. Di 21.03.1938'an de keçek ji wan re çêbû û wan navê Sînemxan lê kirin. Di roja 09.11.1939'an de kurek ji wan re çêbû û wan navê wî kire Cemşîd. Di 15.07.1951'ê, saet 9'ê sibehê Mîr Celadet Bedirxan li gundê Hêcanê, li nêzîkî Şamê çû ber dilovaniya Xwedê. ¹⁹⁸

Ew ji malbatek naskirî dihat. Bavê wî Emîn Alî Bedirxan, ronakbîrekî dûrdîtî bû. Zarokên xwe, bi hemû îmkânên xwe, da ber xwendinê. Mîr Celadet Bedirxan, xwendina xwe ya ewil û navîn li Stenbolê xilas kir. Piştî ku mezin bû, di nav tevgera "Îttihad û Teraqî" de cîh girt. Ji ber dijîtîya Sultan Ebdulhemîd, Mîr Celadet Bedirxan, tevî malbata xwe hatin nefî kirin. Ewana şandin Yemenê. Piştî şoreşa "Îttihad û Teraqî" ya sala 1908'a ku Sultan Ebdulhemîd ji text hat daxistin vegeriya. Di Şerê Cîhanê yê Yekem de, bi rutbeya serbazî, di nav Artêşa Împaratoriya Osmanî de cihê xwe girt û li enîya Qafqasê şer kir. ¹⁹⁹

Piştî têkçûyîna dewleta Osmanî, di bin desthilatdarîya nû de, di derheq Emîn Alî Bedirxan û her sê lawên wî de fermana dardakirinê derket. Emîn Alî Bedirxan û kurê wî Sureya Bedirxan çûn li Misrê bi cîh bûn. Kamiran û Celadet jî çûn Almanya, dest bi xwendina bilind kirin. Celadet li wir zanîngeh xilas kir û dîploma doktoriya hiqûqê wergirt. Piştî vêya di 25.8.1930'an de vegerîya hat Şamê. Wê gavê Şam di bin destê Fransîzan de bû. Li wir dest bi xebata siyasî kir. Di nav xebata Xoybûnê de cîh girt. Di dema Serîhildana Agirî de, di nav Xoybûnê de roleke aktîf girt. Serhildan têk çû ew carekê din vegerîya Şamê. Li wir, Mîr Celadet Bedirxan dest bi xebata edebî û

¹⁹⁷ Bedirxan, C. (1933). Heyîneke Yeksalî, *Hawar*, Şam, hj:20, r.2-3.

¹⁹⁸ Zinar, Z. (1991). *b.n.b.*, r.178.

¹⁹⁹ Nivîskar ne diyare. Li ser Kovarê û xwedîyê wî, (Tîrmeh- 1985). *Kovara Ronahî*, Uppsala, Çapa Jîna Nû, r.5.

rojnamegêriyê kir û heta dawîya jiyana xwe vê xebatê domand. Di 15.07.1951'an de li gundê Hêcanê (nêzîkî Şamê) çû ber rehma Xwedê.²⁰⁰

Celadet Alî Bedirxan ji xêncî zimanê xwe, bi Îngilizî, Fransizî, Almanî, Tirkî, Farisî, Erebi û Yunanî jî dizanibû. Xebata wî ya ser zimanê Kurdî, hê ji sala 1918'an de destpêkiribû. Ji wê demê de ji bo çêkirina elfabeya Kurdî bi tîpên latînî kar dikir. Meriv dikare bêje, ku damezrînerê elfabeya Kurdî bi tîpên latînî Celadet Alî Bedirxan e. Ew hîmdarê rêzimana Kurdî ya tîpên latînî ye jî. Ewî di "Hawar" û "Ronahiyê" de û di xebata wekî din de bingeha rêzimana Kurdî danîye. Celadet Bedirxan hem edîb û hem jî zimanzanek mezin bû.²⁰¹

Ji xêncî xwedî û berpirsariya kovarên wek Hawar û Ronahiyê, berhemên wî yên din jî evin:

Berhemên Celadet Alî Bedirxan

1- *Elifba Kurdî*

2- *Rêzimana Kurdî*

3- *Ferhenga Kurdî bi Hemû Lehçên Navxwe*

4- *Rêzana Elfabeya Kurdî*

5- *Rûpelnine Elfabê*

6- *Dibaca Mewlûda "Biyîşa Pêxember"*

7- *Dibaca Nimêjên Êzîdîyan*

8- *Mektup ji Mistefa Kemal Paşe re*

9- *Ji Mesela Kurdistanê*

10- *Edirne Sükûtnunun İçyüzü* (Ruyê Esas ye Rûxandina Edirne) Çapxana Serbestî. İstanbul, 1329. Ev pirtûk ji aliyê Celadet Alî Bedirxan û Kamiran Alî Bedirxan ve hatiye nivîsîn.²⁰²

1.4.2. Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978)

Kamiran Alî Bedirxan, parêzger û rojnamenivîsekî naskirî ji endamên malbata Bedirxaniyan bû. Kamiran Alî Bedirxan birayê Celadet û Sureyya Bedirxan bû. Di

²⁰⁰ *Kovara Ronahî*, (Tîrmeh- 1985). h.n., r.6.

²⁰¹ *Kovara Ronahî*, (Tîrmeh- 1985). h.n., r.6.

²⁰² *Kovara Ronahî*, (Tîrmeh- 1985). h.n., r.6.

21'ê tebaxa 1895'an de li Stenbolê hatiye dinyayê. Kamiran Bedirxan jî wek birayê xwe Mîr Celadet û yên din dema zoroktî û xortanîya xwe da; bi alîkarîya mamostayên taybet, perwerdeyek gelek baş dît. Xêncî zimanê Erebî û Farisî, zimanê Almanî û Frensîzî jî baş dizanibû.²⁰³

Kamiran Alî Bedirxan, zanîngeha Stenbolê beşa hiqûqê qedandîye. Sala 1926'a ji bo doktoraya hiqûqê çû Almanyayê. Li Almanyayê doktoraya xwe ya hiqûqê xilaskirîye. Paşê li Bêyrûtê bi cîh bû û li wir parêzerî kir. Ji bilî ko gelek nivîs û wergerên wî di kovara Hawarê de hatine weşandin, wî di sala 1943'an de li Bêyrûtê rojnameyên Roja Nû û Stêr jî derxistin.²⁰⁴

Kamiran Alî Bedirxan di salên 1940'î de, dersên xwendina Kurdî dida Kurdên Lubnanê.²⁰⁵ Tevî beşdarbûnên wî di weşanên bernameyên Kurdî yên “Radyoya Rojhelatê” li Beyrûta Libnanê, ya ku hatibû damezrandin roja 5'ê Adarê sala 1941ê. Weşana radyoyê her hefte 2 caran bû, roja Çarşembê û roja îne. Dr.Kamiran Bedirxan çend pirtûkên xwe jî çap kiribû li çapxane ya Jozêf (Joseph) Selîm Seyqelî li taxa Sokak Al-Bulat.²⁰⁶

Kamiran Bedirxan di sala 1947'an de çû Fransayê û li wir “Navenda Lêkolînerî ya Kurdî” ava kir. Di wan deman de ji bo naskirina gelê Kurd memorandumek pêşkeşî Neteweyê yekbûyî kir.²⁰⁷

Sala 1950'î de di zanîngeha Sorbonê da bû mamosta. Di beşa zimanên rojhilat de dersên zimanê Kurdî da.²⁰⁸ Ev peywira wî heta çend sal berîya mirina wî jî hê dewam kir.

Sala 1961'î de li Iraqê di navbera Partîya Baas û Kurdan de gava ku şer destpêkir. Kamiran Bedirxan di nav vê tekoşînê de wek nûnerê Ewropa cîh girt.²⁰⁹

Kamiran Alî Bedirxan di sala 1971'î, de ji bo hinek serlêdana çû Beyrûta Lubnanê. Di vê serlêdanê de xêncî dîtina Kurdên li wir, ligel wezîrê kar û barên navxweyî yê Libnanê, Kemal Canbolat (ku ew bixwe jî kurd e) civîya. Piştî vê civînê,

²⁰³ Bedirxan, K. A. (1986). *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*, Cihê Çapê Ne Dîyare, Özgürlük Yolu Yayınları, r.1.

²⁰⁴ Bedirxan, K. (1986). *b.n.b.* , r.1.

²⁰⁵ Bedirxan, K. (1986). *b.n.b.* , r.1.

²⁰⁶ https://ku.wikipedia.org/wiki/Kamiran_Al%C3%AE_Bedirxan, Beşa Kamiran Alî Bedirxan, (15.01.2015)

²⁰⁷ Bedirxan, K. (1986). *b.n.b.* , r.2.

²⁰⁸ Zinar, 1991, r.181.

²⁰⁹ Bedirxan, K. (1986). *b.n.b.* , r.2.

Kemal Canbolat partiyeke Kurdî ramyarî bi awayekî fermî pijirand û destûra xebata ramyarî da Kurdên Lubnanê.²¹⁰

Kamiran Bedirxan, hemû jiyana xwe dabû çand, ziman û wêjeyê Kurdî. Wî di mijarên cihê de, bi zimanên cihê derdora sih pirtûkî nivîsandin. Herçiqas pirtûkên wî yê kurteçîrokan tunebin jî, wî kurteçîrok jî nivîsandine. 07.12.1978'an de li Parîsê çû ber diloanîya Xwedê.

Berhemên Kamiran Alî Bedirxan:

- *Elfabeya Kurdî*
- *Elfabeya Min*
- *Rêzana Zimanê Kurdî*
- *Ferhenga Kurdî*
- *Zimanê Mader (Dê)*
- *Destpêka Xwendinê*
- *Parçeyên Bijarte*
- *Xwendina Kurdî*
- *Tefsîra Qur'anê*
- *Dersên Şerîetê*
- *Çarînen Xeyam*
- *Proverbes Kurd* (Gotinên Pêşîyan, bi Lucy Paule Margerîta re), Parîs, 1937.
- *Helbestên Kurdî*
- *Der Adler Von Kurdistan* (Eyloyê Kurdistanê, Bi Herbert Ortel re), Berlin, 1937.
- *Berfa Ronahîyê*
- *Helbestên Kurdî bi Fransîzî*
- *Gramera Kurdî bi izahkirina Tirkî*, (Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer), 1959.
- *Langue Kurde*, Paris, 1953.
- *Rêzimana Zimanê Kurdî*, Paris, 1971.
- *Zimanê Kurdî / Kürt Dili*, Istanbul (bi Şivan, S.)

²¹⁰ https://ku.wikipedia.org/wiki/Kamiran_Al%C3%AE_Bedirxan, Beşa Kamiran Alî Bedirxan (15.01.2015)

- *Kolay Kürtçe* - Pîrtûka ders, Weşanên Doz (Ji Frensizî, Yakup Karademir)
- *Xwendina Kurdî*, Pirtûkxana Hawarê, Hejmar 10, Çapxana Tereqî, Şam, 1938.
- *Dersên Şerîetê*, Pirtûkxana Hawarê, Hejmar 12, Çapxana Tereqî Şam, 1938.

1.4.3. Rewşen Bedirxan (1909-1992)

Di roja 11 Tîrmehê de sala 1909 de li bajarê Qeyserê yê Tirkîyê, li penaberîyê hate dinyayê. Navê Bavê wê Salih Bedirxan e. Zaroktîya wê, di penaberîyê de derbas bû. Hê ew 4 salî bû tevli malbata xwe nefyê Stenbolê, sala 1915'an de 11-12 salîya xwe da jî nefyê Şamê bûn. Rewşen Bedirxan li Şamê, di dibistana Elteraqî de dest bi xwendina xwe kirî ye.²¹¹

Sala 1924'a de Enstîtûta Perwerdekirinê kuta dike, ango dibe mamoste. li dibistanên Şamê wek mamoste dixebite. Xêncî zimanê xwe, Rewşen Bedirxan fêrî zimanê Tirkî, Ingilîzî, Frensizî û Almanî bûye.²¹² Sala 1929'an de zewicî lê zewaca wê tenê 20 meh kişand.²¹³ Piştî vê zewaca kêmtir temen, qonexeke nû di jiyana Rewşen Xanimê de destpê dîkir. Ew di sala 1935'an de bi kurmamê xwe Celadet Alî Bedirxan re zewicî. Wê demê sê sal ser derketina kovara Hawarê re derbas bibû û herwiha mala Celadet Bedirxan jî wek nivîsgeh û cîhê redaksiyona kovarê bû.²¹⁴

Rewşen Bedirxan di hejmara 27'an de dest bi nivîsandinê kir. Bi navê Stûna Kebanîyan reng û çalakîya jinan xiste nav rûpelên Hawarê.²¹⁵ Tenê du heb nivîsên wê di Hawarê de hatine weşandin. Her wiha meriv dikare bêje ku Rewşen Bedirxan rojnamevana Kurd a yekemîn e.

Sala 1944'an de li ser navê jinên Surîyê tevli Kongreya Jinên Cihanê dibe. 1946'an de wek rêvebira dibistanê kar dike. 1947'an de jî di radyoya Sûrîyê da bernameya zarokan pêşkeş dike. Sala 1957'an de wek nûnera "Kurdîstana Iraqê" tevli konferanseke navnetewî dibe. Ev konferans li Atinayê tê darxistin. Mijara konferansê dijberîya mêtîngerîyê ye. Celal Talabanî û Nuredîn Zaza jî vexwendîyê vê konferansê

²¹¹ Hussein Habasch, (31.03.1996). *Rewşen Bedirxan Rojnamevana Kurde Yekemîn*, Bonn, www.habasch.de, r.1.

²¹² Hussein Habasch, (31.03.1996). *h.n.*, r.1.

²¹³ Haki, B. (2011). Rewşen Bedirxan, *Tîroj*, İstanbul, sal:9, hj:52, r.51.

²¹⁴ Habasch, *h.n.*, r.1.

²¹⁵ Rewşen Bedirxan, (1941). Stûna Kebanîyan, *Hawar*, Şam, , hj:27, r.7.

ne lê belê ji ber derketina astengîyan tenê Rewşen Bedirxan tevli konferansê dibe û gotarek bi Kurdî pêşkeş dike. Yek ji damezrênerê partîya Baas Mişel Eflaq her çiqas dixwaze vê gotarê ra astengîya derxe lê bi ser nakeve. Rewşen Bedirxan wergereke gotara xwe bi zimanê Frensîzî jî li beşdaran belav dike.²¹⁶

Gelek berhem û wergerên Rewşen Bedirxan hatine çapkirin û yên ne çapkirî jî hene. Roja 01.06.1992' an de li Banyasê, Rewşen Bedirxan çû ber dilovanîya Xwedê. Li goristana Şêx Xalid Neqşebendî li bajarê Şamê, li kêleka Mîr Celadet Bedirxan hatîye definkirin.

Berhemên Rewşen Bedirxan:

- *Bîranînên Jinekê*, werger, ji zimanê Tirkî bo Erebû, 1951.
- *Xeramî We Alamî*, werger,(çîrok)ji Tirkî bo Erebî 1953.
- *Mamosteyekî* (sê pirtûk), werger, ji Tirkî bo Erebî 1954.
- *Rûpelên ji Toreya Kurdî*, 1954.
- *Nama Gelê Kurd* (helbest-Goran) ji Kurdî bo Erebî 1954- ji ber rewşa siyasî navê xwe li ser vê pertûkê ne nivîsî ye.
- *Name ji Mustefa Kemal Paşa re*, werger ji Tirkî bo Erebî
- *Bîranînên Min-Salih Bedirxan*, werger ji Tirkî bo Erebî.
- *El-red 'ala El-kosmopolîtiye*, Mehmûd Şîniwî, werger, (ji ber hin sedemên siyasî navê xwe li ser vê pertûkê ne nivîsîye)

Pirtûkên wê yên ne çapkirî

- *Bavê min Ebdulhemîd*, nivîsa Ayşe keça Sultan Ebdulhemîd e.
- *Bîranînên min*. Destnivîs e.

1.4.4. Cegerxwîn (1903-1984)

Cegerxwîn di sala 1903' an de li gundê Hesarê ku girêdayê Kercewsê (Gercüş) ye hatîye dinê. Lê belê ew bi kok û binemala xwe, ji Bêkendê ye. Gundê Bêkend dikeve quntara çiyayê Gurdilan li başûrê Misircê (Kurtalan). Navê Cegerxwîn yê rast

²¹⁶ Haki, (2011). r. 51.

Şêxmûs e. Navê bavê wî Hesên e, navê bapîrê wî Mihemed e, kurê Mehmûdê kurê Elî ye. Navê diya wî jî Eyşan e.²¹⁷

Serê pêşîyê, jê re digotin “Mela Şêxmûsê Hesarî”. Di warê nivîsandina pirtûkên bi zimanê Kurdî de, gelek xebat kirine. Li ser dîrok, ziman, çîrok û helbestan gelek berhem çêkirîye. Ewî bi hezaran helbest nivîsîne. Di van helbest û nivîsên xwe de bernavkê wek "Mûsa Hesên, Cîgerxwîn, Mûsa Hesên Cegerxwîn" bikaranîye.²¹⁸

Berî Şerê Cihanê yê pêşî, malbata Cegerxwîn ji Hesarê çûye Binxetê û li Amûdê bi cîh bûye. Hêj ew zarok bûye, dê û bavê wî mirine û ew li cem xwîşka xwe Asê maye. Bi sêwîmayîna xwe Cegerxwîn pir şerpezetiyê dibîne, belengaz dibe, rênçberî û şivantî û gavantiyê dike. Piştî di 18 salîya xwe de dest bi xwendina dînî kiriye û ji bo xwendinê li gelek deveran gerîyaye. Di sala 1928'an de jî, destûrnameya melatîyê wergirtiye.²¹⁹

Cegerxwîn di nivîs û helbestên xwe de, belengazî û hêjarîya miletê xwe anîye ziman. Ji bo yekîtî û desthevgirtina miletê xwe xebitîye. Cegerxwîn roja 02.10.1984'an de, li bajarê Stockholmê (Swêd) çûye ber dilovanîya Xwedê. Cinazeyî wî, li bajarê Qamîşlo bi merasîmeke pir giran, di nav baxçeyê xaniyê wî de hatîye definkirin.

Berhemên Cegerxwîn

Helbest

- *Dîwan, Dîwana Yekem: Prîsk û Pêti*, 1945 Şam.
- *Dîwan, Dîwana Duyem: Sewra Azadî*, 1954 Şam.
- *Dîwan, Dîwana Sêyem: Kîme Ez?* , 1973 Beyrut.
- *Dîwan, Dîwana Çarem: Ronak*, Weşanên Roja Nû, 1980 Stockholm.
- *Dîwan, Dîwana Pêncem: Zend-Avista*, Weşanên Roja Nû, 1981 Stockholm.
- *Dîwan, Dîwana Şeşem: Şefeq*, Weşanên Roja Nû, 1982 Stockholm.
- *Dîwan, Dîwana Heftem: Hêvî*, Weşanên Roja Nû, 1983 Stockholm.
- *Dîwan, Dîwana Heystem: Aştî*, Weşanên Avesta, 2003 Îstanbul.

²¹⁷ Zinar, (1991). *b.n.b.* , r.182.

²¹⁸ Zinar, (1991). *b.n.b.* , r.182.

²¹⁹ Zinar, (1991). *b.n.b.* , r.183.

- *Dîwan, Dîwana Nehem: Salar û Mîdya*, Weşanên Avesta, 2003
Îstanbul.
- *Dîwan, Dîwana Dehem: Şerefname Menzûm*, Weşanên Avesta, 2003
Îstanbul.

Çîrok

- *Reşoyê Darê*, Weşanên Lîs, 2008 Diyarbakır.
- *Cim û Gulperî*, Weşanên Lîs, 2008 Diyarbakır.

Ziman

- *Destûra Zimanê Kurdî*, 1961 Bağdat.
- *Ferheng, Perçê Yekem*, 1962 Bağdat.
- *Ferheng, Perçê Duyem*, 1962 Bağdat.
- *Folklorê Kurdî*, Weşanên Roja Nû, 1988 Stockholm.

Dîrok

- *Tarîxa Kurdistan*, 3 cild, 1985-1987, Stockholm

Berhemên wî yên wergerandine zimanê Tirkî

- *Lenin Şafağı*, Kaynak Yayınları, İstanbul.
- *Hayat Öyküm*, Evrensel Basım Yayın, İstanbul.

1.4.5. Osman Sebrî (1905-1993)

Yek ji helbestvan û nivîskarên Hawar ê, Osman Sebrî ye. Ew di 7'ê Çileyê Pêşîn, di sala 1905'an de li gundê Narincê hatiye dinyayê. Gundê wî girêdayê bi qeza Kolik (Kâhta) û ser parêzgeha (wilayet) Semsûr'ê (Adıyaman) ye.

Bavê wî rîsipîyê eşîra Mirdêsîya bû û di sala 1915'an de çûye ber dilovanîya Xwedê. Di pey wefatkirina bavê xwe de, apê wî Şukrî lê xweyîti kirîye û wî daye ber xwendinê. Osman Sebrî di sala 1922'an de li Stenbolê xwendegeha bilind "Ruştîye" kuta kirîye. Herdu apên Osman Sebrî, Şukrî û Nûrî hevaltî bi Serhildana Şêx Seîd re kirine. Piştî vemirandina Serhildanê, hikûmetê di sala 1925'an de, herduyan jî li Diyarbekir bi sêpiyê ve daleqandiye û Osman Sebrî jî, neffî kirîye û heta dawîya sala 1928' an di girtîgeha bajarê Denizli yê de maye. Piştî ku Osman Sebrî tê berdan, dîsa wî di sala 1929'an de li Meletyê digirin. Lê ewî, xwe ji destên hêzên dewletê

filitandiye û revîye, di 24 çileyê pêşîn 1929'an de çûye Binxetê (Sûriye). Di kovara Hawarê de li ser mijarên cihê dest bi nivîsandinê kir. Xêncî xebatên wî yên siyasî, herweha xebata wî, di warê çand û folklorê Kurdî û nivîsandina bi tîpên Latînî de jî pir çêbûye, heta ku dersa zarokan bi zimanê Kurdî daye.²²⁰

Gelek caran hatiye girtin û temenekî dirêj di navbera çar dîwaran de bihurandiye. Edene (Adana), Qonya (Konya) û Denizli hinek girtîgehên ku Osman Sebrî tê de girtî maye ne. Herwiha çar caran jî hatiye nefîkirin (sirgûn) û pênc caran jî daxistine bin rûniştina mecbûrî de.²²¹

Di sala 1957'a Osman Sebrî ligel hinek hevalên xwe, di xebata damezirandina "Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyeyê" da cîh girt û wekî sekreterê vê partiya navborî hat hilbijartin.

Ji xêncî van kar û xebatên ku Osman Sebrî kirine, herweha ew nivîskar û hozanekî pir bi nav û deng e jî. Hêj ew di nav salên 1932-1945'an de bû, di gelek kovar û rojnameyên Kurdî de nivîsar û helbest û xeber nivîsîne û weşandine. Di sala 11.03.1981'ê de, Hemreş Reşo piraniya helbestên Osman Sebrî kom kirine û bi navê "Apo" li Almaniyaya Rojava çap kiriye. Herweha weke Hemreş Reşo, Dr. Nûredîn Zaza jî pêşgotinek ji wê Dîwana wî re nivîsîye. Dîwan bi temamî 160 rûpel e.

Piraniya helbestên Osman Sebrî li ser rewşenbîrîkirin, yekîtî û hevkarîya Kurda ye. Di helbestên xwe da Osman Sebrî temî, şîretan û nesîhetan li milletê xwe dike. Di helbestên xwe da ew nîfiran li merivên du rû dike.²²²

Osman Sebrî roja 11ê çileyê paşîna sala 1993'ê ya çû ser dîlovanîya Xwedê. Ew li gundê Berkevîrê, li binxetê hatîye defîn kirin.

1.4.6. Pîremêrd (1867-1950)

Navê wî yê rastî, Tewfîq e. Ew di sala 1868'a li bajarê Silêmanî'yê hatîye dinyayê. Tewfîq Kurê Mehmûd Axayê kurê Hemze Axa bû. Ji ber çûyîna wî ya li hecê, navê wî bûye "Hacî Tewfîq". "Pîremêr" yan jî "Pîremêrd" nasnavê wî ne. Ev nasnav di jiyana wî de wisa cihê xwe girtiye ku bûye wekî navê yê resen û her kes bi vî nasnavî, wî nas dike. Heya bi xwe jî, xwe bi heman nasnavî dide nasîn. Di giraniya

²²⁰ Zinar, (1991). *b.n.b.*, r.190.

²²¹ Zengî, D. (2004). *Bîranînên Mamoste Osman Sebrî (1905-1993)*, Beyrût, Çapxaneyê Emîral, r.89-102.

²²² Kurdo, Q. (1983). *Tarîxa Edebyata Kurdî I*, Stockholm, Weşanên Roja Nû, r.169.

antolojiyên wêjeya Kurdî de, dîrokên wêjeya kurdî û pirtûkên din de jî bi vî nasnavî hatiye nivîsandin.

Zarokatîya Pîremêrd li bajarê Silêmanîyê derbaz dibe. Di temenê 6-7 saliya xwe de diçe cem Mela Huseyn dest bi xwendina Qur'ana pêroz dike û di demeke kin de diqedîne. Pişt re derbazî medreseyan dibe û dest bi jiyana medreseyê û xwendina wê dike. Him pirtûkên Kurdî him erebî û him jî pirtûkên farisî dixwîne. Her du zimanên din jî hîn dibe. Ji bo qenctirîn hînbûna van her du zimanan, diçe cem Mela Mihemedê pêşrewê mizgefta Hemze Axa. Li wir him xwendina medreseyê diqedîne û him jî zimanê erebî û farisî qenc hîn dibe. Di ber xwendina xwe re gelek helbestên hozanên kurd, ereb û faris jî di ber çavan re derbas dike û gelek rind hînî wêjeya wan jî dibe. Hindik jî be bi zimanê erebî û farisî jî helbest nivîsandine.²²³

Pîremêrd, di dema feqîtiya xwe de, li gelek bajar û medreseyan gerîyaye, kesên curbecur dîtine. Ji wan gelek ramanên cîhanê hîn bûye û ji seydayên têvel sey standîye. Pîremêrd helbestên helbestkarên bi nav û deng, yê wekî Hacî Qadirê Koyî, Nalî, Mehwî, Şêx Riza Talebanî û Mewlewî xwendîye. Pişt re hêdî hêdî bi aliyê sazandina helbestên Kurdî ve diherike û di dema feqîtiya xwe de bi zaravayê soranî gelek helbest nivîsandîye. Di ciwaniya xwe de, nav û dengê wî belav dibe û tê naskirin.²²⁴

Pîremêrd, di navbera salên 1882 û 1898'an de di kar û barên dewletê de wek karmend dixebite. Di sala 1882'an de li bajarê Silêmaniyê dibe katibê nifûsê û di sala 1886'an de dibe serkatibê dadgeha Şarbajêr. Di sala 1895'an de li bajarê Kerbeleyê dibe cîgirê dozger. Di sala 1898'an de digel şêx Seîdê bavê Şêx Mehmed diçe Tirkîyê û ji wir jî bi hev re diçine hecê. Piştî edakirina ferza hecê careke din dizivire bajarê Silêmaniyê. Di sala 1891'ê de digel Şêx Ehmedê Xaneqînê û helbestkar Wefayî diçine Tirkîyeyê. Li bajarê Stenbolê bi cîh dibe. Piştê demekê karbidestên Meclîsa Osmanî ji ber gelek başzanebûna bi zimanê farisî; wî dikin endamê meclisa alî û payeya “beg”-tiyê didinê. Piştî çend sala pêkhanîna vî karî, diçe zanîngeha Stenbolê. Di beşa huquqê de qeyda xwe çêdike û dest bi xwendina bilind dike. Bi rewşeke serkeftî beşa hiqûqê dixwîne û diqedîne. Piştî wergirtina diplेमoya hiqûqê dibe parêzer. Di navberê

²²³ Kurdo, Q. (1985). *Tarîxa Edebiyata Kurdî 2*, Stockholm, Roja Nû, r.109-110.

²²⁴ Kurdo, (1985). *b.n.b.*, r.109-110.

re dizewice û nivîsgehek vedike dest bi karê nivîsê dike. Dixwaze rojname û kovaran derxe.²²⁵

Di sala 1908'an de ji aliyê rewşenbîrên kurd ve di binê serekîtiya Seyîd Evdîlqadir de cemiyeteke bi navê “Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurd” (Kürd Teavün ve Terakki Cemiyeti) li bajarê Stenbolê tê damezirandin. Ji aliyê din, heman cemiyetê bi navê “Rojnameya Alîkar û Pêşketina Kurd” (Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi) rojnameyek jî weşandin. Pîremêrd bi navê xwe yê hemanî “Tewfîqê Silêmanî” di nav de cîh girt û bû xwedî û berpirsiyarê weşana rojnameyê. Di heman demê de helbestên xwe jî, di rojnameyê de diweşandin.²²⁶

Pîremêrd, di sala 1909'an de dibe qaymeqamê Colemergê û di sala 1918'an dibe muteserîfê Amasya'yê. Paşê ew jina xwe û du kurên xwe dihêle li Tirkîyê û vedigere diçe Silêmanîyê. Wî çaxî li bajarê Silêmanîyê rojnameya “Jîn” di bin serekîtiya Huseyn Nazim de derdiket. Huseyn Nazim, serperîştîya wê rojnameyê dispêre Pîremêrd. Di sala 1934'an de Huseyn Nazim diçe ber rehmetê û Pîremêrd dibe rêveberê rojnameya “Jîn” û di heman salê de, çapxaneyekê kirê dike. Rojnameyê li wir çap dike. Dû re navbera Pîremêrd û xwediyê çapxaneyê xerab dibe û bi pêwîstî çapxaneke din kirê dike. Heya dawîya emrê xwe weşandina rojnameya “Jîn” didomîne. Pîremêrd gelek helbest û nivîs ji bo kovara Hawar jî şandîye û ew nivîs û helbest di kovarê de hatine weşandin. Di nav salên 1926 û 1950'î de berpirsiyarê rojnameyên “Jiyanewe” û “Jin” bû. Ser folklor gelek lêkolîn kirîye. Pîremêrd wekî pêşevanê helbestvanîya Kurdî ya nûjê jî tê hesibandin.²²⁷

Mehemed Resûl Hewar, di pirtûka xwe de gelek li ser “Pîremêrd” sekiniye û pesnê vî zatî dide. Mehemed Resûl Hewar wê pirtûka xwe di sala 1970'yî de li bajarê Bexdayê diweşîne. Hûr û gir der barê jiyana Pîremêrd radixe ber çavan. Mehemed Resûl Hewar, Pîremêrd tenê weşanker, helbestvan û nivîskar nabîne. Di tanga Lew Tolstoy, Victor Hugo de dibîne û pêşkêşî xwendevanan dike:

“Pîremêrd, der barê evîn û evîndarî, hezkirin û siruştîya xwezayê de, der barê neteweyên bindest, nemaze neteweya kurd, rizgariya gelên bindest nemaze gelê kurd û yên wekî wan gelek berhem û helbest nivîsandine û pêşkêşî gelên cîhanê kiriye. Pîremêrd, wekî giraniya helbestkar û wêjekarên kurd, ji normalê zêdetir di helbestên

²²⁵ Kurdo, (1985). *b.n.b.*, r.109-110.

²²⁶ Kurdo, (1985). *b.n.b.*, r.109-110.

²²⁷ Kurdo, (1985). *b.n.b.*, r.109-110.

xwe de dabaşa spehîtiya xwezayê dike. Her wekî li ser vê spehîtiyê bengî bûye dide nîşan.”²²⁸

Pîremêrd, di felsefeya xwe de dibêje, ew mafê ji law û mêran re hatiye nasîn, divê heman maf ji keç û jinan re jî bê nasîn.

Pîremêrd, di sala 1950'yî de li bajarê Silêmaniyê di temenê 83'yan de çûye ber dilovanîya Xwedê. Gora wî li bajarê Silêmaniyê ye.

Berhemên Pîremêrd

- *Mawlawî Kurd* (ji hewramanî wergerandiye soranî), 1935.
- *Trajediya Mem û Zîn A Ehmedê Xanî*, 1935.
- *Çîroka 12 Suwariyan Ji Merîwanê*, 1935.
- *Xirmaî Kay Kon*, Jiyan, 1936.
- *Galte û Gep*, Berhevka Folklorê Kurdî, 1947.
- *Kemançejen* (wergêra ji tirkî)
- *Mewlana Xalid Neqşîbendî*,
- *Besaranî*, (ji hewramanî wergêra soranî)
- *Encamî Piyawî Bengkêş*, Gelawêj, 1941.
- *Zoremilî Milşikanîle Dûwaye*, Gelawêj, 1942.
- *Felesefey Kiçe Kurdek*, Gelawêj, 1942.
- *Mehmûd Axa*, 1942.²²⁹

1.4.7. Qedrî Can (1911-1972)

Qedrîcan, Di sala 1911'an da hatiye dinyayê. Ji Dêrika çiyayê Mazî ye ku girêdayî bajarê Mêrdînê ye. Navê wî yê rast Ebdîlqadir Ezîz Can e. Navê diya wî Eyşê ye. Piştî xwendina xwe ya seretayî û navendî diçe Qonya'yê ji bo xwendina beşa mamostetîyê. Di destpêka xortanîya xwe de tevî hinek tevgerên siyasî dibe. Ji ber sedemên siyasî xwendina xwe nîvcî dihêle û diçe binxetê.

Cegerxwîn di bîranînên xwe de dibêje: “Du xortên ciwan ji Tirkîyê hatine Amûdê, xwendina xwe ya lîse xelaskiribûn. Herdû xort Qedrîcan û Reşîdê Kurd bûn.” Ji hêlekê din ve hevalê wî Dr.Xalid Qotreş dibêje: “Qedrîcan xwendina xwe nebîr serî,

²²⁸ Qanatê Kurdo, (1985). *b.n.b.*, r.109-110.

²²⁹ Qanatê Kurdo, (1985). *b.n.b.*, r.109-110.

di sala diduyan de, ji xwendina xwe ya Mala Mamosteyan (Dar el-mûellimîn) revîya û hate Sûriyê.” Di sala 1928’an de dema hatîye Sûriyê, temenê wî 17 salî bû. Di salekê de hînî zimanê Erebi bû. Li bajarê Selemîyê xwendina “Mala Mamosteyan” dixwîne. Piştî ku xwendina xwe kuta dike, li bajarê Antakya yê dibe mamoste”. Li wir Memdûh Selîm Beg nas dike.²³⁰

Qedrîcan li bajarê Qamişlo û Amûdê mamosteyî dike. Li gorî gotina şagirtê wî Mustefa, (kurê Hesên Hîşyar) dibêje: “Di sala 1942’an de Qedrîcan li bajarê Amûdê kargîrê dibistanê bû. Li bajarê Şamê, “Taxa Kurdan”, û derdora wê jî mamostetî kirîye. Piştî demekê, li wezaretê perwerdehiyê mîna rêvebir xebitîye.”²³¹

Qedrîcan di hejmara pêşîyê di kovara Hawar’ê de nivîsek bi navê “Hawar Hebe Gazî Li Dûye” nivîsîye. Di sala 1936’an de Qedrî Can helbesta bi navê *Rêya Teze* nivîsîye. Edîb Nadîr dibêje: “Ev helbest (Rêya Teze), helbesta pêşîn e, di dîroka helbestên nûjen û azad, di toreyê Kurdî de”. Ev dîrok, bûye mîna qonaxeke nû di toreyê Kurdî de, hem di nûjenkirina helbesta Kurdî ji hêla ruxsar û naverokê de û hem bûye bîhnokê di navbera herdu qonaxan de; qonaxa nûjen û ya klasîkê de. Ew qonaxa klasîk, û ya hevdemî di yek demê de gihandiye hev, û her du rêbaz di nav xwe de hilgirtîye.”²³²

Li gor ku Dilawerê Zengî radigihîne, alîyekî Qedrîcan, yê ramyarî jî heye. “Di sala 1957’an de, di meha tîrmehê de, Qedrîcan bi grûpek xortên Kurd re beşdarî mihîrcana ciwanên cîhanê yê şeşan li Moskowê dibe. Li wir, diçe serlêdana Mela Mistefa Barzanî û helbesta xwe ya bi navê “*Serdarê Kurdan Berzanî*” diyarî wî dike. Di sala 1958’an de piştî vegera Berzanî, li bajarê Bexdadê careka din hevûdu dibînin. Di wê dîtinê de, nameyekê bixêrhatinê dispêre destê Barzanî, û di kovara Hêwa û Azadî de helbesta xwe ya bi navê “*Şêr Hat Welat*” belav dike.”²³³

Qedrîcan piraniya berhem û nivîsên xwe di kovar û rojnameyên ku li Sûriyê û Libnanê derdiketin wek; Hawar, Ronahî û Roja Nû belavdikir. Çend helbestên wî li Îraqê, di Kovara Hêwa, Gelawêj û rojnameya Azadî de jî belavkiriye. Xêncî çîrok û helbestan, çend gotarên wî di kovara Hawar, Ronahî û Roja Nû de hene. Ji wan:

²³⁰ Zengî, D. (2005). *Qedrîcan (1911-1972)*, Beyrût, Çapxaneya Emîral, r.17.

²³¹ Zengî, (2005). *b.n.b.*, r.17.

²³² Zengî, (2005). *b.n.b.*, r.18.

²³³ Zengî, (2005). *b.n.b.*, r.19.

”Silêman Bedirxan, Gelo Ne Wisa Ne, Bihara Dêrikê, Şîna Xalê Min, Inqîlaba Sor, û Yaney Serkewtin”.²³⁴

Qedrîcan yek ji nivîskarê pêşîn e, ko di van kovar û rojnameyan de nivîsiye. Evî nivîskarî li kêleka helbestan kurteçîrok, gotar û karê wergerandinê jî kiriye. Ji hêlekê din, alîkarîya wergerandina romana “Şivanê Kurd” ya Erebe Şemo kirîye, û pêşgotina dîwana yekê ya Cegerxwîn nivîsiye. Piranîya naverokên nivîsên Qedrîcan li ser xwendevanên dibistanan û cîhana jiyana wan e. Ji hêleke din ve li ser gerdiş û serpehatîyên Kurdan in. Helbestên wî derûnî û bi hest in.²³⁵

Naveroka çîrokên Qedrîcan, di cîhana bîranînan û demên borî de digere. Bîranînen Zarotîyê, Birayên Xwînê, Xewn û Sawêr, û Berhaweyên Kurdî hinek ji çîrokên wî ne. Pir dûrî ramyarîya rojane ya germ diçe. Di çîrokên xwe de ji siyaseta rojane dûr e. Naverokên çîrokên wî dijberî naverokên helbestên wî ne. Piranîya mijarên helbestên wî bi ramyarîya rojane ve têne girêdan.²³⁶

Qedrîcan, çîroka nivîskarê Misrî, Mistefa Lutfî Menfelûtî ya bi navê “Tayek Porê Sipî” wergerandiye zimanê Kurdî. Pirtûka nivîskarê Rûs Grigorî Petrov ya bi navê “Di Welatê Zembeqê Spî de”, li ser daxwaza Dr. Ehmed Nafiz wergerandiye zimanê Kurdî û di rojnameya Roja Nû de, mîna gotaran, perçe perçe, xelek bi xelek daye belavkirin.

Di sala 1939'an de zewiciye, navê hevjinê wî Nilûfer e. Du kur û keçeke wî ji xanima wî hene. Navê zarokên wî; Mizgîn, Şêrîn û Serwer in. Di meha Tebaxa sala 1972'an de çûye ber dilovanîya Xwedê. Li bajarê Şamê, li taxa Kurdan li goristana Şêx Xalidê Neqşebendî hatiye definkirin.²³⁷

1.4.8. Qedrî Cemîl Paşa (1891-1973)

Qedrî Cemîl Paşa di sala 1891'ê da, li Diyarbekirê hatiye dinyayê. Ji malbata Cemilpaşazadeyan kurê Fuad Beg e. Piştî ku dibistana Leşkerî ya Diyarbekirê (Diyarbekir Askerî Rüştiyesi) qedand çû Stenbolê, li wir Dibistana Sultanî (İstanbul Sultanisi) kuta kir.

Di sal 1911'an de ji bona xwendina bilind qeyda xwe li Mekteba Cotkarî ya Bilind (Ziraat Âli Mektebi) çêkir. Di vê demê de tevî kurê apê xwe Ömer Cemilpaşa û

²³⁴ Zengî, (2005). *b.n.b.*, r.20.

²³⁵ Zengî, (2005). *b.n.b.*, r.22.

²³⁶ Zengî, (2005). *b.n.b.*, r.22.

²³⁷ Zengî, (2005). *b.n.b.*, r.21.

du hevalên xwe, komeleya xwendekarên Kurd Hêvî (Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti) damezrand. Piştî demekî ji bo xwendinê diçe Lozan a Swisre. Li wir jî ew û kur apê xwe Ekrem Cemîl Paşa û çend hevalên wan li wir şaxeke komeleya Hêvî vedikin.²³⁸

Destpêka şerê cîhanê yê yekemîn vedigere Stenbol'ê, ji bo leşkerîyê xwe dinivîse. Piştî perwerdeya leşkerî ku çar meh dikişand, wek zabit dest bi kar kir û çû enîya şer. Di bin emrê artêşa sêyemîn li enîya rojhilat (şark cephesi) kete şer. Di gelek enîyên şer û peywirên cur be cur de cîh digre û dawîyê de diçe enîya Filistinê. Lê belê li Emman'ê dîl dikeve destê Inglîza û wî dişînin bajarê Îskenderîye, yê li Misrê. Li wir sal û nivekî wek hêsîr li qampa Seydbeşîr de dimîne.²³⁹

Gava di sala 1925'an de serhildana Şêx Seîd rû dide, ew jî tevî malbata Cemîlpaşazadeyan tê girtin û di dadgehên Îstîqlalê (İstiklal Mahkemesi) de tê darizandin. Her çiqas hatibe berat kirin jî, dîsa wek penaber nefiyê bajarê Burdur'ê dibe. Di sala 1929' an de vedigere Diyarbekir'ê. Piştî vegerandina xwe, bi rêxistina Xoybûnê re peywendî datîne û di heman salê de derbasî bînxetê dibe. Li Sûrîyê tevî Xoybûnê dibe û rêvebirîya navendî re tê bijartin. Li gor plana Xoybûnê ew wek serleşkerê enîya Mêrdîn û Dêrikê tê peywardarkirin lê ji ber ku desthilata Frensî ya Sûrîyê, Kurd hemû li Şamê topkirin û ji tixûbê Tirkîyê dûrxistin ew pîlan pûç bû. Ew jî negihîşt wê armanca xwe.²⁴⁰

Sala 1932'an de li Sûrîyê'da rêxistinek bi navê "Civata Arîkariyê Ji bo Belengazên Kurd" li Cizîrê hat damezrandin, Qedrî Cemîl Paşa jî bû endamê vê rêxistinê. Di sala 1933'an de ji hemwelatîbûna Tirkîyê hat derxistin. Desthilatdariya Frensîyan dixwestin ku Kurd û Xiristîyanan li hember Ereban bidin şerkirin. Sala 1937'an de ji ber ku gotina Frensîyan nekirin ew jî wek Kurdên din û malbata Cemîlpaşazadeyan nefiyê Tudmûrê bûn. Di sala 1937'an de bû berpirsîyarê "Civata Azadî û Yekîtiya Kurdan" ku ev komele ji aliyê Xoybûnê ve hatibû damezrandin.²⁴¹

Piştî ku Komara Mahabadê hat îlankirin ew jî wek nûnerê Partîya Demokrata Kurdî ya Suriyê hate şandin. Gava ku bi rêya Silêmanîyê diçû Îranê, bi rêva rastî serbazekî Kurd ku di artêşa Iraqê de, bi navê Mistefa Xoşnav hat. ew her du bi hevra çûne Mahabad'ê. Li Mahabadê tevî "Partîya Demokrata Kurdistana Îranê" bû û bi

²³⁸ (Torî) Işık, M. K. (2000). *'Kadri Cemil Paşa (ZinarSilopî)', Ünlü Kürt Bilgin ve Birinci Kuşak Aydınlar*, İstanbul, Sorun Yayınları, r. 157-159

²³⁹ Torî, (2000). *b.n.b.*, r. 157.

²⁴⁰ Torî, (2000). *b.n.b.*, r. 157.

²⁴¹ Torî, (2000). *b.n.b.*, r. 159.

fermana Qadî Muhemmed qonsolxaneyê Sovyetê ya Tewrêzê (Tebriz) ziyaret kir. Di vê serlêdanê de xwestekên Komara Mahabad'ê anî ziman û ji bo van xwastekan nivîsek ji bo bigihînin Stalîn, raberê rayedaran kir. Ji ber peywir nedanîna di Komara Mahabad'ê de vegehiya Şam'ê.²⁴²

Qedrî Cemîl Paşa perwerdeyek baş dîtibû. Herî kêr zimanekî Ewropî – Frensisî- diaxivî. Ji alîyekî ku li Stenbolê di nav rewşenbîrên Tirk, Kurd û Erebiyê de mabû, alîyekî din, mayîna wî ya li Ewropa ew bi fikrên neteweperwerîyê ra dabû nasandin. Ji ber ku Frensisî dizanibû, haya wî ji niqaşê derbarê fikrên neteweperwerîyê hebû. Di pêvajoya ruxandina Dewleta Osmanî de damezrandina dewleteke Kurdî serbixwe di hişê wî de cîh girtibû.²⁴³

Qedrî Cemîl Paşa xencî alîyê leşkerî û siyasî, alîyekî wî yê rewşenbîrî û wêjekarî jî hebû. Kovara Hawarê de diwana Melayê Cizîrî, ji alîyê Qedrî Cemîl Paşa ve hatibû nivîsandin.

Bi Cawîde xanima qîza Qasim begê Cemîlpaşazade re zewicîbû û zorokên wan tune bûn. Di 26 Qasim'ê sala 1973'an de li Şam'ê çû ber dîlovanîya Xwedê. Ew li goristana taxa Heyy'ul Ekrad (Rukneddin) hatîye definkirin.

Berhemên Qedrî Cemîl Paşa:

- Zinar Silopî, *Doza Kurdistan*, Stewr, Beyrut, 1969.

1.4.9. Reşîdê Kurd (1910-1968)

Reşîdê Kurd kurê Mihemedê Reşo û Zîna Xêlid e. Dêya wî ji Amedê ye. Navê jina wî Xatûn e. Sala 1910'an li gundê Roşatê, navça Dêrikê hatîye dinyayê. Reşîdê Kurd xwendina xwe li gundê Derikê, li Mêrdînê û saleke jî li Qonyayê dike. Sala 1930 berî kutakirina xwendina xwe ya mamostatîyê bi çend mehan tê girtin. Piştî demekî, derfetê dibîne û ji zindane direve. Pey re, di wexteke kurt de ji nû ve tê girtin û wî dişînin zindana Dêrikê. Haya wî çê dibe ku dikin wî bi darve bikin. Reşîdê Kurd

²⁴² [http://kovarabir.com/selahaddin-ugur-isik-bir-kurt-milliyetçisinin-portresi-kadri-cemilpasa/\(06.08.2016\)](http://kovarabir.com/selahaddin-ugur-isik-bir-kurt-milliyetçisinin-portresi-kadri-cemilpasa/(06.08.2016)).

²⁴³ Özoğlu, H. (2005). *Osmanlı Devleti ve Kürt Milliyetçiliği*, İstanbul, Kitap Yayınevi, r.136.

careke din ji zindanê direve. Zêdetirî mehekî xwe vedişere, heya ku fîrsetê dibîne û sala 1940'î derbasî Suriyê dibe.²⁴⁴

Demekê li gundan dimîne û dawiyê li Amûde bi cîh dibe. Piştî derketina wî ji Tirkîyê zarokekî wî çêdibe. Ev zarok ji ber bê şîrîyê, piştî du mehan dimre. Çend meh naborin bavê Reşidê Kurd, pey re jî dêya wî dimirin. Kebaniya wî, Xatûn tenê dimîne ew jî diçe mala bavê xwe. Reşidê Kurd, sala 1946'an bi dizîkava vedigere û diçe ku jina xwe bîne. Reşnivîsa pirtûka xwe, "Reziman"ê dide jina xwe derbasî Sûrîyê dike. Reşidê Kurd jî, ji Tirkîyê vedigere û li Amûdê bi cîh dibe. Bi navê Reşad Mihemed Elî xwe di nifûsa Suriyê de qeyd dike. Sala 1949'a, dewleta Suriyê wi digre û dike Girtîgeha Tedmurê, şeş mehan hukmê karên zehmet didinê. Sala 1950'î, ji zindanê derdikeve lê her tim eskerên Sûrîyê li pey wî ne. Reşidê Kurd li mala xwe xew nake. Sala 1958'an, diçe Îraqê û li wir penabertîya siyasî daxwaz dike, lê desthilatdarên Îraqê wî digrin û teslîmê hukûmeta Yekitiya Misir û Sûriyê dikin. Wi dişînin Qamişlo, li wê derê tê îşkence kirin, bi kendiran bi koka darekî ve girê didin û sê rojan wisa girêdayî li ber germa Tîrmehê bê xwarin û be vexwarin dihêlin. Piştî ku karbidestên dewletê hêviya xwe dibirin ku Reşidê Kurd tu tiştî nayne ser xwe, wî û hevalekî wî dişînin girtîgeha "Mezê" ya Şamê. Sala 1949'a di girtîgeha Tedmurê de nexweşîya kezebê lê peyda dibe. Sala 1967'an, ji bo dermankirina xwe, Reşidê Kurd diçe Romanya yê, mehekî jî li Bulxaristanê xwe derman dike, lê tu encamekî hîlnagire. Roja Şemiyê, 20 Çile sala 1968'an, Reşidê Kurd diçe ber dîlovanîya Xwedê.²⁴⁵

Reşidê Kurd yek ji rewşenbîrên Kurdan yên destpêka sedsala bîstan e. Nivîsên wî di Hawarê de kêş in. Di Hawarê de gotarek bi sernivîsa "Civat" di hejmara 49 û 52'an de belav kirîye. Reşidê Kurd bêtir wek zimanzan tê naskirin. Di sala 1956'an de, pirtûka wî ya rêzimanê bi navê "Rêzimana Zimanê Kurmancî" ji aliyê çapxana Kerem, li Şamê hate belav kirin. Ew di nivisandina helbestan jî jêhatîye. Ji ber xebatên xwe yên siyasî tê girtin. Di girtîgeha "Mezê" de li Şame, Reşidê Kurd van helbestan dinivisîne: "Bersiv", "Oktobir", "Sor im", "Rêya Azadan", "Roj me", "Karwan" û "Zindan". Ev her sê helbestên mayîn jî; "Basen Beyrûtê", "Eger Em Nebêjin Ay, Ewê Bibêjin Ay" û "Ez" li derveyî girtîgehê nivisîne. Helbesta "Ez" û "Rêya Azadan" di rojnameya Rêya Teze, 27 Çiriya Pêşîn 1966'an de belav bûne. Reşidê Kurd helbestên xwe di girtîgehê de bi zimanekî tûj nivisandine. Gava ku diçe Sovyetistanê û dixwaze van helbestan di Rêya Teze de bide belav kirin, navê xwe yî rast diguherîne û li şûnê

²⁴⁴ Kurd, P. R. (Çîrîya Paşîn 1990). Jînegerîya Reşidê Kurd, *Armanc*, hj.110, r.9.

²⁴⁵ Kurd, (1990). *h.n.*, r.9.

“*Cûnê Reş*” bi kar tîne. Helbestên wî bi zimanekî serrast hatine nivisandin. Tevgera helbesta Kurdi ya wê deme bi tevgera siyasî ve pirr nêzik hatibû girêdan. Bi gotineke din, helbest bi serûber ketibû xizmeta siyasî. Ê helbestvan helbestên xwe li gor rewşa xwe ya siyasî dinivisand û propaganda wê dikir.²⁴⁶

Reşîdê Kurd jî weki Cegerxwin û Osman Sebrî di yek ekolekî da ne. Babetên sereke yên helbestên wan nêzîkê hev in. Çîroka “Şewlê Mezrayî” jî çîrokeke folklorî ye, ku Reşîdê Kurd nivisandîye.²⁴⁷

1.4.10. Ehmed Namî (1906-1975)

Namî, me ji nameya te zanî

Seydayî ji bo melay Xanî

Cîgerxwîn

Mela Ehmed Namî (Mela Ehmed Mehmûd Ebdela) di sala 1906'a, li gundê Erbetê (nêzîkê Nisêbînê) hatiye dinê. Hê ew biçûk bû, bavê wî çû rehmetê. Seyda li ser mirina bavê xwe, piştî wextan ji zarokên xwe re digot "ez li ber mirina bavê xwe ketim, çimkî şeker didan min ", diyar dibe ku dema wefata bavê wî, temenê Seyda 3-4 salî bûye. Lê li gor gotina Seyda ew pir bi mirina diya xwe êşîya ye, lewra hingê deh salîbû. Dîya wî berî mirina xwe, temîya wî li meta wî dike û jê re dibêje ku Ehmed bê xwendin nehêlin. Meta Seyda gotina dêya wî li erdê naxe û Ehmedê sêwî dide xwendinê. Paşiyê Seydayê Namî, dadikeve binxetê. Li gundê Tilşêrê li cem Şêx Îbrahîm feqîtiya xwe didomîne. Piştra bi çendekî diçe cem Şêx Ehmedê Xiznawî, li wira jî demekê dimîne. Gava feqîtiya xwe temam dike, li gundê Tilşêrê dibe mela û li wira jî dizewice.²⁴⁸

Di vê demê de têkilîyên wî bi Mîr Celadet Bedirxan re çêdibin. Loma jî di vê demê de, Tilşêr dibe wargehek kulturî û civakî. Gava Seydayê Namî dibistanekî li gund vedike, şêx û melayên herêmê êrîşê tînin ser, ji mirîdên xwe re dibêjin "Namî konê şeytên li ser girê Tilşêrê vegirtiye. "Ji bextiyariya Mela Namî re, wê demê axayê gund Eliyê Ebdê, pêşmêriya Seyda dike, şêx bi mirîdên xwe ve bi poşmanî vedigerin. Paşê vê bûyerê, kevaniya Seyda bilome jê re dibêje “Çima te ev qiyamet anî serê me? Te mekteb vekir, lê zarokên me yên ber xwendinê jî tune ne!” Seyda lê vedigerîne û

²⁴⁶ Kurd, (1990). *h.n.*, r.9.

²⁴⁷ Kurd, (1990). *h.n.*, r.9.

²⁴⁸ Namî, M. A. (1987). *Agirê Sinema Amûdê*, Uppsala, Weşanên Jîna Nû, r.7.

dibêje: “Zarokên kurdan hemû yên min in...” Di demek wisa de dijiwarîya vekirina dibistanê di vê bûyerê de jî diyar dibe. Dibêjin piştî ku Seydayê Namî bi zorê kurê gavan xiste dibistanê, gavanê belengaz li ber dîwêr rûnişt girîya û nîfir kirin: “Heger tişteke bi lawê min bê, bira xwedê ji Mela Namî re nehêle!”²⁴⁹

Li gor gotinên zarokên Mela Ehmed Namî, di destpêka salên pêncî de, mala wan ji Tilşêrê bar dibe, bi temamî li bajarê Qamîşlo datîne. Li vira Seydayê Namî xebata xwe ya edebî, û civakî didomîne. Ew heya dawîya jiyana xwe li Qamîşlo dimîne. Sala 1975’ê piştê nexweşiyêke dirêj, Seydayê Namî diçe ber dilovanîya Xwedê. Cenazeyê wî li goristana bajêr tê veşartin.²⁵⁰

Mela Ehmed Namî sê berhemên nivîsî li pey xwe hiştibûn. Ji wana "Dîwana Rista" sala 1986’ê bi awayê broşûrekê di bin navê "Daxwazname", li Stockholmê hat weşandin. Li gor pêşgotina Seydayê Namî bi xwe ya di wê dîwanê de nivîsiye, pirê ristên wiha têne qetandin û windakirin. Tenê tiştên ku xelkê jiber kiribûn (paşê Seyda ji devê wan kesan nivîsandi bûn) yan jî ewên ku di Hawar û Ronahiyê de hatibûn belav kirin. Bi çî awayî eserên Ehmed Namî hatin talan kirin, wî bixwe di pêşgotina ristan de nivîsiye. Dibêjin ku Seydayê Namî her car jî tîrsa polîsan berhemên xwe li malên gundî û cîranan vedişart. Carekê, gundiyeke nivîsandinê Seyda di turekî de li ber zikê axur veşartibû. Piştî pêlekê, Seyda tê wan dixwaze. Dema li tûrik dinêhêrin, dibînin ku çêlekan cûtiye. Tişteke tê de nemaye. Seydayê belengaz polî poşman û bi dîlşikestî vedigere malê.²⁵¹

Berhema Mela Ehmed Namî, yê duduya; Agirê Sinema Amûdê ye. Li Bajarê Amûdê bi xwe du şewatên bi nav û deng çêbûne. Şewata pêşî, di salên 1930’î de, dema ku balafirên Fransîzan Amûdê bombe kirin, bi bombardimanê bajar hate şewitandin. Şewata sinema Amûdê, ya duduya ye ku li vî bajarî qewimîye. Ev li gor şewata pêşî ne pir dûr e. Hîn bi hezaran kes hene, ku şewata sinemayê bi çavê xwe dîtine. Heya niha jî nîşaneyên vê bûyerê li Amûdê mane. Dema şewata sinema Amûdê, Seydayê Namî nivîsek bi awayê roportajeke fireh li ser vê şewatê nivîsiye. Bi çapkirina vî eserî, şewata zarokên Amûdê di dîroka miletê wan de ciyê xwe digre.²⁵²

Berhema Mela Ehmed Namî ya sisîya jî, Ferhengoka Kurdî-Erebî ya bi navê "Kozar" e. Ev, hîn nehatiye çapkirin. Seydayê Namî ji ber têkiliyên xwe yên bi Mîr

²⁴⁹ Namî, (1987). *b.n.b.*, r.8.

²⁵⁰ Namî, (1987). *b.n.b.*, r.8.

²⁵¹ Namî, (1987). *b.n.b.*, r.8.

²⁵² Namî, (1987). *b.n.b.*, r.9.

Celadet Bedirxan re di kovarên Hawar û Ronahiyê de jî nivîsiye, di van kovaran de cîhekî aktîf girtiye. Wek xebata Seydayê Namî ya civakî û edebî, xebatên wî yên siyasî jî hene. Di vî warî de kurê Seydayê Namî, di nameya xwe de wiha dinivîse: "Ji bilî xebata torevanî û zanyariyê, xebateke dûr û dirêj kiriye." Têkilîyên wî bi rêxirava Xoybûnê re jî hebûye.²⁵³

Berhemên Ehmed Namî:

- *Dîwana Rista* (Daxwazname), Stockholm, 1986
- *Agirê Sinema Amûdê*, Uppsala, 1987
- *Kozar* (Ferhengoka Kurdî-Erebî), ev berhem hê nehatîye çapkirin.

1.4.11. Hesên Hîşyar (1907-1985)

Hesên Hîşyar, jî yek ji nivîskarê Hawarê ye, ku di navbera salên 1907-1985'a de jîyana xwe derbaz kirîye. Nivîskar, helbestvan û dîrokzanekî naskirî ye. Di sala 1907'an de li gundê Serdê, ku bi zimanê Tirkî jê re tê gotin *Seren* (70 km bakurê rojhilatê bajarê Diyarbekir) di navbera Hênê û Liceyê de hatiye dinyayê.²⁵⁴

Di nav salên 1920'î de bi tevgerên Kurd re dikeve danûstandinê. Peywendîyên navbera Îhsan Nûrî Paşa bi navçeyên Hênê û Liceyê pêk tîne. Serhildana Şêx Seîdê Pîran a sala 1925'an de, bi awayekî xebatkar û çekdar cîh digre. Piştî şikestina serhildanê, Hesên Hîşyar bi birîndarî tê girtin û di dadgehê de tê darizandin. Ji ber piçûktîya temenê wî cezayê darvekirinê dikin 15 salan û tê girtin. Çend salan jî, li bajarê Niğde'yê neftî dibe û di bin çavdêrîya bêgavî, li wir dimîne. Piştî efûya giştî ya sala 1928'an ji girtîgehê derdikeve, diçe Diyarbekirê û wek karger dikeve karê dewletê, dibe kargêr û rêveberê tapûya Qulpê.²⁵⁵

Dema serhildana Agiriyê dest pê dike, Hesên Hîşyar di serhildanê de cîh digre. Piştî têkçûna serhildanê tevê Îhsan Nûrî Paşa derbasî Îranê dibe. Di sala 1934'an de diçe Sûriyê û li Binxetê cîh dibe. Hesên Hîşyar dema ku tê Sûriyê, dibe endamê rêxistina Xoybûnê. Herweha di warê ziman û çand û folklorê Kurdî de jî kar û xebatên

²⁵³ Namî, (1987). *b.n.b.*, r.7.

²⁵⁴ Hîşyar, H. (1993). *Dîtin û Bîrhatinên Min 1907-1985*, Beyrut, Çapxana Emîral, r.33.

²⁵⁵ Hîşyar, (1993). *b.n.b.*, r.Berga Dawî

wî hene. Di kovara Hawar û Ronahî û Çiya de gelek nivîsar û helbest bi navê Hesên Hişyar weşandine.²⁵⁶

Di sala 1956'an de Komela Zanistî û Alîkariya Kurd bi destê wî û çend rewşenbîrên Kurd hatiye damezirandin. Komelê pirtûka Nûrî Dêrsimî ya bi navê "Dêrsim Tarîxî" û pirtûkeka din a bi navê "Bi Riya Qaçaxçiyên", ya din jî bi navê "Jenosîd" ku bi zimanê Tirkî û Îngilîzî û Frensîzî bû, çap kirîye. Piştî Hesên Hişyar, Nûrî Dêrsimî û Rewşen Bedîrxan, bi hevdu re, rojnameyek bi navê "Wijdan" weşandine. Di sala 1966'an de jî, wî bi tena serê xwe kovara Agahî derxistîye. Dîbêjin ev kovar gihîştîye 19 hejmaran.²⁵⁷

Antropologê Holandî Martîn Van Bruinessen, lêkolîna xwe ya li ser bûyera Şêx Seîd ku kiribû, piranî wî agahdarî ji Hesên Hişyar girtibû û di pirtûka xwe ya bi navê Axa, Şêx, Dewlet (Agha, Shaikh and State) de li serê nivîsîye. Li gor agahdariya kovara Hêvî, Hesên Hişyar 18 heb pirtûk nivîsîne.²⁵⁸

Hesên Hişyar di 14'ê îlona 1985'an de çû ser dîlovaniya xwedê û li goristana Dugirê li devera Qamişlokê hatiye veşartin.

Berhemên Hesên Hişyar yên çapkirî

- *Dîtin û Bîrhatinên Min 1907-1985* (1993), Çapxaneya Emîral, Beyrût.
- *19 Hejmar Ji Kovara Agahî*

Berhemên wî yên neçapkirî

- *Pênc Cildên Dîroka Kurd* ji 8000 sal berî zayînê heyanî qirnê 19'an de.
- *Pênc Cildên "Dîtin û Bîrhatinên Min 1914-1983"*.
- *Dîwaneke Helbestan*.
- *Zerdeşt û Noroz Bûza û Konfîşyos*.
- *Felsefa Xebata Welêt*.
- *Gazî û Hewara Navbera Zagros û Zara*.
- *Erûda Kurdî*.
- *Kirasêsipî û Destêreş*.
- *Muzakeratên Qedrî Beg Wergerandin*.

²⁵⁶ Zêrîn, T. û Polat, L. (1986). Me Seydayê Hişyar Wendakir, *Hêvî*, Parîs, hj. 5, r.17.

²⁵⁷ Zêrîn, T. û Polat, L. (1986). *h.n.*, hj. 5, r.17.

²⁵⁸ Zêrîn, T. û Polat, L. (1986). *h.n.*, hj. 5, r.18.

- *Deh Muzakeratên Ku Wî Dane Şoreşa Îraqê.*
- *Şoreşa Şêx Seîd û Araratê.*²⁵⁹

1.4.12. Faîq Bêkes (1905-1948)

Navê rastîyê helbestvan Faîq Bêkes, Faîq Ebdal e. Kurê Ebdal Begê, ji binemala qereçolanêye. Faîq Bêkes 3'yê Gulana 1905'an li gundê Sîtakê bi ser Silêmanîyê ve ye, hatîye dinyayê. Gundê Sêtak hingê navenda qeza Şarbajar bûye. Ebdal Beg, li wêderê serokê taxbûrê bûye, jê ra digotin "Tabur Axasî". Dayika Bêkes jî, ji Silêmanîyê bûye.²⁶⁰ Bavê helbestvanê bi nav û deng Şêrko Bêkes e.

Faîq Bêkes û Cegerxwîn hema hema di heman salan tîne dinyayê. Çawa ku Cegerxwîn bi helbestên xwe ve bandorek mezin li ser Kurdên kurmancîxêv kiribe, Bêkes jî herwiha bandorê li ser Kurdên Soranîxêv kirîye.

Faîq Bêkes di jiyana xwe ya kurt de, ku tenê 43 salan jiyaye, du şerên cîhanê dîtîye. Bavê Faîq Bêkes, Ebdal beg di Artêşa Osmaniyan de 'Tabûr Axasî' bûye. Ebdal Beg zarokên xwe dide ber xwendina medreseyê. Dewleta Osmanî ber bi nêzîkbûna Şerê Cîhanê yekemîn di sala 1911'an de Ebdal Beg dişînin Xaneqîn û Bexda'yê lê piştî çend salan ew diçe ber dîlovaniya Xwedê. Ev yek dibe sedem ku Faîq tevli dayika xwe û birayên xwe Tahar û Şehîd di warê aboriyê de gelek zehmetiyan bibînin.²⁶¹

Heta piştî wêfata Ebdal Beg sal û nêvek derbas nabe dayika Faîq Bêkes û birayê wî Şehîd ji ber vê rewşa xirab (ku dibe ji ber birçîbûnê be jî) jiyana xwe ji dest didin. Apê wan Emîn Axa wan rê dike Bexdayê cem Hecî Elî Axa. Hecî Elî wan rê dike cem Hemexanê. Hemexan û hevjiîna xwe meyla xwe didin ser wan û wan hînî xwendin û nivîsandinê dikin. Sal 1914'a Şerê Cîhanê yê yekemîn dest pê dike û îngilîz Iraqê dagir dikin. Sala ku şer bi dawî dibe ango di 1918'an de Hemexan wan paşve dibe Silêmaniyê cem apê wan. Apê wan Emîn Axa wan dide ber xwendinê. Hasilî Faîq Bêkes heta sala 1923'yan li Silêmaniyê dûre, di sala 1925'an de jî li Bexdayê diçe dibistana mamostetîyê.²⁶²

²⁵⁹ Hişyar, (1993). *b.n.b.*, r.499-500.

²⁶⁰ Kurdo, Q. (1992). *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Ankara, Öz-Ge Yayıncılık, r.336.

²⁶¹ Kurdo, (1992). *b.n.b.*, r.336.

²⁶² Kurdo, (1992). *b.n.b.*, r.336-337.

Piştî ku mezûn dibe di gelek karan de dixebite. Paşê li Hewlêr û Helepçeyê dest bi mamostetîyê dike û di wan salan de dest bi nivîsandina helbestan dike. Qanatê Kurdo dibêje: “Hikûmeta piştî Şerê Cîhanê yekemîn ku di bin mêtîngeriya Îngilistanê de hatiye avakirin polîtîkayên neqenc dimeşînin. Faîq Bêkes wan salan li hemberî vê yekê, dikeve nav xebatên polîtîk û di sala 1930’î de ji aliyê rejîma nû ve tê girtin û îşkence lê dikin. Piştî ji zindanê derdikeve di 1933’yan de dîsa vedigere mamostetîyê û dibe hevkarê koma mamosteyan.”²⁶³

Jîyana helbestkar Faîq Bêkes di nav rojên nexweş de derbas bûye. Bêkes ji bo ku gelê xwe ji vê rewşa xirab rizgar bike ligel xebatên polîtîk bi helbestên xwe jî dixwaze rê nîşan wan bide. Bêkes di helbestên xwe de her tim têgînên wekî tifaq, yekîtî, xebat bi kar aniye. Xêncî Kurdî, bi Erebbî, Farisî û Îngilîzî jî zanibûye û bi saya van zimanan xwe di warê entelektueliyê de jî xwe pêş xistiye. Faîq Bêkes ji ber belengazî û bêkesîya miletê xwe bernavkê Bêkes bikar aniye. Faîq Bêkes ji ber van dilêşîyan û pêkutiyên rejîmê di temenekî ciwan de 43 salî di 11’ê kanûna 1948’an de diçe ber dilovaniya xwede. Heta ku diçe ser dilovaniya xwedê jî, ji bo jiyaneke hevpar a di navbera kurd û ereban de têdikoşe.

Helbestên wî ji aliyê zanyarê kurd Mehemed Mele Kerîm ve di sala 1981’an de bi navê Dîwana Bêkes li Bexdayê hatiye çapkirin. Mehemed Mele Kerîm têkildarî Bêkes di pêşgotina dîwanê de behsa jiyana Bêkes dike û helbestên wî jî kategorîze dike. Li gorî Mela Kerîm helbestên Bêkes li ser Kurdîtiyê, komeleyatî, derd û xemên gel, helbestên bo zarokan bûne.²⁶⁴

1.4.13. Refîq Hilmî (1898-1960)

Dîroknaş û helbestvanên Kurd Refîq Hilmî di sala 1898 bajarê Kerkûk’ê hatiye dinyayê û di sala 04.08.1960’î jî çûye ber dilovanîya Xwedê. Xwendina xwe ye seretayî û navendî li Kerkûk û Silêmanîyê kuta kirîye. Xwendina amadehî (lîse) jî li Bexdayê xilas kirîye, pişt re ji bo xwendina bilind beşa endezyarîyê çûye Stenbolê. Sala 1920’î wek mamosteyekî pîspor vedigere Iraqê. Li Stenbolê hînî zimanê Tirkî û Frensî dibe. Dema Şêx Mehmûd Berzencî cara duyem di sala 1922’an de desthilatdarîya xwe îlan dike; Refîq Hilmî jî wek şewirmendê siyasî yê Şêx Mehmûd kar kirîye. Gelek nivîsên ramyarî di kovara *Rojî Kurdistan* de nivîsiye.²⁶⁵

²⁶³ Kurdo, (1992). *b.n.b.*, r.337.

²⁶⁴ Kurdo, (1992). *b.n.b.*, r. 338.

²⁶⁵ <http://www.xozga.com>, Malperê xozga (Sorani-Erebbî, 10.02.2013).

Piştî hilweşandina Desthilatdarîya Şêx Mehmûd bi destên Îngilîzan, Refîq Hilmî dîsa dest ji karên xebata xwe berneda. Ji bo gelê xwe her dixebitî. Ji ber vê yekê di sala 1930'î da li Silêmanîyê vegeyîya û kar û xebatên xwe li wir domand. Piştî Silêmanî, Kerkûk, Hewlêr, Koye û Kifrê yê komeleyek ramyarî ji bona xwendevan û xortan damezrand. Çend sal şûnde ev komele bu partîya Hîwa û Refîq Hilmî jî bû serokê partîyê. Partîya Hîwa heta dawîya sala 1943'a bihêztirîn rêxistna siyasî ya Kurdî bû li Iraqê. Dewsa Hîwa'yê partîya Şorîş û partîya Rizgarî hat damezrandin. Ew der dû partî jî sala 1946'a bi damezrandina Partîya Demokrata Kurdistanê tevli vê partîyê bûn.²⁶⁶

Nivîskarê Hawarê Refîq Hilmî, xêncî alîyê ramyarî, ji alîyê rewşenbîrî jî merivekî bihêz bû. Dîroknas, helbestvan, rexnegirê wêjeyê bû. Kovara Hawarê de nivîs û helbestên wî belav bibûn.

Berhemên Refîq Hilmî ev in:

- *Kurd Le Seretay Mêjû Ta 1920*, (Destpêka dîrokê heta 1920'a Kurd) bi zimanê Erebi
- *Kurtasîya Pirsgirêka Kurd*,
- *Şî'r û Edebyatî Kurdî 1*, (1941)
- *Şî'r û Edebyatî Kurdî 2*, (1956)
- *Kurdistanê Iraq we Şoreşa Şêx Mehmûd*,
- *Paş Temûz*, (dîwan -helbest)

1.4.14. Dr. Ehmed Nafiz (1899-1968)

Dr. Ehmed Nafiz sala 1899'a li Paxir Madena Elazîzê hatîye dinyayê. Navê bavê wî Mela Yusif e. Mela Yusiv merivekî xwendî, dîndar û maldar bû. Dr. Ehmed Nafiz xwendina xwe ya seretayî û navend li Elezîzî û Diyarbêkrê qedand. Ji bo xwendina bilind çû Stenbolê li wira beşa pizîşkî da qeyda xwe çêkir û di vê beşê de perwerde bû. Piştî qedandina xwendina pizîşkî Ehmed Nafiz tev komele û rêxiravên Kurdî bû. Têkiliya wî bi malbata Cemîl Paşa, Dr.Fuad, Hacî Îbrahîm û Malbata Bedîrxanîyan re çêbû. Dr. Ehmed Nafiz him pizîşkîya leşkerî dîkir him jî yek ji endamê komeleya Azadî, li Diyarbêkirê bû.²⁶⁷

²⁶⁶ www.xozga.com, Malperê xozga (Soranî-Erebî), h.n.

²⁶⁷ Konê Reş, (01.01.2015). Pizîşk û Welatparêzê Ku Nayê Jibîrkirin, Dr.Ehmed Nafiz Zaza (1899-1968), *Kovara Dicle*, hj.34, r.1.

Di serhildana Şêx Seîd de Dr. Ehmed Nafiz wek pizîşk cîh girt. Gava serhildan têk çû Dr. Ehmed Nafiz jî hate girtin.²⁶⁸

Di sala 1928'an de ji zinadanê derket. Ew jî wek hemû rewşenbîrên wê demê ji ber şertên nerênî berê xwe da bin xetê. Li Sûrîyê komeleya Xoybûnê de cîh girt. Dr. Ehmed Nafiz û birayê wî Dr. Nûredîn Zaza çûn Şamê tevî rewşenbîrên Kurd li Şamê bûn. Dr. Ehmed Nafiz alîyekî karê xwe yî pizîşkî dikir, ji alîyekî din serokatîya "Civata Alîkarîyê Ji Bo Kurdên Belengaz" dikir. Evê civatê, bi taybet ji bo Kurdên nefîkirî û yên ji Tirkîyê revîbûn kar dikir. Di dawîya sala 1932'a Dr. Ehmed Nafiz wek pizîşkê hikûmeta Frensîz hat peywardarkirin û li gundê Eyndîwerê ku nêzikê tixûbê Tirkîyê ye klînîkek vekir. Hemze Begê Miksî jî di heman Gundî de dibistanek ji bo zarokên Kurdan vekiribû û têde zimanê Kurdî bi herfên latînî hînê wan dikir.²⁶⁹

Dr. Ehmed Nafiz destpêka weşandina Hawarê de, di "quncikê pizîşkî" de cîhê xwe girt. Di vî quncikê de nivîsên li ser tenduristîyê dinivîsî û pirsên xwendevanên kovarê, yên di vî mijarê de jî dibersîvand.

Di destpêka salên 1940'î de Dr. Ehmed Nafiz çû Qamişlo li wira klînîkek vekir û ji alîyekî tê de nexweş derman dikir, alîyekî din jî her hefte roja pêncşemê diçû Amûdê li wir jî nexweş derman dikirin. Ji ber van xebatên wî, him helbestvanên wek Cegerxwîn û Ehmed Namî, him jî gel bi xwe helbest ser dirêstin.²⁷⁰

Destpêka salên 1950'î de Dr. Ehmed Nafiz bi Madam Îvon re zewicî. Ji wê zewacê, sê zarokên wan bi navê Cem, Hulya û Leyla çêbûn. Dr. Ehmed Nafiz salên 1960'î de nexweş ket. Ji ber nexweşîyê mala xwe barkir çû bajarê Helebê. Li wir jî klînîkek vekir lê nexweşîyê zor dayê, vê carê ji bo dermankirina xwe çû Bêyrûtê. Dr. Ehmed Nafiz sala 1968'a li Bêyrûtê nexweşxaneyê Amerîkî çû ber dilovanîya xwedê. Xanima wî li gor wesiyeta wî cinazê wî bir Helebê, ji wir jî ew birin gundê Dûgirê (ku girêdayî Qamişlo ye) li wir hate defin kirin.²⁷¹

Dr. Ehmed Nafiz pizîşkî herî pêşîne ku bi tîpên latînî nivîsîye. Di warê pizîşkî de zimanê Kurdî bikar anîye û zimanê Kurdî di vî warê de pêşde birîye. Îro li Qamişlo nexweşxaneyek bi navê Dr. Ehmed Nafiz heye.²⁷²

²⁶⁸ Konê Reş, (2015).*b.n.b.*, r.33.

²⁶⁹ Konê Reş, (2015).*b.n.b.*, r.33.

²⁷⁰ Konê Reş, (2015).*b.n.b.*, r.34.

²⁷¹ Konê Reş, (2015).*b.n.b.*, r.34.

²⁷² Konê Reş, (2015).*b.n.b.*, r.34.

1.4.15. Dr. Nuredin Zaza (1919-1988)

Dr. Nuredîn Zaza ji Paxir Maden'a Elazîz'ê ye. Ew di sala 1919'an de hatîye dinê. Navê bavî wî Mela Yusuf e. Ji binemaleke zana, rewşenbîr û dewlemend e. Piçûktîya wî li Tirkîyê derbas dibe. Piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd ew tevê birayê xwe yî mezin Dr. Ehmed Nafîz derbazî bixetê dibin. Tevî temenê xwe yî piçûk, Nuredîn Zaza di rêxistin û komeleyên Kurdî de cîh digre.

Sala 1938'an de di nav tevgera Klûba Ciwanên Kurd de cîh digre. Rewşenbîrên wek Cegerxwîn, Qedrîcan, Osman Sebrî û birayê wî Dr. Ahmed Nafîz jî endamên vê komeleyên bûn. Nuredîn Zaza piştî şerê cihanê duyemîn li Swisre bi cîh bû. Li wir, di Zanîngeha Lozanê de dest xwendina bilind kir. Sala 1956'an de tevî komêk hevalên xwe ku hejmara wan 17 kes bûn "Komeleya Xwendevanên Kurd li Ewropa" li Almanyaya bajarê Wiesbaden damezrand.²⁷³

Piştî qedandina doktorayê ji zanîngeha Lozanê, di dawîya sala 1956'an de vedigere Sûrîyê. Dibe serokê "Partîya Demokrata Kurdistanê Sûrîyê". Çawa ku tê zanîn ev partî di sala 1957'an de hatibû damezrandin.²⁷⁴

Di zanîngeha Şamê de, du salan wek mamoste kar kir. Dr. Nuredîn Zaza di salên 1960'î de li girtîgehên Sûrîyê, Libnan, Urdun û Iraqê de hatîye girtin.

Hevjîna wî Gilberte Favre di hevpeyvînekê de dibêje: "Nuredîn Zaza xêncî alîyê siyasî ji alîyê rewşenbîrî û wêjekarî de jî merivekî çalak bû. Keda wî di ziman û edebiyata Kurdî de nayê jibîrkirin. Kurteçîrokên wî di kovarên wek Hawar û Ronahîyê de dihatin belavkirin. Mîr Celadet Bedirxan ji bo Dr. Nuredîn Zaza dibêje: ew Çehov ê Kurdan e."²⁷⁵

Di sala 1969'an de vedigere Lozanê û di warê edebiyatê de gelek xebatên berbiçav derdixe holê. Di damezrandina Enstîtuya Kurdî Ya Parîsê de cîh digre. Berhema Ehmedê Xanî ya bi nav û deng *Mem û Zîn* werdigerîne zimanê Frensîzî. Di sala 1982'î de berhema xwe ya *Wek Kurdek Jîyana min/Bir Kürt olarak Yaşamım/ Ma Vie Kurde* nivîsî. Evê pirtûkê Ewropayê gelek deng da. 7'ê Çileyê Pêşîn 1988'a li Lozan'a Swisre yê ji ber nexweşîya penceşîrê çû ber dîlovanîya Xwedê.²⁷⁶

²⁷³ Zaza, N. (1994). *Bir Kürt Olarak Yaşamım*, Sweden, Mezopotamya Publishing, , r.8.

²⁷⁴ Zaza, (1994). *b.n.b.*, , r.191-196.

²⁷⁵ <http://kovarabir.com>, Nureddin Zaza'nın Eşi Gilberte Favre ile Röportaj, 22 Şubat 2011.

²⁷⁶ <http://kovarabir.com>, *h.n.*, 22 Şubat 2011.

Berhemên Dr. Nuredin Zaza:

- *Destana Memê Alan*, Bahoz, Uppsala, 1973.
- *Les Kurdes et l'accord d'Alger*, Centre Culturel Universitaire, Beyrût, 1975.
- *Memê Alan*, Çapxaney Korî zanyarî Kurd, Bexda, 1977.
- *Ma Vie Kurde /Wek Kurdek Jiyana min*, Çapa yekem Lausanne, 1982.
- *El-Meseletu'1-Kurdiyye we'l-Suhûfu'l-'Erebiyye* (Erebî) Beyrût.
- *Şerê Azadî*, (Helbest) Beyrût, 1963.

1.4.16. Tewfîq Wehbî (1891-1984)

Zimannasê Kurd Tewfîq Wehbî, di 01.01.1891'an de hatiye dinyayê. Wî hewl daye ku Kurdîyeke standart bi elfabeya Latînî durist bike. Ew wek nivîskar, rewşenbîr û siyasetmedar tê naskirin. Wî, demekî parêzgerîya Silêmaniyê jî kiriye. Îngilîzan ew girtine û xistine zindanê. Di 5'ê Kanûna duyem a sala 1984'an de li Îngilîstanê wefat kiriye û li Silêmaniyê hatiye defin kirin.²⁷⁷

Ew, kesê yekemîn bû, ku tîpên erebî li gor dengên Kurdî amade dikir. Di destpêka sala 1920'î de tîpên latînî li ser bingeha zimanê Îngilîzî bo nivîsandina zimanê Kurdî amade kir.²⁷⁸ Tîpên ku Tewfîq Wehbî amade kiribûn dişibîhîn tîpên ku Celadet Bedirxan amade kiribûn. Tewfîq Wehbî Beg û Mîr Celadet Bedirxan li Şamê hevdu dibînin. Di vê hevdîtînê de elfabeya latînî ya ku çêkirîye nîşanê Mîr Celadet Bedirxan dike. Daxwaza wan herduya ewe ku elfabeyeke nû bi hevra çê bikin; lê ev daxwaza wan nayê cîh. Ew her du li ser yekkirina tîpên latînî xebitîbûn.²⁷⁹ Ewî kovarên wek Hawar û Gelawêj de bi nivîsên xwe yên ser ziman û edebiyatê ve cîh girt. Tewfîq Wehbî di gelek nivîsên xwe yên di kovara Gelawêj de, li ser bêjeyên Kurdî hûr dibû.²⁸⁰

Zimannasê naskirî Tewfîq Wehbî Beg, li ser ziman û rêzimana Kurdî gelek xebat kirine û berhem çêkirine.

²⁷⁷ <http://www.kurdishacademy.org/?q=node/88>, Lingustic Figures, Taufiq Wahby (1891-1984), (08.02.2015)

²⁷⁸ Elî Seydo, (1932). Ez û Hawar, *Hawar*, hj.9, r.7.

²⁷⁹ Bedirxan, C. (1932). Li Ser Yekitîya Zimanê Kurdî, (Birê Erebi), *Hawar*, hj.10, r.6-7.

²⁸⁰ Hawar, (1941). Neşreyên Kurdî, *Hawar*, hj.27, r.9.

Berhemên Tewfîq Wehbî:

- *Kurdîyekeman Be Çon Hirûfêk û Çon Binûsin*, 1925.
- *Destûrî Zimanî Kurdî*, Bexdad, 1929.
- *Xwêndewarî Baw*, Bexdad, 1933.
- *The Origins Of The Kurds And Their Language*, 1965.
- *Ferhengî Kurdî – Ingilîzî bi Cecil John Edmonds re*, Weşanên Oxford, 1966.
- *Eslî pîte qalibî “e” û şewey Silêmanî*, 1973.

1.4.17. Elî Seydo Gewranî (1908-1992)

Elî Seydo Goranî di sala 1908'an de li bajarê Emmanê (ku serbajarê dewleta Urdun'ê ye) hatiye dinyayê. Li gor Reşid Hûsên Xoşnaw ew di sala 1880'yê de, li Diyarbekr'ê hatiye dinê. Li gor min di vê tarîxê de şaşîyek heye. Lewra ku ev tarîx rast be divê ew di 102 de salî de wefat kiribe û xêncî wî jî kalê wî di sala 1880'yê de ji ber wezîfeya xwe çûye Urdun'ê. Ya din jî ewî xwendina Lîseyê di sala 1924'an de kuta kirîye. Heger tarîxa 1880 rast be, divê ew 44 salîya xwe de lîse qedandibe. Wisa dixuyê ku ew 28 sal piştî çûyîna kalîkê xwe, di sala 1908'an de li Emman'ê hatiye dinyayê. Di berhema ferhenga Erebi- Kurdî ya Elî Seydo Gewranî de jî; tarîxa ji dayîkbûnê, wek sala 1908'ê mîladî hatiye nivîsandin.²⁸¹

Elî Seydo Goranî bi esl û binyada xwe, ji Diyarbekir'ê ye. Navê Eşîra wî, Eşîra Dodikan e û navê gundê wî jî Lexerê ye. Ew ji deşta Gewran a ku di navbera Diyarbekr û Erxenî'yê da ye. Çi di Hawarê de çi jî berhem û nivîsên din de navê wî “Elî Seydo Goran” hatibe nivîsîn jî; bi elfabeya Erebi de nivîsandina Gewran û Goran ku wek hev tê nivîsin, dewsa Gewran de Goran hatiye xwendin. Derheq jiyana Elî Seydo, di pirtûka wî ya “Qamûsa Kurdî-Erebî” de, bi zimanê Erebi ku nivîsî ye: “Di sala 1880 de, kalê wî bi leşkerên Osmanî re çûye Urdunê û li wir bûye qaymeqam. Herweha gelek wezîfeyên îdarî yên din jî kirine.”²⁸²

Elî Seydo di sala 1916'an de, li Emmanê dest bi dibistana seretayî kiriye û bi zimanê Tirkî xwendîye. Piştî di sala 1920'î de çûye bajarê Qudsê, li wir “Xwendegeha Metran Gobat” bi zimanê Ingilîzî pola duyemîn qedandîye. Piştî wê, dîsa

²⁸¹ Gewranî, E. S. (1985). *Qamûs'ul Kurdî El-Hedîs, (Ferhenga Kurdî ya Nûjen), Kurdî- Erebi*, Emman, Matbaatî'l Şarqul Ewset, r. 9.

²⁸² Gewranî, (1985). *b.n.b.*, r.9.

li wir çûye dibistana “Rewdet-ul Mearîf el Wataniye” û dibistana amadehî (lîse) li wir kuta kirîye. Elî Seydo vê demê de bi mamosteyekî bi navê Arnold re dinase.²⁸³

Rojek ew di çarsûya Quds’ê ku digerin, mamoste Arnold ji re dibêje: “Tu ne erebî, tu Kurdî. Ev gelek berhemên li vî bajarî ji aliyê bapîrên te Eyyubîyan ve hatine çêkirin. Divê tu xwedî li ziman û miletê xwe derkevî û girîngîyê bidî netewa xwe.” Li ser vê axaftinê, Elî Seydo dest bi lêkolîn û xebatên Kurdî dike.²⁸⁴

Piştî qedandina lîseyê, Elî Seydo Gewranî çûye Zanîngeha Emerîkan a li Bêyrûdê, beşa Siyasî-aborî xwendîye. Wî di 22 ê Hezîranê sala 1928’ an de jî, ew zanîngeh bi (tevî hevalê xwe yê ji Hewlêrê, Elî Heyder Suleyman) kuta kirîye. Piştî ku Seydo Xwendegêhê kuta kiriye, di lîseyeka Emmanê de bûye mamosteyê dersa Îngilîzî. Di sala 1938’ an de, bûye rêvebirê Lîseya bajarê Kurkê. Di heman salê de bûye rêvebirê Lîseya bajarê Siltê, piştî ew bûye rêvebirê Lîseya bajarê Erbedê û di 1940 î de jî, bûye rêvebirê Lîseya Emmanê.²⁸⁵

Piştî du mehan, Elî Seydo bûye Sekreterê yekem di Wezareta Derve de û wî hinartine bajarê Cîdde’yê. Ew li wir maye heta bi sala 1946’an, ku Urdun bûye dewleteka serbixwe. Vê carê ew li wir bûye sefirê Dewletê. Piştî li Enqere, Şam, Yemen û Siudî Erebaştanê peywira balyozîyê kirîye. Ew di sala 1963’ an de teqawid bûye.²⁸⁶ Lê belê Elî Seydo Goranî, di salên 1930’î de dest bi nivîsandinê kiri bû. Ewî di Kovara Hawarê, di hejmara 9’an de nivîsek belav kiribû û piştgirîya bikaranîna elfabeya latînî kiribû. Gelek rojname û Kovarên dewletên ereban de li ser dîrok, erf-edetan dinivîsî. Di dema balyozîya xwe de dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kirîye û pirtûk nivîsîne û hinek jî wergerandine zimanê Erebi.

Berhemên Elî Seydo Gewranî:

- *Ji Bo Delalî û Bilindîya Kurda*, Ji zimanê Înglîzî wergerandiye
- *Gera Dana Şimîs ê Emerîkî*, Ji zimanê Îngilîzî wergerandiye
- *Ji Emmanê Heta Îmadiyê*, Qahîre, 1939.
- *Ji Te’lîmatên Qonsûla Urdunî*,
- *Qamûsa Kurdî-Erebî*. Emman, 1985.

²⁸³ Xoşnaw, R. H. Kürd Tarihçilerinin Meçhul askeri: Elî Seydo Goranî (1880-1992), <http://www.Newroz.com>, (17 Şub 2007).

²⁸⁴ Xoşnaw, h.n. (17 Şub 2007).

²⁸⁵ Gewranî, (1985). b.n.b. , r.9.

²⁸⁶ Gewranî, (1985). b.n.b. , r.9.

- *Lor û Loristan*, Bexdad, 1974.
- *Gera Li Yemenê Di Dema Îmam Ehmed De*,
- *Komara Kurdî ya Mehabad*, Mister Egilton. Ji zimanê Înglîzî wergerandiye.
- *Kurd*, Tomas Bo, Ji zimanê Îngilîzî wergerandiye.
- *Pirsgirêka Rojhilata Tirkîyê*. M.Emîn Bozarslan. Ji zimanê Tirkî wergerandiye.²⁸⁷



²⁸⁷ Gewranî, (1985). *b.n.b.*, r.10.

BEŞA DUYEMÎN: BANDORA HAWARÊ LI SER ZIMANÊ KURDÎ

2.1. Ziman û Erka Wê

Platonê Yewnanî di nivîsa xwe ya bi navê *Kratylos* ku warê çavkanîyên ziman de metna herî pêşîn tê pejirandin, ziman wiha dinasîne: Ziman ewe ku meriv ramanên xwe bi alîkarîya deng, bi amraza (wasita) kirde û lêkera dide fahmkirinê.²⁸⁸ Raman, hest û daxwazîyên ku li hêla deng û wateyan û bi alîkarîya hêman û rêbazên hevpar ên di nav civakê de radigihîne merivên din ziman e.²⁸⁹

Walter Porzig ziman wek “hemû amrazên ku komêk meriv, bi wî ve bihev re diaxive” dinasîne.²⁹⁰ Herwiha Agop Dîlaçar dibêje: Ziman sistemek e ku raman bi wî ve tîrîşaret kirin.²⁹¹

Ziman di navbera însanan da amrazêke siruştîye ku meriv bi wî ve ji hev fahm dîkin. Qanûnên wî yêrî taybet hene ku li gor wan qanûnan pêşve diçe. Bingeha wî, zemanekî ne dîyar de hatîye avêtin, sistemeke civakî ye wek paymanek nepenî bi dengê va hatîye sazîkirin.²⁹²

Li jor jî tê xuyakirin ku danasîna hemû zimanzanan de du peyvên sereke ji bo ziman tîrî bikaranîn. Ew peyv jî hevifahmkirin û ragihandin e. Em jî ji ber van danasîna dikarin bi kurtasî bêjin ku; *ziman, amureke ragihandinê û hevifahmkirinê ye. Amraza têkilî û danustandinê ye di navbera kesan û civakê de.*

Ziman di hebûna netewan de cîhekî pir girîng digre. Her netewek berî her tiştî, bi zimanê xwe tê nasîkirin. Nîşaneyê ku gelan ji hev vediqetîne û wana datîne cîhekî taybet ziman e. Xwedayê mezin jî, cudahîya zimanan wek ayetên xwe ji bawermenda ra dinasîne û pêleyeke pir mezin dide ziman. “*Afirandina erd û asîmanan û cudahîya reng û zimanên we ayetên wî ne. Bê şik di van de ji bo merivên zana delîl hene.*”²⁹³

Prof. Qanatê Kurdo, him danasîna ziman û him jî girîngîya ziman bi hev ra rave dike û peywireke berfirehtir dide ser milê ziman û ziman bi vî awayî terîf dike: “Ziman bingeh û binaxa yekitiya endamên millet e. Amraza serbestî û serxwebûna wî ye. Li jîn û afirandina xwe da her millet, merivên her civakê hevbendîya xwe,

²⁸⁸ Aksan, D. (2003). *Her Yönüyle Dil: Ana Çizgileriyle Dilbilim*, Ankara, Türk Dil Kurumu, r.55.

²⁸⁹ Aksan, (2003). *b.n.b.*, r.55.

²⁹⁰ Porzig, W. (1985). *Dil Denen Mucize*, (Wer: Vural Ülkü), Ankara, Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, r.100.

²⁹¹ Dîlaçar, A. (1968). *Dil, Diller ve Dîlcilik*, Ankara, Türk Dil Kurumu, r.3.

²⁹² Ergin, M. (1986). *Üniversiteler için Türk Dili*, İstanbul, Bogaziçi Yayınları, r.7.

²⁹³ Qurana Pîroz, Rûm, 30/ 22. (wergera ayetê li Kurdî, S.Ç)

pevgirêdana xwe bi hevra dikine yek. Bê hevbendî, bê pevgirêdan û bê hevfehmkirin qet miletek, qet endamên civakê nikarin bijîn û biafirînin. Amraza hevbendî, pevgirêdana endamên civakê, amraza netewan bi hevra, amraza hevfehmkirina wan bi hevra ziman e. Ziman neynika diyanet, feraset, rewş, bîr û bawerîya millet e, neynika ruh, can û tarixa millet e. Ziman wisa jî, amraza peşkevtina merivên millet û civakê ye. Reng, rû û rewşa jiyîn û afirandina her milletî, her andamên civakê li ziman da tê ber çavan, ziman kanîya tarix û kultura millet e, sebeb vê ye ku her millet, endamên her civakê, zimanê xwe hîn dibin, dixwazin bizanibin qanûnên sazumanî û çêkirina zimanê dayika xwe.”²⁹⁴

Em dikarin li ser van danasîn û ravekirina ziman bêjin ku; ziman hêza neteweyan ya manewî ye. Hebûn, li ser pê xwe sekinandin û berdewamîya gelan girêdayî bi ziman e. Huner, wêje, çand, bîr û bawerî, muzik û exlaq bi rêya ziman pêşde diçin û ji nîşên nû ra tên veguhastin. Ji ber wî jî parastin û pêşdebirina ziman parastin û pêşdebirina milletan e. Herwiha Xwedayê Mezin (c.c) gava merivatî afirandîye, zimanên cuda cuda hînê wan kirîye û ev yek jî wek nîşaneyê mezinbûna xwe daye zanîn.

2.2. Pêvajoya Dîrokê da Kurd û Zimanê Kurdî

Li ser bingeş û nîjada Kurdan gelek nêrînên cuda cuda hene. Herçiqas derbarê vî netewî da gelek lêkolîn hatibin kirin û berhem hatibin nivîsîn jî di hinek waran de cudahî di navbera van lêkolîn û berheman de heye. Gava em hemû lêkolîn û berheman bidine ber hevdû, li ser Kurdan kêma zêde dikarin hinek tiştên zanistî û bibingeş bêjin.

Şerefxanê Bedlîsî di berhema xwe ya bi nav û deng Şerefname yê da, çend nêrînên li ser nîjad û binemala qewmê Kurd, ji me ra radigihîne. Çawa ku Şerefxan jî tîne ziman riwayetên li ser neseba Kurdan muxtelif û zêde ne. Yek ji wan rîwayetan jî eve:

“Hikumdarê Pişdadîyan yê 5. “Dehhaqê Maran” hewqas zalim û bêdîn bû, hinek dîrokzanan navê Şeddad lê kiribûn. Li ser herdu milên vê zalimî da du birînên (penceşîr) wek maran derketibûn. Bijîşkan çiqas tedawî kirin jî; birînên wî qenc nebûn. Êdî hedara wî ji ber êşa van birînan tine bû. Rojekî şeytan hate cem û jê ra got: heger tu mêjuyê du xortan wek merhem bidî ser van birînan tu dê ji êşa wan xilas bî. Piştî her roj mêjîyê du xortan didane ser birîna wî. Ew kesê ku ser xorta bû merivekî

²⁹⁴ Kurdo, Q. (1981). *Zimane Kurdî* (Rêziman), Frankfurt, Weşanên Komkar, r.5.

kerîm û bi merhemet bû. Her roj xortek berdida û dewsa wî xortî da mêjîyê pezekî dixiste nav mêjîyê din û dikişande ser birînên Dehhaq. Lê li gor şertên wî ew kesên ku dihate berdan divê biçûna cihekî dûr û serê çîya. Bi çûyîna wan kesên ku serbest hatine berdan hejmara wan xortan zêde bûn. Zewicîn, zarokên wan çêbûn û ji wan ra gotin Kurd.”²⁹⁵

Herwiha Şerefxan, hinek nêrînan cuda cuda derbarê vî qewmî de hatine gotin, radihgihîne. Yek ji wan jî eve: “Li gorî hinek dîrokzanan, dêw û însan bi hev ra zewicîne û ji wan jî Kurd peyda bûne. Hinek zana dibêjin Kurd taîfek ji Cin’a ne û Xwedê perde li ser wan rakirîye. Hinek dibêjin, ji ber ku Kurd zêde wêrek û cesûr in, lewma ji wan re gotine Kurd.”²⁹⁶

Helbet bingeheke şênber (somut) ya van nêrînan û riwayetan tune. Çawa ku Muhemmed Emin Zeki Beg dibêje: “Ew kesên ku li ser reh û binyada Kurdan lêkolîn bike; divê di serî da kok û rehên qewmên herî kevin vekolin. Em dikarin li ser hemû riwayet û nêrînan bêjin: Ew qewmên ku hatine li Kurdistanê cîh û war bûne û bûne niştecihên vî welatî, Kurd in.”²⁹⁷

Nivîseke Sumerî ya li ser kevîran (B.Î 2000) da, behsa welatekî bi navê “Kardaka” tê kirin. Ev welat dikeve başûrê gola Wanê. 1000 sal piştî vî nivîsarê Tiglath Pilaser di çiyayê Azû da qewmekî bi navê “Kurtî-e” ra ceng kir. Driver dibêje cihê şer Hezo (Sason) ya îro ye.²⁹⁸

Ew qewmên ku Ksenefon di berhema xwe ya navdar “Anabasis” de ji wan re dibêje “Kardukh” gelo Kurd in? Dema meriv guh dide Ksenefon, Dicle û Firat, çiyayên asê, cirantîya Ermenîyan û Behra reş, ji alîyê cografîk bi me dide zanîn, meriv dibêje qey ku ev der cîh û warên mîlletê Kurd e. Rewşa civakî, tevgera gel û salix (teswîr) ê jiyana rojane, Kurdan tîne ber çavên meriv. Kesên ku vî berhemê bixwîne û welatê Kardukha mêzeke wê têkilîyan di nav Kurda û Kardukha baştir bibîne.²⁹⁹ Bilge Umar dibêje qertafa “ukh” (ûx) yan jî kh (x), di zimanê Ermenîkî de tê wateya “xelkê wir”. Yanî Kard(a)ukh tê maneya xelkê Karda yê. Herwiha qertafa “uana” (wana) jî di zimanên latin û hellenî da tên heman wateyê. Gorduana, (Gordiyene, Corduene), jî, ji

²⁹⁵ Bedlîsî, Ş. (1860). *Şerefname 1*, (Farisî), St. Petersburg, Weşangeha Akademîya Împeratorîyê, r.12-13.

²⁹⁶ Bedlîsî, (1860). *b.n.b.*, r.13.

²⁹⁷ Zeki Beg, M. E. (2011). *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, İstanbul, Nûbihar Yayınları, r.75.

²⁹⁸ Bois, Minorsky, Mc. Kenzie, (2004). *b.n.b.*, r.4.

²⁹⁹ Ji bo agahiyên berfireh, bnr. Ksenefon, (2012). *Anabasis*, İstanbul, Kum Saati Yayınları, (Wer: Eyüp Benlioğlu) r. 109-110.

bona vê peyvê wek mînak dide. Dîsa ew dibêje ku Kardukh, bi teqez Ermenî nînin. Lewra Ksenefon, wana ji Ermenîyan vediqetîne û bi wî şeklî vedibêje. “Dibe ku Ksenefon bi navkirina beledên (rêber) xwe yên Ermenî, ewana nav kiribe. Lewra kurd, xwe bi vî awayî nav nakin.”³⁰⁰

Nivîskarê şerefnameyê, Şerefxanê Bedlîsî Kurdan wiha dinasîne: “Kurd li gor ziman û adetên xwe yên cuda dibin çar beş. Kurmanc, Lor, Kelhor û Goran. Welatê Kurdan ji Hurmuzê (Besra) destpê dike û li ser xeteke rast hetanî Meletî, Mereşê dewam dike. Bakûrê vî welatî Welatê Faris, Iraqê Ecem, Azerbeycan û Ermenistan e. Başûrê wî da jî; Diyarbekir, Mûsil û Iraqa Erebbeyê. Lê gelê vî milletî, ji rojhilat hetanî derya rojava, gelek cihan belav bûne.”³⁰¹

Derbarê xislet û taybetmendîyên Kurdan de, nêrînên hinek çavdêr û lêkolîneran em dikarin wiha binivîsin. “Kurd bi nîjada xwe Aryanî ne. Zimanê wan û zimanê Farisî ji yek malbatê ye, lê Kurd zimanekî cuda, yê Hindo-Ewropî diaxivin. Pirranîya gelê Kurd bi zaravê Kurmancî diaxivin. Ew kesên têkilîya wan bi Kurdan re çêbûye jî qebûl dikin ku; Kurd xweyî hinek qabilîyetên serdestin. Herçiqas wek çors bixuyên jî zîrek û biaqilin. Ji alîyê aqlê selîm û şarezatîyê de hosta ne. Xeyalên wan yên pîrfîreh û hozanwarî hene û hostayê hicwê ne. Axaftin û niqaşên xwe bi hezaran gotinên pêşîyan ve dixemilînin û meriv hizmekarê jêhatîbûna wana çavdêrîyê ye. Kurd ji strana gelek hez dikin. Şevên zivistanê yên dirêj da bê westandin, guhdarîya kilam, çîrok, dastan û serphatîyên dengbêjan dikin. Şert û mercên zivistanê dijwar di heman demê da kesayetî û xisletê Kurd çê kirîye.”³⁰² “Kurd hewqas bêtirs, cesûr, egîd û xwedî rûmetin, ji bo destxistina parî nan destê xwe rabêrî tu kesî nakin û mirinê didin ber çavê xwe.”³⁰³

Lêkolînerê bi nav û deng Vladimir Minorsky dibêje: “Hesibandina Kurdan li ser qewmên Îranî, ji nîjadê zêdetir girêdayî ziman û dîrokê ye. Xîsusîyetên (taybetmendîyên) Kurdan cih cih ji hev cuda ne. Dibe ku Kurd ji rojhilat ber bi rojava koç kiribin. Mîmkûne ku em bêjin, ku berîya hatina Kurdan li cihê xwe yî îro, qewmekî bi navê xwe bişîbihe navê wan (Kardu) lê bi nîjada xwe cuda be hebûye û paşê ev qewm tevli Kurdan bûye.”³⁰⁴

³⁰⁰ Umar, B. (2013). *Doğu Anadolu*, İstanbul, İnkılâp Yayınevi, r.25.

³⁰¹ Bedlîsî, (1860). *b.n.b.*, r.13-14.

³⁰² Rambout, L. (1978). *Kürdistan (1918-1946)*, İstanbul, Komal Yayınları, r. 22.

³⁰³ Bedlîsî, (1860). *b.n.b.*, r.14.

³⁰⁴ Minorsky, V. (1988). *Kürtler*, Köln, Weşanên Helepçe, r.3.

Zimanê Kurdî zimanekî Hindo-Ewropîye û di nav famîlyeya Îranî de cîh digre. Di rojhilata navîn û hinek jî ewropa bi qasî 40 milyon însan bi vî zimanî diaxivin. Di rojhelata navîn û asyaya nêzîk de piştî zimanên Erebî, Tirkî u Farisî zimanê herî zêde tê axaftin zimanê Kurdî ye. Famîlyeya Hindo-Ewropî ya fireh de dikeve nav beşa Îranî. Zimanên ku taybetîyên vê famîlyeyê herî zêde di nav xwe de dihevin yek jî zimanê Kurdî ye.³⁰⁵

Gava em li nêrîn û nivîsên cuda cuda li ser Kurdan, ku me li jor nivîsîye binihêrin; em dikarin wiha berhev bikin: Kurd qewmek ji binemala merivahîyê ne. Ne berek ji cina ne, ne jî bi zewaca dêw û însanan peyda bûne. Ew jî wek qewmên din, ji bavê merivahîyê Hz. Adem pêxember (a.s) û dayîka merivahîyê Hz. Hewa yê peyda bûne. Herwiha di malbata zimanan de, Kurd qewmekî aryanî ne û zimanekî wanê cuda heye ku navê wî zimanê Kurdî ye, û ew bi vî zimanî diaxifin.

Wisa tê qebulkirin ku lêkolînên li ser zimanê Kurdî û zaravayên wî, bi xebata Maurizio Garzonî ya Rêzimana Kurdî (1787) va dest pê dike. Nivîskarê vê berhemê mîsyonerekî katolîk bûye, hijdeh sal di nava Kurdên Amedîyê da jîyaye. Ji bo bigihîje armanca xwe (karê mîsyonerîyê), hînê zimanê Kurdî bûye. Di pêşgotina pirtûka xwe da dibêje ku min ev rêziman nivîsîye ji ber ku dema peywendî û rabûn û runîştina digel Kurdan de karê mîsyonerîyê ji bona min hêsan bibe.³⁰⁶

Piştî xebatên M. Garzonî heta naverasta sedsala nozdehem, tu xebateke rêzimanî li ser zimanê Kurdî çêbûye nayê xuya kirin. Di destpêka nîvê sedsala nozdehem de hinek gotar û mijarên gerokan, ku derbarê zimanê Kurdî, zaravayên wê (ku cîhê zimanê Kurdî di nav zimanên Îranî de bû), hatin çapkirin. Ev berhemên G. Xiyurnil, Y. Ryudîger, A. Pot, A. Xudsko, Y. Bîrîzn û yên din bûn. Naverako avan xebatan di nava berhema Kurdnasê Rûs P. Lêrx hene. Berawirdkirina bêjeyên ferhengî yên giyanewer (heywan) û cotkarîyê digel bêjeyên ferhengî yên zimanên din yên Îranî (Farisîya kevin, Avestayî, Farisîya nû û yên din) ji bo Y. Ryudîger û A. Pot eşkere bû ku zimanê Kurdî ji alîyê bêje û rêzimanê ve zimanekî serbixwe yê Îranî ye. Ev nivîskar gihîştin vê bawerîyê ku zimanê Kurdî û zimanê Farisî berê ji zimanekî (zimanê dayîk) peyda bûne û paşê ji hev cihê bûne û bûne zimanên serbixwe.³⁰⁷

³⁰⁵ Bedir Han, E. C. ,Lescot, R. (2001). *Kürtçe Gramer*, Paris, Institut Kurde De Paris, r.1-3. (Pêşgotina Kendal Nezan).

³⁰⁶ Kurdo, Q. (2013). *Rêzimana Kurdî (Kurmançî-Soranî)*, İstanbul, Nûbihar, r.17.

³⁰⁷ Kurdo, (2013).*b.n.b.* , r.17-18.

Di sala 1848'an de Xaçatur Abovyan li ser zimanê Kurdî, dîrok û etnografya Kurdan de çend nivîs di rojnameya Qafqaz de belavkirîye. Di van nivîsan de taybetmendîya civata Kurdî, digel peywendiyên malbatî, awayê jîyana wan, rewîşt (exlaq), dab û nêrît (adet) û zimanê wan sekinîye. Di dawîyê da zimanê Kurdî li ser du zaravayan (zazakî û kurmancî) dabeş kirîye û dawa zanayên cîhanê kirîye ku li ser vî gelê xanedan û zimanê wan lêkolîn bikin.³⁰⁸

Bi destpêkirina M. Garzonî şûnda li ser zimanê Kurdî û zaravayên wê, gellek lêkolîn û xebat çêbûn. Hema hema em dikarin bêjin ku hemûyan jî zimanê Kurdî endamek ji malbata zimanê Îranî hesibandine. Yek ji wan zanyaran P. Lêrx di lêkolînên xwe yên derbarê Kurdan û zimanên wan de ne, bi dûr û dirêjahî li ser dîroka wan, zimanê wan berhemên neteweyî û etnografyaya wan nivîsîye. P. Lêrx zimanê Kurdî ser pênc zaravayan ve dabeş kirîye: Kurmancî, Lorî, Kelhûrî, Goranî û Zazakî. Ji nava vana da jî; li ser Kurmancî û Zazakî lêkolîn kirîye û di her sê berhemên xwe de tekst û ferhenga Kurdî-Rûsî belav kirîye.³⁰⁹

Zimanê Kurdî di grûpa Îranî ya Hind û Îranî, binemala Hindo-Ewropî ye. Zimanê Kurdî jî wek zimanên din yên cîhanê ji diyalekt (zarav) ên mezin û piçûk pêk tê.³¹⁰ Zanayê zimanê Kurdî Tewfîq Wehbî Beg di nîvê sedsala 20'an de nexşeya dabeşkirina zaravayên zimanê Kurdî weşandiye, ku hemû herêmên Kurdîaxêv ji aliyê zaravayên wê vedigre. Tewfîq Wehbî zimanê Kurdî li ser sê zaravayan dabeş dike.

1. Kurmancî, 2. Lorî, 3. Goranî û Zazakî. Kurmancî jî li ser Kurmancîya jorîn û jêrîn dabeş dike.

1. Kurmancî ya Jorîn û Kurmancîya Jêrîn.

A- Kurmancî ya Jorîn: Zimanê Kurdên navçeya Yêrîvan, Qers, Ezirgan, Erzerûm, Meletî, Mereş, Îskenderûn û navçeya Gola Wanê hetanî Rûbarê Dîcleyê dixe ser Kurmancîya jorîn, ku ev beş, ji zaravayên Bayezidî, Botanî, Aşeteyî, Hekarî û Badînanî pêk tê.³¹¹

B- Kurmancîya Jêrîn: Nivîskar, zimanê Kurdên herêma başûrê rojhilatê Gola wanê heta Kirmanşan, Xaneqîn û Rûbarê Dîcleyê ji li ser Kurmancîya jêrîn dihesibîne.

³⁰⁸ Kurdo, (2013).*b.n.b.*, r.19.

³⁰⁹ Kurdo, (2013).*b.n.b.*, r.20.

³¹⁰ Xeznedar, M. (2001). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Hewlêr, Dezgayê Aras, r.37.

³¹¹ Xeznedar, (2001).*b.n.b.*, r. 39.

Dîyalektên Mukrî, Soranî, Silêmanî, û Sineyî (Erdelanî) û Germîyanî (Kerkûkî) dixev nav Kurmancîya jêrîn.³¹²

2- Lorî: Nivîskar Lorî li ser zaravayê Kirmanşanî, Feylî, Bextîyarî, Lekî, Kelhûrî û Mamesanî dabeş dike. Herêmen ku ev zarava lê belav bûne, ku jor de dikeve navbera Sultanabad, Dewletabad, Kirmanşan û Xaneqînê û rubarê Dicle. Ji jêr ve jî, ji Şîraz û Kazerûn heta nêzîkê kendavê ye.³¹³

3-Goranî û Zazakî: Dîyalekta Goranî jî; li ser Hewramanî, Kakeyî, Bacelanî û Zengeneyî dabeş dike. Cîjê ku van zaravayan diaxivin jî; Sineyê bigre, ji başûrê rojava heta sînorê Îraq û Îranê ye. Nivîskar ew cîhên ku zaravê Zazakî dixaxivin, wîlayeta Erzerûm, Xarpût, Bedlîs û Diyarbêkrê dide rêzê. Herwiha dîyalektên Zazakî û Goranî nêzîkî hev in û yek dihesibîne.³¹⁴

Xwedî û berpirsîyarê kovara Hawar û zimanzanê naskirî Mîr Celadet Alî Bedirxan jî, zimanê Kurdî li ser sê zaravayan dabeş dike û vê derbarê de wiha dibêje: Zaravayên zimanê Kurdî yên bingehîn sisê ne. Zaravayê welatê jorîn, zaravayê welatê jêrîn û zaravayê Dimilî. Herwekî tê zanîn zaravayê welatê jorîn Kurmancî ye û di zaravayê Kurmancî de di navbera devoka de ferqeke zêde tune ye. Ji vî alî ve Kurmancî zaravayekî yekgirtî ye. Lê zaravayê welatê jorîn (Soranî) ne wisa ye. Vî zaravayî de çend devok hene û di nav devokên vî zaravayî de jî cudatî hene. (Mîr Celadet herwiha Lorî jî di nav zaravayê Soranî de dihesibîne.) Zaravayê Dimilî yan jî Zazakî jî di nav Kurdên welatê jorîn tê axaftin û pirranîya wan zaravayê Kurmancî jî dizanin. Di vî zaravayî de jî du devokên bingehîn hene ku ew devok jî; Siwêregî û Paloyî ne. Ji ber ku devoka Paloyî de dewsa dengê “j” yê de, dengê “z” tê bikaranîn ji wan re gotine Zaza.³¹⁵

Zimanzan Samî Tan jî, zimanê Kurdî di nav malbata zimanên Îranî de dihesibîne. Ew dibêje ku zimanê Kurdî di koma bakûrê rojavayê Îranê de cîh digre. Zimanê Medî serdema kevnare, zimanê Partî serdema navîn û zimanên Kurdî, Tatî, Gilakî, Talişî jî serdema nû temsîl dikin.³¹⁶ Tan, duayekî bi zimanê Medî ku di sedsala 14'an de hatîye dîtin û D. N. Mc Kenzie jî gotarek li ser nivîsîye, ji angaştê xwe ra dike balpişt. Dua bi zimanê Medî wiha ye:

³¹² Xeznedar, (2001).*b.n.b.*, r. 39.

³¹³ Xeznedar, (2001).*b.n.b.*, r. 39.

³¹⁴ Xeznedar, (2001).*b.n.b.*, r. 39.

³¹⁵ Bedirxan, C. (1933). Zarê Dumilî, *Hawar*, (Birê Tîpên Erebi) hj.23, r.4.

³¹⁶ Tan, S. (2001). *Rêzimana Kurmancî*, İstanbul, Enstituya Kurdî, r.21.

Pakêj Xodê, pakêj zehm,

Pakêj vêmerg, koy hatî xaçê, eş kirme rehmetê ma.

Bi Kurdî ya îro:

Paqij Xwedê, Paqij zexm,

*Paqij bê mirin, ku hatî xaçê, rehmetê bike li me.*³¹⁷

Ev duayê ku Tan behs dike hebûna wî çiqas rast yan jî nerast e, li ser wî jî gengeşî hê berdewam in.

Lêkolînerê navdar Basil Nikitîn jî; Zimanê Kurdî dixê nav grûba zimanên Îranî. Ew dibêje ku zimanî Îranî jî liqek ji zimanê Hindo-Ewropî ye ku ji zimanên Kurdî, Farisî, Efxanî û Tacikî pêk tê. Dîsa wiha pê de diçe: Herçiqas ev ziman di pêvajoyeke nerênî de derbasbûbe jî; zimanê Kurdî gotinên xwe yên resen parastîye û li gel hemû astengî û rewşên nebaş, bandora zimanên Erebi û Tirkî li ser vî zimanî gelek kêmkirîye.³¹⁸

Zimanê Kurdî herçiqas di warê çapemenî û ragihandinê de bi awakî fermî nehatibe bikaranîn jî; di nav civakê de axaftina rojane û jîyana rojane da zindîbûna xwe parastîye. Bi kêmayî be jî; di warê çapemenîyê hatîye bikaranîn û de cîh girtîye. Qelsbûna di warê nivîsandinê de, xwe bi zimanê devkî, yê rojane ve tolere kirîye û nehiştîye ziman bi temamî ji bîr bibe. Lê axaftina nav gel de tesîra zimanên fermî yên dewletên desthilatdar êşkere ye. Li gor Amir Hassanpour zimanê Kurdî bi şêweyê îro, di sedsala 15'în de di warê wêjeyî da hatîye bikaranîn. Herçiqas hinek lêkolîn û lêkolîner angaştên xwe hetanî berîya Îsa biherin jî; li ser vê yekê nîqaş heye û tu tifaq li ser vê angaştê tineye.³¹⁹

Zimanê Kurdî di nav xwe de yekgirtî nîne. Heta niha standartek ji bo vî zimanê navborî çênebûye. Kurmancî, Soranî, Hewramî/Dimilî zaravayên vî zimanî ne. Xêncî van zaravayan, devokên herêmî jî gelek in. Lê dîsa em dikarin bêjin ku di nav zaravayên Kurdî de hev fahmkirin di rewşa îro de, ji bo gel hêsan nebe jî; ji bo yekî ku zimanê xwe (kîjan zarav dibe bila bibe) baş bizanibe pir hêsan e. Merivêkî ku bixwaze zaravakî din hîn bibe, dikare di navbera hefteyek û du hefteyan de bigihêje vê armanca

³¹⁷ Tan, (2001). *b.n.b.*, r.24.

³¹⁸ Nikitine, B. (1956). *Les Kurdes*, Paris, r.9.

³¹⁹ Hassanpour, (2005). *b.n.b.*, r.119.

xwe. Derbarê vê rewşê de Nikitin dibêje: “Her çendîn zimanê Kurdî belavî ser çend lehçeyan bûye jî, cardin karakterê wî yê taybetî bi awakî berbiçav tê de maye.”³²⁰

Nêrîn û tespîtên Qasimlo vê derbarê de wiha ne: “Heta niha bi awakî, yekgirtîya edebî di zimanê Kurdî de peyda nebûye. Niha jî du zaravayên serekî hene; Kurmancî û Soranî. Lehça Kurmancî di nav kurdên Tirkîye û Sûrîyê tê axaftin ku piraniya Kurdên tê de dijîn, ji xêncî dor û berê Dêrsimê, ku bi zaravayê Zazakî diaxifin, hemû Kurdên Tirkîyê digre nav xwe. Kurmancî her wiha li Surîyê û li melbenda Mûsilê li Iraqê û li melbenda bakurê Urmîyê û Iranê jî tê bikaranîn. Lehça Soranî jî; beşek ji Kurdên Îranê, piraniya Kurdên Iraqê yê ji Rewandîzê ber bi başûr û yê Îranê jî ji Urmîyê şûnve cardin ber bi başûr de, diaxivin. Heta Şerê Cîhanê yê Yekem zaravayê Kurmancî zaravayê edebiyata Kurdî bû, lê piştî qedexekirina zimanê Kurdî li Tirkîyê û Surîyê, bihêzbûna xebata Kurdên Iraq û Îranê, lehça Soranî tesîra xwe li ser edebiyata Kurdî zêde kirîye. Zaravayê Soranî di dema Komara Mehabadê de, di navbera salên 1945-1946'an de, li Îranê heta derecekê zêde pêş ket. Piştî serkeftina şoreşa 14'ê Tîrmehê ya Iraqê, ku di qanûna esasî ya Iraqê de îtîraf bi hebûna Kurdî hatibû kirin, edebîyata Kurdî di Iraqê de gelek pêş de çû û bi vî awayî Soranî bû lehça edebîyata Kurdî ya îroyîn. Pêwîst e ev yeka han jî bê gotin, ku di navbera van herdu lehçeyan de ferqek mezin tune ye û di eslê xwe de zimanek in. Ji ber ku gotinên eslî û rêzimana herduyan wek hev in. Pêwîst e bê gotin ku ferqa di navbera Kurdî - yanî Soranî- û Kurmancî de gelek besît e, Kurdekî kurmancîxêv bi hêsanî bi Kurdekî soranîxêv digihîje.”³²¹

Zimanê Kurdî, îro di nav Kurdên, hevvelatîyên dewletên wek Tirkîye, Îran, Iraq, Sûrîye û Ermenistan û Azerbeycan in tê axaftin. Xêncî van, Kurdên ku li Ewropa, Rojhilata Navîn û Qefqasya û hinek cihên cîhanê yê mayîn de dijîn, dîsa bi vî zimanî diaxivin. Ev ziman heta îro jî di nav Kurdan de hatiye parastin û bi vî zimanî ve çand, wêje, huner tên çêkirin û kar û barên rojane bi vî zimanî tên meşandin.

2.3. Elfabe yê ku Kurdan Bikaranîne

Her netewekî li gor ziman, wêje û nivîsên xwe, ji xwe ra elfabeyek çêkirîye û bi wê elfabeyê ve edebiyata xwe ya netewî saz kirîye. Kurdan jî carnan hinek elfabe çêkîrine û bikaranîne, carnan jî; elfabeyê netewê cîranên (Ereb, Latîn û Kiril) xwe

³²⁰ Nikitine, (1956). *b.n.b.*, r. 9.

³²¹ Qasimlo, A. (1991). *Kurdistan û Kurd, Lêkolînek Sîyasi û Aborî*, (Werger: Elîşêr), Balinge, Jîna Nû, r.35.

bikaranîne. Piştî pejirandina Îslamîyetê em dibînin ku berhemên Kurdî bi gelemperî, bi elfabeya Erebî hatine nivîsîn. Hinek berhemên bi elfabeyên wek elfabeya Ermenî û Suryanîyan jî hatibin nivîsîn, ev berhemanan ne ji aliyê Kurdan ve; lê ji aliyê wan netewan (Ermenî û Suryanîyan) ve hatine nivîsandin. Em dikarin wergera Încilê bi zimanê Kurdî lê bi elfabeya Ermenî û hinek pirtûkên bi elfabeya Suryanî wek mînak bidin.³²²

Berîya Îslamê Kurdan elfabeyên cuda cuda bikaranîne. Elfabeya Mixî, Elfabeya Avesta, Elfabeya Aramî û Yewnanî, Elfabeya Pehlewî, Elfabeya Bîn-û Şad û Masî Soratî, Elfabeya Kurdên Êzidî ku Pirtûkên Êzidîya yên pîroz bi vî elfabeyê hatine nivîsandin hinek ji wan in.³²³

Çavkanîya ku derbarê elfabeyên Kurdan de ji me ra agahîyan radigîhîne (vê gavê ya ku di destê me da ye), pirtûka Ibnûl Wehşîyye ya bi navê “Şewqu’l-müstehâm fî ma’rifeti rumûzi’l-eqlâm”e. Îbnûl Wehşîyye di pirtûka xwe da, wiha behsa elfabeya kurdan dike:

*“Keldanî di dewra xwe da, di warê zanistî, felsefe û teknîkê da kesên herî pêşdaçûyî bûn. Kurdên di dema antîk de hewasa wan dikirin û bi wan re hevrikî (reqabet) dikirin. Lê qasî nevbera erd û ezman, di navbera her dû gelan de mesafe heye. Lê Kurdên dema antîk jî; di hinek warên zanistî da pêşketî bûn. Evana jî ilmê çandinî û botanîk e. Angaştê Kurdan ew bû ku ji nesla Pînoşad in. Pirtûkên çandê Safarîs û Kosamî di nav Kurdan de pirr bi navû deng in. Kurd van pirtûkan nisbetê Âdem pêxember dikin. Xêncî heft pirtûkan, Kurdan angaşt dikirin ku mishefa Dewanay di destê wan da ye û di ilmê efsûnê (sêhr) da jî xwedî zanînin. Lê bi qinyata min rewş ne wisa ye. Lewra ilmê zanistî û huner bi destê Keldanîyan gihîştîye Kurdan. Di van ilman de Keldanî ji Kurdan zêdetir pêşdaçûne. Ji ber vêya di navbera Kurd û Keldanîya de dijminatî û dexesîyeke kûr û dûr heye.”*³²⁴


³²² Derbarê mijarê de berfirehî dikarin binihêrin, Mehmet Malmisanli, (1988). Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler Üzerine, **Tarih Ve Toplum**, , İstanbul, r.387-388.

³²³ Yıldırım, Y. (2013). Kürtlerin Kullandığı Alfabeler, **Kürt Tarih Dergisi**, İstanbul, hj. V, r. 15-29.

³²⁴ Zozanî, W. En Eski Kürt Alfabeti, **Kovarabîr**, 13 Nisan 2013.

Çawa ku tê zanîn Îbnûl Wehşîyye bixwe zanayekî ji netewa Keldanîya ne. Di ilmê efsûn, tilsim, kimya, antropolojî, çandinî, tarîxa olan û endezyarî yê da, xwedîyê zanîneke kûr bû. Di dema Ebbasîyan de, di nav xebatên wergerê de cîh girtî bû. Gelek pirtûk ji zimanên Kurdî û Keldanî wergerandiye zimanê Erebî. Di sala 908'an de wefat kirîye.³²⁵

Îbnûl Wehşîyye derbarê pirtûkên bi elfabeya Kurdî hatine nivîsandin, ji me ra hinek agahîyên zelal radigihîne û wiha pêda diçe: “Nivîsên dema antîk, yek ji elfabeke ku tîpên di elfabeyên din de tinebûn di nav de hebû. Li gor angaştê Kurdan bapîrên wan Pînoşad û Masi es- Soratî bi vê elfabeyê ve berhemên xwe nivîsîne. Hinek tîp hebûn ku em di elfabeya Erebî û yên din de rastî wan û hevşeweyê wan nehatine. Bi rastî jî, ev elfabe, elfabeke balkêş û cuda ye. Dema ku ez li Bexdayê bûm, di nav gorekî de rastî 30 pirtûkên bi vî elfabeyê hatibûn nivîsandin hatim. Ev elfabe ya ku ez behs dikim ev e.”³²⁶



Elfabeya Masî-Soratî

³²⁵ Zozanî, h.n. 13 Nîsan 2013.

³²⁶ Zozanî, h.n. 13 Nîsan 2013.

Ev 30 pirtûk kîjanin û mijar û naveroka wan çi bûn em pê nizanin. Lêbelê Îbn'ûl Wehşîyye pirr hindik, derbarê wan pirtûkan de jî agahîyê ji me ra radigîhîne.

Li Şam'ê du pirtûkên min ên bi vî elfabeyê hatibûn nivîsandin hebû. Yek ji wan derbarê çandinîya rezên tirî ya(bax) û çikandina darên xurma bû. Ya din jî li ser rêbaza dîtina çavkanîyên avê, ew kanîyên ku cîhê li dizên ne diyarderxistina wan e. Min ev pirtûk ji Kurdî wergerande zimanê Erebi. Lewra min dixwast merivahî jî; ji wan berhemên sîd bigre.³²⁷

Ew pirtûkên ku Ibn'ûl wehşîyye behs dike:

-Eflahûl Kermî Wen- Nexl

-Î'lelûl Miyah We Keyfîyyetû Istixracîha We İstinbatîha Min-el Eradil Mechuletil Esl' in.

Di vir da pirr zelal diyar dibe ku Kurdan beriya elfabeya Erebi, elfabeyek ku ne Erebi û ne jî dişibihe elfabeyên din bikar anîne. Ev elfabe li gor ziman, qirik (gewrî), deng û sentaksa zimanê Kurdî çê bûye. Kurdan bi vî elfabeyê gellek berhem jî nivîsîne. Lê di hinek dewran de elfabeyên curbecur jî bikaranîne. Ev elfabeya hinek caran yê cinarên wan bûne, hinek caran jî bi rêya ol guherandinê (wek islam) elfabe pejirandine û berhem bi van elfabeyên nû hatine nivîsandin.

Xêncî elfabeya ku Îbn'ûl Wehşîyye behs dike, çawa ku min li jor behs kiribû; Kurdan hinek elfabeyên din jî bikaranîne. Elfabeya ewilî ya mixî ye ku Sumerîyan ev elfabe çê kiribûn û ji 36 tipan pêk dihat. Di navbera salên B.I. 3000-600 de gellek netewan ev elfabe bikaranîn. Lê Kurdan 6 tip li vî elfabeyê zêdekirin û li gor zimanê xwe bi vî elfabeya mixî ve nivîsandin.³²⁸ Li gor Cemal Reşîd Ehmed, Kurdan berîya Îsa sedsala 4'an de elfabeya mixî berdan, dewsa vî elfabeyê da elfabeya Aramî û Yewnanî bikaranîn.³²⁹

Elfabeya ku di pirtûka Îbn'ûl Wehşîyye da ji behsa wî tê kirin elfabeya Pinoşad (Bîn-û Şad) û Masî Soratî ye. Ev elfabe ji 37 tipan pêk dihat û ji alîyê rastê ber bi aliyê çepê dihat nivîsandin. Îbn'ûl Wehşîyye dibêje min 30 pirtûk dîtin ku bi vî elfabeyê hatibûn nivîsandin.³³⁰

³²⁷ Zozanî, h.n. 13 Nîsan 2013.

³²⁸ Yıldırım, (2013). Kürtlerin Kullandığı Alfabeler, *Kürt Tarihi Dergisi*, İstanbul, , hj. 5, r.15-20.

³²⁹ Yıldırım, (2013). b.n.b. , r.26.

³³⁰ Yıldırım, (2013). b.n.b. , r.28.

Elfabeya ku Med'an çêkirîye elfabeya Avesta ye. Ev elfabe ji 44-45 tîpan pêk tê. Xêncî kurdan gellek qewmên Îranî ev elfabe bikaranîne. Dîsa elfabeyeke neteweyên îranî ku Kurdan jî bikaranîne, elfabeya Pehlewî ye. Ev elfabe ji 24 tîpan pêk tê. Di navbera sedsalên 3. û 7. de Kurdan bi vê elifbayê ve hinek pirtûk nivîsîne. Ev pirtûkana bi zaravayê Goranî- Feylî hatine nivîsandin. Zend- Avesta, Pendnamegî Zaradûşt, Mînokî Xîred, Dînkêrd û Bondhîşîn hinek ji van pirtûkanin.³³¹ Elfabeyeke xwemalî, ku Kurdên Êzîdî bikaranîne elfabeya Êzîdî ye. Ev elfabe ji 31 tîpan pêk tê. Ji ber elfabeyên Avesta, Pehlewî û Erebi hatîye girtin. Ji aliyê rastê ber bi aliyê çepê tê nivîsandin. Kurdên Êzîdî Cilwe, Mishefa Reş û hinek pirtûkên xwe yên din bi vê elifbayê nivîsîne.³³²

Elfabeya ku Kurdan piştî pejirandina dîne Îslamê, bikaranîne elfabeya Erebiye. Ev elfabe ji 28 tîpan pêk tê û ji aliyê rastê ber bi aliyê çepê tê nivîsandin. Lê kurdan 5 tîp li vê elfabeyê zêdekirine (p-ç-j-g-v), li gor deng û zimanê Kurdî têkuz kirine û bi wî şeweyî bikaranîne. Piştî qebûlkirina dîne îslamê heta destpêka sedsala 20'an li nav Kurdan de, nivîsên Kurdî bi tîpên erebî bûn. Piştî sedsala 20'an hinek xebatên ji bo elfabeyek netewî hatin kirin. Xebata komelaya Hêvî (1910) em dikarin bêjin ku hewldana yekemîn e ji bo çêkirina elfabeyek Kurdî. Di sala 1913'an de xwendevanên Kurd projeyek ji bo elfabeyek Kurdî pêşniyar kirin û ev pêşniyarî di kovara Rojî Kurd da belav bû. Bi îmzeya M. S. Azîzî rêbaza elfabeyê wek pêşniyarî hatibû nîşan kirin.³³³

Di sala 1920'an de li Tiflîsa paytexta Gurcistanê, Lazo Kazaryan ji bo Kurdên Qafqasyayê li ser bingeha tîpên Ermenî elfabeyek çê kir. Serî da ev elfabe di dibistanek -ji bo zarokên Kurda hatibû vekirin- da hat bikaranîn. Pirtûkek bi navê “Şems” bi vî elfabeyê hatibû çapkirin.³³⁴ Hinek nivîsên kurdnasên rojavayî bi tîpên latinî hatibûn nivîsandin, lê ewana tu car ji bo Kurdan nebûn elfabeyek standart ya Kurdî. Hinek Kurdên Îsraîl jî; li ser bingeha tîpên Îbrî (Ibranî) elfabeyek çêkirin. Hinek pirtûk bi vê elfabeyê hatin çapkirin û belav kirin. Ew kesên ku şarezayê vê elafbeyê ne, ji van pirtûkan sûd vergirtin.³³⁵

³³¹ Yıldırım, (2013). *b.n.b.*, r.28-29.

³³² Sağınç, F. H. (2002). *Diroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol, Enstitûya Kurdî, r.28.

³³³ Azîzî M.S. (Bihar 2003). Harflerimiz ve Okuma Kolaylığı, *Rojî Kurd*, (Transkripte û wer: Meretowar, A.) hj.2, r.95-96.

³³⁴ Xeznedar, (2001). *b.n.b.*, r.40.

³³⁵ Xeznedar, (2001). *b.n.b.*, r.40.

Di sala 1923'an wezareta perwedeyî (Iraq) ji zimanzan Tewfîq Wehbî xwast ku; rêzimana zimanê Kurdî çê bike. Bi navê "Kurteya Rêzimana Kurdî" berhemek hat belavkirin. Di vê elfabeya ku hatibû bikaranîn de dengdêr hebûn lê gelek kêmasî di vê elfabeyê da jî hebûn.³³⁶

Di sala 1929'an de zimanzanê Ermenî Îshaq Margulov û nivîskarê Kurd Erebe Şemo, li ser bingeha elfabeya latînî, elfabeyek ji bo kurdan çê kirin.³³⁷ Ev elfabe di warê perwerdeyê, çapê û hemû cureyên nivîsandinê da hat bikaranîn. Rojnameya Rêya Teze heta sala 1945'an bi vê elfabeyê çap bû. Di 1945'an şûn da elfabeya Rûsî (Kiril) dewsa vê elfabeyê da hat bikaranîn.³³⁸

Әльфавје тәзә курманҷи НОВЫЙ КУРДСКИЙ АЛФАВИТ					
Aa Aa А	Vv Vv В	Cc Cc Ч	Єє Єє ТЧ єəгт (кожа)	Çç Çç ДЖ çer (кувшин)	Dd Dd Д
Ee Ee Е	Əə Əə МЯГКОЕ А əм (мы)	Ff Ff Ф	Gg Gg Г	Oj Oj Г МЯГКОЕ тəсјвəр (кладбище)	Hh Hh ХЫ нəсп (лошадь)
Ii Ii И	Ьь Ьь Ы ды (сердце)	Jj Jj Ж	Kk Kk К	Qq Qq ТВЕРДОЕ К qer (нож) qaz (гусь)	Qq Qq КЫ qaz (гусь)
Ll Ll Л	Mm Mm М	Nn Nn Н	Oo Oo О	Өө Өө О МЯГКОЕ хəсə (вкусно)	Pp Pp П
Pp Pp Р рəгə (мост)	Rr Rr Р	Ss Ss С	Şş Şş Ш	Tt Tt Т	Тt Tt Т ТВЕРДОЕ ter (хурджин)
Uu Uu У	Yy Yy МЯГКОЕ У духьт (кушая)	Vv Vv В	Ww Ww WƏRЬS (БЕРЕВКА)	Xx Xx Х	
Zz Zz З	Žž Žž Ж				

Elfabeya Margulov & Erebe Şemo

³³⁶ Xeznedar, (2001). *b.n.b.*, r.41.

³³⁷ Margulov û Erebe Şemo, (1929). *Xa- Xa Xwandin û Nivîsara Kurmançî*, Rewan, Neşra Dewleta Şewra Ermenistanê, r.57-58.

³³⁸ Xeznedar, (2001). *b.n.b.*, r.41.

Sala 1932'an de Herekol Azîzan (Celadet Bedirxan), li ser bingeha tîpên latînî elfabeyek çê kir û pirtûkek bi navê “Rêzimana Elifbêya Kurdî” li Şam’ê çap kir. Ev elfabe li ser zaravayê Kurmancî hatibû ava kirin û kovara Hawar jî bi vê elfabeyê dihate çapkirin. Îro jî ew nivîsên ku bi tîpên latînî tên nivîsandin, li ser hîmê elfabeya Mîr Celadet Bedirxan dewam dikin.

Zimanê Kurdî li Iraq û Îranê bi tîpên Erebî, li Surîyê bi tîpên Erebî û Latînî û li li nav kurdên Sovyeta berê jî bi tîpên Rusî (Kiril) tê nivîsandin. Li Tirkîyê jî bi tîpên Latînî û di medrese û pirtukên dînî de bi tîpên Erebî tên nivîsandin. Abdurehman Qasimlo vê yekê li ber yekkirina zimanê Kurdî wek asteng dibîne. “Bêguman ji ber nebûna awayek nivîsandina yekgirtî ji bo zimanê Kurdî, tesîrek xerab ji bo pêşdeçûyîna ziman heye û di rastîya xwe de ev yek astengek mezine ji bo pêkhatina zimanek yekgirtî ya wêjeya Kurdî ye.”³³⁹

Niha jî Kurd çapemenîyê de sê elfabeyên sereke bikartînin. Kurdên Tirkîyê elfabeya latînî, yên Surîyê elfabeya erebî û latînî, yên Iraq û Îranê jî elfabeya erebî, (heta demên nêzîk de) Kurdên Qafqasyayê (Sovyeta berê) jî elfabeya kirilî bikartînin. Lê ji ber pêşveçûyînên amûrên ragihandinê, (bi taybet înternet û medya civakî) em dikarin bêjin ku gellek kurdên Iraq û Îranê jî, bi tîpên latînî dikarin bixwînin û binivîsin. Ji xwe medya Herêma Kurdistana Iraqê, weşanên xwe bi her du tîpan ve jî dikin. Ev yek jî Kurdan ji bo bikaranîna yek elfabeyekî (ku ev jî wisa dixuyê ku latînî ye) digihîne hev. Wisa dixuyê ku mêla pirranîya rewşenbîr û nivîskarên Kurdan jî, li ser bikaranîna tîpên latînî ne. Lê li ser vê yekê heta îro jî lihevhatin û yekrêzî çênebûye. Lewra ew kesên ku dixwazin bi tîpên erebî ve bixwînin û binivîsin jî hejmareke kêr nînin.

Yek ji wan siyasetvan û rewşenbîran, ji Kurdên Îranê, Dr. Abdurehman Qasimlo vê mijarê de fikrên xwe wiha îne ziman:

“Aşkera ye tîpên Latînî, ji bo nivîsîna zimanê Kurdî, ji hemû tîpên din baştir e. Hinbûna zimanê Kurdî hinek rehet e, eger tîpên Latînî bê bikaranîn, nexwendewarî zêdetir ji holê radibe û biyanî jî hîn hêsanîtir zimanê me hîn dibin.”³⁴⁰ Lê kesên ku wiha nafikrin jî gellekin.

³³⁹ Qasimlo, (1991). *b.n.b.*, r. 35.

³⁴⁰ Qasimlo, (1991). *b.n.b.*, r.35.

2.4. Bandora Hawarê Li Ser Zimanê Kurdî

*“Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me, dê bide nas kirin. Lewra ku Ziman şerta heyînê, a pêşîne”*³⁴¹ ev gotin, sebebê heyîna kovara Hawarê ye. Hawar hebûna milletan bi ziman ve girê dide. Sebebê weşana kovarê, rêbaz û naveroka wê jî, ji xwe li ser vê hîmî hatîye avakirin.

Xweyî û berpirsîyarê kovara Hawarê, Mîr Celadet Alî Bedirxan, ziman wek şertê hebûnê yê ewil dinasîne. Ew, vê gotina xwe bê bingeş nahêle û sebebê wê jî bi awakî balkêş ji xwendevanan re rave dike. *“Çawa tê zanîn fikr û hîs di dora ziman de xwe digihînin hev û her ziman fikr û hîsên xwe û awayê gotina xwe bi xwe ra hildigire û ew pê re diguhêzin û pey zimanê xwe dikevin. Bi vî awayî digel zimanî fikr û hîsên biyanîyan jî dikevin nav me, di dil û hîşê me da cîh digrin û rû û gonê me ên manewî diguherînin, diheşîfnin.”*³⁴²

Heşifandin û asîmîlekirina netewan bi ziman ve pêk tê. Ew mîletên zimanê xwe jibîr kiribin êdî hatine pişavtin û asimîle bûne. Milletek di çi rewşê da be bila bibe, divê zimanê xwe wînda neke. Ev yek di kovara Hawarê de gellek cîhên cuda cuda de bi awayên cuda û balkêş ji xwendevanan re hatîye gotin. Girîngîya vê mijarê carnar wek şîretan û carnar jî wek diruşmeyên bi tesîr hatîye ziman.³⁴³

Nivîskarê Hawarê Dr. Kamiran Bedirxan jî; di nivîsa xwe ya bi navê “Di Dora Hevxistina Zimanan” bi gelemperî li ser hemû zimanan, lê bi taybetî, li ser zimanê Kurdî û rewşa wî de hûr bûye. Ev nivîs ji bo li serpê mayîn, parastin, pêşdebirin û geşkirina ziman nivîseke cuda û balkêş e. Ev meqale, di heman demê de, nîşan dike ku kovara Hawar, ji bo parastina ziman ketîye nav xebateke mezin û xebata wê ya herî mezin jî; li ser zimane. Di vî xebatê de kovara Hawar naxwaze tu peyveke ziman, êdî ji dest here û wînda bibe. Di tekoşîna navbera zimanan de zimanê Kurdî bindest bibe û ji holê rabe. Ev nivîs ji bo xebatên Hawarê, yê derbarê ziman û rêbaza wê ya li ser parastina ziman gelek balkêşe.

“Ziman jî wek her tiştî li hev dixin, navbera wan tune, her dem di şerî de ne. Ji ber ku her ziman dil dike mezintir bibe, hawîrdorên xwe fireh bike, bikeve ser lîvên nû, serên nû. Ji ber vê yekê jî ziman dixawazin, zimanên din ji

³⁴¹ Bedirxan, C. (1932). Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê, **Hawar**, hj.1, r.1.

³⁴² Bedirxan, K. (1932). Edebiyata Welatî, **Hawar**, hj.1, r.5

³⁴³ Bnr. Bedirxan, C. (1932). Di Dora Hevxistina Zimanan De, **Hawar**, hj. 3, r.2.

holê rakin û bikevin şûna wan. Dîroka dinê, ji me re dide zanîn ku heta niha gelek zimanên dinê hatine kuştin. Ji wan zimanan re "Zimanên Mirî" dibêjin. Pevçûn û hevxiştina zimanan, kerrekerr û bêdeng e. Belê, ev şer bê deng e, bê top û tifîng, bê balafr û mitralyoz e. Lê belê hikmê wî; ji her şerî bêtir, mezintir û xirabtir e. Di şerê zimanan de, rihê zimanan tîn standin, xurtîya dil û canên wan tîn şikênandin û pêta heyîna wan tîn vekuştin.

Zimanên ku li hev dixin dest bi kuştina pirs (peyv) ên hev dikin. Dil dikin, herçend heye ewçend bikevin hindurê zimanên din, tê de cîh bibin. Hêdî hêdî bikevin kûrîyên wî zimanî û di paşîyê de çarkenarên wî bigirin. Ewî jî hîm û rîknên wî hildiweşînin û ser xerabeyên wî avayîkî nû ava dikin û tê de, di nav wê avahîya nûjen de dibrûskin. Herçend zimanê me ne keti be bin vê talûkeyê jî, heke em miqate mebin, dê bikevê. Berî ewilî, gelek pirsên biyanî hene ku ketine nav zimanê me. Gelek kurdan zimanê xwe ji bîr kirine, pê nikarin bixwînin, binivîsîn. Ev hal dawîya hevxiştina zimanan e. Ma zimanê me ne spehî ye? Ma Kurd xwendin û nivîsandinê nizanin? Ma ji bo her tiştî nav û peyveke kurdî nîne? Çawan nîne? Belê heye. Lê belê, zimanê me di hevxiştina zimanan de, hinek kêrî kirîye. Gelek kurd hene, ji zarokên xwe re bi zimanekî biyanî diaxivin. Ew kesên ku vî awayî dikin, xwe davêjin bin hikmê zimanên biyanîyan.

Kurd halê şerî rind dizanin. rikeber bi derbekê nakeve. Di hevxiştina zimanan de jî wisa ye. Her pirs kozîkek e, û her pirs ku em pê emel nakin ji zimanê me dikeve û wînda dibe. Li şûna wî pirsêke biyanî tê û dikevê, welê kozîkek ji destê me diçe. Bi pêveçûna vî halî, kozîk yek bi yek ji destê me dertên û paşê bi tevayî em şargeha xwe wenda dikin. Yanî zimanê me wek merivekî birîndar, nexweş dikeve û dimire. Vêca ji bona vejandina zimanê me divê kurd hemî, gava diaxêvin, yan

dinivîsîn, bala xwe bidin, û pirsên ne kurdî tev li zimanê xwe mekin.

Bi vî awayî, zimanê me pirsên xwe yên jibîrkirî an windabûyî ji nû ve peyda dike. Ji mile din jî pirsên nû dizên û bi vî halî zimanê me vedigere ser xurtîya xwe a pêşîn.

*Miletekî dîl ku zimanê xwe winda ne kiriye, wek girtîyek e ku mifta zindana xwe bi xwe re hilanîye. Zimanê me gelek kevn e, zimanekî dewlemend, spehî û freh e. Lê em zimanê xwe rind nizanin. Me ew hêj nas ne kirîye. Berî her tiştî divêt em hînê zimanê xwe bibin da ku bikarin wî nas bikin û bidin nas kirin.*³⁴⁴

Dr. Kamîran Bedirxan vê gotara xwe ya li ser ziman, bi beyteke Ehmedê Xanî ya li jêr diqedîne:

"Ev meywe eger ne abdar e.

*Kurdmancî ye, ev qeder li kar e."*³⁴⁵

Dr. Kamiran Bedirxan ji bo vejîna zimanê Kurdî, xwe dispêre Ehmedê Xanî û wiha dibêje: "Ehmedê Xanî berîya sêsed salî ev rê ji me ra vekirî bû. Lê heyf paşîyên wî, pey wî neçûn".³⁴⁶ Herwiha ew jî wek Xanî, bi xurtbûna zimanê Kurdî bi bawer e,

Safî şemirandî vexwarî durdî,

*Manendê Derî³⁴⁷ lisanê Kurdî.*³⁴⁸

Yan jî;

*Manendê durre lisanê Kurdî.*³⁴⁹

³⁴⁴ Bedirxan, K. (1932). Di Dora Hevxistinê Zimanê De, *Hawar*, hj.3, r.1-4.

³⁴⁵ Bedirxan, K. (1932). Di Dora... *h.n.*, r.1-4.

³⁴⁶ Bedirxan, K. (1932). Edebiyata Welatî, *Hawar*, hj.1, r.5.

³⁴⁷ Zimanê "Derî" zimanê farisî yê resen e. Her çiqas zimanê Kurdî ji alîyê nivîsandinê de, wê demê qels be jî, Xanî zimanê xwe bi qasî zimanê Farisî xurt dibîne. Hinek berhemên de ev beyt wek "Manendê Durre lisanê Kurdî" hatiye nivîsandin. Di Hawarê de dewsa peyva "durr" de, peyva "derî" hatiye nivîsandin. Li gor min jî ya rast ev e. Xanî zimanê Kurdî, di her alîyê ve ji zimanê Farisî kêmtir nabîne û ji ber wê dibêje "manendê derî" yanî zimanê Kurdî, di asta zimanê "Derî" da ye. Heke "durr" bê nivîsandin wê çaxê di navbera "durd" û "durr" de dijayetî çê dibe, wate tam cîbicîh nabe.

³⁴⁸ Bedirxan, K. (1932). Edebiyata... *h.n.*, hj.1, r.5.

³⁴⁹ Ehmedê Xanî, Mîzanul Edeb, (bi nivîsa Zeynelabidîn Amedî 1990), cihê çapê û sal nedîyare, r.20.

Wisa dixuyê ku xwedî, berpirsiyar û nivîskarên Hawarê jî, piştî sêsed salî ketine şopa Ehmedê Xanî. Ew ji her tiştî zêdetir, ji zimanê xwe bawerin. Wisa tê fahm kirinê; ev bawerî jî, ji xurtbûna ziman dihat. Lewra Celadet Bedirxan xêncî zimanê Kurdî heşt zimanê din jî dizanibû û bi pisporî dikaribû zimanê Kurdî û yên din berawirdê hevdu bikira. Li gor wî, ew kesên ku derbarê vî zimanî de nivîsîne ligel tiştên rast, tiştên nerast jî nivîsîne. Ew angaşt dike ku; ewana zimanê Kurdî, ne qasî wî dizanibûn, ne jî xêncî zimanê Kurdî bi qasî wî, zimanên din dizanibûn. Mîr Celadet Bedirxan vêya di hejmara Hawarê ya yekem de tîne ziman: “Ez ku kurdmanczimanîm û zimanê xwe rind dizanim û min ew bi heft heşt zimanên din danîye ber hev, kitkitên wî hûr hûnandine; qeydeyên wî jî, hev derxistine. Dikarim ji biyanîyan bêtir û qenctir dehkera wî bidim xuyakirin û zanîn.”³⁵⁰ Mîr Celadet jî 300 sal piştî Ehmedê Xanî, li gel zanîna heft-heşt zimanên navsere, ew hemû ziman danî alîyekî, bi zimanê xwe nivîsî. Xêncî nivîsandinê bi xebatên xwe yên derbarê vî zimanî ve ew ziman ji nû ve vejand, xiste duzanê, elfabeyek û bingeheke nû jê re çêkir. Dibe ku zimanê Kurdî bi van xebatan ve cîhê xwe di nav zimanên cihanê de xurt kir û ev zimanê nivîskî, bû zimanekî nûjen û bi rêk û pêk.

Hawar û gerîndeyê wî Mîr Celadet Bedirxan, piştî pêhisandina girîngîya ziman û hişyarkirina xwendevanan awayê xebata xwe û rêbaza wî jî radixe ber xwendevanan.

1. Pêwistîya elfabeyek nû û belavkirina vê elfabeyê di nav millet de. Lêkolîna zaravayên Kurdî û berhevdanîna wan.
2. Cihê zimanê Kurdî di nav zimanên Arî de. Bingeheke zimanê Kurdî, dîrok û awayê rabûn û pêşketina wî.
3. Berhevkirina çîrok, lawij û stranên Kurdî û belavkirina wan.
4. Dabeşkirin û belavkirina dîwanên Kurdî û jînenigarîya şair, nivîskar û merivên din yên bijarte.
5. Lêkolîna li ser folklor û stranên Kurdî.
6. Lêkolîn li ser dîrok û erdnigarî.
7. Lêkolîn li ser hunerên Kurdî.³⁵¹

Bingeheke awayê xebata Hawarê bi vî şêweyî, di bin heft xalan de pê da diçe. Di vê pronivîsa bingeheke xebatê de dixuyê, Hawar xebatên xwe, bi awayekî pisporî û

³⁵⁰ Bedirxan, C. (1932). Armanç, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê, **Hawar**, hj.1, r.1.

³⁵¹ Bedirxan, C. (1932). Armanç, Awayê..., *h.n.*, r.1.

zanistî bi rêve dibe. Wisa dixuyê xebateke bi vî awayî, di pêvajoya xebatên li ser zimanê Kurdî de, berîya Hawarê nehatine kirin.

Xebatên Hawarê yên li ser ziman, xebateke piralî ye. Armanca kovarê ewe ku bi ziman ve perwerdeya milletê xwe, pêşdebirina wî ya edebî û çandî têxe rêyeke têkûz û bibe serî. Hawar pêşdeçûyîna milletê Kurd tenê bi yekkirin û xurtkirina vî zimanê de dibîne. Dibe ku xwestibin armancên xwe yên siyasî jî bi vê rêyê bibin serî. Kovar vê armanca xwe, raste rast tîne ziman û dibêje: “Millet, tenê dikarin heyîna xwe bi ziman ve biparêzin û bend tenê ziman e.”³⁵²

Me çawa ku gotibû kovara Hawar yekîtîya milletê xwe, girêdaye yekîtîya ziman. Ji bo vê jî hewl û xebat li ser vê yekê ye. Nivîsa Hevîndê Sorî, derbarê vê mijarê de bi zaravê soranî û kurmançî bi hevra hatîye nivîsandin. Di vê nivîsê de, ji hemû rewşenbîr û zanayan tê xwestin ku bersîva van pirsan ji alîyên wan ve bên dayîn.

“Hun dizanin ku pêpeluka yekîtîyê a pêşîn, belkî ya mezintir jî yekîtîya zimên e. Bê yekîtîya zar û zimên yekîtîya netewî çê nabe. Herwekî li Elmanya, Italya û di hikûmetên din de hetanî ku zar û ziman ne bûne yek û di navbera wan de zimanekî tevayî peyda ne bû, yekîtîya wan ne çû serî. Dîsan ji we re nas e ku armanca vê kovarê ya mezin nêzîkkirina zarên Kurdî û pêkanîna yekîtîya zimanê Kurdî ye.

Edî ev armanca ha ne tenê armanca kovarê ye. Lê belê armanca hemîyan e û bendewariya wê digel her Kurdî heye. Ber vê yekê, em ji we, ji hemî kesên ku dilê wan ji bo milletî disojit û dixwazit navê milletê xwe bilind bikit, hêvî dikin, li van sê pirsîyarîyên jêrin vegeirînin;

1- Zimanê Kurdî çawan xwerû û pak dibe?

2- Bi çî awayî zarên Kurdî, yên cihê dikevin nîzingî hev û zarekî welê tête pê ku Kurd hemî di zarên hev digehin.

3- Zimanê Kurdî çawan pêş ve diçe û bi çî awayî bi ser dikeve?”³⁵³

Piştî belavkirina vê nivîsê di hejmarên hatî de ji gellek kesên rewşenbîr, nivîskar û zimanzan bersîv ji kovarê re hatin û ji bo pêkhatina yekîtîya ziman pêşnîyarî û daxwaz hatine nivîsandin. Hinek ji wan bersîvên ku hatine, wek me li jêr nivîsîye:

³⁵² Bedirxan, C. (1933). Heyîneke Yeksalî, **Hawar**, hj.20, r.1.

³⁵³ Sorî, H. (1932). Sehitî, **Hawar**, hj.16, r.1.

1- Peyvên ji zimanê bîyanî, ji nav Kurdî bên derxistin û di şûna wan de ji hemû zaravayên Kurdî peyv bêne bijartin û bikaranîn.

2- Berî her tiştî, divê zaravayekî Kurdî ji bo xwendin û nivisandinê bibijêrin, piştî peyvên zaravayên din jî bixin nav wî zaravayî.³⁵⁴

Xêncî van xebatan, divê zimanê Kurdî bi awayê xebatên li jêrîn hatine rêzkirin pêşve here û bi serkeve.

a- Berhevkirina helbest, gotin û şîretên bav û kalan, ku kanîyeke edebîne dê bigêhêje û bikeve destê her nivîsevanî.

b- Çêkirina dibistanan di nav hemû bajar, gund û eşîran de.

c- Wergerandina kitêbên biyanîyan yê hêja bi zimanê Kurdî.

d- Belavkirina rojname û kovaran.

e- Damezrandina du civatên cihê, zanist û dînî. Ev her du civat bi hîlbijartina peyvên kevînar û peyda kirin û li hevedudanîna peyvên nû de mijûl bibin.³⁵⁵

Dîtin û nêrînên nivîskarên kovarê û di heman demê de yek ji pêşdehatîyê ziman û wêjeya vî zimanî Osman Sebrî jî wiha ne:

1- Yekîtiya elfabeya Kurdî.

2- Heçî xortên Kurdan yê ku îro bi zimanê Kurdî re bendewar dibin, ji kurdên her welatî, divê xortek bê bijartin û ji van xortan civateke zanistî were avakirin.

3- Di vê civata zanistî de berî her tiştî ferhengeke mezin, di piştî re kitêbên kevînar û nûjen, temamên wan li ser hemû zaravayên Kurdî bên belav kirin û di piştî re bi yekîtiya zimanê Kurdî mijûl bibin. Bi vî awayî heya deh salan di xwendinê de yekîtiya û di axaftinê de nêzikayîyê, hêsanî dibînim.³⁵⁶

Nêrînên Cegerxwîn ji nêrînên kesên din ji hev cuda ne. Ew jî dixwaze ku hemû zaravayên vî zimanî bibin yek; lê rêbaza ku ew pêşniyar dike, rê û rêbazeke cuda ye. Ew dixwaze kongereyek li ser zimanê bê darxistin û vê kongreyê de nêrîn û nîqaşên li ser ziman bîn kirin. Cegerxwîn nêrînên xwe wiha rave dike:

1- Gereke civatek ji hemû tebeqeyên gel çêbe, seyda, zana û merivên ku zaravayên Kurdî tevî dizanin tê de kom bibin.

³⁵⁴ Gewrî, E. S. (1933). Sehîfî-2, *Hawar*, h.22, r.1.

³⁵⁵ Gewrî, (1933). *h.n.*, r.1.

³⁵⁶ Sebrî, O. (1933). Sehîfî-3, *Hawar*, h.22, r.2.

2- Devokeke Kurdî ya şêrîn ku pirranîyê millet bi vê devokê diaxivin bibijêrin, devokên din bikujin. Heke peyvek kêr be em dikarin ji zimanê kuştî bistînin.

3- Heger em wiha bikin du milyon kurdê zehmetîyê bikişînin, ger em ji temami zaravayan zimanekî çêkin 9-10 milyon Kurdê zehmetê bibînin. Çawa ku milletên din ji zaravayek xweşik hilbijartine yêrî din kuştine emê jî wisa bikin. Em dikarin di kongreyê de hê tiştên din jî bêjin û delîlan nîşan bikin fikrên xwe berfireh bikin.³⁵⁷

Lacê Henê, belavbûna Kurdan ya li nav çend dewletan û zêdebûna zaravayan wek dewlemendîyê dibîne. Sebebê cudabûna zaravayên Kurdî û çareserîya vê yekê dinivîse. Çiqas zaravayên Kurdî hene, wek Kurmancî, Babanî, Zazakî, Lorî, Feylî, Bextîyarî, Hewramanî û yêrî din, divê hemû bîr berhevkerin û bi usuleke zanistî li ser van zaravayan bi kêrî du sê pirtûk bîr nivîsandin. Paşê zimanekî yekgirtî bê çêkirin û peyvên bîyanî jî ziman bîr derxistin. Zimanekî xwarû Kurdî bê çêkirin.³⁵⁸ Di vê nivîsa xwe ya dirêj de Lacê Henê jî bo yekkirina zarava û devokên ziman û pêşdebirin û serketina zimanê Kurdî nêrînên xwe bi dirêjahî, di beşa tîpên erebî de nivîsiye.

Bersîvên li ser lêkolîn û pêşniyarîya yekkirina zimanê Kurdî, di hejmara 21'an ve dest pê dike. Di vê derbarê de gelek pêşniyarî û nêrînên cuda cuda û balkêş hatine nivîsandin. Lê hemû nêrîn û pêşniyarî li ser yekbûna zaravayên ziman û rê û rêbazên vê xebatê ne. Yek ji wan pêşniyarîyan jî ya Lawikê Kurd e ku ew jî vê derbarê de gelek xalên zanistî rêz dike û jî bo yekkirina zimanê Kurdî pêşniyar dike.³⁵⁹

Em dikarin van nêrîn û pêşniyarîya bi kurtasî wiha rêz bikin.

- 1- Berhevkerina peyvên ji nav wêjeyê û folklorê û çêkirina peyvên nû.
- 2- Derxistina peyvên bîyanî jî nav ziman û bicîhkirina peyvên xwemalî li şûna wan.
- 3- Damezrandina civakeke zanistî û xebatên çêkirina ferhengeke berfireh.
- 4- Bijartina zaravayekî yan jî bi hev xistin û hemû zaravayan û çêkirina zaravayekî nû; ku hemû gel tê bigihêje û xurtkirina vî zaravayî.
- 5- Çêkirina elfabeyê yekgirtî û belavkirina pirtûk û rojnameyan bi vî elfabeyê.

Kovara Hawar zaten di serî de, ji bo yekîtiya ziman bi zaravayên Kurmancîya Jêrîn (Kurmancî) û Kurmancîya Jorîn (Sorani) û hinek hejmaran de jî bi Kirmanckî

³⁵⁷ Cegerxwîn, (1933). Sehîfê-4, (birê erebî), *Hawar*, hj.23, r.6.

³⁵⁸ Henê, L. (1933). Sehîfê-5, (birê erebî), *Hawar*, hj.23, r.7-8.

³⁵⁹ Lawikê Kurd. (1933). Sehîfê-1, (birê erebî), *Hawar*, hj.21, r.1.

(Zazakî-Dimilî) nivîsan diweşîne. Nivîsên bi her du zaravayên sereke (Kurmancî-Soranî) ji xwe, her hejmarî de zêde ne. Lê di hejmara 23'yan, di birê tîpên Erebi de, Mîr Celadet Bedirxan bi xwe nivîseke dirêj bi sernavê “*Zarê Dumilî û Mewlûda Usman Efendî*” li ser vî zaravayê Kurdî nivîsandîye û derbarê zaravayê Zazakî-Dimilî de gelek agahîyên balkêş dane. Hejamara 23'an, bi berfirehî 6 rûpel ji bo zaravayê Zazakî hatîye terxan kirin. Berhema ku cara ewilî bi zaravayê Zazakî hatîye nivîsîn Mewlûda Cenabê Pêxember (a.s) e, ku ji aliyê Usman Efendîyê Babij ve hatîye nivîsandin. Hawar di vê hejmarê de vê berhemê dide nasandin û serpêhatîya pêvajoya çapkirina vê berhemê ji xwedeveanan re radigihîne.

Nivîskarê vê nivîsê Mîr Celadet Bedirxan radigihîne ku ewî, “Mewlûd” gelek caran xwendîye, li ser hûr bûye lê dilê wî lê rûneneştîye ku vê berhemê binivîse û bide ber çapê. Armanca wî ewe ku bi alîkarîya yekî pişpor vê daxwazê bîne cîh. Piştî 4-5 salan ew rastî Mela Mihemed Nezîrê Dêrşewî³⁶⁰ tê. Mîr Celadet û Mela Mihemed Nezîr bi hevra li ser mewlûdê hûr bûne û destnivîseka di destê Mihemed Elî Ewnî jî daye hanînê û her du destnivîs dane ber hev. Piştî xebateke hûr û kûr mewlûda Dimilî (Zazakî) têkûz dikin û didin ber çapê.³⁶¹

Mîr Celadet Bedirxan di vê nivîsa xwe ya dirêj da; li ser zaravayê Zazakî bi pişporî disekine û bi xwendeveanan re dide nasandin. Bingeha rêzimana Zazakî, cudahî û wekhevîyên navbera zaravayên Kurmancî û Zazakî dide ber hev. Hem cudahîya navbera zaravayên Zazakî û Kurmancî, hem jî cudahîya navbera devokên Zazakî (wek devoka Siwêregê û ya Palo) jî dide ber hev û bi mînakên ve pirsê zelal dike. Kurteçîrokekî bi her du devokên ku me behskiribû jî, di vê nivîsê de cîh digre. Dîsa di vê nivîsê de xêncî mewlûda Usman Efendî, mewlûda Mela Ehmedê Xasî jî di vê nivîsê de cîh girtîye. Mîr Celadet Bedirxan dixwaze vê berhemê jî bide çapkirin. Ji bona pêkhanîna vê yekê, ji xwendeveanan tika dike ku destnivîsên vê berhemê di destê wan de hene, jê re bişînin.³⁶²

Gava ku ev nivîs bê xwendin wê baş bê dîtîn ku; Hawar û xweyê kovarê di navbera zaravayên Kurdî de cudahî nexistinê. Hemû zaravayên Kurdî li cem wana di heman qîmetêda ne. Lê dîsa baş dixuyê ku li gor zaravayên Kurmancî û Soranî, nivîsên bi zaravayê Dimilî gelek kêr in. Ji xwe Hawar di nivîsên xwe da,

³⁶⁰ Mela Mihemed Nezîrê Dêrşewî, ji Siwêregê ye û bavê wî Kurmanc, dayîka wî dimilî ye. Ji ber wî jî her du zarava pirr baş dizane. Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Hawar, hj.23, r.1-6 (birê erebî)

³⁶¹ Bedirxan. C. A. (1933). *Zarê Dumilî û Mewlûda Usman Efendî*, (birê erebî), **Hawar**, hj.23, r.1-6.

³⁶² Bedirxan, C.A. (1933). *Zarê Dumilî...*, h.n. , hj.23, r.6.

bangewazîyê li xwendevanan dike da ku bi hemû zaravayên Kurdî ji wan re nivîs bîn şandin û ew nivîs bîne weşandin.

Wisa dixuyê Kovara Hawar di vê rêbaza xwe ve dixwaze yekîtiyê di nav zaravayên vî zimanî de çê bike. Lewra mînakên ji milletên din hatine girtin û di kovarê de behsa wan hatîye kirin vê yekê nîşanî me dike. Hawar, yekîtiya Kurdan bi yekîtiya ziman ve girê dide û vêya jî bi diruşmeya “Yekbûna Kurdan bi yekîtiya zimanê Kurdî çê dibe”³⁶³ tîne ziman. Wisa dixuyê ku Hawar ji alîyekî ve ziman vedijîne, bi vejîna ziman ve jî dixwaze rewşa gel bi her alî ve biguherîne. Ev tespîta kovarê ku li jêr nivîsîye jî vê rewşê zelal dike. Li gir kovarê pêşveçûyîna ziman, pêşveçûyîna civakî, aborî û yên din, bi hevra girêdayîne. Heke miletek di her warî de pêşde çûbe û ev pêşdeçûyîn di karên xwe yên rojane da bikar anîbe wan tiştan ziman jî dewlemend kirîye û ziman pê fireh bûye. Herwekî zimanê Kurdî jî wiha ye. *“Ev tiştên ku Kurd pê mijûl bûne dest dane wan ziman jî bi wan re pêşde çûye. Ew tiştên ku Kurd pê nenas mane û pê re mijûl nebûne, di wî warî de zimanê me rawestiyaye, pêş ve neçûye, di cîhê xwe de maye.”*³⁶⁴

Hawar derbarê zimanê Kurdî de projeyek nû daye ber xwe ji bo vê armanc û projeyê, ji xwe re rêbazek danîye. Kovar dixwaze hîmê zimanê Kurdî ji nû ve dayne. Ev hîm jî bi;

- Guherîna elfabeya Erebî û sazkirina elfabeyek nû
- Danîna bingegehên Rêzimana Kurdî
- Xurtkirin û geşkirina Edebiyata Kurdî
- Sazkirin û nivîsandina Ferhengeke Kurdî,

hatîye danîn. Wisa tê qebûlkirin, ku ew hîmê Hawarê di sala 1932'an de danîye, li gel hinek kêmasî û rexneyan; zimanê Kurdî heta îro li ser wî hîmî bilind bûye û pêşde çûye.

Hawarê di hemû hejmarên xwe de, zimanê Kurdî pesinandîye û heskirina ziman bi nivîsên balkêş ve xistîye dilê xwendevanan. Ew dixwaze, Kurd bi zimanê xwe biaxivin û binivîsin. Edebiyat, çand û kelepura milletê Kurd, bi zimanê vî milletî bi wan dide naskirin. Ji bona vê yekê jî; tevî elfabeyeke nû, rêzimanê têkûz û bingeha ferhengeke nû û nûjen jî hatîye çêkirin. Ev xebatan jî bi me dide zanîn, Hawar

³⁶³Bedirxan, C. (1932). Bi Hinceta Pîroznamekî, (bi tîpên erebî), *Hawar*, hj.3, r.4.

³⁶⁴Bedirxan, C. (1932). Armanc, Awayê ,hj.1, r.1.

kovareke bingeha xwe li ser ziman, edebiyat, çand û hunerê çêkirîye. Herçiqas hemû cureyên nivîsan tê de cîh girtî be jî; armanca wê ya sereke, pêşdebirina ziman û edebiyata Kurdî ye. Her çiqas carnan nivîsên civakî û rojane jî tê de hebin, ev nivîsana tu car nakevin pêşîya nivîsên li ser ziman û edebîyatê.

2.4.1. Elfabe

Nivîs ji bona ragihandina hest û ramanên meriv, amrazêke herî girîngtir e ku di dîroka merivahîyê de hatîye îcad kirin. Piştî îcadkirinê, nivîsê ji xwe ra sistemek û rêbazek taybet saz kir û elfabe derxiste holê. Di dîroka merivahîyê de neteweyên cuda cuda, elfabeyên cur be cur, ji bo zimanê xwe çêkirine û bikaranîne. Milletê Kurd jî; di pêvajoya dîroka xwe da, gelek elfabe bikaranîne û bi wan elfabeyan ve nivîsandine.

Berîya weşandina Kovara Hawarê di Dewleta Osmanî de, di nav rewşenbîrên Osmanî de li ser guherandina elfabeya Tirkî, niqaş û xebat çêdibûn. Niqaşên li ser elfabeya Tirkî, cur bi cur bûn. Evan niqaşan piştî tanzimatê destpêkirin û dawîyê de, di sala 1928'an de elfabeya Latînî ji bo zimanê Tirkî hat pejirandin û bi qanûnekî ve hat pesend kirin.

Guherandina elfabeya Tirkî bi destê dewletê û bi derxistina “Qanuna Herfên Tirkî” ve çêbibû.³⁶⁵ Niqaş û xebatên li ser guherandina elfabeya Kurdî li ser milên rewşenbîran dimeşîya. Hinek rewşenbîr û zimanzanên Kurd, ji bo têkûzkirina elfabeyên heyî yan jî çêkirina elfabeyek nû, dixebitîn û ji bo kêmasîya di vî warî de, serê xwe diêşandin.

Pêşîya derketina Hawarê, li Stenbolê rewşenbîr Xelîl Xeyalî li ser elfabeyeke nû dixebitî. Ewî di kovara Rojî Kurd de, nivîsa xwe ya bi sernavê “ziman” de; hewceyîyên Kurdan di 10 xalan de rêz dikir:

1. *Ji bo xwendin û nivîsandinê hîref,*
2. *Ser terzek nû elfabeyek,*
3. *Ji bo zanîna temamê zimanê Kurdî “qamusek”(ferheng),*
4. *Îlmîhalek,*
5. *Tarîxê bav û kalê Kurdan we an'ane ya wan,*
6. *Welatê Kurdan we adet û teb'ê wan we mîqdar û navê eşîran,*

³⁶⁵ Resmi Gazete, “Türk Harflerinin Kabul Ve Tatbiki Hakkında Kanun”, 03/11/1928, hj. 1030.

7. *Kitêbê hîsabê,*

8. *Ji bo zimanê Kurdan serf û nehv (rêziman),*

9. *Tercumeyê halê mezinê di Kurdan,*

10. *Edebiyata Kurdan we navê şairê wan,*

Ji bo çêkirina van tiştan çiqas kitêbên kurdî heye lazime wan bişînin. Ji dengbêjan lawjek û çîrok û qewlê Kurdan (gotinên pêşîyan) pirs kin we binivîsin û verêkin. Mela û Feqehê di Kurdan çî dizanin bila bêjin. Tû texsîratek tê nekin, herkes di terefê xwe da xizmetek bike, zû bi zû mirov digihe xereda xwe. Gelî biran ji we hêvîya min ewe kû xizmeta Kurdîtiyê û misilmanî neavên pişt guhê xo, misilmanî ji we hêvîya xizmetê dike.”³⁶⁶

Xelîl Xeyalî ji bo pêşdebirina Zimanê Kurdî, li ser elfabeyê nû û yekgirtî disekinî û vîya wek hewceyîyek bêgav didît. Di sala 1909'an de elfabeyek Kurdî bi navê “Elifbayê Kurmancî” bi tîpên erebî nivisîye.³⁶⁷

Bedîuzzeman Seîdê Nursî jî, di nivîsên xwe yên wê demê de, li ser girîngîya ziman disekine; ji Kurdan re behsa qîmet û pêwistîya zimanê zikmakî dike. Ew jî, ji bo pêşdeçûyîna millet, ziman derdixe pêş. Ji kesên rewşenbîr dixwaze ku zimanê Kurdî yê ku gelek dewlemende; lê paşdemayî û bi kêmasî ye, temam bikin û lê xweyî derkevin. Piştî danasîna ziman û girîngîya ziman rave dike, bi taybet li ser Zimanê Kurdî wiha dibije: Ew zimanê Kurdî yê ku wek “dara tûbayê” xwedîyê geşepêdaneke berfireh û dewlemend e, ji ber tiralî û bêxemîya we hişk û perîşan bûye û ji zimanê edebiyata medenî paşde maye. Ji ber wî; zimanê we bi heyf û berketinek me’newî gilîyê xwe bi we dike.³⁶⁸

Bedîuzzeman Seîdê Nursî, piştî van gotinên xwe, behsa xebata Xelîl Xeyalî ya li ser rêziman û elfabeya Kurdî dike, xebat û hewlên wî dipesinîne, û ewî wek nimûneyek milletperwerîyê nîşanî Kurdan dike û wha dibêje: “Ezê mîna kek ji dilmezîniya millî (neteweperwerî) nîşanî we dikim ku ew jî; Xelîl Xeyalî Efendîyê Motkî ye. Mîna her beşeka milletperwerîyê; di beşa qada pêşbazîya ziman da, xelat û şeref ya wî ye. Ewî bingeha zimanê me, -ku rêziman û elifba ye- hanîye pê (çêkirîye). Hetta ez dikarim bêjim ku; hebûna wî ya manewî çêkirîye. Bi rastî ku cewherekî wiha

³⁶⁶ M. X. , (1 Ağustos 1329). Ziman, *Rojî Kurd*, Stenbol, (Transkirîpe û Wergerandin: Cemîl Amedî) hj. 3 r.88.

³⁶⁷ Motkî, Xelîl Xeyalî. (2004). *Elifbêya Kurdî*, Stenbol, Hivda Iletişim, (tîpên erebî) hemû rûpel.

³⁶⁸ Nursî, B. S. (sal ne dîyare). Hatime, *Asar-i Bediyye*, İstanbul, Envar Neşriyat, r.332.

di madena Kurdistanê da derketîye, pêşeroja me wê bi cewherên wek wî va ronî bibe. Evî zatî tevgerike mînakgirtinê nîşan kirîye, hîmek danîye ji bona zimanê me yî millî yê ku hewceyî temamkirinê ye. Ez ji ehlê hemîyetê (kesên neteweperwer) ra tewşîye dikim ku; rêça wî bişopînin û li ser hîmê ku ewî danîye, bîna ziman ava bikin.”³⁶⁹

Di nav xebatên wê demê ji bo elfabeyê nû, yekgirtî û têkûz hewlên zimanzanê naskirî Tewfîq Wehbî Beg jî cîhekî girîng digre. Tewfîq Wehbî Beg û Mîr Celadet Bedirxan esasen bi hevra li ser elfabeyekî dixebitin û di navbera wan de peywendî hebû. Lê piştî hinek tevlihevîyên siyasî yên deverê ev daxwaz û proje neçû serî.³⁷⁰

Em ji nivîsa Mîr Celadet ya li jêr têdigîhîjin ku esasen ew dixwaze vî barê giran bi hinek pîspor û zimanzanên Kurd yê wek Tewfîq Wehbî Beg ra parve bike. Xêncî wî jî, armanca Mîr Celadet ewe ku elfabeya nû bi xebateke nîvekarî bê çêkirin.

“Belê em dizanên ku zimanzanê bi qîmet û mamhostayê giram Tewfîq Wehbî Beg jî bi herfên latînî elfabeyek çêkirîye. Pêrar wekî ku me hevdu li Şam’ê dît, me elfabeyên xwe nîşanê hev kir û hevdû dan zanîn û herdu elfabe danîn ber hevdu navbera wan de hinek ferq hebûn. Me dil kir em elfabeyên xwe bigihînin hev û ji herduyan elfabeyek nû bibijêrin û belav bikin. Hingê destebirayê min ê xwoşewîst û giram digot ku hê li ser elfaba xwe dixebite, ji ber wê me yekkirina elfabeyên xwe avête paş. Li pey wî ra Tewfîq Wehbî Beg vegerîya Iraqê. Piştî bûyerên nexweş têkiliya me çênebû. Min çend caran jê re nivîsand lê nivîsên min neketin destên wî. Derketina Hawarê ji bona vêya dereng maye. Hawar di meha gulanê de derket. Min ruxseta hawarê di 26 çiryaşê 1931’an de girt. Karên derxistina wê di meha şibatê de pêk anibû. Çar meh ez li hêvîyê mam da ku ez Tewfîq Wehbî Beg bi hevra dest çêkirina elfabeyê bikim û rê li pêşîya duyîti bigirim. Ku peywendîyên me qut bûn, bersîva nivîsandinên min nehatin, êdî ez nikaribûm zêde bisekinim ji bo çêkirina elfabê û derxistina kovarê.”³⁷¹

Yek ji nivîskarê Hawarê Elî Seydo, ku wê demê li Urdun’ê rûdinişt, di nivîseke xwe da behsa xebatên Tewfîq Wehbî Beg dike û ji bo elfabeyek bi tîpên latînî nêrîn û dîtinên xwe tîne ziman:

³⁶⁹ Nursi, Hatime, *b.n.b.*, r. 332-333.

³⁷⁰ Bedirxan, C. (1932). Li Ser Yekitiya Zimanê Kurdî”, (Birê Erebi), *Hawar*, hj.10, r. 6-7.

³⁷¹ Bedirxan, C. (1932). *b.n.b.*, r. 6-7.

“Em ji nivîsên di Hawarê de hatine belavkirin têdigihîjin ku; rewşenbîr û zanayên Kurdan yê de verên din jî çêkirina elfabeyek latînî kêfxweşin û hinekên din jî li ser vê dixebitin. Par çû bûm Iraqê. Li Bexdayê min Tewfîq Wehbi Beg dît. Ew jî bi elfabeyekî mijûl dibû. Lê berîya wê, elfabeya Hawarê derket û me da pey. Li Silêmanîyê di Civata Zanistîyê de min çend xortên xwenda nas kirin. Bi tevayî digotin ku zimanê me tenê bi herfên latînî têtê nivîsandin û ne bi hinekên din. Herwekî îro jî em dinivîsîn. Lê divê herçî xwenda û zanayên Kurdan hene pişt bidin me û elfabeya me belav bikin, bi xwe hîn bibin û ji xortên nûgiha re hîn bikin.”³⁷² Ji nivîsa Elî Seydo Goranî jî baş tê fahmkirin ku xebatên li ser elfabeyek nû, niqaşên bi vî rengî di civaka xwenda û rewşenbîrên Kurd de çê dibin. Dîsa em ji heman nivîsê ve têdigihîjin ku xortên xwenda û rewşenbîrên wê demê ji elfabeya latînî kêfxweşin û reaksiyonek li dijî elfabeya nû tune ye. Helbet ev nayê wê wateyê ku elfabeya Hawarê, bi her alî ve temam e û bê kêmasî ye û ji aliyê hemû kesan ve hatîye qebûlkirin. Ji xwe Mîr Celadet Alî Bedirxan jî vê yekê bi xwendevanan re parve dike û ji wan dixwaze ku kêmasî û xeletî yê heyî bi hevra temam bikin, rast û dirust bikin.

Mîr Celadet li ser yekîtîya ziman û yekîtîya elfabeyê gelek disekine. Daxwaz, xebat û hewla wî, çêkirina elfabeyeke wisa ye ku hemû zaravayên Kurdî bi vê elfabeyê bînin nivîsandin û di nav hemû zaravayan da yekîtî çêbe. Vê fikra xwe wiha vedibêje: “Herwekî me çend caran gotîye yekîtîya milletê Kurd bi yekîtîya zimanê Kurdî çêdibe. Di yekîtîya zimên de gava pêşîn jî yekîtîya herfa ne. Yanî ji bona nivîsandina zimanê milletekî divê zana û xwendevanên wî milletî bi tevayî ji bona zimanê xwe elfabayekî bibjêrin û di wî zimanî de çiqas zarav hene, zarav hemî bi wî elfabeyê bêne nivîsandin. Ji hejmara pêşîn ve xuyaye ku armanca Hawarê ya pêşîn û bingeîn ev e.”³⁷³

Mîr Celadet Bedirxan hê 13 sal berîya weşandina kovara Hawarê, ser tîpên Latînî xebitîye. Wisa dixuyê, Celadet Bedirxan bingeha guherandina tîpên Latînî hem di mêjuyê xwe da, hem jî di hinek berhemê xwe da sêwirandîye û bi weşana Hawarê ve jî ew fikr hatîye cîh. Serpêhatîya vê pêvajoyê em bi devê Mîr Celadet Bedirxan, ji kovara Hawarê dixwînin:

“Di sala 1919’de, me da bû çiyayên Meletyê. Em ketibûn nav eşîra Rewan. Mêcer Nowel (ingilizek) jî digel me bû. Mêcer zarê nivro (sorani, s.ç.) dizanî bû,

³⁷² Elî Seydo, (1932). Ez û Hawar, **Hawar**, h.9, r.7.

³⁷³ Bedirxan, C. (193). Li Ser ,h.n. , r.6.

dixebîtî ku hînî zarê bakûr bibe, û ji xwe re her tişt dinivîsandin. Min jî hin medhelok, stran û çîrok berhev dikirin. Carinan me li nivîsarên xwe çavên xwe digêrandin, dixwendin û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi bilêvkirineke biyanî, le bê dişwarî destnivîsa xwe dixwend, le belê ez, heta ku min (û, و) ji (o, و) û (î - ی) ji (ê - ع) h. p. derdixistin diketim ber hezar dişwarî. Ma çîman? Ji ber ku Mêcer bi herfên latînî, lê min bi herfên erebî dinivîsandin. Ser vê yekê, di cih de min qerara xwe da û ji xwe re bi herfên latînî elfabeyek lêkanî. Êdin minê bikariya destnivîsa xwe paş hezar salî jî bê dişwarî û weke xwe bixwînim, ji ber ku her deng cihê cihê li ser kaxezê dihat sekinandin. Lewra ku di Elfabêya Latînî de tenê (26) herfên serxwe hene û di zimanê Kurdî de deng ji bîst û şeşan bêtir in. Gelek herfên hevedudanî ketibûn nav elfabêya min; wek: ch, ou, ai ... Ji xwe di zaroktîya xwe de, wekî min di dibistana de dixwend û hînî herfên Erebi û Latînî dibûm, tiştê hebû ku min çavê xwe, ra dikir û ji bona herfên Erebi, di dilê xwe de digot: Ev elfabeyeke welê ye ku dengên dide xwendin ku nayine nivîsandin. Latînî yekcar vajîyê wê ye. Herfin dide nivîsandin ku nayine xwendin. Belê fikra min di babeta van her du elfabeyan de ev bû. Bawer bike bi vê fikra ku min ji zaroktîya xwe ve di serê xwe de bixwedî dikir, kêfa min ji herfên hevedudanî re nedihat. Hingî ji zimanên ku bi herfên erebî nayine nivîsandin min Yunanî, hinekî Frensîzî û elfabêya Rûsî nas dikirin. Hema di çiyê de, rabûm herçî herfên hevedudanî ji elfabêya xwe derêxistin û li şûna wan ji elfabêya Yûnanî û Rûsî herfinen serxwe êxistin. Bi vî awayî, min elfabeyek bi sih û şeş herfên serxwe êxisti bû destê xwe. Wekê em veşeriyên hatin Stenbolê bi vê elfabêyê min kitêbeke elfabêyê û ferhengêke piçûk nivîsand û ji bona çapê kar kiri bûn. Lê mixabin ne ew elfabê, ne jî ew ferheng îro ne di destê min de ne. Di sala 1925'an de digel hin nivîsarên min en din gehîştine heta pêşberê Mehkema Xarpûtê. Sala 1926'a de li Elmanyayê min carekê din çavê xwe li elfabêya xwe gerand, hûr le mêze kir û mideke xweş liser xebitîm. Min bala xwe dida û didît ku ev se texlît herf qenc lihev ne dihatin, herfên yûnanî û rûsî yekrengîya elfabêyê xirab dikirin. Jû pêve têde du herf hebûn ku ji me re ne gerez bûn. Ji lewra min elfabêya xwe ji nû ve senifand. Herfên zêde je avêtin, hin herfên latînî bilindek li wan bar kirin û di şûna herfên yûnanî û rûsî de êxistin. Bi vî awayî "elfabêke bi sih û çar herfan û yekreng hâte pê. Ez paşê ji bi elfabêya xwe mijûl dibûm. Lê hetanî ku tirk elfabêya xwe belav kirin ya me weke xwe dima û têde me tistekî bingehî nediguhart. Min her tiştên xwe pê dinivîsandin û nasên xwe re dida zanîn. Weqê tirk elfabêya xwe belav kirin me dît ku di dengên hin herfan de elfabêyên

me ne mîna hev in. Hinek deng hebûn ku tirkan ne bi wan herfên ku me nîşan kirine lê bi herfinên din nîşan kirî bûn. Herwekî me berê jî çend caran goti bû, ji bona hêsanî kirina xwendina nivîsarên me, ji kurdmancên Tirkîyê re, me dengên hin herfan bi hev guhartin û herçend hebû me ewçend elfabêya xwe xist nîzingî elfabêya tirkan. Ji gotinên jorîn qenc xuya dibe ku elfabêya me paşîya xebateke sêzdehsalîn e, gora zimanê Kurdî, gora dengên zimanê me ye. Herê ev elfaba berî sêzdeh salan hatiye nivîsandin û gora zimên û dengên wî hîn bi hîn edilî û ket halê xwe yê îro. Berî û piştî belavkirina elfabêyê min fikrên gelek kesan pirsîn û gotinên hinekan bi kêrî min hatin. Di nav wan de mirovînen yekcar nexwenda jî hebûn. Ji lewra ez vê elfabêyê ji keda xwe bêtir keda mîletê xwe dihesibînim û pêşkeşî wî dikim. Ji xwe herçî yê wî ye, ji yê herkesî hêjatir û spehîtir e”.³⁷⁴

Ji gotinên Mîr Celadet Bedirxan wisa tê fahm kirin ku ewî ev elfabe piştî salên dûr û dirêj û xebat û cehdeke mezin çêkirîye. Wisa dixûyê ku, guherandina elfabeyê ji ber fikrên siyasî, olî û h.w.d. zêdetir, ji ber hêsanbûna tîpên latînî ji bo zimanê Kurdî ye. Mîr Celadet vê nêrîna xwe jî bi bingeş kirîye, bi mînakên ve mijar zelal kirîye. Herwiha Mîr Celadet Bedirxan, di medreseyan jî gerîyaye û li ser elfabeya latînî ji xwendevanên medreseyan pirsîye û nêrînen feqehan guhdarî kirîye û dîtîye. Ew dibêje: “Pêrar, digel çend hevalan derketibûm gerê. Çendekî di nav feqehan de mam. Me sê çar medrese dîtin. Li nav wan de xortên her welatî, her eşîrî peyda dibûn. Serhedî, Botî, Diyabekîrî, Bidlîsî, Mûşî, h.w.d. Bi dîtina min gelek kêfxweş dibûn, Ji min ser kurdanîyê gelek tiştan dipirsîn. Piranîya wan bi herfên Latînî jî dizanîbûn. Pêkve digotin ku Kurdmancî bi herfên Latînî gelek qenc tê nivîsandin. Ji bin paşilên xwe hinek rûpel derdixistin û ji min re dixwendin. Tedigot, hemî jî şair bûn.”³⁷⁵

Di vê beşê de divê em tiştekî ku hê niha jî nîqaş li ser heye zelal bikin. Dibe ku hinek kes angaşt bikin ku guherîna elfabeya Erebi bi ya Latînî bûye sebebê jidûrmayîna Qur’ana Piroz û hinek zanistên Erebi yê din. Zêdetir ev angaşt ji bo guherîna elfabeya Tirkî tê kirin lê pir kêr be jî, dibe pirseke wisa were hişê hinek kesan ji bo guherîna elfabeya Kurdî jî. Em dikarin bi çend hevokan vê angaştê bi bersîvînin. Kurd bi guherîna elfabeya Erebi bi ya Latînî, yekcar ji tîpên Erebi dûrneketin û jê neqetîyan. Hawarê jî heta hejmara 24’an weşana xwe bi herdu elfabeyan dewam kir. Erê Hawar ji bo hemû Kurdan dihate belavkirin lê armanca wê,

³⁷⁴ Bedirxan, C. (1932). Pêşgotinek, *Hawar*, hj.13, r.1-2.

³⁷⁵ Bedirxan, C. (1932). Stûna Feqehan, *Hawar*, hj.1, r.4.

zêdetir Kurdên Tirkîyê bûn; ew jî ji xwe 4-5 sal (1928) berîya weşana kovara Hawarê (1932) bi temamî derbasî elfabeya Latinî bibûn. Kurdên li Tirkîyê, êdî bi tu şiklî hînê tîpên Erebi nedibûn, xêncî medreseyan heremê. Me çawa li jor, ji Mîr Celadet Bedirxan ragihandibû, wisa dixuyê ku; mela û feqîyan medreseyan jî alîkarîya guherîna elfabeyê dikirin. Lê ev nayê wê maneyê ku yekcar elfabeya Erebi bidin alîyekî û tenê elfabeya latinî bikar bînin. Ji xwe kesên misilman kîjan elfabeyê bikarbînin jî; divê elfabeya Erebi jî teqez bizanibin, da ku Qurana Pîroz bixwînin û hinek ilmên din jî pê bixwînin û binivîsin. Xaleke din ya girîng ewe ku, guherîna elfabeya Kurdî - Latinî bi destê dewletekî ya jî desthilatekî nebûye. Ew bi temamî ji ber guherînê demê û belkî wek pêwîstîyeke demê bûye. Kes nikare sed ji sedî bêje ku elfabeya Latinî ji bo Kurdan ji ya Erebi çêtir e. Her elfabeyek kêmasî û zêdahîyê xwe heye. Lêbelê guherîna elfabeya Tirkî, bi şiklekî guherîna elfabeya Kurdî-Latinî xiste tişteki bêgav. Ji xwe Mîr Celadet Bedirxan jî di gelek cihên kovarê de dibêje ewan xwe ji elfabeya Tirkî dîr nexistine.³⁷⁶ Ji alîyekî din, kovarê di hejmarên xwe da cîhekî fireh daye nivîsên olî. Ji ber vêya jî dibe ku reaksiyonek li hember bikaranîna tîpên nû çenebûye. Lewra kovara Hawar, xwe tû car nexistîye hemberê dinê Îslamê, beravajî yê wî, herdem rêz ji dînê Îslamê re girtîye. Ji xwe di hejmara 27'an şûn de Hawarê dest bi tefsîra Qur'ana Pîroz û Hedîsên Cenabê Pêxember (s.a.s) kirîye.³⁷⁷ Weşandin û danasîna berhemên zanayên Îslamê yê wek Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyê û mawlûda Kirdkî ya Usman Efendî jî hinek nimûne ne ji wan nivîsan.

Mîr Celadet Bedirxan ku merivekî pirziman bû û perwerdeyeke baş dîtibû;³⁷⁸ bi hêsanî dikaribû ziman û elfabeyan bide ber hev û elfabeyeke nû, ji bo deng û zimanê Kurdî çê bike. Di hejmara didûyan de hîlbijartinên tîpan, sebebên wan û nêzikbûna tîpa ji bo zimanê Kurdî bi awakî berfireh di Hawarê de hatîye nivîsandin. Rêjeya tîpan di axaftin û nivîsandinê de bi pîvan hatîye kifşkirin, piştî tespîta bikaranîna dengên; tîp hatine bijartin. Di hejmara 3'yan de nimûneyek di vê derbarê de wiha ye: Axaftin yan jî nivîseke ku 33798 tîp tê de hebin; dengê “v” 329 caran, dengê “w” 557 caran tê bikaranîn.³⁷⁹ Piştî pîvanên bi vî rengî tîp hatine bijartin û yan jî hatine hîştin. Ev rêbaz zêdetir di dengên nêzikî hev de hatiye bikaranîn; lê hem ji alîyê teşeyê, hem jî alîyê deng de ji bona bijartina tîpan de rêbazeke zanistî heye. Mîr

³⁷⁶ Bedirxan, C. (1932). Elifbêya Kurdî-11, *Hawar*, hj.11, r.5.

³⁷⁷ Bedirxan, K. (1932). Tefsîra Qur'anê, *Hawar*, hj.27, r.1. (Tefsîra Quranê û hedîsên cenabê pêxember heta hejmara dawî dewam kirîye. s.ç)

³⁷⁸ Bedirxan, C. (1932). Armanc, Awayê....., *h.n.*, hj.1, r.1.

³⁷⁹ Bedirxan, C. (1932). Elifbêya Kurdî-3, *Hawar*, hj.3, r.4.

Celadet Bedirxan di nivîseka xwe de, rêbaza çêkirina elfabeyê û bijartina tîpan wiha rave dike:

“Herwekî di gelek tiştan de têt dîtin, dibe ku di cara pêşîn de di elfabêya me de jî kêmanî û zêde bin, kêmanî dê bikevin ber çavan. Ev kêmanîyên ha di eslên xwe de jî kêmanîyê bêtir paşîya hin kotekîyan in ku meriv ji wan nikare xwe bide alîyekî. Ji lewra piştî dan zanîna elfabeyê divê awayê hevedudanîna wê û kitkitên bingeheên wê bîn ravekirin. Da ku xwendevanên me qenc têbigihin ku ew kêmanîyên ha herwekî me got ne kêmanî, lê di azîna elfabê de tiştînen adetî ne. Ev benda ha ji bona berhevdana wê hatiye nivîsandin; lê berî destpêkirina berhevdanê divê herçî esas û bingehe hene ku ji me re bûne hîm û elfabê li ser wan hatiye danîn bêne xuya kirin. Me ev bingeheên ha, di dora şeş destûran de gihandine hev.

1. Ji wan niqtan pêve ku xasê danganîya zimanê Kurdî ne, di şikl û dengên herfên de, herçend heye, xwe li elfabêya Tirkî nîzing xistin û jê dûr neketin. Armanca elfabê sekinandina dangan li ser kaxezê bi şiklan e. Şikil bi herfan tîp nîşan kirin, û herf qebalewî û bihemdin. Ji lewre nîşankirina dengê (ç) bi (c) û yê (ç) bi (ç) û bi hevguhartin û cihguhastina wan wekhev û bêferq e. Bi vî awayî kurdên welatê jorîn û heçî ku elfabêya tirkî dinasin, dê bikarin bê dişwarî ya Kurdî hîn bibin û komel û kitêbên me bi hêsanîti bixwînin.

2. Herçend dibe, ewçend dengên herfên latînî yê adetî ku di zimanên din de nas in, di elfabêya Kurdî de hîlanîn û neguhartin. Bi vî awayî kurd dê bikarin elfabêya biyanîyan û biyanî ya me bi hêsanîti fêr bibin.

3. Nîşankirina her dengî bi herfeke serxwe û ji awayê herfên hevedudanî xwe dûr xistin. Bê şik e ku hînbûn, xwendin, nivîsandin û lêkdana herfên serxwe ji yê hevedudanî hêsanitir e.³⁸⁰

4. Her dengî bi herfekê cihê nîşankirin. Yanî ji awayê nîşankirina çend dangan bi herfekê an dengê bi çend herfan, xwe dan alî. Ev awa ji fikra çêkirina elfabêkê bi hindik herfan an ji qesda qenc li sersekinandina danganîyê dikare bizê. Lê pê her du jî nakevin dest û di zimanî de bêsebeb pirsînen di şiklî de cîyok peyda dibin û di nivîsandinê de tevlihevîke mezin çêdibe. Ji xwe di tu zimanî de danganî û nivîsandin ne lîvên yek in, û nivîsandin nikare bi tevayî li danganîya wî zimani bê. Lewra ku

³⁸⁰ Bedirxan, C. (1932). Elfabêya Kurdî-6, *Hawar*, hj.2, r.5.

kitkit û rengên danganîyê bi elfabêyê nayên nîşan kirin û li ser kaxezê sekinandin. Welê bûya divîya bû elfabêya her zimanî ji (50-60) herfan hevedudanî bibe.

5. Herçend heye, ji barkirina herfan bi nîşanên nû, xwe dan alî. Nîşan ji hêlekê di nivisandinê de bi vegera qelemê wextî dide winda kirin. Ji hêla din, bi jibîrkirin nîşanê herf vedigerin ser şiklên xwe en eslî yên bîrîşan, û tevlihev dibin. Pejirandina çend nîşanan bi hev re ev jî diwarîke din e. Ji lewra, ji bona tevahîya herfên binîşan me ev (^) pejirand, û bilindek nav lêkir. Ji ber ku dengên herfan hem diguhêrîne hem bilind diqe, û ji nîşanên weq (-, -') qenc tê veqetandin. Ji xwe zêdebûna nîşanan nivisandinê kirêt dike.

6. Herfên welê bijartin ku di şiklên xwe de li hev bîr û bikevin hev. Ji lewre divîya bû ku em di nav herfên latînî de bimînin û ji elfabêyên din wek yûnanî û rûsî herfan megirin. Me jî welê kir û elfabêya xwe bi hindik guhartina dengên herfên latînî û bi barkirina hinan bi bilindekê çêkir, Bi vî awayî û gora destûrên jorîn me j elfabêya xwe li sih û yek herfan hevedudanîye. Herwekî di despêkê de me da zanîn. Lêkolîna ku di her sê zarên Kurdî de hatine çêkirin xuya kirine ku di zimanê Kurdî de dengên bingehî ev sih û yek deng in.”³⁸¹ Ew jî bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin. Belê, herfîn hene ku geh zirav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşîyê tên xwendin; lê ev ferqên ha ne ji guhêrîna cihderka dangan, lê belê ji guhêrîna rengê dangan têne pê. Ji lewre di elfabêyê de nayin nîşan kirin. Ji ber ku elfabê tenê dangan nîşan dike, ne rengê dangan. Ezê bi dengdaran dest pê bikim, Ji sih û yek dengdarên Kurdî, dengên hevdehên jêrîn, di elfabêya her zimanî de, bi ferqnên piçûk, yek in.

b-d-g-h-q-l-m-n-p-r-s-t-f-v-w-y-z

Tenê di elfabêya tirkî de (q) û (w) nînin, Ji ber ku di zimanê tirkî de dengîna cihê wek (v) û (w); (q) û (k) nayin dîtin. Dengê herfa (w) ji xwe di tirkîyê de peyda nabit.³⁸²

Dengê “ş”piştî berewirdkirina gelek ziman û elfabêyan; wek ku di elfabêya tirkî de hatîye nîşan kirin bi tîpa “ş” hatîya nîşankirin.³⁸³ Ji xwe mîr di bijartina nîşankirina tîpan de xwe nêzîkî elfabêya Tirkî girtîye. Lewra pirranîya Kurda di bin desthilatdarîya Tirkîyê de dijîn û ew jî di dibistan û nivîsên xwe da elifbêya latînî

³⁸¹ Bedirxan, C. (1932). Elfabêya Kurdî-6, *Hawar*, hj. 2, r.6.

³⁸² Bedirxan, C. (1932). *h.n.*, r.6.

³⁸³ Bedirxan, C. (1932). *h.n.*, r.6

bikar tînin. Ev tercîheke rast e û ji bo Kurdên Bakûr hêsanîyeke mezin û destxistineke hazir e.

Mîr Celadet Bedirxan, di hejmara ewil ya Hawarê de, elfabeya Kurdî ya latînî bi xwendevanan dide nasandîn. Ew wek mamostayekî ku xwendevanên xwe ji nû ve fêrî xwendinê bike, bi awayekî zanistî elfabeya nû, di 15 hejmarê Hawarê de dide naskirin. Sebebê çêkirina her tîpekî yan jî guherandineke nû, bi zanistî zelal dike, bi zimanên din ve dide ber hevudû û bi xwendevanan dide zanîn.

Em wek nimûne, hejmara ewilî bidin ber xwe û binêhêrin ka elfabe bi çi awayî hatîye nivîsîn û hînkirin.

“Bi Navê Yezdanê Pak ê Diloan û Mîhrîvan

Elfabeya Kurdî ji sîh û yek herfan hevedudanîye (pêk tê):

a - b - c - e - ç - d - i - g - h - x - ê - j - î - q - k - u - l - m -
n - o - p - r - s - ş - t - û - f - v - w - y - z

Em dibînin ku Celadet Bedirxan, rêzika herfan, wek ya îro rêz nekirîye. Çawa ku emê di tabloya jêrê da jî bibînin; dema mînak dayîne de nêzîkê rêzkirina îroyîn tîpên Latînî- Kurdî rêz kirî ye.

Pişti nîşandan û rêzkirina tîpan, tîpên Kurdî ji alîyê dengî û bê dengî ve bi mînakan û li gel tîpên latînî, tîpên erebî ve jî nîşan dike û dide naskirin:

Herf di dengdayîyê de du texlît in: Dengdêr û dengdar. Dengdêr ew herf e ku bixwe deng e. Dengê wê bi serê xwe derdikeve û dengê dengdaran derdixîne. Dengdar ew herf e ku bixwe deng e, lê belê dengê wê bi serê xwe û bê arîkariya dengdêrê dernakeve.

Di zimanê Kurdî de heşt dengdêr hene:

a - e - ê - î - û - o - û

Lewra ku di danganîya Kurdî de dengdêrek geh kin û geh dirêj nabe, dengdêrên Kurdî di dirêjahîya dengên xwe de sersekinî, ne kin û drêj in.

Dengdêrên kin: e - î - u

e	der	در	şer	شر	ser	سر
i	kin	کن	din	دن	bin	بن
u	kurd	کرد	kur	کر	kul	کل

Dengdêrên dirêj: a - ê - î - o - û

a	av	آف	sar	صار	bar	بار
ê	dêr	دیر	şêr	شیر	mêr	میر
î	tîr	تیر	zîv	زیف	şîv	شیف
o	dor	دور	sor	سور	kor	کور
û	kûr	کور	şûr	شور	dûr	دور

Dî zimanê Kurdî de bîst û sê dengdar hene:

b	bar	بار	bav	باڤ	ban	بان
c	car	جار	can	جان	cûn	جون
ç	çar	چار	çun	چون	çem	چم
d	dar	دار	dan	دان	dîn	دین
g	gav	گاف	giş	گش	garan	گاران
h	hîm	هیم	hêja	هێژا	halan	هالان
x	xanî	خانی	xêr	خیر	xwarin	خوارن
j	jîn	ژن	jor	ژور	jajî	ژاژی
q	qîr	قیر	qenc	قنچ	qelî	قلی
k	ka	کا	ker	کر	kom	کوم
l	lo	لو	law	لاو	lez	لز
m	mar	مار	mêj	میژ	mak	ماک
n	nan	نان	nerm	نرم	nas	ناس
p	par	پار	por	پور	pehn	پحن
r	rê	ری	rû	رو	reş	رش
s	sar	سار	sebat	سبات	sofî	صوفی
ş	şor	شور	şev	شف	şa	شا
t	têr	تیر	taqet	طاقت	tûj	توژ
f	find	فند	filan	فلان	fanos	فانوس
v	vajî	قاژی	vala	قالا	virnî	قرنی
w	war	وار	wek	وک	werîs	وریس
y	yar	یار	yek	یک	yarî	یاری
z	zor	زور	zabit	ضابط	nafiz	نافذ

Ji van pêve du herfên biyanî hene ku birek ji kurdan wan herfan dibêjin. Lewra ku ew herfên ha di eslên xwe de ne Kurdî ne. Me ew nexistine nav elfabeya xwe. Ew jî (ح) û (غ) ne, me ew du herf bi danîna du deqan ser "h" û "x" yê nîşan kirine. h- (ح)- hal حـ x- (خ) xar خار . Ku ev du deq ketin, ev herfên ha vedigerin ser herfên Kurdî û dibin "h" û "x". Ji xwe piranîya Kurdan şûna (غ), (خ) dibêjin; xeyîdîn "غبيدين" , xeyîdîn "خيدين"

Hawar dengê zanîne ye. Zanîn ji me re rêya felat û xweşîyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me de bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyîne a pêşîn e. Hawar jû pêve bi her tiştê ko kurdanî û Kurdîtî pê bendewar e, dê mijûl bibe.

*Bi xêzên jorîn ve me rêberî û rêzanîya elfabeya Kurdî kuta kir. Ji niho pêde bi hûrhûnandina hevedudanîna wî de mijûl bibin.*³⁸⁴

Çêkirin û hînkirina elfabeya Kurdî bi vî şeklî dest pê dike. Lê daxwaz ji xwendevanan tê kirin da ku pêşnîyarî û fikr û ramanên xwe derbarê elfabeyê da binivîsîn. Lewra kovar jî qebûl dike ku dibe kêmasî û xeletî yên wan jî hebin.³⁸⁵ Divê ew bi alîkarîya xwendevanan van kêmasîyan rast bikin. Ji bo vê yekê bangewazî ji xwendevanan hatîye kirin.

Mijara elfabeyê di 15 hejmarên Hawarê de cîh digre. Di van hejmaran de her beşeke elfabeyê, wek waneyan ji xwendevanan re tê ravekirin. Heya hejmara 24'an tîpa "q" û "k" di cîhê hev da dihatin bikaranîn.³⁸⁶ Di hejmara 24'a şûn da tîpên "k" û "q" wek bikaranîna îro cîhê xwe guhartin. Hinek guhartinên piçûk jî çêdibûn. Hinek tîpên taybet ku ji bo dengên h- (ح)- û (غ)' a elfabeya Erebi hatibûn bikaranîn, ji hejmara 30'î şûnde êdî nehat nivîsandin. Jixwe Mîr Celadet Bedirxan ev yek di hejmara yekem da anibû ziman.

Hawar çêkirina elfabeya Kurdî-Latinî wek ala serxwebûna edebî bi nav dike.³⁸⁷ Xweyê hawarê dibêje: "Bi çêkirina elfabeya nû, Kurd ji bin nîrê elfabeyên neteweyên din derketine. Heta berîya elfabeya Kurdî li ser keleha edebî ya kurdan alên bîyanîyan hatibûn çikandin. Bi weşandina Hawarê ve Kurdan ev alên bîyanî hildan û di dewsa

³⁸⁴ Bedirxan, C. (1932). Elfabêya Kurdî, *Hawar*, hj. 1, r.4.

³⁸⁵ Bedirxan, C. (1932). Elfabêya Kurdî-2", *Hawar*, hj. 2, r.5.

³⁸⁶ Kurd wek Kurd dihate nivîsandin. (s.ç)

³⁸⁷ Bedirxan, C. (1941). Sê Tarîxên Hawarê, *Hawar*, hj.27, r.4.

wan ala de, ala xwe ya netewî çikandin. Kurd elfabêya nû bi hêsanî hîn bûn, bê dijwarî xwendin, nivîsandin û kovar û pirtûkên Kurdî çapkirin.”³⁸⁸ Bê şik ev nêrînek hestîyarî ye, lê ji bo hestên dema çêkirina elfabeya nû jî balkêş e. Bi rastî jî, ev elfabe ji nû û tinebûnê nehatîye çêkirin. Belkî dikare bê gotin; li ser hîmê elfabeya latinî, ji bo dengên zimanê Kurdî hatîye guherandin û têkûzkirin. Herwekî pêşîyê jî ev lêanîn (adaptasyon) li ser elfabeya erebî hatibû çêkirin.

18 Tebaxê 1935’an de dema ku derketina Hawarê rawestiya, heta sala 1941’î ku carek din dest bi weşanê kir, hinek pirtûk bi elfabeya Kurdî-Latinî hatin çapkirin. Mîr Celadet Bedirxan vê yekê weke serkeftina elfabeya nû diwesîfîne. Ew dibêje ku kovara Hawar, gelek kesên ku bîrewerên heyîna xwe ne, hînê xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî kirîye, ew kes jî; ji milletê bê dibistan re bûne dibistan û welatîyên xwe hînê xwendinê kirine û milletekî xwenda anîn pê.³⁸⁹

2.4.2. Rêziman-Gramer

Ji bo ku ziman rast were nivîsandin, divê rêzimanê wî ya rast jî hebe. Wisa tê qebûlkirin; heta dema weşandina kovara Hawarê, bi zimanê Kurdî rêzimanê têkûz û çapkirî tinebû. Xebatên ku li ser ziman û rêzimana Kurdî çêbibûn, ji xwe me di beşa li ser zimanê Kurdî da nivîsî bû. Di wê beşê de jî pir zelalî dixuyê ku; ev xebatana bi rêk û pêk nebûn û kêmasîyên wan gelek bûn. Pirranîya wan jî, ne bi zimanê Kurdî bûn. Vê rastîyê Roger Lescot jî tîne ziman: “Mîr Celadet Bedirxan yek bîrewerê guherîn (ronesans) a çanda Kurdî ye. Heta dema wî, zimanê Kurdî bi kêma û kasî hatibû lêkolîn. Ewî rêzimana zimanê Kurdî çêkir û bi rêk û pêk kir. Ev şerefa mezin ya Mîr Celadet Bedirxan e.”³⁹⁰

Hawar heta hejmara 26’an elfabeya Kurdî ya nû çêkir û ew elfabe hînê xwendevanên xwe kir. Di vî warî de ewî bi gotina Mîr Celadet, “di nav milletê xwe yê bê dibistan de, karê xwe kêma û zêde bire serî.” Xweyê Hawarê, dixwaze gaveke nû bavêje ew gav jî; çêkirina rêzimanê bi rêk û pêk e. Ew dibêje: “Hîmê zimanekî, li ser sê hêmanên bingehîn sekinîye. Elfabe, rêziman û ferheng. Elfabe hate çêkirin, rêziman destpê dike, li pey jî ferheng e.”³⁹¹

³⁸⁸ Bedirxan, C. (1941). *h.n.*, r.4.

³⁸⁹ Bedirxan, C. (1941). *h.n.*, r.4.

³⁹⁰ Lescot, R., Bedirxan, C. (2009). *Kürtçe Gramer*, İstanbul, Avesta Yayınları, r.V.

³⁹¹ Bedirxan, C. (1941). *Sê Tarîxên Hawarê, Hawar*, hj.27, r.5.

Wek ku Mîr Celadet Bedirxan jî dibêje, heta wê demê derbarê zimanê Kurdî de gelek xebat hatine kirin û gelek tişt hatine gotin; lê di nav wan gotin û xebatan de bi qasî tiştên rast, tiştên ne rast jî hene. Ji ber wê, ew dixwaze ku xebata herî rast bi destê pisporekî weke xwe çêbike da ku xeletî û kêmasî kêmtir bibin. Pisporekî rêzimana Kurdî, li gor wî ew e: “Ez Kurd û Kurdmanc zimanîm û zimanê xwe rind dizanim. Min ew bi heft heşt zimanên din danîye ber hev, kitkitên wî hûr hûnandine; qeydeyên wî ji hev derxistine, dikarim ji biyanîyan bêtir û qenctir dehkera wî bidim xuyakirin û zanîn.”³⁹²

Xebatên Mîr Celadet li ser rêzimana Kurdî, di sala 1929’an de li Hesîçê destpê dike. Rêzimanekê piçûk ji bo dibistanê çêkirîye, lê nedaye çapê. Xêncî wê, rêzimanek ji bo zarokan bi navê “Kitêba Sinemxanê” jî nivîsandîye.³⁹³

Jimarên 16, 17, 18, û 26’an de di birê frensizî de xebatên li ser rêzimana Kurdî bi zimanê frensizî bi sereta “*De La Grammaire Kurde*” hatibû weşandin. Ji hejmara 27’an da, Hawarê dest bi belavkirina “Bingehên Gramera Kurdmancî” kiriye. Di bîst û du hejmaran da, rêzimana zimanê Kurdî hatîye nivîsîn û bi xwendevanan re pê bi pê, hûr hûr (weke ku mamosteyekî pisporekî û zîrek ji xwendevanên xwe yê di pola seretayî de dixwînin, ji wan re rave bike) hatîye vegotin. Hêmanên rêzimanê herçiqas temam nebûye jî; heta hejmara 54’an belavkirina rêzimana Kurdî dewam kirîye. Belê ji ber hinek sebebên giran weşana kovara Hawarê dewam nekir û di heman demê da nivîsandina rêzimana Kurdî jî herwisa nîvcîh ma. Yek ji hevalê Mîr Celadet Bedirxan, di heman demê de nivîskarê kovara Hawarê, zimanzanê Frensiz, Roger Lescot ev xebata rêzimanî temam kir û wek berhemeke bingehîn ji zimanê Kurdî re hîşt. Ji xwe dema ku Mîr Celadet Bedirxan “Gramera Kurdî” di Hawarê de diweşand, Roger Lescot ji Mîr Celadet xwestibû ku ew her du, bi zimanê Frensizî rêzimanekê bi rêk û pêk binivîsîn û biweşînin. Ev rêziman wek 168 rûpel hate nivîsandin û çapkirin; lê xebatên her du zimanzanan ji ber hinek sebebên neçû serî. R. Lescot dibêje: “*Piştî wêfata Mîr Celadet; him ji bo ku xebata wî ji windabûnê xilasbikim û him jî ji ber rêzgirtina bîranînen wî min dest avête rêzimana Kurdî da ku temam bikim. Me herduya bi hevra destpê kir, lê min tenê ev berhem qedand. Ya ku min kir ew beşên ku Mîr Celadet nivîsibûn, min careke din çav pê xist û hinek beşên nîvcîh jî temam kir.*

³⁹² Bedirxan, C. (1932). Armanc, Awayê, h.n., r.1.

³⁹³ Bedirxan, C. (1941). Sê Tarîxên, h.n., r.5.

Ew beşên ku hevalê min ê hêja nedît û min tena serê xwe nivîsye dibe xelet hebin. Berpîrsîyarîya wan kêmasî û xeletîya hemî yamin e.”³⁹⁴

Mîr Celadet Alî Bedirxan bingeha rêzimana Kurdî, bi dengan û bi elfabeyê ve, dest pê kirîye û danîye. Bi dirêjahî û kûr, li ser vê rêzimanê sekinîye û nivîsiye. Hemû sernavên rêzimanê bi zimanê Kurdî, ji nû ve bi nav kirîye. Nivîsarên Mîr Celadet Bedirxan yên li ser rêzimana Kurdî ku di Hawarê de hatine belavkirin, li gor rêbazeke zanistî hatîye nivîsandin. Ji ber ku gelek zimanên biyanî û hemû zaravayên Kurdî baş dizanibû; ewî bingeheke saxlem jo bo rêzimana zimanê xwe çêkir. Ne tenê li ser zaravayekî, li ser piraniya zaravayênê Kurdî sekiniye; lê rêzimana wî ya ku em behs dikin, li ser zaravayê Kurmancî ye.

Emê niha nimûneyek ji kovara Hawarê, li ser rêzimana Kurdî nîşan bikin. Ji mînakê jî dê baş bê xuyan kirin ku rêzimana Kurdî, wane wane hatîye nivîsandin. Bingeheên rêzimanê hûr hûr hatine rave kirin û bi mînakan hatine zelal kirin. Têgehên (term) ku heta wê demê bi zimanê Kurdî nehatibûn nivîsandin, di Hawarê de hatine nivîsandin û ew têgeh hê jî di rêzimana Kurdî de tên bikaranîn. Heke ku rêzimana Hawarê nebûya, dibe ku ew gengeşîya hê jî di nav zimanzanên Kurdî da heye, wê gelek kûr bibûya. Heke kêmasî û xeletî di vê rêzimanê de hebin jî; em bi dilrihetî dikarin bêjin ku bingeha rêzimana Kurdî ya nûjen, bi kovara Hawarê ve dest pê kirîye û avahîya rêzimana vî zimanî, li ser vî hîmî hatîye ristîn û bilind bûye.

Ji bona ku orjinaliteya metnê neyê xirabkirin, me xêncî hinek guherandinê piçûk orjîna metna rêzimana Hawarê li jêr wek nimûne nivîsandîye.

BINGEHÊN GRAMÊRA KURDMANCÎ

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHRÎVAN

RÊMANÊN BERPÊŞKÎ

- 1- **Gramêr:** Gramer tevayîya qeydeyên rastaxaftin û rastnivîsandina zimên e.
- 2- **Zimanê Kurdmancî:** Zimanê kurdmancî zimanê milletê kurdmanc e. Kurdmanc pê diaxêvin, dinivîsîn û bi gotinên din his û fikrên xwe pê eşkere dikin.
- 3- **Hêmanên zimên:** Di zimanê devkî de hêmanê bingehîn deng e. Deng bi tîpan tene sekinandin û bi wan zimanê nivîskî dest pê dike. Bi tîpan kî, û bi kîtan bêje bi hev dikevin. Pîrîcar bêje an kesekî an tiştêkî dinimîne. Gava çend bêje bi awakî

³⁹⁴ Lescot- Bedirxan, (2009). *b.n.b.*, r.VI-VII.

manadar digehin hev, ji wan komek çêdibe. Komek fikreke tam dide zanîn. Bi peyhevketina komekan qiset têtê pê. Qiset bi mijarekê mijûl dibe û ew ziman bi xwe ye. Ji gotinên jorîn dixuye ko hêmanên zimên çar in:

Tîp: a g ê u y h o p m j

Kît: ta, den, ser, co, rût, a, poz, ê.

Bêje: hesp, peyar, xanî, sipehî, gotin, were.

Komek: “Par ez çû bûm Rewanê.” “Îro dinya sar e.” “Gundê me di navbera du avan de ye.”

4-Tîp: Her dengê ko di dev û qirika me de peyda dibe, li ser kaxezê bi îşaretekê têtê sekinandin. Ji wan îşaretan re tîp dibêjin.

5- Tîpên zimanê kurdmancî: Di her zimanî de herçend deng hene, ewçend jî tîp peyda dibin. Ji ber ku di zimanê kurdmancî de sîh û yek dengên binigehîn hene, ji lewre tîpên zimanê kurdmancî sîh û yek in.

Hûrek: a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Girdek: A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

Bi adetî û gelemperi em bi hûrekan dinivîsîn. Girdek kêman caran tên îstî'mal (bikaranîn) kirin. Komek, bi girdekekê dest pê dike. Tîpa serenavekî ya pêşîn hergav girdekek e.

6- Dengdayiya tîpan: Tîp ji awirê dengdayiyê ve bi du biran leva dibin: dengdêr û dengdar.

7- Dengdêr: Dengdêr ew tîp in ku bi serê xwe ji devê me dertên û dengêkî mûsîqayî tînin pê. Dengdêrên zimanê kurdmancî heşt in: a e ê î î o u û

8- Dengdar: Dengdar ew tîp in ku bêtî arîkariya dengdêrekê nikarin ji devê me derkevin û dengêkî mûsîqayî bînin pê. Ew di devê me de dikevin hin cihan, wek lêv, diran û ezmanê dev û ji wan pêjneke kerr peyda dibe. Dengdarên zimanê kurdmanci bîst û sîse ne:

b c ç d f g h j k l m n p c r s ş t v w x y z.

Di vir de Mîr Celadet ji bo vê seretayê zelaltir rave bike, wek jêrenotekî (bi navê şanek), mijarê bi mînakan zelal dike.

Şanek: Di pratîkê de dengdêr ji dengdaran bi awayê jêrîn têne derxistin. Dengdêr ji serê xwe jî dikarin kîtekê bînin pê. Lê dengdar bêyî dengdêrekê tu kîtê nayînin pê. Herwekî di kîta “par” de heke me dengdarên (p) û (r) xistin û (a) bi tenê hîşt ew (a) bi serê xwe jî kitek e. Lê (p) û (r) beyî (a) yê, yan dengdêrekê din, nikarin kîtekê bînin pê.

9 -Doma dengdêran: Dengdêr ji awirê domê ve bi du biran par dibin, kurt û dirêj:

Dengdêrên kurt: e i u

Dengdêrên dirêj: a ê î o û

Dengdêrên kurt bi derbekê ji devê me dertên, devê me bi nîvî vedibe, doma wan hindik e, û ew tu caran dirêj nabin.

Dengdêrên dirêj gava ji devê me dertên dom dîkin, devê me bi temamî vedibe û ew tucaran kurt nabin.

Herçend dengdêrên kurt (e i u) û dengdêrên dirêj (ê î û) ji aliyê şikilî ve nîzingî hev bibin jî, ji aliyê dengî ve ji hev dur û gelekî biferq in. Ji ber ku cihderka heryekê cuda ye.

10- Xweseriya hin dengdêran: Dengdêrin hene ku nikarin bikevin pêşî an paşîya hin dengdaran. Hinên din jî di pêşî an di paşîya bêjeyan de peyda nabin.

“I” Ev dengdêra ha bi gelemperî nakeve pêşî an paşîya bêjeyan. Yanî bêjeyên kurdancî ne bi (i) yê dest pê dîkin ne jî pê temam dibin. Ji hin daçek û pronavan pê ve; mînak: li, di, ji, bi, ci

Ji milê din bêjeyên ko di eslê xwe de ne kurdancî ne, û ji zimane biyaniyan ketine zimanê me bi “i” yê dest pê dîkin.³⁹⁵

Heta vira hejmara 27’an de hatîye nivîsandin. Dumahîka her dersekî di hejmara paşîn de domandîye. Emê jî ji bo nimûne di hejmara 28’an de dewam bikin.

“Wek: “Ibret, icra, iflas, imza, inkar, insaf, isaret”. Ji xwe kurdancên kevin gava ev bêjeyên ha bi lêv dikirin “h” yek didan pêşîya wan û digotin: (hibret, hicra, hiflas, himza, hinkar, hinsaf, hişaret). Ev bilêvkirina ha hetanî îro jî di hin cîhên din de peyda dibe.

³⁹⁵ Bedirxan, C. (1941). Bingehên Gramêra Kurdancî, *Hawar*, hj.27, r.11-12.

Şanek: Dengdêra “î” di hin bêjeyan de û gava kêtek bi wan bêjeyan ve dibe, naye xwendin, le tête nivîsandin; ji ber ko di eslê bêjeye de “î” heye û gava kîta ko wê nade xwendin jê dibe “î” tête bi lêv kirin. Wekî niho, “î” yen bêjeyên “qetil, bihin, remil, qifil, resim, eqil, qedir, qehir, rikin, kevin, şikil, qesir, fikir, şikir, sihir, tevin, tihin” gava bêje bi serê xwe ne, tête xwendin. Lê heke kêtek bi paşîya wan ve bû ew “î” nayine bi lêv kirin. Herwekî: “qetla wî, ev çi bihn e? bi remlê dizane, bi qiflê, van resman, eqlê te, qedrê wî, ji qehran, rîknên Birca Belek, ev kevn e, di vi şiklê de, qesra jorîn, bi vê fikrê, şikra xwe, bi sihrê, li ser tevnê, ez tihn im.”

Lê ew di vê bilêvkirinê de jî ve kîta xwe ya binhegîn hiltînîn û di şiklên jêrîn de tête nivîsandin. (qetila wî, ev ci bihin e? bi remilê dizane, bi qifilê, van resiman, eqlê te, qedrê wî, ji qehran, rîkinên Birca Belek, ev kevin e, di vi şikilê de, qesira jorîn, bi vê fikirê, şikra xwe, bi sihrê, li ser tevinê, ez tihin im). Lê heke pêr an, parkêtek bi wan ve bû û pê bêjeyekê nû û hevedudanî hâte pê, heke (î) neketiye bêjeya nû naye nivîsandin. Ji ber ku ev pêr an parkê, nema ji wê bêjeyê dibin û ev bêjeya hevedudanî bêjeke biserxwe ye û we vekîta xwe ya xweser heye. (Kevin, kevnar, Bihin, bihnok, Tevin, tevnepirk)

Lêbelê, heke ji bervajî ve di bêjeya nû û hevedudanî de (î) hate bilêvkirin tête nivîsandin jî.(Şikir, - şikirdar, Sihir, sihirbaz, Remil, remildar, Eqil, eqilmend, Qedir, qedirgiran)”,³⁹⁶

Ev rêzimana ku kovara Hawarê bîngeha wî ristîye, îro jî (bi kêma û zêde) ji alîyê zimanzan û Kurdînivîsan ve tê bikaranîn. Gava em nîqaşên di navbera zimanzanên Kurd yê îro dinîhêrin, tiştekî wiha tê hişê meriv: Heke Mîr Celadet Bedirxan ev rêzimana çê nekiribûya; îro gengeşî û tevlihevîyeke mezin wê çêbibûya. Termên ku Mîr Celadet di rêzimana xwe de bikaranîye, hema hema bi temamî îro jî tên bikaranîn. Helbet meriv nikara bêje ev rêziman bi temamî rast û bê kêmasî ye. Ligel kêmasî û xeletîyan ve heta îro vê rêzimana girîng di nav zimanzanîya Kurdî de cîhekî mezin girtîye. Heke pirtûkên rêzimanê yê îro, bîna xwendin û lê hûrbibin; wê bandora rêzimana Hawarê baştir were xuyakirin.

2.4.3. Edebiyat

Em dibînin ku Hawar bi rastî jî wek dibistanekî tevgerîyaye. Çawa dibistan xwendevanên xwe bi awayekî rêk û pêk perwerde dike; her wisa jî Kovara Hawarê bi

³⁹⁶ Bedirxan, C. (1941). Bîngehên Gramêra Kurdmancî, *Hawar*, hj.28, r.9.

awayekî rêk û pêk xwendevanên xwe hîne ziman û edebiyata Kurdî kirîye. Serî de elfabeyek nû (Latînî) durust kirîye, paşê bi wî elfabeyê ve hîmê edebiyata zimanê wê elfabeyê avêtîye. Ji edebiyata klasîk a nivîsandî bigre, edebiyata devkî û heta edebiyata nûjen cîhê xwe di nav rûpelên Hawarê de girtîye. Çawa ku Dr. Kamiran Bedirxan jî dibêje, edebiyata miletekî, reng û bihna jiyana wî ye. Hest û raman, bawerî, hêvî, diltengî, kêfxweşî, serpêhatî xebat, dab û nêrîta wan, ji edebiyata miletan tê naskirin. Edebiyat jî we ku tê zanîn, bi devkî û bi nivîskî ye.

Nivîskar M. Bekir, taybetîyên Edebiyata Kurdî ya devkî wiha dipesînîne: “Edebiyata Kurdî ya devkî hewqas bilind, dewlemend û rengîn e, ku hempayê wê di nav edebiyatên cihanê da gelekî kêr in; lê Kurdan dewlemendiya vê gencîneyê nas nekirî bûn. Kurdnasên biyanî, berî herkesî, ev dewlemendiya hanê nas kirine û li hember vê edebiyata devkî ecêbmayî mane. Wan hê tiştekî wisa rind û rengîn nedîti bûn. Hema dest bi komkirina folklora Kurdî kirine û ew wergerandine zimanên ewrupayî. Zimanên wek Rûsî, Almanî, Frensîzî, Îngilîzî, Îtalî hwd. Bi xebata wan camerên biyanî, birekî hêja ji folklora miletê Kurd hatiye parastin.”³⁹⁷ Nivîskar, rojhilatnas û kurdologên wek, Alexandre Jaba, Oscar Mann, Basil Nikitine, Roger Lescot, D. N. Mackenzie, hinek ji wan kesanin ku nivîskar Mihemed Bekir li jor behsa wan dike.

Hawar, wek ku gelek kesan jî gotibû; wek pireka qedîmî bû di nav edebiyata klasîk û ya nûjen. Gava em rûpelên Hawarê vedikin, rastî hemû cureyên edebiyata nûjen jî tên, rastî berhemên edebiyata klasîk jî. Edebiyata klasîk û ya nûjen bê tenaquis di nav rûpelên Hawarê de cîhê xwe girtine. Dîwana Melayê Cizîrî, ji alîyê Qedrî Cemîl Paşa ve di hejmara 35'an de dest pê kirîye heta hejmara dawî, di Hawarê de hatiye belavkirin. Her wisa Mem û Zîn a Ehmedê Xanî jî; ji alîyê Mir Celadet Bedirxan ve ji hejmara 45'an heta hejmara dawîyê hatiye nivîsandin. Klasîkên Kurdî yê din jî, di nav Hawarê de xwe ra cîh dîtine. Hawar wek hemû beşên ziman, di warê edebiyatê de jî xebat û nêrînen xwe bi zanistî kirîye. Ji bona kêmasî û nexweşîyên edebiyatê baş bibînin; rewşa edebiyata Kurdî û cîhê wî, berawirdî edebiyatên cihanê kirîye da ku çareserî û rêyeke rast bide ber xwe. Xebatên li ser edebiyata klasîk de jî, ev rêçik û rêbaz heye. Berî her tiştî, edebiyata klasîk çî ye? Bersîva vê pirsê digere û ji xwendevanan re dibersivîne. Di cihanê de nimûneyên vê edebiyatê û rewşa wî nîşan dike, paşê jî rewşa edebiyata Kurdî ya klasîk beramberê ya cihanê bi hevra radixe ber

³⁹⁷ Bekir, M. (1987). Pêşgotin, *Wergera Hawarê 1-9*, Stockholm, Weşanxana Hawar, r.XIV.

çavan. Hawar dide zanîn ku li ser klasîkên Kurdî, xebateke dûr û dirêj divê. Hawar hêvî dike ku hinekên din vî karê giring bikin û li ser edebiyata klasîk xebatên kûr û berfireh bê kirin. Kovar pirseke balkêş vê derbarê de ji xwendevan dipirse û bi nivîseka Mîr Celadet ve bersîva vê pirsê (bi bernavkê Herekol Azîzan) dide:

“Gelo di edebiyatê de, klasîkên kurdmancan ki ne? Ew kengê rabûne û bi paş xwe ve çi eser hiştine?

Bersîva vê pirsîyariyê ne hêsanî ye û jê re xebateke zor divêtin. Ji xwe ji eserên beriya îslamîyetê hesêb tiştek ne maye. Piştî îslamîyetê, ji nav Kurdan gelek şair, edîb û peyayên zana rabûne, lê berhemên xwe bi piranî bi erebî, bi farisî an jî tirkî nivîsandine. Ji wan mîletan û edebiyata wan re xizmeteke mezin kirine. Herçî şairên tirkî yên mezin, yên ku serê tirkî bilind dîkin Nabî, Nefhî û Fîzûlî her sê jî kurdmanc in. Yên ku bi kurdmancî nivîsandine gelek hindik in û wan jî bala xwe ne daye zimên û zêdetir kêfa xwe ji peyvên erebî û farisî re anîne. Digel vê hindê ev çend eserên ku pêşîyan ji me re hiştine, edebiyata me ya klasîk diîtin pê û di nav wan de berhemên kûr û hêja hene. Ji xwe herçî folklorê me ye, yanî edebiyata xelkê, di nav folklorên dinyayê de, bi bijarteyî dikeve rêza pêşîn. Di rojhelatê nîzing de folklorê tu mîletî ne gihastîye dereca folklorê me. Herçî klasîkên me, herwekî me got ev behseke dirêj û zehmet e, û jê re wextekî fireh divêt. Ev ne îşê bendekê an du bendan e. Heke îro em vê bendê dinivîsînin mîxsedê me ne ew e ku em li vê behsê hûr bibin û klasîkên xwe bisenîfînin. Bi tenê em dixwazin vê behsê vekin; bi hêviya ku hinekên din pê mijûl bibin û tiştekî têkûz bi ser xî. ”³⁹⁸

Mîr Celadet di nivîsa xwe ya “Li Ser Klasîkên Kurdî” de rewşa edebiyata klasîk û nivîsarên wan yên wê demê radigihîne:

“Di vê babetê de di destên me de tu wesîqe nînin. Tiştên ku ez pê dizanim, min pirê wan ji şêxê rehmetî, Evdirehamanê Garisî bihiştine. Ji mile din, di kitêba Kurdîzanê Êrîs Eleksandr Jaba de der heqê edebiyata Kurdî hin not hene. Jaba jî melayekî kurdmanc³⁹⁹ re di heqê edebiyata me de bendekê dabû nivîsandin. Melayê kurdmanc, ji xêra Xwedê re, benda xwe ne bi erebî, ne bi farisî û ne jî bi tirkî, lê bi kurdmancî nivîsandiye.”⁴⁰⁰

³⁹⁸ Azîzan, H. (1941). Klasîkên Me, *Hawar*, h.33, r.6.

³⁹⁹ Mela Mehmûdê Bayezîdî (s.ç)

⁴⁰⁰ Azîzan, (1941). *h.n.*, r.7.

Şanek: Ew berhema ku Herekol Azîzan behs dike berhema M. Alexandre Jaba ye ku bi alîkarîya Mela Mehmûdê Bazîdî nivîsiye, navê berhemê, “*Recueil Des Notices Et Récits De La Littérature Et Des Tribus Du Kourdistan (Cami’î Risaleyan we Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî)*” ye. Berhem bîrek bi Frensîzî û bîrek bi Kurdî û bi tîpên Erebi hatîye nivîsandin. (s.ç.)

Kovara Hawarê, edebiyata klasîk û edîb û nivîskarên edebiyata klasîk bi milletê wan daye naskirin. Mela Ehmedê Cizîrî, Elî Herîrî, Feqîyê Teyran, Melayê Bateyê, Ismaîlê Beyazidî, Şerefxan, Miradxan Bayezidî, Siyehpûş, Axayokê Bêdarî, Mewlana Xalidê Şehrezorî, Mela Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrê, Şêx Evdîlqadirê Gêlanî, Nalî, Şêx Riza Talabanî, Hacî Qadirê Koyî, Osman Efendîyê Babîj, Mela Ehmedê Heyderî, Mela Ehmedê Xasî, Şêx Evdirrehmanê Axtêpê, Şêx Evdirrehmanê Taxê, Melayê Arwasî û hwd. Kêm kes hebûn ku jînenigarîya van hêmanên edebiyata klasîk nasbikin. Hawarê ev nivîskar, helbestvan û zanayên vî milletî bi milletê wî dan naskirin û hinek ji berhemên wan, bi nivîskî wek nimûne di nav rûpelên xwe da weşand.

Rêvebirên kovara Hawarê dizanibûn ku milletên pêşdeçûyî xebatên xwe, berhemên xwe bi zimanê xwe afirandine. Tê dîtî ku edîb, zana û nivîskarên mezin yên Kurd wê demê jî gelek hebûne. Lêbelê wana ne bi zimanê xwe, bi zimanên wê demê yên ku derbasdar bûn nivîsibûn. Yên wek Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Hacî Qadirê Koyî, Nalî û Ehmedê Xanî bi zimanê xwe nivîsibûn û ji bo peyrewên xwe, rê û şopek nû vekiribûn. Lê wisa tê xuyankirin ku nîşên li pey wan hatin, ew ne şopandîne û dîsa bi zimanên derbasdar yên wê demê ve nivîsîne û berhem afirandine. Mebesta kovara Hawarê ewe ku rewşenbîr û edîbên Kurdan bi zimanê xwe binivîsin û edebiyateke têr û tije bi zimanê xwe biafirînin.

Nivîsa li jêr, ya Dr. Kamiran Bedîrxane ku nêrîna kovarê, armanc û rêgeza Hawarê ya li ser edebiyatê nîşanî me dike. Di nav civakê de bandora edebiyatê, edebiyata netewî, girîngîya xebatên edebî û dîsa bi taybetî jî ziman, mijara vê nivîsê ye. Bandora edebiyatê, ya li ser ziman jî di vê nivîsa bi navê “Edebiyata Welatî” de, raberî xwendevanên kovarê dike.

“Edebiyata welatî, ew edebiyat e ku ji jîna milletî, ji hiş û dilê wî, ji dîrok û çîrçîrokên wî, ji stran û lawîje yên wî hiltê. Kanîya wî, dilê millet, hiş û heyata wî ye. Tenê ev edebiyat e, ku germ, rengîn, bibihî û xwedan ronahî ye. Ji vê edebiyatê, dengê blûr û dîlanê, stranên çiyê, zîzîya hêvîn û hezkirinê bi teptepa dilan ve tîn bihîstin.

Piranîya miletan pirîcar vê rastîyê seh ne dikirin, ber ne diketin. Li Ewropayê, hinek millet hebûn ku hez ji zimanên xwe ne dikirin. Zimanên xwe piçûk, teng, nerind û nehêja didîtin. Ev hal di welatên Rojhilatî de jî dihat dîtî. Herwekî di nav kurdan de, heçî merivên zana radîbûn kitêbên xwe ne bi zimanê Kurdî, lê bi zimanê biyanîyan dinivîsandin. Piştî xebata sedan salan, di welatên ewropa û rojhilat de hate seh kirin ko ev rê dernakeve û bi vî awayî naçe serî. Lewra millet guh ne dida wan kitêban û bi

xebata wan merivan berxwudar ne dibûn. Ber vê yekê, ev mirovên ha vegeriyan ser zimanên xwe. Vêca xebata wan zûka berên xwe dan û millet pey edebiyata wan çû. Bi vî awayî di nav wan miletan de edebiyateke geş û zindî carî bû. Êdin her kes zana, nezana, bajarî, gundî ku xwendinê zanî be, zimanê wan seh dikirin û kitêbên wan dixwendin. Ji xwe welê jî diviya bû. Ji ber ku ji nivîsandin û belavkirina kitêban qesd ew e ku hiş û fikrên qenc bikevin nav xelkê, di dil û serên wan de cîh bigirin.

Ji mesela zimanî pêve meseleke din jî heye. Herwekî tê zanîn, fikr û his di dora zimanî de digehînin hev, û her ziman fikr û hisên xwe û awayê gotina xwe bi xwe re hildigire û ew pê re diguhêzin, û pey zimanên xwe dikevin. Bi vî awayî digel zimanî fikr û hisên biyanîyan jî tên dikevin nav me, di dil û hişê me de cîh digirin, û rû û gonê me ên manewî diguhêrînin, diheşîfînin vedibe û dikeve pêşîya me. Paşî vê gotinê, qesda me, awayê edebiyata me ji xwe tê seh kirin, û ew rêya ku tê re dixwazin herin bi xwe vedibe û dikeve pêşîya me.

Vêca divê ku em bi zimanê dê û bavên xwe, bi zimanê şîrîn û delal, bi zimanê Kurdî, bi Kurdîya xwerû binivîsînin, û fikr û hisên xwe ji çîrok û stranên Kurdî bigirin. Ji xwe Ehmedê Xanî berî sêsed salî vê rêyê ji me re vekirî bû. Lê heyf paşîyên wî pê ve ne çûn. Xanî xurtîya zimanê xwe hêj wê gavê hesiya bû, û ji wan re ku pê ne dinivîsandin bi beyta jêrîn dixwest bide zanîn.

Safî şemirand vexwarî durdî

Manendê derî lîsanê Kurdî

Êdin çax e, ko em bidin pey Xanî. ”⁴⁰¹

Beşeke girîng ya edebiyatê jî zargotin e. Kovara Hawarê, zargotina (folklor) Kurdî jî dabeş kirîye. Li gor vê dabeşkirinê jî, nimûne berhev kirîye û evan nimûneyan di Hawarê de hatine belavkirin. Stran, çîrok, çîrçîrok û medhelokên curbecur di Hawarê de cîh girtîye. Hawar dabeşkirina stranên Kurdî di hejmara 3’yan, di birê frensizî bi vî awayî nîşan dike.

Li gor berdewamîya stranan

1- Stranên ku demeke dirêj dijîn û li gelek deverên welêt têne strandin.

2- Stranên ku demeke kurt, pirîcaran, tenê salekê dijîn.

Li gor meqamê stranan:

1- Lawik: Stranên lîrîk û evînê

⁴⁰¹ Bedirxan, K. (1932). Edebiyata Welatî, **Hawar**, hj.1, r.5.

- 2- Şer: Stranên li ser şer û cengê
- 3- Dîlok: stranên govend û dîlanê
- 4- Lavij, lavijok, laje: Stranên olî (dînî)
- 5- Bêrîte yan jî bêlîte: Stranên feqîyên medreseyan
- 6- Beste: Stranên tevî giran.⁴⁰²

Di wêjeya Kurdî de heta demekê, edebiyata devkî çiqas xurt û bihêzbe jî; gava ku meriv vedigere li edebiyata nivîskî dinihêre ew jî; li gor edebiyata devkî, hinek bêhêz û qels dixuyê. Lê ev nayê wê wateyê ku di warê edebiyata nivîskî de tu tiştek çenebûye. Belê, rewşenbîr û zanayên wek Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Melayê Bateyê û hwd. gelek dîwanên giranbiha ji wêjeya Kurdî re diyarî kirine. Lêbelê li hember çand û edebiyata devkî ku hewqas xurte, ev xebatan bi hejmara xwe ve gelek hindikin. Dema edebiyata Kurdî ya nivîskî berawirdê ber bi ya devkî bibe, wê bê dîtin ku ferqeke mezin di nav wan da heye. Kovara Hawar vê kêmasî û paşdemayîne jî, ji xwe ra dike mijar û bi nivîsên cur be cur, derbarê edebiyata Kurdî de nivîsan belav dike û rêya xurtkirina edebiyatê digere.

Ji wan nivîsan yek jî, ku bi rêk û pêk li ser Edebiyata Kurdî di Hawarê de hatiye nivîsandin, ji pênûsa Hevindê Sorî derketîye. Hevind, di hejmara 5'an de bi zaravayê soranî bi sernavê "Edebiyatî Kurdî" derbarê wêjeya Kurdî de çend nivîsên girîng û balkêş nivîsîne. Ev nivîsana di hejmarên 7 û 8 an de jî dewam dîkin. Hevind, li ser gelek pîrsgirêkên edebiyatê sekinîye. Rewşa edebiyata Kurdî û peywendîyên edebiyata Kurdî bi edebiyata cihanê re, bi taybetî jî edebiyata milletên arî mijara van nivîsan e. Li gor wî, edebiyata zimanên ewropî li ser sê lingan heta roja îro hatiye. Wan her sê cureyan jî wiha rêz dike.

- 1- Edebiyata goranî
- 2- Edebiyata çîrokî
- 3- Edebiyata komêdî⁴⁰³

Dîtina Hevind ewe ku Kurdan jî wek milletên ewropî, di demên berê da hest û ramanên xwe bi helbest û stranan anîne ziman. Piştî çîrokên helbestkî û drêj di nav xwe da gotine. Yanî Kurd edebiyata stranvanî û çîrokî wek milletên hindo - ewropî pêk

⁴⁰² Bedirxan, C. (1932). Le Folklore Kurde, **Hawar**, hj.3, r.10-11.

⁴⁰³ Sorî, H. (1932). Edebiyatê Kurdî, **Hawar**, hj.7, r.3.

anîne. Lê di edebiyata komedî de paş de mane û hê negihîştîne wê qonaxê.⁴⁰⁴ Hevînd di wê bawerîyê de ye ku edebiyata Kurdî, bi taybet di warê çîrokê da, ji edebiyatên zimanên rojava kêmtir nîne û tu ferq di navbera wan de tune. Herwiha di navbera Mem û Zîn û dastana Ilyada de çî ferq nîne. Ew dibêje ku; herçiqas medeniyet li nav miletê Kurd de pêşve here, hewqas ew edebiyat jî dê bilintir û tekûztir bibe.⁴⁰⁵

Hawar, ji bo pêşvebirin û xurtkirina edebiyata Kurdî ya nivîskî da jî, gelek xebatên girîng, bi zanistî kirîye. Mîr Celadet di nivîsa xwe ya bi navê “Heyîneke Yeksalî” de van xebatan wiha dinivîse: “Bi bîst hejmarên kovara me ku heta niha belav bûne, me dil fikir, em her awayê nivîsandinê biciribînin û bêxin zimanê xwe. Herwekî awayên bingeşî, nezm û nesir û çend şiklên nesrê kêr û zêde di Hawarê de belav bûne. Tenê awayê temaşayê hebû ku hêj neketibû zimanê me. Mîna ko xwendevanên me di vê hejmarê de dê bixwînin, me ew şikl û awa jî ceriband û xiste nav zimanê xwe. Temaşake piçûk bi navê *Hevînd*. Ev mewzûa ha mewzûa kitêbekê ye, ne mewzûa çend stûnan. Lê herwekî hate gotin ev tenê ji bona ceribandin û êxistina zimanê temaşayê, bi zimanê me hatiye nivîsandin.”⁴⁰⁶ Ji vê gotinê jî baş tê têgihîştin, armanca Hawarê ewe ku; hemû cureyên wêjeyî yên cihanê, di zimanê Kurdî da jî biciribîne, binivîsîne û vî zimanî jî, ji van cureyan bêpar nehêle.

Xêncî hebûna hemû cureyên edebiyatê, Hawar ji nivîskar û xwendevanan jî dixwaze ku nivîsên wan ji alîyê edebî ve xurt bin. Di hejmarên ewilî de ji ber kêmbûna nivîskaran û nivîsan, kovarê zêde guh nedida vê yekê, lê ji hejmarê 20’an şûn de, hatibû xwestin ku, divê êdî nivîs û helbest têkûz bin û ji alîyê edebî ve jî bi rêk û pêk bin.⁴⁰⁷ Yek ji nivîskarê Hawarê û di heman demê de, di edebiyata Kurdî de kesekî bi nav û deng Osman Sebrî jî, li ser rewşa qalîteya nivîsên edebî, di kovarê de rexneyeke bicîh dike û vê rexneya xwe jî, wek gazind wiha tîne ziman:

“Binalîya çapkirina Hawarê, ji bona danîna bingeşa zimên bû. Ji bo vê yekê jî herwekî xweyîyê Hawarê di hejmarê yekê de dabû zanîn ku qesda belavkirina Hawarê civandina peyvên Kurdî yên ku wînda bûne, edebiyata kevînar û ya nûjen, çîrok, çîrçîrok û rêzimana Kurdî bûn. Ez niha dinihêrim ku hinek birayên me yekcar, ji bo ku navên xwe di kovarê de bibînin çav dane şîr û bendikan. Hinek bê pesna xwe pêve tu tiştî nanivîsînin.

⁴⁰⁴ Sorî, (1932). *h.n.* , r.4.

⁴⁰⁵ Sorî, (1932). *h.n.* , r.4.

⁴⁰⁶ Bedirxan, C. (1933). Heyîneke Yeksalî, *Hawar*, hj.20, r.2.

⁴⁰⁷ Bedirxan, C. (1933). *h.n.* , hj.20, r.2.

Dil dixwaze ku di vê qada zanatîyê de yên wekî Evdîlxalik Esîrî, Hevîndê Sorî, Cegerxwîn hespên xwe bibe zînin da ku edebîyat û ziman têkûz bibin. Em jî pê zana bibin. Ne ewên ku çar pîrsên bêmana bidin ber hev û navekî dûrdirêj di bin de daçikînin.”⁴⁰⁸ Ev gazînd û rexneyên Osman Sebrî îro jî, ji bo wêjekaran derbasdarî û rastîyeke eşkere ye.

Kovara Hawar, ji alîyê hemû cureyên edebîyatê bi xwendekarên xwe dida naskirin û bi zîmanê Kurdî jî van cureyan nivîs dihatin belavkirin, ji alîyê din ve jî; berhemên giranbiha ji zîmanên biyanî werdigêrande zîmanê Kurdî. Hinek berhem û nivîsên hatine wergerandin û di kovarê de hatine belavkirin ev in:

- Seyahatnameya Ewliya Çelebî, wergêr: Dr. Kamiran Bedîrxan (h. 16)
- Kardûx û Welatê Wan, Ksenofonê Yûnanî, wergêr: Celadet Bedîrxan (h. 32)
- Bawerî Bêganeyêk, Mecer Hey, wergêr: Hevîndê Sorî (h. 17)
- Kurd û Kurdistan Bi Çavê Biyanîyan, M. Hartman, Moltke, wergêr: Celadet Bedîrxan (h. 19, 23, 24)
- Tefsîra Quranê û Hedîsên Pêxember, wergêr: Dr. Kamiran Bedîrxan, Ji jimara 27-an da dest pê dike)
- Çarînen Xeyam, wergêr: Dr. Kamiran Bedîrxan (h. 17-24)
- Derketî, Lamennais, (h. 29)
- Ji Xortan Re, Rudyard Kipling, (h. 29)
- Stêrk, Alphonse Daudet, (h. 33, r. 4-6)
- Xatûn An Piling, Frank Stockton, (h. 44) jî; ji alîyê Dr. Nûredîn Zaza, hatine wergerandin.

Herwiha kovara Hawarê, di birê firensîzî da, nivîsên gelekî giring li ser zîman, edebîyat, dîrok, civak û jîna Kurdan belav dikir. Gelek çîrok û stranên Kurdî bi zîmanê Frensîzî cîhê xwe di kovarê de girt û bi vî awayî zîman, edebîyat û çand ji biyanîyan re hate danasîn.

- Zîmanê Kurdî, Celadet Bedîrxan (h. 1, 2, 3)
- Elfabeya Kurdî, Celadet Bedîrxan (ji jimara pêşîn da dest pê dike)
- Folklorê Kurdî, Celadet Bedîrxan (h. 3, 4)

⁴⁰⁸ Sebrî, O. (1932). Gazînd û Gîlî, **Hawar**, h.14, r.4.

- Même Alan: Celadet Bedirxan ev destana Kurdî, bi firehî, di gelek jimaran da belav kiriye (ji jimara 4'an da dest pê dike)
- Mêvandariya Kurdan, Dr. Kamiran Bedirxan, (J. 6)
- Çend têbînî li ser Mishefa Reş, Dr. Kamiran Bedirxan, (J. 14-16)
- Rêzmana Kurdî, Celadet Bedirxan (ji jimara 16'an da, dest pê dike)
- Jina Kurd, Dr. Kamiran Bedirxan (J. 19)

Hawarê di hinek hejmarên xwe de cîh daye edebiyata zarokan jî. Bi rastî, ji bo wê demê ev gaveke gelek girîng bû. Lewra edebiyata zarokan, hê jî di nav edebiyata Kurdî de cîhê xwe yê esasî negirtîye. Lê di wan salan de, kovarê di “stûna zarokan” de cîh daye zarokan û ji bo wan helbest çîrok û çîrçîrok nivîsandîye û belav kirîye. Helbesta bi navê “Buhar” û “Şeva We Xweş” di hejmarên yekem û sisîyan de, di kovarê de hatine weşandin.

BUHAR

Buhar e, nuh buhar e,
 Tebîet giş li kar e,
 Çi heyadedan çi hal e,
 Her tişt zendî rewal e.
 Buhar e, ev buhar e,
 Tebiet giş li kar e.

Berf dihele li zozan,
 Stirî şîn in li deştan.
 Kulîlk hêj nuh şepal in,
 Gul û bilbil hevalin.
 Buhar e, ev buhar e.
 Tebiet giş li kar e.
 Mij ketîye li doran,

Hure hur e tum baran.
Mîh û berx in dikalin,
Kew li marî dinalin.
Buhar e, ev buhar e.
Tebiet giş li kar e.

Roj vedide mina bûk,
Şun ve mane ba û pûk.
Şehar, zinar, lat û ber,
Diçirisin der bi der.
Buhar e, ev buhar e.
Tebiet giş li kar e.⁴⁰⁹

ŞEVA WE XWEŞ

Şev e, şev e; roj çû ava
Hingûrê re cihê xwe da.

Roj safirî ket li doran,
Soringa wê ma li boran,

Le, şûna xwe vala nehişt,
Hêv û stêrik şandin ji pişt.

Hêdî hêdî hilhatine,
Li ser seran xweş hatine.

⁴⁰⁹ Bedirxan, C. (1932). Buhar, *Hawar*, hj.1, r.4.

Ber bi me tên ji zozanan,
Belav bûne li ezmanan.

Hatin hatin pêrgî-hev bûn,
Pêwr û mêzîn rengî-hev bûn.

Xemilandî geş û şîrîn,
Dinêrîn me ji kakeşîn.

Deşt û newal mîna sih in,
Pozên çîyan wek birih in.

Xuya nakin herçî dur in,
Herçî gir in, tev de hûr in.

Xewa min têt xewa şîrîn,
Li min xweş e, cih û nivîn.

Himbêz bikim dayîka xwe,
Ez xwe bidim landika xwe.

Hêvî dikim sibeke geş,
Guhdarino şeva we xweş.

(Nivîsa helbestê, Şam, 18 Tîrmeh 1931)⁴¹⁰

⁴¹⁰ Bedirxan, C. (1933). Şeva We Xweş, *Hawar*, hj.3, r.2.

Hawarê xêncî nivîsên edebî, çandî û li ser ziman, belavkirina fikr û ramanên xwe yên di vî warî de, bi çapkirina gelek berhemên Kurdî jî; edebiyata Kurdî re xizmet kirîye. Di wan demên desteng û kêr derfet da, Hawarê pirtûkxaneyê xwe bi gelek pirtûkên Kurdî ve dewlemend kirîye û ev pirtûkxanê jî; ji edebiyata Kurdî re hiştîye. Li gor ku dawîya hejmarên kovarê de hatîye danasîn; Kitêbxana Hawarê jî van kitêban pêk hatîye.

1- Rêzana Elfabeya Kurdî - Celadet Alî Bedirxan

2-Elfabê- Celadet Alî Bedirxan

3-Dilê Kurên Min- Dr. Kamiran Alî Bedirxan

4-Bîyîşa Pêxember- Bi Kurdiya dumilî (zazakî), bi dibaca Celadet Alî Bedirxan

5-Nivêjên Êzediyan- bi dibaca Celadet Alî Bedirxan

6-Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re- Celadet Alî Bedirxan

7-Mesela Kurdistanê- Bazîl Nîkîtîn

8-Ji mesela Kurdistanê- Celadet Alî Bedirxan

9-Kurdî -Dr. Kamiran Alî Bedirxan

10- Xwendina Kurdî - Dr. Kamiran Alî Bedirxan

11-Elfabeya min- Dr. Kamiran Alî Bedirxan

12-Dersên Şerîetê Dr. Kamiran Alî Bedirxan

13-Çarînên Xeyam- Dr. Kamiran Alî Bedirxan

14-Proverbes Kurdes, Medhelokên Kurdî, Lucy Paule Margueritte û Emîr Dr. Kamiran Alî Bedirxan, Paris - 1937

15-Le roi du Kurdistan, Qralê Kurdistanê, Emir Dr. Kamiran Alî Bedirxan û Adolphe de Falgerolle, Paris - 1937

16-Der Adler von Kurdistan, Eyloyê Kurdistanê, Prens Dr. Kamiran Alî Bedirxan û Herbert Ortel Berlin - 1937

Edebiyata Kurdî, heta dema weşana Hawarê pirranî bi devkî û li ser edebiyata klasîk û li ser helbestên klasîk bû. Bi weşana Hawarê ve edebiyata Kurdî, ji qonaxekî derbasî qonaxeke din bû. Bi awayekî nivîskî û bi hemû cureyên edebiyatê ve, berhem hatin çêkirin. Xwendevan bi zimanê xwe, edebiyata cîhanê hisîyan ewanan jî wek milletên din, yê pêşdeçûyî, edebiyata nûjen xistin nav rûpelên edebiyata xwe.

Nivîskarên wê demê; ekoleke edebî û çandî li derdorê kovarê çêkiribûn û nivîsên xwe yê ku mijar û naveroka wan curbecur bûn, ji bo xwendevanên xwe, di Hawarê de dinivîsîn. Bandora wan edîb, zimanzan û nivîskaran, îro jî li ser ziman û edebiyatê bihêz tê xuyakirin. Ew nivîskaran îro jî wek hîmên edebiyata Kurdî ya nûjen tên hesabandin. Di vê xebata me de, beşa nivîskarên kovarê de, jînenîgerîya wan, bi kurtasî hatibû nivîsandin.

2.4.4. Ferheng

Helbet di pêşîya Hawarê de jî ferhengên Kurdî hatibûn çêkirin û weşandin. Wek nimûne ferhenga Ehmedê Xanî ya bi nav û deng “Nûbihara Biçûkan” yek ji wan ferhenga ye.⁴¹² Dîsa ferhenga bi navê “El-Hediyetûl-Hemîdiye Fî Lîsanîl Kurdîye” di sala 1883’an ji hêla Yusuf Ziyaeddin Paşa ve hatibû nivîsandin. Yusuf Ziyaeddin Paşa, dema ku hakimê Mûtî ya navçeya Bedlîsê bû, ferhenga xwe bi alîkariya hin zana û melayên deverê nivîsî bû.⁴¹³ Ferhengeke din ya girîng jî, bi navê “Mîrsadul Etfal” ji aliyê Şêx Muhemmed Kerbela ve di sala 1912 ‘an de hatiye nivîsandin. Ew jî ferhengeke Kurdî –Farisî ye. Ev ferheng wek nûbihara biçûkan bi kêş û kafiye hatiye nivîsîn ji bo zarokên Kurdan. Ferheng ji 1350 peyvên pêk tê. Şêx Muhemmed Kerbela ferhenga xwe wiha diwesifîne:

Wekî wê newbahara şêxê xanî,

Esasê wê ji bo etfala danî.

Ku da newrestegan û new nîhalan,

Melekteb’anê kurdan purşepalan,

⁴¹¹ Bnr. Hawar, (1942). Kitêbxaneya Hawarê, hj. 44, rûpela dawîyê.

⁴¹² Ehmedê Xanî.(1332). *Nubihara Piçûkan*, Îstanbul, Matbaat-ul Ehmed Kamîl, r.1-37.

⁴¹³ Paşa, Y.Z. (2011). *El-Hediyetûl-Hemîdiye Fî Lîsanîl Kurdîye*, Diyarbekir, Weşanê Mektebetu Diyarbekir, r.11.

Bikin se'yê di vê mîrsadê eqser

*Bighîjin meqsed û rahên di enwer.*⁴¹⁴

Wek ku me li jor nivîsîye, pêşîya kovara Hawarê, çend ferhengên Kurdî hatibûn amadekirin û çapkirin. Lê Hawar û xwedîyê wê, dixwastin ferhengeke berfireh û nûjen amade bikin. Hîmê ferhengeke berfireh û nûjen bavêjin. Herwiha di hejmara yekem da, kovarê dest bi weşana ferhengokekî kiribû. Mîr Celadet Bedirxan dixwast piştî çêkirina elfabeya nû û rêzimana nû, ferhengeke nû û nûjen jî çêbikin. Lewra ew di wê bawerîyê da bû ku ziman, li ser sê hêmanên bingehîn bilind dibe. Elfabe, rêziman û ferheng.⁴¹⁵ Ji nivîsên Mîr Celadet wisa tê fahmkirin, ku di vê xebatê de rêbaza wî ev e:

1. Berhevkirina peyvên ku di jîyana rojane de, di nav gel de tên bikaranîn.
2. Bikaranîna ew peyvên xwemalî yên ku di zaravayên Kurdî yên din de hene.
3. Ji nû ve vejîna peyvên ku di Kurdî de hene, lê di dewsa wan de peyvên biyanî tên bikaranîn.
4. Derxistina peyvên xwemalî, yên ku di nav çîrok, pêkenok, helbest, stran û zargotina gel de tên bikaranîn.
5. Çêkirina peyvên nû.⁴¹⁶

Wisa dixuyê ku ew dixwaze hem bi wan peyvan ve binivîse, hem jî wan peyvan têxe nav ferhenga ku dixwaze amade bike.

Piştî teşxiskirina kêmasî û nexweşîyên ziman, Mîr Celadet dibîne ku di zimanê Kurdî de du kêmasîyên mezin hene. Yek windabûna peyvên xwemalî, ya din jî ketina peyvên biyanî li nav ziman.⁴¹⁷ Piştî nasîna kêmasiyan, çareya wan jî pêşniyar dike. Pirseke di cîh de dipirse, bersîva pîrsa xwe da çareyê jî dibêje:

“Em çî bikin ku zimanê Kurdî bikare vegere ser xurtîya xwe û di nav zar û zaravayên xwe de bikemile û bibe zimanekî têkûz? Ji bo peyva, rêya xebatê eve: Hinek peyv hene yekcar winda bûne, hinek hene ji zaravakî de winda bûne, lê di zaravakî din de dijîn. Çendek hene di axaftinê de kêmtêne gotin, lê di mamik, medhelok, çîrok û stranan de têne bihîstin. Divê ev peyv werin berhevkirin, bisenifînin

⁴¹⁴ Perteve, R.(2012). *Mîrsadu'l-Etfal, Ferhenga Menzûm A Kurdî-Farisî, (Vekolîn-Tekst)*, Teza Lisansa Bilind, (nehatîye weşandin) Mardin, Zanîngeha Artuklu, r.91-92.

⁴¹⁵ Bedirxan, C. (1941). Sê Tarîxên Hawarê, *Hawar*, hj.27, r.5.

⁴¹⁶ Bedirxan, C. (1932). Armanç, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê, *Hawar*, hj.1, r.2.

⁴¹⁷ Bedirxan, C. (1932). hj.1, *h.n.*, r.2.

û li gor hewceyîyê, jî peyvên nû bê çêkirin.”⁴¹⁸ Em dibînin ku Hawar, di warê bikaranîna peyvên de hemû zaravayên Kurdî wek hev dibîne, hebûna wan wek dewlemendîyekî qebûl dike. Dixwaze vê dewlemendîyê jî; ji bo berhevkirin û çêkirina peyvên bikar bîne.

Mîr Celadet piştî pêhisandina kêmasîyan, di warê firehî û tengîya zimanê Kurdî da hûr dibe, û encameke wiha derdixe. “Ev tiştên ku Kurd pê mijûl bûne dest dane wan ziman jî bi wan re pêşde çûye. Ew tiştên ku Kurd pê nenas mane û pê re mijûl nebûne, di wî warî de zimanê Kurdî rawestiyaye, pêşve neçûye, di cîhê xwe de maye. Lê zimanê Kurdî ji wan zimana ye ku ber her tiştê nû, bêjeyên nû jê dizên û çêdibin.”⁴¹⁹ Ji bo dewlemendkirina ziman, çêkirina peyvên nû gelek girînge, di vî warî de guncanbûna zimanê Kurdî jî; ji bo Hawarê derfeteke mezin e. Ew jî vê derfetê di çêkirina ferhengê de bikar tîne.

Rêbaza çêkirin û weşandina ferhengê jî dîsa di hejmara ewilî de hatîye ravekirin: “Emê di paşîya her hejmareke Hawarê de ferhengokekî daynin. Tê de wateya peyvên ku di zaravayan de kêmbûne û yên ku ji nû ve hatine çêkirin, ji xwendevanên xwe re bidin zanîn. Ji xwendevanên xwe hêvî dikim, ferhengoka me qenc bixwînin û di heqê peyvekî de ku fikreke wan hebe; ji me re binivîsîn. Heke ciyoka peyvekî bizanin, ewa ha ji tev mana û ferqên wê digel ciyoka xwe ji me re bidin zanin. Mînak: rêkirin, şandin û hinartin.”⁴²⁰ Her zarava û devokekî de ev her sê peyv hene û hev wate ne. Di zimanê Kurdî de ev hersê peyv jî, di şûna hev de dikarin werin bikaranîn.

Ji bo çêkirina ferhengeke xwarû bi Kurdî, ferhengoka Hawarê bingehek gelek kêrhatî û nirx bilind e. Lê ev ferheng jî, bi rawestandina Hawarê ve temam nebûye. Ferhengok di hejmara yekem ve destpê dike. Peyvên ku hatine jîbîrkirin yan jî kêmtir tîrîkîyên bikaranîn, zêdetir hatine nivîsandin. Wisa dixuyê heke weşana kovarê dewam bikira ev ferhengoka ku di Hawarê de hatibû belavkirin wê ji bo ferhenga ku Mîr Celadet Bedirxan dixwast binivîse bibûya bingehek. Emê wek nimûne ji hinek hejmaran, ferhengoka Hawarê bidin nasîn. Herwiha bi vî şêweyî, xwendevanên me dê hem peyvên ku di ferhengokê de hatine nivîsîn bibînin, hem jî bi saya vê ferhengokê bi hêsanî peyvên kovarê têbigihîjin.

⁴¹⁸ Bedirxan, C. (1932). hj.1, h.n. , r.1.

⁴¹⁹ Bedirxan, C. (1932). hj.1, h.n. , r.1.

⁴²⁰ Bedirxan, C. (1933). hj.1, h.n. , r.2

FERHENGOKA HAWARÊ

ARMANC: Her tiştê ko ji bona avêtina nîşanê têt daçikandin. Paşîya tiştê ko çavê mirov lê ye û dixwaze xwe bigehîne wî: Berikê wî û armancê ne ket, armanca Hawarê pêşvexistina zimanê Kurdî ye.

BENDEWAR: Pêgirêdayî. Heçî Kurd hene hemî jî bi Kurdên Îraqê ve bendewar in.

ERDNIGARÎ: Ilma ko bi her awayî wesfa erd û dinyayê dide; çiya, çem, deşt, bajar, tendûrek, gol, newal h. p. Erdnigarîya kurdistanê.

BINGEH: Hîm û eslê tişteki: herçend zmanê Kurdî û farisî di kikitên xwe de ji hev vediqetin lê di bingehî de digihin hev.

CIYOK: Pirsên ko mana wan nizingî hev an wekhev in: wek rêkirin û şandin.

DEHKER: Rastîya tişteki ko bi temamî û ji binî ne nas e û carinan veşartî ye: Ji gotina xelkî re guh mede dehkerê meselê ez dizanim.

DÎROK: Pêşîya tişteki an miroveki. Dîroka dinyayê gelek kevn e. Dîroka jîna Selaheddîn bi serê xwe dinyayek e. H.P. Heta paşî..

JÎNENIGARÎ: Awayê jiyînê û tevayîya biserhatîyên miroveki jînenigarîya wî ye.

PRONIVÎS: Her tiştê pêkhatî, nivîsandî nenivîsandî, ko awa û rêveçûna xebat û kerekî nîşan dide, û berî destpêkirinê têt çêkirin: Me pronivîsa xebata xwe pêkanî, êdin divêt ko em dest bi xebata xwe bikin.

FERHENGOK: Ferhengok komela tevayîya pirsên zmanekî ye. Ferhengok ferhenga kiçik e ko tê de pirsînen wî zmanî peyda dibin. Ferhenga Kurdî, ferhengoka Hawarê.

ZIMANAZÎN: Tevayîya qeydeyên zimanekî zimanazîna wî zimanî ye. Herwekî me di serstûna xwe de got pirsîn hene ku ji zarekî ketine lê di yekî din de dijîn. Ji Lewra dibe ko di nav bendên me de pirsînen din jî hebin ji hin xwendevanên me re nenas in. Em ji wan hêvî dikin bila ji me mana wan bi pirsîn. Da ku di ferhengoka hejmara duduyan de em bikarin mana wan jî bidin.⁴²¹

⁴²¹ Ferhengok, (1932). *Hawar*, hj.1, r.7.

AZÎN: Awayê tevayîya zanînekê an tişteki. Azîna elfabê, yanî tevayîya qeyde û destûrên ilma elafabê. Berdêlka wê di zmanê Elmanî de "lehre" ye.

BERHEVDAN: Ser tişteki, ji bona diltijîkirina hevdu ştexalî û sehîti kirin. Bi saetan ve me da ber hev le dîsan me dilê yek tijî ne qir.

BERPÊBÛN: Hatin pê. Ji serxwebûna welateki re xebateke mezin divêt, serxwe bûn bê xebat û fedakarîyê berpê nabe, nayê pê.

BÎNYAN: Ji her texlît avahîyê re binyan têt gotin. Xanî, bure, qesr, olî, mizgeft h. p.

BÎHEMD: Heçî ko ne bêhemd e.

BOŞ: Zehf, gelek. Li ser welêt baraneke boş hat.

BÎJÎŞK: Ewê ko bijîşkî dike. Bi xweşkirina jiyîna mirovan mijûl dibe û wan derman dike. bijîşkî dike. Bi xweşkirina jiyîna mirovan mijûl dibe û wan derman dike.

DÎBÎSTAN: Ew dera ko tê de hîn dikin. Di dibistana gundê me de deh zaro hene.

DÎŞWAR: Ne hêsanî, zehmet.

Dişwar e gelek belayê xurbet,

Binve, kezeba min binve lo lo!

Emîn Alî Bedir-Xan

DÎL: Ne aza, girtî, hesîr.

Dîlê dîlana te me

Îşev mêvanê te me

Sibe ser rêka xwe me.

DOZ: Dehwa û daxwaz, paşîya daxwazê.

Xwelî li ser te dikim,

Dest bi deng û ceng dikim.

Doza Şeng û Peng dikim,

Dehwa şerîet dikim.

GEŞÎ: Halê geşbûnê. Geş, ew tişt e ko bi rohnahîye, bel û vekirî ye.

Bihnûnîya dewleta te geş bit,

Qasî tu hebî dilê te xweş bit.

Emîn Alî Bedir-Xan

GEWHERÎN: Ji gewherî çêkirî, wek gewher.

HAVÎNA-PÊŞÎN: Meha salê a çaran. Ji xwe kurdmanc mehan bi du awan bi nav dikin. Binavên serxwe û bi navên çaxên salê.

1 – Adar- Buhara-pêşîn

2 - Nîsan -Buhara-navîn

3 – Gulan- Buhara-paşîn

4 – Hizêran- Havîna-pêşîn

5 – Tîrmeh- Havîna navîn

6 – Tebax- Havîna-paşîn

7 – îlon- Paîza-pêşîn

8 - Çirîya-berî- Paîza-navîn

9 - Çirîya-paşî- Paîza-paşîn

10- Çileya-berî- Zivistana-pêşîn -Kanûna-berî

11- Çileya-paşî- Zivistana-navîn -Kanûna-paşî

12- Sibat (gecok)- Zivistana pašîn

HÊSANÎ: Ne dişwar. Ji bona her kesî zmanê wî hêsanî ye, ne dişwar e.

QEBALEWÎ: Bi qebale, û gora dilxwaz an lihevhatinê çêkirî, ne kotekî.

KOTEKÎ: Tişteqî bêhemd, bi zorê, bivê nevê. Ez nediçûm, kotekî ez birim.

KÛVAN: Êş, kul, keser.

Sed ah û kûvan û keser,

Heft eyn û lam çûn j' hicretê.

Feqehê Teyran

NÎMÎNENDE: Eve ko heyînek an heyîna tişteqî dinimîne, raber dike.

PEJÎRANDÎN: Ji tişteqî re ko têt dayîn an gotin herê kirin û pê ve çûn, qebûl kirin.

RAVEKÎRÎN: Ji binî, ji rayî vekirin û dan zanîn.

REHAKAR: Ewê ko rehayê, xweşîyê dide.

TOL: Evd, evdin, heyf.

TÊGEHÎŞTÎN: Qenc fehm kirin û berketin. Herçend tu bibêjî jî ew ténagehit.⁴²²

CIVAKÎ: Yê civatê, bi civatê re giredayî, xwe digehîne civatê, Rêzikên civakî, kanonên civakî. Yanî ew rêzik û kanonên ko jiyîna me ya civakî digerrînin,

ZAR: Ziman, birê zimanekî. Di zimanê Kurdî de sê zar hene. Zarê Dumilî, Zarê Lorî û Zarê Kurdmancî.

ZARAWA: Di nav yek zarî de, awayên gotinê û bilêvkirinê.

⁴²² Ferhengok, (1932). *Hawar*, hj.2, r.6-7.

YEKÎTÎ, YEKBÛN: Yekîtî, pê û lihevanîna kitkitên tiştêkî ko di hîm û bingehên xwe de ji yek rayî ne, ne cuda ne. Ko bi yekîtîyê digihin hev û bi tevayî heyînek ditînin pê û êdin ji hev venaqetin. Yekbûn, yekbûn jî wek yekîtî ye. Lê di yekbûnêde ew tiştên an kesên ku hatine lihevanîn an dayîn hev, dibe ku ne ji yek rayî bibin û rojekê ji hev vebin û veqetin.

DOTMÎR: Keça mîr. Di rêzika Kurdistanê de herçî torin û maqûl gora rêzên xwe dihatin bi nav kirin. wekî niho: Mîr, Mîrek, Pismîr, Dotmîr, Têmmîr, Jinmîr, Axa, Pisaxa b.p.

LÎSERVEBÛN: Naskirin, karin bi nav û nîşan kirin. Bijîşk li ser nexweşîya min venebû, yanî nikarî bî bizane ez ji çî têşihim, nexweşîya min çî ye.

XWENDA, XWENDEWAR: Her kesê ku xwendin û nivisandinê dizane xwenda ye. Lê xwendewar ew kesê ku gelek xwendîye û di vî warî de xwedan behre bûye.

VÊN: Bi tevayîya xurtîya dilê xwe xwestin û li ser sekinîn, pê biqerar bûn.

“Sifatên di seb'ê ji bo zilcelal

Bizan heft in ey arîfê pur kemal,

Xweşî, şîn û zanîn û vên û kelam

Bihîstin digel dilî bû tamam.”

*Ehmedê Xanî*⁴²³

ZERDEŞT: Ber kurd zerdeştî bûn. Zerdeşt pêxemberê wan bû. Ehmedê Xanî ku pê dizani bû, di Zîn û Mem de bi beyta jêrîn ve li zerdeştîbûna kurdan îşaret dîkî û dibêjî:

“Malê xwe ji rengê qewmê Zerdeşt

Da agir û gazîya xwe rahişt”

Ehmedê Xanî

ZENDAVESTA: Wek her pêxember Zerdeşt jî xwedan kitêb bû. Zend- avesta navê kitêba wî ye.

⁴²³ Ferhengok, (1932). *Hawar*, hj. 3, r.5.

ZENDÎ: Zimanekî kevn e. Zimanê me, zimanê Kurdî jê hatiye girtin, yanî eslê zimanê me zendî ye. Zendavesta bi zimanê zendî hatiye nivîsandîn.

KAT: Di kitêba Zerdest de lajê an stranin hene ji wan re kat têt gotin. Katên Zerdest.

GÛMÎK: Serîyên tilîyan, nermikên tilîyan.

TAR Û PO: Benên tevnê, yen drêjahî û pehnahî.

HEPO: Şehê hesinîn, pê girên mehfûran tên şidandin.

ZÎVARÎ: Belengazîya mirovên, mezin û dewlemend.

MED: Miletêkî kevn e. Miletêkî arîniyad e. Med medeniyeteke mezin anîne pê. Kurd ji

medan da hatine, kurd zarowên medan in.

AFÎRANDÎN: Anîn pê, anîn wicûdê, xuliqandin. Xwedê erd û ezman û mirov afirandin.

“Xwedê afirandin ji bo wî felek

Ji bo xidmeta wî şihandin melek”

Ehmedê Xanî

HÎNGÛR: Piştî evarê, destpêka şevê.

“Şeva tarî ji hingûrê kifş e.”⁴²⁴

PARÎZ: Bexçeyê bihnûn û kulîlkan, xemilandî û lêkdayî. Bi frensizî je re (park) têt gotin.

MEHDÎK: Xelkê Botan dibêjin. Kurdmancin hene jê re landik, hinekên din dergûş dibêjin.

FEKRANDÎ: Nihêrtin, meyizandin. Fedkire binihêre.

EJNÛ: Çok, kab. Kurdmancin hene wek frensizan jê re “jinû” dibêjin.

HEYÎN: Heyîn: halê hebûnê, heyîna Xwedê ji mêj ve ye û abadîn e.

NEYÎN: Halê nebûnê. Heyîn û neyîna wan wek hev in. Ji heyînê ketiye neyînê.

⁴²⁴Ferhengok, (1932). *Hawar*, hj.4, r.4.

DÎLBEND: Ewê ku bi du yan çend zimanan dizane, pirsên zimanekî bi pirsên zimanekî din dide zanîn dîlbend e. Dîlbendê me her çend bi kurdmancî rind dizane lê frensizîya wî hinik kêr e.

DÎLBENDÎ: Karê dîlbendan, Filan kes dîlbendîyê dike, yanî dîlbend e.⁴²⁵

DENG: Vê paşîyê û gora mehcetê, ji pirsê deng me rend pirs hevedudanîne. Bi hinceta pirsê (dengî) ku di elfabeya Kurdî de derbas dibe, em dixwazin van pirsên nû û hevedudanî ravekin û ji xwendevanan re bidin zanîn.

DENGÎ: Bi deng re giredayî, pê bendewar

DENGÎNÎ: Tevayî û halê “dengî”, herf carekê bi şiklên xwe, carekê bi dengîniya xwe tene seh kirin.

DENGAYÎ: Pişeva dengan, pê tevayiya dengên zimanekî tene seh û nîşan kirin.

GUWAH: Ewê ku tiştek dît an bihistiye û piştê awayê çêbûna wî gora dîtin yan bihistina xwe dide zanîn.

PÊŞKÎ: Her tiştê ku ji pêşîyê ye.

DENGÊ PÊŞKÎ: Ew dengê ku ji pêşîya dev derdikeve.

PAŞKÎ: Her tiştê ku ji paşîyê ye. Dengê paşkî. Ew dengê ku ji paşîya dev derdikeve.

CÎHDER: Cihê derketinê. Kanîya tiştekî. Cihderka (b) lêv in, yanî dengê herfa (b) ji lêvan derdikeve.

RAVEKÎRÎN: Ji rayî vekirin, pêş çavan xistin û dan zanîn; îzah kirin.⁴²⁶

MÊVANXANE: Xaniyê ko mêvan û rêwîyan bi pêre dihewinin. Wek odeyên gundên kurdmancî. Lê bi vê ferqa ko odeyên me herwene, Mêvanxanê bi pêre ne. Bi firensizî (Otêl) dibêjin.

VÊSIHANDÎN: Rahet kirin. Xwe vêsîhandin, xwe rahet kirin e.

BELG: Ji belgên daran pêve ji cil û girêdanê re jî têt gotin.

KUTA-KÎRÎN: Xelas kirin, qedandin. Me dersa xwe kuta kir. Dersa me kuta bû.

⁴²⁵ Ferhengok, (1932). *Hawar*, hj.5, r.7.

⁴²⁶ Ferhengok, (1932). *Hawar*, hj.7, r.5.

AGAH: Xeberdar, serwext. Ez agah bûm, ez xeberdar bûm.

XEBERDOX: Ewê ko bi nav û navê çendekên din, ber hemîyan ve dibêje.

XEBERDOXÎ: Xeberdox bûne.⁴²⁷

BÎYANÎ: Herçî ku ne ji wî eslî ye ku çêl lê dîkin, yanî qala wî dîkin. Kurdmancin hene li şûna *biyanî*, *xerîb* dibêjin. Xerîb pirseke erebî ye. Biyanî, xwerû kurdmançî ye. Xelkê welatê jêrîn jê re “bîgane” dibêjin.

LÎSERVEBÛN: Nas kirin, ji hev derêxistin. Ez carekê hatibûm vê derê, le niho liser venabim. Bijîşk li ser nexweşîya min venebû.

PÎSPOR: Mirovê zana ku zanahîya xwe di zanînekê de kûr xistiye, lê hûr nihêrtiye û di kitkitên wê gihaştîye.

QELEMREW: Tevahiya erd û welatên ku di bin destê dewlelekê de ne.

NÎJAD: Tevahiya pêşî û paşîyên mal û miletekî. Her millet vedigere nijadekî û çend millet di nijadekî de digehin hev. Herweqî Kurd û Ecem ji nijadekî, ji rehekî ne. Her du jî ji nijadê arî ne.

ZÛBÎRBÎRÎ: Xurtîya zûbîrbirinê, filan zûbîrbir e, zû bîr dibe, têdigehe, di zûbîrbirîyê de xurt e.

TÎP: Şîkl, texlît, nimînendeyê şîklekî. Tipê her milletî cihê ye. Tipê kurdan ji tîpên din bi hin wesfan tête veqetandin. Tîp û “pit” welê dimîne ku ji yek rayî ne. Pit, bi mana kîçîkê her tiştî ye. Piçîk pitik, piçkok, pitek h.p. Kurdmanç wekê banî jînên xwe dîkin dibêjin “pitê” yanî piçûkê, spehyokê. Dîsan heye ku “pit” û pîrsa frencezî “petit” ji hev ne cuda ne.

KAMÎRAN: Yê ku kama xwe dirane, pêş ve dajo. Kam bi xwe miraz e.

NEPENDÎ: Cîhê ku kes lê nîne, ne sêpîla xelqê ye. Ji pandinê têt, cîhê ku ne pandî ye, lê napên. Nepenî jî tête gotin.

DUTA: Ta bi xwe qat e. Duta, duqat. Xanîqî dutayin, xanîqî bi du qatan.

NÎFŞ: Çêlîyên zemanekî û zîkekî.

MÎVRO: Mirovê netevav, tişteki wî kêr “nîvmirov” herwekî kor û kulek.

KEVANDÎN: Mîna kevanê tewandin û li erdê xistin.

⁴²⁷ Ferhengok, (1932). *Hawar*, hj.8, r.7.

DÎLEVRA: Dilê wî bilind û pak, çavtêr û mihirban. Alîcenab.

BABELÎSK: Tevayiya sed salî. Sedsalek babelîske e.

SERPÎLKÎ: Ne ji binî, ji rû û ser, ji derve û dûr. Ez filan kesî serpilkî nas dikim, yanî navbera me de nasî hebe jî ne ewçend kûr e, ez wî nas dikim lê nizanin çi mirov e, qenc e, xirab e.

RAMAN: Dan serê xwe. Fikirîn jî tête gotin, lê ev ne bi kurdmançî ye. Raman kurdmançîyeke xwerû ye, lê di nav kurdmançan de kêmbûye. Ji ber ku zû ve ye me dev ji ramanê berdaye. Ma em qet diramin û didin serê xwe, gelo halê me dê bibe çi?

VÊN: Bi xurtîya dilê xwe xwestin, liser wê xwestinê sekinîn, pê bi qerar bûn. Rehmetî Xanî dibêjit:

Xweşî, şîn û zanîn û vên û kelam

Bihistin digel dîtî bû tamam.

BERBÎNÎ: Dîtina tiştê berî ku bête pê. Berbînîya wî ne çû serî, yanî di heqê filan tiştî de digot holê yan welê dê çêbibit lê çênebû.

BERBÎN: Ewê ku berî çêbûnê dibîne.

BERBÊJÎ: Qewimîna tiştê berî ku biqewime gotin. Berbêj, ewê ku berî ku biqewime dibêjit.

PEND: Şîret e. Pendên ayîna kurdanîyê. Ew pendin ku mirov di ayîn û xebata kurdanîyê de divêt pêve biçit, kar û xebata xwe li gora wan saz bikit.

ÇAND: Ev pirseke gelek muhime. Divêt xwendevanên me qenc bala xwe bidin û di ser zimanê xwe re bêxin. Ji ber ku ev pîrsa ha ne di zimanê me de ne jî di zimanên cînar de jî heye. Ereban jî vê paşîyê xistine zimanê xwe, Ji tevayîya ilm û huner û pîşeyên spehire çand tête gotin. Me ev pîrs ji çandinê girt Ji xwe di her zimanî de jî welê ye. Ji ber ku herweqî ceh û genim bi erdê têne wer kirin, ilm û pîşe jî bi ser û mejîyê mirov têne wer kirin, çandin. Çanda ewrûpayî, evayî û awayê zanîna xelqê ewrûpayê. Em dikarin çanda kurdan jî bibêjin. Pê dîrok, çîrok, stran, dîlan, medhelok, mamik û herçî rêzik û adetên me hene têne zanîn.⁴²⁸

⁴²⁸ Ferhengok, (1933). *Hawar*, hj.19, r.4-5.

NÎVÎSANOK: Bi du manan e. Tevayîya nivîsevanên rojname an kovarekê, koma nivîsevanan. Cîh an mezela nivîsevanan. Hevînd ji nivîsanoka Hawarê ye, yanî ji koma nivîsevanên wê ye.

HEVOL: Ol ew tişt e ku mirov pê ewle û bawer e. Ola Zerdest, Ola Musa. Perîcar em jê re diyanet dibêjin. Hevol: yên ji olekê ne.

DESTRÊJ: Pirseke kevn e. Wekê çekên me tir û kevan bûn û di serî de kevankêşan kevanên xwe bi hev re dikişandin û tîrên xwe berdidan, jê re destrêj dihate gotin.

LAVELAV: Ji lavayîyê têt. Liber gerîyan. Lavayî kirin. Wekê mirov ji Xwedê lavayî dike û daxwaza xwe jê re dibêje ji wê daxwazê re “lavelav” têtê gotin.⁴²⁹

AWARTE: Yê ku nakeve bin hikmê qeyda gelemper û jê têtê awartin. Vê qeydê tu awarte nîne. Bi awarte jî destûra wî dan. Awarte tu qeyde nayînin pê. (Exception)

BERPÊŞKÎ: Yê ku berîya esas û bingeş têt û wan bi ronî dike û sehkirina wan pê hêsanî dibe. Rêmanên berpêşkî, qeydeyên berpêşkî. (Preliminaire)

BÎRAWER: Tiştê ku hêja ye di bîran de bimîne û naye ji bîr kirin. Sala 1925' an ji bo kurdan tarîxeke bîrawer e. (Mémorable)

BÛYER: (m) Her tistê ku di dinyayê de têtê pê. Ev bûyereke girane ye. (Événement)

CENKEŞTÎ: (m) Herçî keştîyên ku ji bona şer hatine çekirin. Gir û hûrên wan hene. Wek torpiyor, bertorpiyor, krewzor, dretnewt. (Baliment de guerre)

GELEMPER: Tiştê ku ne xweser e, ji bo her kesî an ji bo her tiştî ye. Qanûna mirinê qanûneke gelemper e; tu kes jê nafilite. Bi gelemperî, bi awayê gelemper. Bi gelemperî Kurdmanc çiyayî ne. (Général)

HEYBER: (n) Her tiştê ku xwediyê heyînekê ye, rihber, nerihber. Heyberên tebîetê. (Objet, être)

HÊMAN: (n) Esas an rîkinên heyînekê. Ew tev de heyînekê ditînin pê, lê bi xwe ji hev de nakevin, yanî ew heyberîne sade ne û ne hevedudanî ne. Pêşîyan digot hêmanên tebîetê çar in: ax, av, agir û hewa. (Élément)

⁴²⁹ Ferhengok, (1933). *Hawar*, hj.20, r.7.

KEŞTÎ: (m) Jê re bi hin ferqan gemî û vapor jî dibêjin. Keştî xwerû Kurdmancî ye.

KEŞTÎVAN: Peyayên ku di keştiyê de dixebitin û wê bi rê dixin, mîna kelekvan. (Bateau)

NÊREVAN: (n) Yê ku guhdariya tiştekî dike, lê kûr dinêre û bala xwe dide, nêrevaniyê dike Nêrevanên siyasî, balafirên nêrevanîyê. (Observateur)

NOQAR: (m) Keştiya ku noqî avê dibe û di bin avê re diçe. Noqar cenkeştiyek e, tê de top û torpîl hene. Dûrebîneke wê heye ku di ser avê re dimîne. Kumandarê noqarê pê guhdariya keştiyên dijmin dike û gava ew wan dibîne noqar dertê rûyê avê û li wan dixe. (Sous marin)

NÛÇE: (m) Tiştê ku ji nû ve qewimîye. Nûçeyên şer, nûçeke derewîn, li gora nûçeyên radyowê di şeşê Nîsanê de Elmanan dirêjî Yewnanistan û Yûgoslavyayê kirine. (Nouvelle)

PARKÎT: (m) Kîta ko dikeve paşîya bêjeyekê û mana wê diedilîne. “xew - xewar, mêr-mêranî, mal – maldar” di bêjeyên “xew - ar, mêr - anî, mal – dar” de “ar”, “anî”, “dar” parkît in. (Suffixe)

PÊRKÎT: (m) Kîta ko dikeve pêşîya bêjeyekê û mana wê diedilîne. “bûn - vebûn, kirin - rakirin, anîn – hilanîn” di bêjeyên “vebûn, rakirin, hilanîn” “de, ve, ra, hil” pêrkît in. (Préfixe)

RÊMAN: (m) Fikra ku me derheqê tiştekî heye. Tu rêmana mêraniyê di wî de nîne. (Notion)

ŞANDIYAR: (n) Mirovê ku ji stasyoneke radyowê nûçeyan û tiştine din diweşîne û belav dike. Di Radyowa Rohelat de şandiyarê Kurdî li heftê du caran bi kurdmancî diweşîne. (Speaker, émetteur)

TÊVEL: Ne ji yek cîsn û celebî, ji cîsnine ji hev cuda û biferq. Ne weke hev. Ordiya ingilîzan ji eskerine, têvel bihevketî ye. (Différent)

WEŞÎNEK: (m) Karê belavkirinê, herwekî di radyoyê de. Weşîneka Kurdî nîv saet dom dike, di vê weşînekê de şandiyar nûçeyên dinyayê dide zanîn û piştî dest bi pronivîsa stranê dike û çend qewanên kurdmancî digêrîne. (Emission)⁴³⁰

⁴³⁰ Ferhengok, (1941). *Hawar*, hj.27, r.12.

HEVOK: (m) Ji her birê komekê re hevok dibêjin. Komek carina ji çend û carina jî ji hevokekê bi tenê tête pê. Di her komekê de herçend lêker hene ewçend jî hevok peyda dibin. Komekine bi yek hevokê: Derew sêwî ye. Baran dibare. Gurgîn çû welêt. Komekine bi çend. lievokan: Ez bawer dikim ku Xwedê heye. (Propûsilion)

MIJAR: (m) Tiştê ku asasê nivîsandin an axaftinê ye. Mijara Hawarê a bingehîn zimanê Kurdmancî û pêşveçûna wî zimanî ye. (Sujet)

RAWES: (m) Halê rawestan û sekinînê. Tiştên destpêkirî qut kirin û sekinîn. Ev der cihê rawesê ye. (Arrêt)

VEKÎT: (m) Awa û şikilê nivîsandina bêjeyan û terzê bihevebûna wan. Vekîta Gurgîn qenc e; yanî gava dinivîsîne xeletan nake û her bêjeyê weke xwe û rast dinivîsîne. Ez vekîta vê bêjeyê nizamim; yanî ez nizamim ev bêje çawan tête nivîsandin. (Dictée)

VEKÎTANDIN: Ji yekî re tiştêk xwendin an gotin û ew tişt jê re dan nivîsandin. Tu ji min re vekitîne ezê binivîsînim. (D.cter)

VÊSIH: (m) Di halekî de mayîn û tê de ji rawesê kêmtir sekinin. Te di vê vêsîhê de dirêj kir. (Pose) ⁴³¹

DÛPAŞ: (n) Birê bêjeyê ê guhêrbar. Di bêjeya “ketin” de du bir hene “ket” û “in” “ket” rayek û “in” dupaş e û ev dikeve şikilê din û diguhire. Ez ket - im, tu ket - î, ew ket – in. (Terminaison)

FOLKLOR: (m) Ev bêje di eslê xwe de ingilîzî ye. Lê îro ketiye hemî zimanên dinyayê. Ji lewre me jî ew xistîye zimanê xwe. Ji xwe kurdên Qefqasê berîya me ev bêje xistine zimanê me û kitêbek bi navê “Folklorê Kurdmancî” belav kirine. Folklor tevayîya adet, çîrok û stranên miletekî ye. Ew adet, çîrok û stranên ku ji nav xelkê der ketine û di dora nîfşan de bi ser ve ketine û gihastine nîfşên nû. Ji xwe bêjeya folklore bêjeke bihevketî ye û bi mana zanîn an zanistîya xelkê ye. (Folklore)

GUHÊRBAR: Tiştê ku di bal û şikilê de namîne, diguhêre û dikare biguhêre. Ev bêje guhêrbare. Yanî şikilê wî diguhêre û di halekî de namîne. Herwekî bêjeya “bajar”. Ez ji bajêr tîm. Tu vî bajarî dibînî. Ez van bajarên dibînim. (Variable)

⁴³¹ Ferhengok, (1941). *Hawar*, hj.28, r.12.

RAYEK: (n) Birê bêjeyê ê neguhêbar. Di bêjeya “ketin” de “kel” rayek e û tu caran naguhêre. Ez ket - im, ew dê bi - ket - a, ez ket -i- biwam. ew ket-i bû. (Radicale) ⁴³²

Wek ku di hejmara 27'an de hatîye ravekirin; ji ber nivîsandina ziman, peyvên nû çêbûne û ziman jî berfirehtir û dewlementir bûye. Ew peyvên nû di ferhengoka kovarê de cîh girtine, wateya wan hatîye dayîn. Ji alîyekî din tê dîtin; weşanên “Radyoya Rojhelat” ji alîyê kovarê ve hatîye şopandin û ew peyvên ku tê de tên bikaranîn û nû tên bihîstin, jî di kovarê de cîh girtine û wateya wan ji xwendevanên kovarê re hatîye nivîsandin. Ji xwendevananên kovarê hatîye xwestin ku; ew bêjeyên nû dibihîzin û wateya wan nizanin, ji kovarê re bîr şandin da ku wateya wan jî bê nivîsandin. Di vê hejmarê de cara yekeme ku zayendê peyvan jî hatîye nîşankirin. Ev yek jî, ji bona amadekirina ferhengeke nûjen û tîkûz gaveke girîng e. Dawîya ravekirina bêjeyan de, hemwateyê wan yên zimanê Frensîzî jî hatîye nivîsandin.

Em di ferhengoka Hawarê de dibînin ku hinek peyv ji wêjeya Kurdî ya devkî û nivîskî hatine girtin. Hinek peyv jî ji ber peyvên wateya wan nêzîkê hevin hatine çêkirin. Peyva “balafir” û “çand” ji bo vê yekê nimûneye. Ferhengoka Hawarê de, di navbera zaravayên Kurdî da ferq tune. Peyveke di kîjan zaravayî da be, ew peyv weke peyveke xwemalî hatîye bikaranîn. Ew peyvên ji bo xwendevanan wateya wan zêde nayên zanîn, di hejmarên paşîn de hatine rave kirin.

Ev ferhengoka piçûka ku nêzîkî 150 peyvî pêk hatîye, bi taybetî ji bo çêkirina ferhengeke nûjen, wek bingeş tê hesibandin. Her çiqas Mîr Celadet Bedirxan di hejmara ewil de behsa çêkirina ferhengekî kiribe jî ev daxwaz û armanca wî neçûye serî. Hetanî hejmara 8'an di her hejmarê de ferhengok heye lê piştî hejmara 8'an navber ketîyê heta hejmara 19 û 20 a. Dîsa navber ketîyê ta hejmara 27'a. Piştî dîsa hetanî hejmara 30'î ferhengokê dewam kirîye. Piştî hejmara 30'mîn, êdî ferhengokê di nav Hawarê de cîh negirtîye.

⁴³² Ferhengok, (1941). *Hawar*, hj.30, r.15.

ENCAM Û NIRXANDIN

Hawar di demeke wisa de derket, ku tenê derketina vê kovarê ji bo ziman û wêjeya Kurdî, wek bêhnvedanekî tê hesibandin. Lewra wê demê de, rewşa çapemenî û nivîsandina bi vî zimanî, zêde baş nebû. Ji alîyê din jî em dikarin bêjin; bi weşana xwe ve kovara Hawarê, zimanê Kurdî re xweyîti kir û ev ziman ji kêmasî û tinebûna hêmanên zanistî xilaskir.

Di wêjeya devkî de yan jî, di nivîsandina hinek cureyên edebî de zimanek çiqas pêşdeçûyî be jî; heke ew ziman bi her alîyî ve bi rêk û pêk nebe û di hemû alîyên çand û wêjeyê de nebûbe zimanekî nivîskî; ev ziman di nav zimanên cihanê de cîhê xwe yî bi rûmet hilnagire. Di serî de em bi dilrihetî dikarin bêjin ku kovara Hawarê, zimanê Kurdî ji qonaxekî derbasî konaxeke din kir û bi hemû alîyan ve ev ziman xiste zimanekî nivîskî. Helbet heta dema weşana kovarê, pir hindik berhem bi vî zimanî hatibûn nivîsîn û çapkirin; lê ji bona zimanekî wek zimanê Kurdî, hejmar û cureyên van berheman gelek kêr bûn. Xêncî milletên din, dibe ku hinek Kurdan jî heta wê demê bawer nedikirin, bi zimanê Kurdî jî pirtûk û berhem hatibûn nivîsandin û çapkirin. Nivîsa Qedrîcan ya di Hawarê de hatîye belavkirin di vê derbarê de gelekî balkêşe.⁴³³ Berî her tiştî Hawarê ev pêşbawerîya xelet şêndand û nîşanê herkesî kir ku bi zimanê Kurdî jî, hemû cureyên edebiyata cihanê bi awakî rêk û pêk dikare bê nivîsandin.

Lê zmanê me jî wan zmanên e qo ber her tistê nuh, pîrsên nuh dizên û bîrêve pîrsên nuh jî wan çar dibin.

Herweqî xelqê Geliye-Goyan, berî çardeh salan, gava tiyare ditin, tavil bi zarê xwe balatir nav lê qirin. Ji lewre

Hejmara Yekem, Nivîsa Mîr Celadet Bedirxan, Li Ser Armanc û Rêbaza

Kovara Hawarê

qo ji bani, ji bala difire, Disan qurdmancinen qo tîlêfon dîtin, ji mesmehî wê re bihistoq gotin. Ji ber qo deng pî têt bihistin.

Niho em vegerin ser gotna xwe; ser awayê nivisandina zmanê xwe.

Îrû di zmanê me de du texlit qemani hene: wînda bûna pirsinen qurdî û qelîna pirsinen biyanî nav zmanê.

Em çî b qin qo zmanê me biqare vegere ser xurîtiya xwe û di nav zar û zarawayên xwe de biqemile û bibe zmaneqî teqûz.

Di wînda bûna pirsan de, pirsin hene yeqcar wînda bûne, hin hene ji zareqî qetine lê di zareqî din de dijin û çendeq hene di axaftinê de qem tene gotin lê di mamîq, medheleq, çîroq û stranên de tene bihistin.

Em li peywan in, hîn bi hîn em wan dixin dest û disenifînin û gora melcete ji ji nuh ve ser awayê hevedudanina pirsan qurdî pirsinen nuh çêdîqin.

Ji bona pêşvegiştina zmanê, divê em bendên xwe bi tevayîya van pirsan binivîsin û li paşîya her hejmarê ferhengê qeşî danin û tî de mana pirsan qo di zarên de qem bûne û yên qo ji nuh ve hatine hevedudanin ji xwendevanên xwe re bidin zanîn. Ji xwendevanên xwe hevî diqim ferhengê qeşî me kenc bixwin û di heke pîrseqê de qo fiqrege wan hebe ji me re binivîstin; heqe cîyoqa pîrseqê bizanin, ewa ha ji tev mana û ferken wê digel cîyoqa xwe ji me re bidin zanîn.

Weqo: rêqirin, sandin, hinartin cîyoqên hev in. Lê di mana rêqirî de ji mana sandin û hinartinê farkeq heye. rêqirin, her hal, bi rê existin û sandin e.

Disan, xebirdan, axaftin, peyivîn cîyoqên hev in. Gelo di nekeba wan de çî ferk hene?

Hawar zaroqege nûza ye. Zarowa me ye; zarowa qurdan e. weq her zaro bi xweyîtiya dî û bav, bra û pismamên

xwe diqare bîji. Herqes, her qurd diqare ariqariya hawarê biqe.

Tuqes mebeje qo, ez miroveqî reben û neqerhatî me. Ji min ji diayê pêve tişteq naye.

Belê, tuqes wê xeberê mebeje, herqes bi tişteqî, bi awaqî diqare bî hawra hawarê. Tîne di be qo awayê hawarê nizane. Jê re çend awa hene:

1— Qiriyarê hawarê bûyîn û jê re qiriyaran peyda qirin

2— Navên mirovên xwendewar lê nemaldar, qo niqarin qiriyar bibin, û navên medresan ji me re dan zanin. Da qo hawar ji wan re herwe bête şandin.

3— Paş xwendina hawarê ji heval û nasên xwe re dan xwendin û ji mirovên nexwendar re bi xwe xwendin û ew ser tedexistiyên qomelê serwest qirin

4— Ji hawarê re her texlit sîhr û bendan nivisandin.

5— Çîroq, medheleq û mamîqan berhev qirin û ji hawarê re şandin.

6— Di heke welat, eşîr, bajar û gundê xwe de tiştên qevn û nuh ji hawarê re rêqirin.

7— Her texlit bergehên Qurdistanê peyda qirin û digel wêlên wan ji me re hinartin.

Ji gotinên jorin kenc dixuye qo ji hawarê re ariqirin geleq hesantî ye. Qesê qo dil biqe dî biqare ji.

Di destpêqê de qomela me di pînzdeh rûjan de careqê dî derqeve. Pîstî çend hejmaran qomela me dî bibe helteqî û li serê her heftêyê dî belav bibe.

JÎ XWENDEVANAN RE

Hawar hawara we ye,

Deng û gazîya we ye.

Jîn û zanîna we ye,

Werîn, hawara xwe bin.

HAWAR

Hejmara Yekem, Nivîsa Mîr Celadet Bedirxan, Li Ser Armanç û Rêbaza

Kovara Hawarê (Dewam)

SAL 11
HEJMER 57
YEKŞEMB
15 TEBAX 1943

HAWAR

ANNÉE 11
NUMERO 57
DIMANCHÉ
15 AOÛT 1943

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Şeytanqûnî	Osman Sebri
Dîwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Gulistan	Farisixwin
Memozîna Xani	Herekol Azizau
Ya Reh	Cegerxwin
Sefera Sicilyayê	Nêrevan
Hêviya Nuh	Osman Sebri
Ez û Yar	Cegerxwin
Çeteyên Rûsî	Smînê Serbedî
Feryad	M. E. Botî
Panama	Qadirê Ferman

TEFSÎRA QURANÊ

40 — Roja ko emê ji her mileteki li ser emelê kafiran şahideki bînin, û Pêxemberê min, emê te ji bikin şahidê emelê wan, gelo wê demê halê kafiran wê çilo bibe?

41 — Di wê rojê de, yên ko kafir bûne û li ber Pêxemberên Xuda serhişki kirine, wê bixwazin ko erd di bin lingê wan de biheze û ji hev bibe û ew bikevin û te de wînda bibin; lê ew kengê dikarin gotin û emelên xwe ji Xuda veşêrin.

42 — Geli bawermendino ... Gava hon serxweş in, heta ko serxweşiya we ne bore û gotina xwe nizanin, niziki nimêjê me bin; gava hon bi cinobe dibin, beriya ko destmêja xwe a mezin rakin ranebin nimêjê. Heke hon nesax in, an rêwingî ne û ji her du rîyan tiştek derketiye, an hon niziki jinan bûne û ko av bi dest we na keve bi axa pak teyemimê bikin, rû û destên xwe pê bifrikinin. Xuda îşê evdên xwe sivik dike û di gunehên wan dibore, xuda piyar e.

43 — Ma hon nabînin û birewer na bin ko zanayên cuhîyan seba xatirê çend peran metna Tewratê diguhêrinin û dixwazin we ji rîya rastiyê derinin.

44 — Xuda dijminên xwe nas dike; bizanin ko arikari û sermiyaniya Xwedê best we ye.

45 — Ji cuhîyan hin hene ko cihê kîlaman diguhêrinin û dibêjin: Me bihistiye û me isyan kiriye; an ew ji dil inkar di kin û bes bi zîmanê xwe mikur tîn û emrên kitabê qebûl dikin û bi ser ve zêde dikin û dibêjin; tu me dibihîstî, lê em te na bihîsin, li me binêre, da ko em bêjine te û gotinên te fehim bikin. Ew bi wan gotiyan dijûnker dibin û heneke xwe bi dinê Xuda dikin.

Heke wan bigota: Me emrê Xuda bihist û me itaet kir, gotina me bibihîse û li me binêre, ev di heqê wan de çetir dibû, lê seba kufre, Xuda ji wan standiye, laneta Xuda li wan e, bi tenê çendek ji wan bawermend bûne.

46 — Geli cuhîno ... Beriya ko emê rûyê we biçilmisînin û halê we xira bikin û laşê we bidewisînin û we mîna mirovên ko di roja şembê de masivani kirine, bexine laneta Xwedê, baweriya xwe bi Qurana ko kitêba we Tewratê tesdiq dike binin û bizanin ko emrê Xuda te cihê xwe.

47 — Xuda, di gunehên mirovên ko hevberê wî, tişteki dikin nabore. Xwedê di gunehên xelkê en din, ew guneh piçûk an mezin bin, li gora daxwaza xwe dibore û ji gunehkaran re efiw û toban dide, lê yê ko ji Xuda re tişteki dike hevber û hempa, divê bizane ko wî destê xwe xistiye gunehêki giran û pê gunehkar bûye.

48 — Ma tu cuhî û filan na bîni, ew xwe bi xwe nefsa xwe ji gunehan paqij dikin ... Lê ne were ye, Xuda bi tenê li gora daxwaza xwe, evdên xwe ji gunehan paqij dike.

Xuda di cezadanê de, ji tu kesî re bi qasî niqutekê ji zilmê nake.

Bergê Hejmara Dawî, ya Kovara Hawarê

Notices sur la littérature
mœurs et coutumes Kurdes

8

MEMÊ-ALAN

Le roi a eu encore une fois recours à son grand père (Neriman) qui entra et sans hésiter chez le monstre et commença à le caresser. Celui-ci se laissa faire et tout d'un coup devint un cheval domestique.

On le nomma (Bozê-rewan) et (Neriman) raconta à son petit fils ce qu'il avait vu dans les livres à son sujet. (Bozê-Bewan) était le cheval destiné à parcourir les plus grandes distances dans le plus court laps de temps. Il pouvait faire le tour du monde dans quelques jours.

(Memê-Alan) le monta et parcourut la ville parmi les applaudissements de ses sujets.

Le roi des (Alan) fit venir tous les célèbres selliers du pays, il mit à leur disposition tout le trésor royal, et leur ordonna de faire une selle modèle pour (Bozê-rewan) « et lui firent une selle que pendant le jour eclipsait le soleil et pendant la nuit la lune »

DEUXIÈME EPISODE

La rencontre de (Zin) avec (Nem)

Les trois filles du roi des fées survolèrent le fleuve de (Cizîr) et se perchèrent sur les murs de (Burca-Beleq) de là elles glissèrent au boudoir de (Zîn) où la jeune princesse dormait tranquillement.

Elles prononcèrent le nom de (Singav) soufflèrent sur (Zîn) et lui jetèrent un mouchoir sur les yeux. Tout d'un coup la respiration cessa (Zîn), elle devint immobile comme une morte.

La soeur aînée appela une suite de fées qui se chargèrent du lit de (Zîn) et l'enlevèrent

A l'arrivée au palais de (Mem) on le trouva dans le même état d'immobilité que (Zîn). On posa le lit de (Zîn) à côté de celui de (Mem). On découvrit le visage de (Zîn) et les trois soeurs se perchèrent sur les bords des fenêtres et contemplèrent les deux beautés.

Elles attendirent un peu, voyant qu'ils ne bougeaient pas, elles leurs soufflèrent de nouveau (Mem) fut le premier à ouvrir ses yeux,

il se dressa dans son lit sur ses genoux, ne savait comment expliquer la présence d'un autre lit auprès du sien. Il se leva, examina, porte et fenêtres, tout était bien clos, rien à soupçonner de ce côté. Il se mit de nouveau dans son lit, il tira la couverture sur sa tête et essaya de dormir, puisque ce qu'il voyait ne pouvait être qu'une vision. Mais le sommeil ne venait pas.

Il se leva de nouveau et s'approcha du lit et enleva un bout de la couverture. Sa surprise fut plus grande qu'auparavant. Une jeune fille qu'on pouvait prendre pour morte reposait dans le lit.

(Mem) retourna à son lit et pria le bon Dieu en disant : « O tout puissant ! mes années n'ont commencé de marcher vers le chiffre quatorze que depuis quelques jours. Même les mouches mâles et femelles n'ont pas encore choisi les pans de mon manteau pour se rencontrer. Aie pitié de moi et comme tu as amené ce lit auprès de moi ramène le d'où il vient ».

(Zîn) restait toujours immobile. Les trois colombes soufflèrent de nouveau.

(Zîn) ouvrit les yeux et constata la présence du lit de (Mem). Elle aussi ne savait comment expliquer la présence d'un lit dans sa propre chambre. Elle aussi, comme (Mem) examina porte et fenêtres. Tout était bien fermé et intacts. Elle remarqua aussi que les lanternes étaient doublées, au lieu de deux il y en avait quatre avec celle de (Mem).

(Zîn) pensa à une trahison. Le même jour elle était allée faire une excursion, un jeune homme épris d'elle en soudoyant les gardes s'était faufilé jusque dans son intérieur.

(Zîn) prise d'effroi et de colère se dressa dans son lit et d'une voix énergique s'adressa à l'étranger : « Lo lo....qui es-tu ? que cherches-tu ici, dans mon intérieur, je ne me rappelle pas de t'avoir parlé, et invité. Si j'appelle (Tacîu, Çeqo, Gurgin) viendront, te donneront à la bouche dévorante des épées ciselées. Ne sais-tu pas qui je suis et où tu es ? (à suivre)

Djeladet Xatî Bedir-Khan

Beşek Ji Nivîsa Mîr Celadet Bedirxan, Li Ser Dastana Memê Alan Bi Zimanê Frensîzî

هاوار

السنه ١
العدد ٨
اللاشبين
١٢ ايلول ١٩٣٢

سال ١
هژمار ٨
د شين
١٢ ايلون ١٩٣٢

کوفارا کردی * مجله کردیة

سیرانی یا زمانێ کردمانجی

وه که از گهشم بیرونی روژ چو بو آفاوسی
ساعت ژ شقی در باس بو بون .
صبه تر ، بری نیشترو ، ژ میغانخانێ در کتم ، من
دا کوچه و کولانان و گهشم میدانا برجی . دنیا
گرم ، باشل ، بهنا مروفت تنگ دبو دچکها . من
خوه دا برسه قهوک ، جانی خوه د فیسهند .
برج میدانکه فره و در بژکی به . د ناڤاوی ده
پار یزکی کچک لی سپی هه به . ب گیان ،
بهنون و داران خهلاتی به . نیره آفکه کچک
دهوره و د کته ناف بیرمه که تنک . اردا بیرمی ژ
کفرین شهکری و بنفشگون راخستی به . رنگی آفی
تیده و نداده . بیرم وک ز فیکه بنفشین خویا ده .
ل سری میدانی ، سی کوچه بین مزن - ژ
با کر ، ژ روزهلات و روژ آفا - خاکی باژیر
دینین ولی در ژین .
خاک دناڤ کوچه یان ده مینا رو باران دهر
کن . آف سی رو بارین کو . میدانی ده دگهن
هڤ ، دین لهیکه بوش و خوه ددن بر پار یزی .
د برجاغین پار یزی ده پلین لهی بی دشکین و لهی
دبه د بژ ، برک د بر راستی و بری دن د برچی پار یزی

ره دهر که ، ختا شتی سیرانی ، پاشی ، دلو پین لهوینی ،
بر ب بچری هه ، ژ هڤ د کفن و بلاڤ دین .
خاک دهر من ره دهورین . پیرو جوان ، ژن
ومیر ، دولند و بلنگاز ، ژ هر ری ، ژ هر
رانی ، ژ هر نژادو ملتی . من او ژ بلگ ، دیم و
سرچین وان ناس دگرن .
جارنان شفه کی گور و چن ب شاشکه
کی کسک دکن هڤ ، ککی صور د سر
چار کی ره دقلی . ژنکه زکرن ، وک دنکی ،
گیردبو و دکت پشنا کچکه نادرین و بژنراف .
آفه ، پیخواسک ، کاشو بی هدی خوه دستین
خوه د مرهیت و ناڤکین فان پیرک و کچکان ره
دگرینه . من جانی خوه فیسهندبو . رابوم ، کتم
ناف وی لهی بی . ژ نشکی هه ، ژ کولانکی چند
سری بین ب . کم و دستمال ل من در بون .
- نه لو ! . هی زویه . . . ماچان . . . دڤ
ژی برده . حسو دگوت . ناھری . . . گهمده . . .
قت نه دهات بیروان کو ازژی ب زمانی وان
دزانم ، کو ازژی بک ژ وانم .
ژخوه ژمن ره زلامک د فیا بو کو دهومورین من

SAL 9
HEJMAR 28

PÛNCŞEMB
15 GULAN 1941

HAWAR

ANNÉE 9
NUMERO 28

JEUDI
15 MAI 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

TEFSÎRA QURANÊ

28 - Ma hon çawan Xwedê inkar di-kin û pê kafir dibin!.. Hon miri bûn, wî can daye we; paşê, ewê we bimirine û piştê ji kerema xwe ewê we vejine û di dawiyê de ewê we bigihîne xwe.

29 - Wî Xudayê ko her tiştên dinê ji bo we afirandiye û paşê dest bi ez-mên xistiye û wî ezman li ser heft tayan ava kiriye.... Xwedê bi her tiştî dizane.

30 - Gava Xudanê te, ji melyaketan re got: Ezê cihgirtiyekî bişînim erdê, wan got: Yê ko tu bişîni, heye ko tê de fesa-diye bike û xwinê birijîne, destê me li her rehma te sekiniye, û em hemî dizanin ko tu ji kêmaniyan pak î, û em bi mezinahiya te bawer in. Xwedê ji wan re got: Tiştên ko hon ni zanin ez pê dizanim.

31 - Xwedê ji cenabê Adem re navê hemî mexlûqan da zanin û paşê ew mexlûq nişani melyaketan kir û ji wan re got: Heke hon dilrast in, ^qe ji min re navên wan bêjin.

32 - Ferîşteyan got: Mezin tu î, ji zanîna ko te gihande me pê ve, em bi tu tiştî ni zanin; yê zana û ferîs tu î.

33 - Xwedê got: Ya Adem! Navê mex-lûqên dinê ji melyaketan re bide seh kirin û gava Adem navê wan ji wan re da zanin, Xwedê got: Ma min ji we re ne gotiye ko ez nependiyên erd û ezmanan û tiştên ko hon di nav beyna xwe de dibêjin an vedîşêrin dizanim.

34 - Û hîngê, me ji melaikan re got: secde ji Adem re bibin, ji şeytên pê ve hemiyan jê re secde birin; şeytên guh ne da, ser xwe ve çû û bû ji kafiran.

35 Me got: Ya Adem, tu û jina xwe pev

re di bûhustê de rûnin û ji her tiştên wê biqasî xwestina xwe bixwin, lêbelê nizikî vê darê me bin, an ne honê bibin ji zalim û gunehkaran.

36 - Lê Şeytên ew xapandin û ew bû sebeba derêxistina wan ji bûhustê û Xwedê ji wan re got: Dakevin erdê û tê de weke dijminên hev biminin; di wê de heta wextekê ji we re war û qûtek dê hebe.

37 - Adem ji kerema Xwedê hînî pirsên diayê bû, dia û tobe kir; toba wî hate qebûl kirin, ji her ko Xwedê bi tobedaran re rehim û piyar e.

38 - Me ji wan re got: Honê hemî dakevin erdê, emê di wê de bi kitêb û pêxemberan rîya rastiye nişani we bikin, yên ko baweriya xwe bi wan tinin, ji bona wan tirs ⁿine û ew xemgir na bin.

39 - Û ewên ko kafir bûne, û derew bi aliyê ayetên me ve dane; dê bikevin dogehê û tê de her wê biminin.

40 - Geli lawên Israil!... Qenciya ko min ji we re kiriye binin bira xwe û baweriya xwe bi min binin û li ser vê baweriyê bextê xwe reş mekin heta ko ez ji li ser bextê xwe biminim; di bextxirabiyê de ji min bitirsîn.

41 - Baweriya xwe bi vê kitêbê bi-nin, ev kitêb şehdetiya kitêba we Tewratê tine, kafirên vê kitêbê ên pêşin me bin û ayatên min bi tiştine erzan me firoşin.

42 - Rasti û xwariyê têkili hev mekin û rastiye vemeşêrin, hon ji xwe pê dizanin.

43 - Nimêjê bikin, zekatê bidin û di nimêjê de tevî bawermendên din xwe bitewinin.

44 - Ma kengê dibe ko hon li xelkê

SAL 9
HEJMAR 27

SÊŞEMB
15 NÎSAN 1941

HAWAR

ANNÉE 9
NUMERO 27

MARDI
15 AVRIL 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

TÊXISTİYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Sê tarixên Hawarê	Xwediyê Hawarê
Dongiya Çeqel	Osman Sebri
Derdên Cegerxwin	Cegerxwin
Keban û Mamoste	Rowşen Bedir-Xan
Marsa Xortan	Osman Sebri
Ciyayê Sasonê	Osman Sebri
Gelawêj	Hawar
Loriya Şehîdan	Mamosteyê gerok
Xurşîd	Nûredîn Usîf
Gramêra kurdmançî	C. A. Bedir-Xan
Wesînekên Kurdî	Hawar
Ferhengok	Ferhengvan
Loriya Fatê	Herekol Ezîzan

BIRÊ FREXSIZÎ

La reaparition de Hawar	La rédaction
La bereuse de Fatê	R. Lescot
Memê Alan	D. A. Bedir-Khan



ŞAM—1941
ÇAPXANA SEBATE

Bergê Hejmarê 27'an û Naveroka Wê

SAL 1
HEJMAR 20
DUŞEMB
8 Gulan 1933

HAWAR

ANNÉE 1
NUMÉRO 20
LUNDI
8 Mai 1933

Qovara Qurdi * Revue Kurde

Gêezistiyên Qovare

Heyineqe yeqsalt
Du Dengbêj
Xurtiya Binahiye
Hevind
Ferhengog

Nivîsanoq
Dr. Q. A. Bedir-Xan
Çiroqbêj
C. A. Bedir-Xan
Hawar

Lavelav
Serxwerabûna Mirîşan
Revandin
Cuhaba Lawani
Berxiqê Hawarê
Dilber
Çarînen Xeyam

Osman Sebrî
Cegerxwin
Dr. Q. A. Bedir-Xan
Kedrican
H. Smail
M. F. Botî
Dr. Q. A. Bedir-Xan

çapxana terekî

ŞAM — 1933

Bergê Hejmara 20'mîn û Naveroka Wê

SAL 1
HEJMAR 13
ÇARŞEMB
14 Çileyê-Berê 1932

HAWAR

ANNÉE 1
NUMÉRO 13
MERCREDI
14 Décembre 1932

Qoyara Qurdî * Revue Kurde



Çapxana Iereki
ŞAM — 1932

Bergê Hejmarê 13'an û Wêneyê Sultan Selaheddîne Eyyubî

SAL 9
HEJMAR 31
—
IN
1 TEBAX 1941

HAWAR

ANNEE 9
NUMERO 31
—
VENDREDI
1 AOUT 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARE

Tefsira Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedisên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Mirina Guri	C. A. Bedir-Xan
Dik û Rovi	Osman Sebrî
Behramê Gor	Cegerxwîn
Navên Kurdmancî	Bavê Cemşid
Dinya Tarî	M. Ehmed Botî
Delaliya delalan	Seydayê gerok
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Diljariyek	Heşyar
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan
Paizok	Stranvan

BIRÊ FRENSIZÎ

Chant d'automne



ŞAM—1941
APXANA SEBATÊ

Naveroka Hejmara 9'an

BINGEHÊN GRAMÈRA KURDMANCI

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHRVAN

— 6 —

TEWANG

52 — Zimanê kurdmaci zimanekî tewangbar e. Yanî bêjeyên wî di qisetê de weke xwe naminin û li gora cihê ko di qisetê de dikevin ê, û wezîfa ko li ser xwe digirin tene tewandin û hin parkit bi wan ve dibin, an hin tipên wan bi tipîne din diguhêrin.

53 — Ji birên qisetê bi tenê ên guhêrbar tene tewandin. Ên neguhêrbar tucaran nayîne tewandin û ew hergav weke xwe dimînin.

54 — Bi gelemperî bête di qisetê de an kirar an bireser in. Gava ew kirar in weke xwe dimînin, û gava dibin bireser hingê tene tewandin.

Tewanga her birê qisetê herçend yekdar ji hev cûda nebin ji ew kem û zêde ji hev bifereq in. Tewanga her biri di cih û di devera wê de dê bête gotin.

55 — Tewanga navdêran: Navdêr, hevenav bin sernav bin, li gora mêjer û zayêndên xwe tene tewandin. Bi gelemperî û di yekejmariyê de navdêrên nêr bi «î» yê û navdêrên mê bi «ê» yê û gelemjara lier diwan bi «an» ê tene tewandin. Ev parkit bi paşya navdêran ve dibin.

Hesp hat. Hesp hatin.
Mehin hat. Mehin hatin.

Di komekên jorin de navdêrên «hesp» û «mehin» ne hatine tewandin. Ji ber ko ew her du ji di wan komekan de kirar in û kirar nayîne tewandin. Lê ev navdêr bi xwe di komekên jêrin de hatine tewandin. Ji ber ko lê de êdi ne kirar lê bireser in.

Ez hespi dibinim. Ez hespan dibinim.
Ez mehinê dibinim. Ez mehinan dibinim.

Di misalên jorin de navdêr hemî bireserê lêkerê ne. Lê navdêr bireserê navdêreke din ji dibin. Hingê ji navdêr tene tewandin. Herwekî: Ev goştê çêlekê ye. Ava golê şêrin e. Di çiyayên Kirdistanê de her texlît dehe û cenawir hene. Gola Wanê goleke spehî ye.

Şanek — Di nav bêjeyên ko bi «an» êkê temam dibin, di hinan de ev «an» ji esil û rayekê bejeyê ye. Mina: Rewan, baran, peyman, garan, kevan, diran h.d. Lê di hinan din de ev «an» bi xwe, tewang e, û ji ber sebebê bi wan ve bûye.

Mina: Serhedan, Botan, Şêrwan, Xêrzan, Hevêrkan h.d. Ji lewre ev bêjeyên ha bi tu awayî nikarin bête tewandin. Ji ber vê yekê herwekî mirov dibêje «Ez ji Rowenê tîm» nikare bibêje «Ez ji Botanê tîm». Ji ber ko eslê bêjeyê «hot» e, «an» ko pê ve bûye tewanga gelemjare ye. Ji xwe gava em Botan dibêjin mîxêd «cihê» an «şêrê» Botan e. Bêjeya «hot» bireserê cih û eşîrê ye û ji lewre hatiye tewandin û bûye «Botan». Mina bêjeya «dar» gava dibe bireserê bêjeke din tete tewandin. Herwekî: «pêlên daran». Bêjeyên wek Serhedan, Şêrwan, Xêrzan, Hevêrkan, Soran ji mina wê ne û tev de yek hawî ne.

Di vê navê de bêjeya «gulan» rehma ko ji vî cîsnî ye tete tewandin. Bi rastî eslê vê bêjeyê «meha gul, meha gulan» e; yanî «an» tewang e. Ji lewre diviya bû «gulan» ne hata tewandin. Lê ev bête ji qeydê der û bi awerteyî careke din ji tete tewandin û dibe «gulanê» û li şûna ko bibêjin «meha gulan» dibêjin «meha gulanê». Ji ber vê yekê «an» gulanê divê ji eslê bêjeyê bête hesibandin.

56 — Awarte: Bi tenê û ji qeydê der di lêkerên gerguhêz û di zemanê wan ên bori de bireserên wan weke xwe dimînin û ji hervajî ve kirarên wan tene tewandin. Ji lewre, di komekên jêrin de rehma ko bêjeyên: «Zin, hesp, çêlek, zarok» kirar in, hatine tewandin û bêjeyên: «Sisin, ceh, pencere» yên ko bireser in weke xwe mane û ne hatine tewandin.

Zinê Sisin dit. Hespan ceh xwar. Çêlekan giya xwarî bû. Zarokan pencere şkenand.

57 — Herçi navdêrên nêr in heke di wan de tipên «ê» û «a» liene ev navdêr dikarin bi guhartina van tipan bi «ê» kî ji bête tewandin. Herwekî di van komekan de: «Soro ji kêvir ket. Gurgin çû eş. Balafir ber bi ezamên firî. Ez li hêsp siwar bûm. Ferzo ji bajêr têt. Kî li ser bîn bû? Êm ji xênî derketin».

Bi vê qeydê ve, divê di qisetê de hin navdêrên nêr bête tewang biminin. Ji ber ko di hemî navdêrên nêr de dengdêrên «e» û «a» peyda nabin. Ji lewre û li nik kurdmancên ko bi vê qeydê ve diçin bêjeyên wek: «kum, goşt, dil, hiş, mirov, mîrik, gir, kur, mîr, mîr, gund» nayîne tewandin, ji ber ko di wan de ne «e» ne ji «a» heye. Ji ber vê yekê gava ew di qisetê de dibin bireser ji weke xwe dimînin. Piştî ko ev qeyde di zmên de cih bûye navdêrên bi «e» û «a» ji di qisetê de bête tewang hatine gotin. Ji lewre herwekî mirov dikare bibêje «ez ji kevîrî - an - kevîr ketin» dikare bibêje ji «ez ji kevîr ketin» û bêjeya «kevîr» netewîne.

Şanek — Ji raveka jorin dixuye ko di navdêrên

nêr de meyildariya zîmên ber bi terikandina tewanga wan a yekejmar e; nemaze şiklê pêşîn. Ji lewre her sê şiklên jêrîn rast in.

Soro kevîrî tavêje. Soro kêvîrî tavêje. Soro kevîrî tavêje.

Gurgîn çû aşî. Gurgîn çû êş. Gurgîn çû aş. Balafir ber bi ezmanî firî. Balafir ber bi ezmanî firî. Balafir ber bi ezmanî firî.

Ez li hespî siwar bûm. Ez li hespî siwar bûm. Ez li hespî siwar bûm.

Ferzî ji bajîrî têt. Ferzî ji bajîrî têt. Ferzî ji bajîrî têt.

Kî li ser bani bû? Kî li ser bân bû? Kî li ser bân bû?

Em ji xaniyî derketin. Em ji xaniyî derketin. Em ji xaniyî derketin.

58 — Gava çend navdêr didin pey hev herwekî mirov dikare wan navdêrên li gora mêjer û zayendê heryekê yek bi yek bitewine, dikare bi tewandina hinekan ji bes bike.

Navdêrên ko dane pey hev ne ji yek zayendî ne; lê tev de ji yek mêjerî ne. Tewandina navdêrên paşîn bes e. «Ez hesp û mehîne dibînim. Ez hesp û mehînan dibînim. Hesp û mehînan xwar».

Navdêrên ko dane pey hev, ne ji yek mêjerî ne. Her navdêr cihê û li gora mêjer û zayendê xwe tete tewandin. «Ez mihê û bizînan dibînim. Ez hesp û mehînan dibînim. Mihê û bizînan xwar».

Navdêrên ko dane pey hev ji yek mêjerî û tev de yekejmar in, lê ew ne ji yek zayendî ne; û navdêrên paşîn nêr e. Ji ber ko di tewangê de esil navdêrên paşîn e û hikim li mêjerê wê ye heke ew ne hatiye tewadin navdêrên mî jî bî tewang dimîne. «Ezê herîm keçik û kurik bibînim. Tu Rewşen û Felemêz dibîni?»

Şanek 1 — Herçî navdêrên ko bi «e» an bi «a» yê temanî dibî, çî mî çî nêr, jî ber kurtiyê, di yekejmarê de bi guhartina van tîpan bi «ê» kî jî tenê tewandin. Di gelemjmarê de ew «e» û «a» yekcar dikevin û «a» ya tewangê dikeve şûna wan.

Lî ser maseyê	Lî ser masê
Lî ser maseyan	Lî ser masan
Ber bi çiyayî	Ber bi çiyê
Ber bi çiyayan	Ber bi çiyân
Çirayê vemirîne	Çirê vemirîne
Çirayan vemirîne	Çirân vemirîne
Perdeyê rake	Perdê rake
Perdeyan rake	Perdân rake

Şanek 2 — Bêjeyên wêk Frense, Sûriye, Emêrike, Efrîqe h.d. yên ko bi «e» kî temam dibî, heke ew bi guhartina wê «e» yê bi «ê» kî ne hatine tewandin û ketine bin hikmê qeyda gelemper ew «e» bi «a» kî diguhêre û ew bêjê bi awayê jêrîn tene tewandin: Ji Sûriyayê, ji Frensayê, ji Emêrikayê, ji Efrîqayê. Lê şiklê din,

yanî şiklê: Ji Frense, ji Sûriyê, ji Emêrikê, ji Efrîqê» siviktir e.

59 — Bireserê Navdêrê: Navdêr di komê de an bi tena xwe ne, an bêjeyeke din bi wan ve bûye û hevaltiya wan dike. Ji wê bêjeyê re bireser dibêjin; jî ber ko ew mana navdêrê diedilîne û dibe serî.

Bireserên navdêrên, li gora cîsnên xwe li pêşî an li paşîya navdêrên tene zêde kirin.

Bireser gava dikevin pêşîya navdêrên bî tu tiştî bi wan ve dibî: ev keçik, kîjan mirov, çar xanî, hin çiya, çend kitêb, delî bizî, van zarokan.

Lê gava navdêr bi xwe li pêş e û bireser dane pey, hingê veqetandekê dikeve navbera navdêr û bireser û wan digihîne hev: Beriya Mêrdînê, hespê beza, mehîna spehî, çiyayê bilind, pehnava çiyê, newala kûr, rêke dirêj, stûna xani, destê bi tenê, dara şikestî, xencera min.

60 — Navdêrêk dikare çend bireserên bibe. Hin ji wan dikarin bikevin pêşî hinên din ji paşîya navdêrê. Bireserên ko ketine pêşîya navdêrê û yên ko dane pey wê jî alikî û tev de bireserên navdêrê ne û ji aliyê din ew bi xwe bireserên hev in:

Min çend kitêb hene. Min çend kitêbên qenc hene. Ev xencera min e. Ev xencera xulanê min e. Ev xencera xulamê pîsmamê min e. Ev xencera xulamê cîranê pîsmamê min e.

II — VEQETANDEK

61 — Veqetandek bêjeke kiçik e ko dikeve paşîya navdêrên û paşîya wan bêjeyên ko li şûna navdêrên radibî û wan dinînin.

Veqetandek carina di pêşîya rengdêrên de jî peyda dibî.

Veqetandek bi gelemperî mêjer û zayendê navdêrê şanî didin û navdêr jî wekhevên wê vediqetînin.

Bi pêvehûna veqetandekê navdêr carina binavkîrî û carina jî nebinavkîrî dibî.

62 — Di zîmanê kurdmancî de du texlît veqetandek hene: veqetandakên binavkîrî û veqetandakên nebinavkîrî.

63 — Veqetandekên binavkîrî: Veqetandekên binavkîrî dikevin paşîya navdêrên ko bireserek bi wan ve bûye û ev veqetandek wan navdêrên binavkîrî dîkin. Ev navdêr bi vî awayî jî wekhevên xwe vediqetin, dibî xweserî kesekî, tiştêkî, an weslekî wan didin zanîn. Veqetandekên binavkîrî sisê nê: ê, a, ên.

Ê — Ji bo yekejmara zayendê nêr: Hes-

ŞEY TANQÛNÎ

— 1 —

« Şeytanqûnî: wekî her miletî li nik me kurdan ji der heqê xerafatan da baweriyek heye. Li goreyî wê baweriyê, hin mirî piştî mirinê radibin. Gava ew mirî navê kîjan mirovî hillin, ew ji dimire. Ji bo vê yekê kîjan miriyê ko şeytanqûnî libe bi merê dikujbin. Ji ber ko dibêjin, şeytanqûnî bê merê bi tu tiştî nayê kuştin ».

Di hejmara Ronahiyê a 14 an da bi navê (torşê şevê) min bendek belav kiri bû. Di wê bendê da min hin xerafeyên ko di nav kurdan da cih girti jimarti bûn. Şeytanqûnî, ji wan xerafan yek e. Îro min divê çirokeke qewimî li ser vî navê han binivîsim.

Li Serhedan feqeyên kurdan gelek hebûn. Dema ev feqe digehêştin Mela-camî (navê kitêbekê ye), ji bo pêşvebirina xwandin û zanîna xwe, hinekên wan diçûn Îranê û destûra xwe ji zanayên Îranê ên fêris distandin. Ei vê yeka han di nav heval û hogirên xwe da digir dibûn.

Bokeyên vê çirokê feqe Emer û feqe Hesen, piştî ko Mela-camî xwandi bûn, ji bo pêşvebirina zanîn û standina destûra xwe berên xwe dabûn Îranê, li gundekî bû bûn mîvan û ev çirok li wan qewimî bû. Ji bo ko xwandevan qenc serwest bibin, emê rê bidin gotîna feqî Emer:

Dema em gihêştin sînorê Îranê bi çvara dereng ra em li gundekî bûne mîvan. Ji ber ko di gund da ode nîne, gundî mîvanên xwe dibin mizgeftê û her yek ji gundiyan jê ra nan û şivê dibe. Em ji rast çû bûn mizgeftê. Me bi gundiyan va bi hev ra nîmêja şivan kir û hîn me nan dixwarin ko dengê girî û şînê bi ser gund ket. Gundiyan ko ji me ra nan anî bûn bi hev ra ev gotin dikirin:

— Kurê mixtar çû rehma Xwedê!.

— Çi kurekî çak û dilpaqijî! pir jî ne ajot.

— Di topa gund da kurekî welê peyda ne dibû.

Ji van gotinên han me zanî ko kurê mixtar piştî bêkêfiyeke du sê rojan emra Xwedê kiriye û canê xwe sipartiye ruhîstîn. Bivê nevé hinek ji diltengiya gundiyan hati bû me jî. Nemaze, mirov î li ser rêkê be, di riya xwe da raste miriyan were, ne tişteki xweş e.

Saetek ne borî ko risîpiyekî gund ji aliyê mixtar va hate cem me. Ji me ra digot: heke hûnê îşev li ser cendekê ku ê mixtar xetmek quran bixwînin, emê cendek bişon û rakin mizgeftê. Mixtar wê di ber westa we va, du zêran bide we. Berê me î li welatê

biyaniyan bû û ji me ra dirav diviya bû. Me qîma xwe bi vê gotinê anî. Piştî saetekê cendekê mirî anîn nik me û her kes çû mala xwe. Me her dûyan ji destmêja xwe nuh kir û her yekî di hêleke cendek da çok berdane erdê û dest bi xwandinê kir.

Cihê em tê da, mezeleke biçûk, di rex mizgeftê da bû. Ev mezela ko ji du kunên biçûk pê va tişteke di diwarên wê da tine bû, bi tenê ji bo raketina mîvanan hati bû çêkirin. Pixêrî di nîveka diwarê eniya dêrî da veketi bû. Cendek di nava tabûteke textinî da, serî berve agir û ling bi dêrî da bûn. Me her du hevalan weke kewê nêçirê li peşberî hev bi dengêkî nîvbiwind quran dixwand.

Şev gîha bû nivî ko dengê xirtiniyekê li pêş min hat. Berê, min ne xwest ko bi guhên xwe bawer bibim. Lê pir ne ajot ko ew deng careke din hat. Êdî ji min ra şivîşk çêbû bûn ko ew dengê han ji tabûtê dihat. Ji tirsan, nema çavên min dixwastin li rûpelên quranê binêrin. Min çiqas cehda xwe dikir ko binêrim, herwekî hinek bi zor çavên min badine ser tabûtê. Eqlê min li hev keti bû. Heke hevalê min, ne ji pîrmijûlayiya wî bûna dê tertilîna min bîr bibira. Lê xwandina bi dengê xurt, ew agahî halê min ne kir. Tu ne çû, careke din dengê xirçinê bi tabûtê ket. Ji ber ko vê carê çavê min î li tabûtê bû, livîna dergehê tabûtê ê nîvbizmarkirî bi ber çavên min ket. Ji tirsan dilê min, wekî teyrê ko bi dafan dikeve û hol dibe, xwe li ber devê min dixist. Ji ber ko hevalê min feqe Hesen î bi çavê î bû û cendek li hêla çavê kor hati bû, tişteke ne didît.

Bi bawika nuhkirina destmêjê ez bi derketim derva û min dêrî di ser feqe Hesen û cendek ra girt û li paş kuneke diwêr guhdariya halê wan kir. Bistek ne çû ko tabût bi carekê liviya. Hînga feqe Hesen her tişt zanî û zûka revî ber dêrî. Lê mixabin ko dêrî girî dît. Carekê bi hêl rahişte dêrî û hezand, hînga du sê dangan gazî min kir. Di vê navberê da bû ko cendek xwe qenc tev da û derê tabûtê li ser xwe rakir. Bi rast hêreke ziravqetîn bû. Hema pê ra qerqer (kefen) jî bi ser serê xwe va anî û daxiste bin çengên xwe. Her du çav jê sor û mîna xûnê bû bûn. Kef û kopik bi dor dêv da dihat û bi destan hin tişt digotîne feqe Hesen. Feqeyê bi çavêkî ji tirsan dîn bû bû. Wî her dixwend û pufe ser cendek dikir.

Lê cihê ko xwandina feqecendek bikuje û wî jê xilas bike; hîn xurtir dikir. Dema cendek

dft ko feqe guh nade daxwaza wî, hema rabû ser xwe û qesda feqe kir û bervê çû. Wê gavê dengêkî welê bi feqe ket ko kevir li ber dibûne kerî. Bi lez û bez dişa derî rahêjand û du sê dangan gazî min kir. Dema min lê venegerand û cendek jî nîzikî lê kir, hêla derî berda û baz da. Lê kû da biçûya! Ji her çar diwaran derbaz bûn ne mikûn bû. Çiqas cara cendekê reben berê xwe didayê ko here cem, feqe qîrek dida xwe û gazî ji Hezreti şêx dikir. Çi serê we biêşînim; tu ewliya û enbiya ne man ko feqe Hesên gaziye nekir. Bi her qîrekê ra xwe li diwarekî davête diwarê din. Pê da pê da feqe Hesên diwestî û cendek xurt dibû. Dawî, cendek feqe Hesên li kuncêkî asê kir û girt. Feqe li ber mirinê jî dest bire xwe û kulmek di pê ra li ser çavê cendek da û pê ra xiste erdê. Xûneke ecêb di dev û bêvilên cendek ra avêt û feqe Hesên jî ji tirsan wekî sofîyê bi cerbeze diricîfî.

Vê hêreya han dil û hinavên min zîz kirin. Êdî jî mêj va ji sinorê henekan borî bû. Bê ko ji tirsan derî vekim, ez hilkişim ser xênî û di pixêriyê ra min rahişte destê feqe Hesên û hilkişande jor. Pir ne ma, cendek rabû ser xwe û piştî şehadetê, ji Xwedê ra sipas kir. Paşê bi dengêkî bilind holê gazî me kir.

— Gelê biran hûn kû da çûne?.. Ji bo Xwedê be werin cem min.

Hin min dikirî lê vegerînin ko feqe Hesên destê xwe da ser devê min û got:

— Kuro, ma tu ji rîya Xwedê ketiye?!.. Ev cendekê han şeytanqûnî bûye. Ma qey tu nizani ko şeytanqûnî çi ye? an te divê bibî şebeba serê me!..

Feqe Hesên di gotina han da ne fî neheq bû. Tîrsa ko bi ser ketî, ev gotina wî ne di gihande warê şermê. Lê tîrsa min ne ewçend bû. Ji xwe dema wî û mirî (cendek) hev û din di nava mezelê da dibirin û tanîn, li derve ji pirkenîne zikê min êşîya bû. Hêdika min destê xwe da ser gurmikê û gotê: Ne heweeyî hinde tîrs e. Mirî navê me nizane. Bi destelepê jî, ew yeke û em dudu ne. Bi ser da me xençer hene. Heke dilê wî heyê xwe bide ber devên xençeran, bê şik destên me dikarin bilivin.

Feqe Hesên heya wê hingê guh bi xwe da girti bûn û li çavên min dinêrîn. Gava gotinên min qedîyan, hinekî ricîfî û got:

— Feqe Emer dilê min ditîrsiye. Ji wê pê va li nik me mer ji nîne ko pê cendek bikujin. Ma şeytanqûnî bi xençeran dimire?!..

8

— Çawan? wêkî keran dimirin. Lê metirse, dibe ko camêr ne mirî be û bi xûnê ketî be. He xwe ragire, mêrik xwe bi qîr û zariyan kuşt; ez binêrim ka çi hewala wî ye.

Mêrik her qîr û zarî bû, bê atlahî gazî me dikir. Min hinekî dilê feqe Hesên rihet kir û ez çûm diwarê pixêriyê. Miriyê me di nivê mezelê da rawestî û her gazî me dikir. Bi dengêkî xurt min gotê:

— Te xêr e û çi dixwazî?

— Bira, ez tişteki naxwazime. Bi tenê min divê tu werî cem min. Ez ne mirime. Xweya ye ez bi xûnê ketîme. Werin yek torpan bidin ko ez li xwe kim û mizgîniyê bidine bavê min û bêjin, kurê te ne miriye. Dê bexşîşeke hêja bide we.

— Ezê çawan bawer bibim ko tu şeytanqûnî ne bûye?

— Te çi divê, ezê welê bikim.

— Qurana min bi tûrê nên va li wir in, heke te dane min, dê zanibim ko tu şeytanqûnî ne bûye.

Mêrik bê dudilî çû quran û tûrê nên anîn û di pixêriyê ra dirêjî min kirin. Hinga dilê min rûnişt ko camêr ne mirî bûye û bi xûnê ketiye. Ez rabûm hatim jêr û derê mezelê vekir û çûm cem. Piştî ko feqe Hesên bi rihetiya mêrik bawerî anî, bi dudiliyeke mezin hate cem me. Lîin jî carcaran diricîfî.

Me her yekî hinekî kinc ji xwe kirin û dane mêrik. Têvî bergera wî, ji tîrsa ko gundî ne bêjin şeytanqûnî bûye û nekujin, min bi şev haya kesî ne kir. Sibê dema hatin ko cendek berin goristanê, mêrik di nav me da rûniştî ditin. Êdî şika kesî ji rihetiya wî ra ne ma bû. Piştî ko bavê mirî tevdira min zanî, xwe avête himbêza min û got:

— Heke ne ji tewitîna te bûya, me dê lawik bi destê xwe bikuşt. Mafîr ko te lawê min ji vî halî û ez jî ji ara kuştina wî xelas kirim, ezê dilê te geş bikim.

Piştî ko sê rojan em li nik xwe kirin mîvan, bi dilxweşî û rûmet bi rê kirin. Gava em li wî gundî bi rê ketin me heryekî pênc zêrên zer bexşîş berda bûn kîsê xwe.

OSMAN SEBRÎ

Kiriyariya Hawarê:

Ji bo Sûriyê 5 liyeyên sûri - Ji bo welatên din li çekî ingilîzî Xwedî û gerinendeyê bepirsiyar: Mir Celadet

Ali Bedir-Xan, Şam - Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali

Bedir-Khan, Damas-Syrie

ŞAM — ÇAPXANA TEREQIYÊ — 1943

792

55

Stûna Fekehan

Ta, Tawî û Tabir

Yeqî ji fekehên deşta Hesinan ji me nexweşiya tayê pirsîyar diqer. Me pirsîyarîya wî da bijîşqê xwe û jê cuhabeqê daxwaz qir.

Eve, reşbeleqa fekeh û cuhaba bijîşqî.

Deşta Hesinan: 23 Gulan 1932

Ezbenî!

Min stûna xwe-stûna fekehan-xwend. Geleq tişt hene qo divêt em ji te bipirsîn. Heval nav hev de şewirin û me got bila pirsîyarîya me a pêşin nexweşiya tayê bibe. Da qo em jê xelas bibin, eklê xwe bidin ser hev û biqarin tiştinên din ji bipirsîn. Ji lewre qo ji tayê eklê me ne ser hev e, em jê geleq aciz in.

Paşî, ez destên te maq diqim û hevîdarê cuhaba te me.

Hesenê Qoçer

Cuhaba bijîşqê me:

«Xelqê deşta Hesinan ji hesinî çêqiri bûwana ji divîya bû heta niho di veytûna tayê de bihatana helandin. Herweqî dihelin ji.

Ji xwe birê welatê me e germiyan û dest ji vî afetê xerab dibe.

Gava ji xelqî têt pirsîn, xelqê nezan dibêjin qo nexwestî ji ava gundî ye. Niq dilê wan ava wan ne paqij e, bijehr e, herqî vedixun pê diqevîn.

Lê ne welê ye. Ew ava zelal û şîrîn qo di ber gundê we re dibore û gundê we pê şên û ava dibe, di eslê xwe de paqij e, avîje ye, qaniya jiyîna we ye. Jehr û nexwestî di nezani û tiraliyê de ye.

Niho divêt ji we re bidim zanî ew avên paq qo qaniya jiyîna ne, çawan nepaq û jehr û axê dibin.

Herweqî nas e, gava av serberdayî diheriqin, li deştan belav dibin di çal, qortal û di her cihên nîzm de dipingirin, ji wan pingavan berpê dibin. Pingav bi

zemanî ve dibin çirav, di dora wan de giya, stirih û zil şin dibin. Di nav wan de pêşî (qelmêş) cih digirin, helinên xwe çêdîqin. Jê difirin, tîni li ser dest, rû û laşên me datînin, bi me vedidin. Mirovên pêvedayî di nav (6-21) rûjan de pê diqevîn û dibin tawî.

Di destpêqa nexweşiyê de laş û leb-tên mirov dişqên, direcifin, piştre germ dibin. Hêlê nexweşiyê ji sê çar saetan heta sê çar rûjan dom diqer û bi xwêh danqê derbas dibe. Pêşdetir ev hêlê ha an her rûj an di serê du sê rûjan de carqê vedigere tî. Heqê nexweşî derman naqin pêde diqer û dibe (taya-veşartî).

Di taya-veşartî de rengê nexweşan zer dibin, xwina wan diqîqin, ziqê wan diperçifin, diqevîn haleqî ecêb, dibin weq meşqeqî vala ser du dariqan an ser key-siqeqî daqîqandî.

Di vî şiqî de nexweş zû bi zû namirê lê ji derba xwe diqeve, bi qerî tu tiştî, tu qest naye. Ne mal, ne zar û zêç, ne welatê wî jê tu fêde nabînin. Pericar ji avîne ji diqeve, zarowên wî nabînin, qo bibin ji nexweş û qemsihet dertên. Bi tiştêqî qîçiq dimirin. Ji bona wî jiyînê din namirê. Heta qo ezrail bî hawara wî di nav êş û tehlîyê de diperpîte, vedigevîze.

Eve ha şiqleq e. Şiqleqî din ji heye Jê re (taya-xebîs) dibêjin. Di taya-xebîs de şiqlinên giran hene qo di nav sê çar saetan de diqujin. Ev şiqî pericar di zarowan de têt dîtin.

Eve ta. Hon dibînin qo tanexweşîq giran û xedar e. Ji tifo, qolêra û ji web-ayê xirabtir e. Nexweşîq welê ye qo rayê heyîna me, rayê heyîna miletî diqoje.

Bi gotinên jorin kenc xuya qir qo ev nexweşîya xedar ji pêşîyan, pêşî ji pingav û çiravan tîne pê, lê tucar ne ji ava zelal qo xwedê pesna wê di kuranê de da û di hekê wê de (we cehelna minel maî qule şeyî hey) me her tişt bi avê jiyandine, gotiye.

Vêca qo me qaniya nexweşiyê peyda

û dijminê xwe bicih qir divêt ji bona qevandin û kelandina wî bixebitin.

Me goti bû qo ta ji pêşyan, pêş ji pingavan çar dibin, lê ne ji avê, ji xwarinê an ji fêqî û terahîyan.

Belê dijmin pingav e. Ji lewre qo pingav û ava men hêlîna hêqên pêşyan in. Icar divêt em bala xwe bidin di dora xwe de tu pingav û çiravan mehilin. Ji bona wê ji divêt, avên segîni bêne heriqandin, çiravan bêne zuwa qirin, di dorê de herçî zil, stîrîh û giya hene bêne jêqirin û digel rayên xwe xeritandin.

Qo av heriqin, çirav zuwa bûn edin pêşî niqarin hêqên xwe li dorên me berdîn, ji me dûr diqevin em ji ji tayê xelas dibin.

Ji bona zuwa qirîna çiravan awaqî kenc heye, Ew ji dantîna darên Evqalîptos e. Ev darên ha ji niq hiqûmetê peyda dibin. Divêt jê bêt daxwaz qirin, Herçî avên qicîq, mirov diqare li ser wan gazê birêşîne.

Nexweşîya tayê ji ber westî bêtir di çaxa fêqî û hênderê de boşe. Ji lewre, xesma di wê çaxê de divêt mirov ji xwe re mikate bibe.

Xebeta bîngehî herweqî me got heriqandina avan û zuwandina çiravan e. Lê ji hêlêqî din bi standina dermanên tabir mirov diqare xwe jê biparêze, Dermanê tabir silfato ye, Berî ewilî silfato dermaneqî erzan e. Di pist re hiqûmet herwe belav diqe. Silfato: erzan me be ji herhal jiyîna we jê behatir e.

Vêca, ji bona parastinê di çaxa tayê de yanî ji havîna pêşî heta paiza pasîn divêt mirov di heftiyê de du caran, serê her sê rûjan grameqî silfato bixwe. Mirovên silfatoxwarî ji pêşyan bêne pêvedan ji bi tayê naqevin.

Heçî bi gotîyên min ve çûn tucar nexweş naqevin. Lê heçî qo pê ve neçûn û nexweş qetin divêt xwe nîsanê diqtoveqî biqin.

Heqe diqtor ne qet dest divêt xwe bi xwe derman biqin.

Awayê dermanqirîne ji, ev e:

XANÎ

Ew nûr e, herê li erdê şîhrê
Şîhra me ye, şîhra bendewarî

Seydayê me ye, melayê yeqta,
Ava qiriye bi şor, kesran,

Parîsê guli bi şorê qurdi,
Ava te diqir melayê xanî.

Bê zêr û qevir, ji pêta arî.
Ava te diqir serayê şîhrê.

Gewher ewe, ew û can e bistam,
Destpêqire ew, û da ew encam.

Rubnahî te da, li erdê qurdan,
Ruhnahîya te, delala yezdan.

Hêvî tu î, tu çavê sayda,
Ferzane î tu û lawê mewla.

B' sazê, te diqir, te da wê cûşîş,
Ey hişveqiro! te da wê xwabiş.

Şesturê te ye, qo da me zûmî,
Firdews li qû ye, bihar û havîn.

Gul, bilbil û ney mekam û jale,
Tev de diqirin fixan û nale.

Zêrger tu î tu ne pilewer tu,
Seyda yî herê, û ser hiner tu.

Meywa te xweşe û avdar e.
Weq Xanî qî ye? tu qes niqare.

Bercis tu î tu, tu rêberê me,
Textê te di dil û ser serê me.

Tirba te ne ax e, canê Xanî.
Tirba te dile û cawidani.

Rehmet bi te ye û pesna yezdan,
Heyrana te ne, xulam û xakan.

Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan



Mirovên gihastî ji hebên silfato — her hebê wî çarîq gram — her rûj çar heb, zaro heta delî salî sê heb, şeş saetan berî hale nexweşîyê, serê saetê hebeq distînin zarowên yeqsali tinê niv heb distînin.

Bi vî awayî fehtiqê xwe derman diqin. Piştî heftiqê du heftiyên din dermanê xwe sê rûjan distînin û sê rûjan berdidin.

Eve, ta, tawî û tabîn. Heqe hon ji ya min diqin nexweş naqevin, qo biqevînin li zû bi zû kenc dibin.

Dr. Ehmed Nafiz

Dewama Nivîsa Li Ser Nexweşîyan û Helbesteke Dr. Kamiran Bedirxan



Qovara Qurdî * Revue Kurde

Edebiyatî Qurdî

Lêraneda demanewêt be qurtî basî edebiyatêq biqeyn qe îlakeyêqî zorî heye legel edebiyatî dinya, we be - taybetî edebiyatî arî. Nextêq le hendê edebiyatî rojawa deqat, we hendê lêy enda debêt, ewîs «edebiyatî Qurdî» ye.

Herweqû tarixî qurdan be nezanrawî mawetewe we hêsta betewawetî le lay tarîx zaneqan nezanrawe, edebiyatî qurdîş bew çesne malûm niye we malûm nebûwe. Herweqû ême betewawetî ew şitane nazarî qe tesîrî qirdiwete ser qurdan, we tarixî qurdan herweha ew şitane nazarî qe tasîrî qirdiwete ser edebiyatî qurdî, inca ew şitane aya siyasî bê, qomelî (civaqî) bê yan dînî... h. p.

Hemîsan çûnqe kewmî qurd tûşî lafawî gelanî kewman bûwe, we kewmanî cûda cûda hemû exlaktî, edebî, qomelî (civaqî) tasîr yan qirdiwete ser yan, zimanîşyan tasîrî lêyan qirdiwe.

Ew milete bêganane qe hatûnete qurdistan we em wilateyan dagîr qirdiwe, qemu zor tasîr yan lêyan qirdiwe we şêqyan beçê lêştiwe, we beşî qurdeyn qe qewtûwete ber em lafawane lejêr tasîrî dînu zimanî tabiyatî ehwalî qomelî ewane mawetewe. We çûnqe kewmî qurd nezan bûwe, we medaniyyetî ew milletane zor bûwe, destîyan qirdiwete werqirdîni medeniyyet lêyan. Inca legel medeniyyet, şitî dîqesyan werdegîrd. Weqû: ziman, edebiyat, helbest, ehwalî qomelî... h. p.

Leber ew şitane qe le serewe gotman qurdeqan hetaqû êstaqe le zimanî xoyan ziyatîr, le edebiyatî zimananî bêganê tedeqoşî. Her be boney ewewe qurdeqan bo edebiyatî qurdî teneqoşîwue,

we edebiyatî qurdî - ewey qe heye - herwa be nezanrawî mawetewe.

Hemû xwendewaranî Hawarî xoşewîst dezanî qo gelî qurd qelêqî arî ye, yanî Hindî - ewrûpî ye. Leber ewe zimanî qurdî we edebiyatî qurdîş weqû zimananî edebiyatî dîqey arî ye, we edebiyatî qurdî le edebiyatî Farsî, Hindî, Yonauf qon, Rûsî, Frensîzî, Elemanî... h. p. zor deqat. Inca bo ewe qe em hekikete çaq têbigeyn, ba hendêq basî edebiyatî çesnanî biqeyn.

Edebiyat pêq hênanu gotinî mîşqû fiqrî insane be çesnêqî ciwanu xoşu saf qe tasîr biqat le ser insan, aya insan xemqînu dilteng deqat, yan ferehnaqu dîlxoşu qeyfdar deqat.

Edebiyat ew şitaneyê qe le dîlî insan gîrd debêtewe we dîtu derêt we derî deqate derewe, we deyîlê be zimanêqî sirî û ciwan.

Inca edebiyat bêjînu gotinî hemû şêq niye, beşqû ibarete le gotînu bêjîni şêq qe bestirawe be (jiyan) ewe, we qe pêwîstî jîyane. Yeqê le edebîyî Misrî, gewre «Abbas Mehmedî Ekkad» gotîwyetî:

Jîyan çî ye we edebiyat çî yellî.

Du şitî le yeq şitî dururî qirawî we be yeq dezû çîrawî we le yeq qarxane der çîne. Lemew pêş xelq pêşewîst qe boyan îspat biqen qe edebiyat be bêjîyan pêq nayêt, belam êstaqe zor pêwîstîyane qe boyan îspat biqrêt qe jîyan be bê edebiyat nabêt. Legel ewesde ferkêq niye le beyanî em du hekikete: Mebest her weqû her jîyanê edebiyatêqî heye, hemû edebiyatêqî jîyanêqî heye, we her duqyan be yeq çîst de pêwrêt we berzî û nîzî dezanrêt.

Ey we xwa hîc jîyan be bê meylu

دومیلیا سبورکی

روژی روژان د د وین د هوار دا کونټ .
شاری دو پیر ورمای . دوی میان د کرگین و
دس لیرکی چا د مندی . لوی یندو فشان اینان
را پیدای . کرگک خپلی ترسا . لوی آی ری فا:
- اژدو تو بورا توری لیرکان
گرگک جری فا: حتا حوت روژی یندر

لوی جری فا: فاندی چی چی ؟
کرگک جری فا: لیرک بول وړد کی
لوی زانا د د کس چنیو فنګک نی کرده
شی . کرگک کونټ فساوت . نوری لیرکان
دو را فترا . شی آری هی هت . اژا آشوانچی
نی دینای . کرگک هوار کرده ، جری فا:

- اوړو لوی بین مارا پیدای ، من ری
فا . اژدو تو بورا . من جری فا حتا حوت روژی
یند . لوی شی ، فنګک نی کرد . ت نکا
نازی و کینکان جاده ک حتا د دی لوی بنو
آشوانچی فا: بول رندو

او وخت پوستی لوی نوای چتوری کردی .
آشوانچی خپلی پی ویش بی . کرگی ری فا:
- اژو نو میدان دلانین پیکین . اژو نوری
کینک و نازی بیان کون . اگر ددی لوی آمه
تنکی آی در را کای بکه . او دو توری
فازی : «ای کرگی ، کرگی ، کرگی ! اژو
تو پوری توری لیرکان» . بادوت جرافاژ:
«ای ددی آشوانچی ، ت بخوه و کینکی فندي
بی تیر»

لوی آمه میدان ، فندا کرگک ، کرگک شی ، جری فا:
- چرنکی ت نکامن پوری ، من ری وښو
تنکی کای کران

دستی ژ وینی گروتی . کرگک جری فا:
من ری دیری پک
لوی فا: ای کرگی کرگی ، نکا اژو نو

بورا نوری لیرکی نو

کرگک فا نوبتا منا ، دست پا کرد:
ای ددی آشوانچی بی تیر ، ت بخوه و
کینکی فندي

لوی ترسا ، فا: هونی ، فاژ ، آخر اژو ترسو
فسه ی تمام کردی ، ددی آشوانچی فترا .
نازی و کینکان وختو لوی دینای ، گروتی و فسنای .
آشوانچی ب لوی ، کرگی و لیرکان بی شای .

دومیلیا پالوی

روپچی روپچا دوپیکي ده هوار کونټ .
شاری دو پیر ورمای . میانی دوه جامند کیرگک
نولی دس لیرکان . پنه ری لوبیک پیدای
زحف فشان . کرگک زحف ترسه . لوی ترفا:
- اژو نو پوری نولی لیرکانی نووی یا

کرگک ترفا: فا: یندر حتا حوتنا روپچی
لوی ترفا: فی چنبا

کرگک فا: لیرچکی زحف فچبی
لوی زانا بی دوه دو چو چنیو ، فنګ
ن کرده ، شی . کرگک کت دشش ییابیش .
دو را نولی لیرچکانی خویا فچبای . شی آریه .
اوجا آرانیچی یدی . کرگک هوار کرده . ترفا:
- اژو نو لوی بک من ری پیدای بی . من را

فا اژو نو پوری . من ترفا یندر حوتنا روپچی .
لوی شی فنګک ن کرد . ت انکای نازی
و روپچی حد رک ، حتا پو لوی بنو .

ار بالچی فا: زحف حو لو
ان وختو پو متی لوی نوای چتوری کیردیه .


آرانیچی زحف پی ویش بی . خو حدره کرد .
کرگک رفا:

- اژان میدان د فک بکین . نولی نازی
و روپچان د کیری . اگر کی آپ لوی آمه تایی
جری بر فسی . او نوری ده فاجو : «هی کرگی ،
کرگی ... اژو نو پوری نولی لیرچکانی نووی یا»
بالچی ت ترفا فاج : «هی آپ آرانیچی ، بی
تیر ، ت بخوه و روپچی فندي»

لوی آ می میدا ، فاندای کرگک ، داه کرگک
شی ، ترفا: فچبکی ت انکای من پوری
من ری و شو اژو بیکه کی برقس
لوی فا: حو لو

دستی بوو بی کرد . کرگک ترفا:
بیکه کی ماری دیری بکی
لوی فا: هی کرگی . کرگی اژو انکای
ت و لیرچکانی ت پیا پوری .

کرگک فا: سهری منو ، هی آپو آرانیچی
بی تیر ت بخوه و روپچی فندي یا
لوی ترسا ، فا: آنو مه فاج ، آخری اژو
ترسا . فالی خوتام کیردی آپو آرانیچی فچبا .
نازی و روپچی هلاک لوی دی ، د حال ده
گرت و خفتنای . آرانیچی ب لوی ، کرگک
ولیرچکان شای .



Ruxseta Ji Bo Derxistina Hawarê



Mîr Celadet Ali Bedirxan